# Vejîna Li Welatê Rojê

**(Pirtûka Heftemîn)**

# TOFANA AZADIYÊ

**Cîlda Yekemîn**

**Fehîma Deştan**

**Weşanên Dibistana Wêjeyê ya Şehîd Şîlan Baqî**

## BEŞA YEKMÎN

Kalekî bikopal li ser devê rê sekinîbû. Germa Tebaxê li rûyê wî xistibû. Ji ber toza ji deşta Berliyasê dihat, çavên wî bi zorê vedibûn. Li ber tîrêjên rojê, mest bibû. Ji germa şaşika serê xwe bi ser eniya xwe de xwar kiribû. Çavên wî li mersedesa şîn bûn. Çavên xwe baş vekirin, germa rojê ji bîr kir, çawa ku toz tine be, derdorê wî dinya rawestiya be, li ser lêvên wî yên ji germa ziwa bûbûn, berkeniyeke xweş ketibûyê. Wisa çavên wî bi seyarê re çûbûn. Kalo bala ajokar kişandibû, lê piştî kêliyekê bala xwe ji ser bir. Di ser milê xwe re li kesê li ser kursiyê paş nêrî. Bi rêzdarî û bi dengekî nizim:

-Serokê min, em bi kû ve biçin?

Lê ti bersiv ji paş ve nehatin. Diyar bû ku bala wî li dereke din e. Seyare hêdîka diçû. Ajokar bi gotina xwe re berê seyareyê da şerîta milê rastê. Camên wê vekirî bûn. Bayekî germ li pencereyê dixist. Ji aliyê deşta Berliyasê ve bablîsokeke ji tozê ber bi bajêr va dihat. Ajokar xwêdana li ser eniya xwe paqij kir. Apo di pencereyê re li gengeşeya li ser rê temaşe dikir. Ji ber tozê cam girt. Piştî bablîsok çû dîsa vekir. Pora wî ber bi paş ve pêl bi pêl bi ser hev de qulibîbû. Mûyên spî di nava por û simbêlên wî re xuya dikirin. Gumlekekî leşkerî û pantolonekî bêj lê bûn, boteke sporê jî di piyên wî de bû. Çavên xwe li ser tevgera mirovan ya li ser rê rawestandibûn. Awirên çavên wî yên reş dijwar û bihizir bûn. Ji tozê du-sê caran li ser hev bêhnijî. Mendîla xwe ji berîka xwe derxist da ber difna xwe. Tiliyên xwe yên zirav û dirêj bi ser birhên xwe yên serê wan li hev badayî re birin. Piştî tiliyên xwe ji ser wan rakirin, serên wan li hev zîvirîn. Rûyê wî pir geş bû. Kê carekê awirên çavên wî yên biwate bidîtan,

zûbizû ji bîr nedikirin.

Dêmên ajokar jî yên Kurdekî çiyayî bûn û rûyekî aram li ser bû. Simbêlên wî bi ser lêvên wî de daketibûn. Mirovekî baldar û di wê zanebûnê de bû ku kesekî girîng pê re ye. Polîsên trafikê seyare sekinandin, pirs li ser pirsan ji ajokar kirin. Apo bi awayekî aram guhdarî wan dikir. Piştî pirs û bersivan seyare ket ser riya xwe. Çavên wî bi kalê ber bi seyareyê ve dihat ketin. Berî çend kêliyan jî bala wî çûbû ser. Berê xwe da aliyê ajokar:

-Orhan ka bisekine, ev kalê ha ber bi me ve tê!

Orhan seyare li kêlekê sekinand. Kalo bilez ber bi seyareyê ve meşiya. Bê ku berê xwe bide ajokar, ber bi pencereya paş ve çû. Apo cam daxist:

-Merheba mamo!

Kalo bikelecan û kêfxweşî destê xwe di pencereyê re derbas kir:

-Tu çawa yî serokê min? Tu serokê me yî, ez te nas dikim. Min tu li akademiyê dîtî, lê ji dûr ve.

Kalo bi kenekî ku xêzikên (gotina qermîçok baştir e) ser rûyê wî tev diyar dibûn keniya. Koçberiya salan û dûrbûna ji welat weke mohrekê li ser rûyê wî xuya dikirin. Di awirên çavên xwe de nîşan dida ku welat û xwediyê xwe dîtiye. Tavilê ew hesret û xemgîniya li ser rûyê wî wenda bûn, li şûna wan rûyekî geş û kurdewarekî çiyayî hatibûn. Qutik û şalwalê wî bi awayekî bêserûber hatibûn dirûtin. Diyar bû ku mirovekî xizan e. Saeteke bi zincîra zîv di berîka wî de bû. Cemedaniyeke sor û spî li serê xwe pêçabû û berçavkeke camên wê stûr li ber çavan bû. Hingî çavên wî hûr û kûr bûn, bi zorê xuya dikirin. Lê çirîsik ji wan diçûn û rondikên kêf û hesretê kaniya çavên wî tijî kiribûn. Bi destên xwe yên ji bayê çiyê hişk û terikî destê wî girt. Apo jî destê wî kir nava her du destên xwe, şidand. Xwêdan bi ser eniya kalo ketibû. Ew destê ku destê ti kesî nedigihatiyê, di nava destê wî de bû. Bi rûyekî geş li nava çavên kalo nêrî:

-Ser çavan, tu çawa yî mamo? Dibe ku te ez şibihandibim hina? Ez jî mirovekî weke we me!     Kalo jî kalo bû, pora serê xwe li êş spî nekiribû û bi awirên xwe nîşan dida ku wî pir baş nas dike:

-Ez di nava hezar kesî de rûyê te bibînim ezê nas bikim! Ev rûyê jiyan dayî me, çawa ezê nas nekim? Ez bi doza te re me. Em Kurd bê te ne tiştek in, bi te em hene. Min îro tu dîtî, ev besî min e ku ez temenê xwe tevî bidim vê dozê! Tu bi xêr biçî serokê min, çavê her kesî li te ye. Em hatin cihê perwerdeya leşkerên Kurdistanê, ew hesret di dilê min de mabû. Dewlet serê te, me ew jî dît.

Hinekî li derdora xwe nêrî:

-Bibore, min li vê naverastê hûn sekinandin, niha karê we jî heye. Ezê dîsa bêm jorê. Mala min jî nêzîkî Helwa ye. Em ji zû ve ji Bakurê Kurdistanê koçber bûne, lê va tu heyî, emê vegerin welatê xwe!

Apo pir jidil guhdarî dikir. Kalo jî, çawa ku bêje, ezê careke din li kû bibînim, dixwest ya di dilê xwe de bêje:

-Em dixwazin her tim hêza te li ser te be û çavên te li ser me bin. Ew şoreşa ne li ser hêza gelê xwe be, wê bin bikeve.

Rojên di van riyan de li têkiliyekê, dostayiyekê digeriya hatin ber çavên Apo. Di dilê xwe de got, ev der ne cihê axaftinê ye lê divê em tiştekî ji mamo re bêjin:

-Her tim ez çîroka xwe ji gel re dibêjim; min xwe çêkir, min partî û artêş jî çêkirin û niha ez we çêdikim. Her tişt li ber we ye, tişta ji we tê xwestin meşa di vê rê de ye.

Kêfa kalo pir hatibû, lê herî dawî wî jî fêm kir ku axaftina li ser devê wê rê ne baş e. Êdî dengê xwe nekir.

Çavên Orhan jî li derdorê bûn:

-Ma em neçin serokê min?

Apo bi ken û kêfxweşî berê xwe da kalo û destên wî kirin nava her du destên xwe:

-Mamo, emê vêca biçin, bi xêr bimîne, spas ji bo te. Kesên weke te vê dozê dimeşînin ne ez.        Kalo bi wateya silavê destê xwe da ber eniya xwe û bi xatirxwestinê xwe paş ve da. Orhan bilez seyare ajot. Di pencereyê re jî li kalo temaşe dikir. Birha xwe dabû ser kopalê xwe, wisa sekinîbû û çavên wî li seyareyê bûn. Bedena wî li wir bû, lê awir û hestên wî bi seyareyê re diçûn.        Apo careke din bi awirekî kûr berê xwe dayê û jê dûr ketin. Pişta xwe spart kursiyê paş; rojên destpêkê hatî Şamê, li cem malekê mayî hat bîra wî:

-Destpêka hatîm Şamê, ez û pismamê xwediyê malê di odeya mêvanan de nivistin. Sibê zû min pirtûk dixwend. Çawa çavên xwe vekirin, got, ez te nas dikim, tu Apo yî. Min wêneyên te di rojnemeyên Tirkan de dîtine. Firsend nedida ku bersivê bidim, got, min li Erebistanê kar dikir, kovar û rojnemyên Tirkan pir dihatin, li ser te pir dinivîsin. Li vir jî ji we re dibêjin Telebe, hûn ji ber zilma Tirkan reviyane, hatine vir. Ez şaş mabûm, min jê re got, na ez ne ew im, navê min Elî ye. Lê ji çavên xwe bawer bû. Serê xwe hejand, got tu Apo bixwe yî. Piştî hingê car bi car em bi hev re dadiketin nava bajêr. Gotina min ji kevaniya malê re gotî, “divê tu goreyên zilaman neşûyî û cihnivînên xwe jî bila ew bixwe daynin û rakin.” bala wê pir kişandibû. Ji wê rojê heta kêliya tê de anîn ber çavên xwe. Ji nava xeyalên xwe derket:

-Ka radyoyê veke, çi heye?

-Serokê min, dengê Ereban tenê dikişîne.

-Xem nake, emê guhdarî dengê wan bikin.

Orhan radyo vekir, li ser straneke erebî hişt:

-Serokê min, niha nûçe nînin ez bigirim?

-Wa dibêje, bawer dikim Um Kelsûm e. Mûzîka erebî pir xweş e. Tê de giyan, welat û germayî hene. Bi riya mûzîkê li ser piyan mane, lêbelê mûzîka arabesk, mûzîka erebî xirab kiriye. Di mûzîka arabesk

de giyan dimire, hêvî, mirovayî namînin. Mirov serxweş û bêhiş dike. Çi kesê ketî binê bandora mûzîka arabesk weke serxweşan e. Li Kurdistanê jî piştî hatina cuntaya leşkerî ya 12'ê Îlona 1980'yan, ev mûzîk belav bûye. Ez dibêjim mûzîk giyan e. Tu çi dibêjî?

Orhan hinekî sekinî, stiranên guhdarî dike anîn bîra xwe:

-Serokê min, ez zêde guhdarî mûzîkê nakim, lê li mala me kasetên Mihemed Arif, Eyşe Şan û Mihemed Şêxo hene.

Ne li benda bersiveke wisa bû:

-Tu çawa guhdarî nakî, mûzîk giyan e. Kesê ji mûzîkê hez neke, ji jiyanê jî hez nake. Kesê ji jiyanê jî hez neke, ti carî nikare xwe xwediyê jiyanê bibîne. Ez pir guhdarî mûzîka klasîk dikim. Li Mihemed Arifê Cizîrî, Kawîs Axa û yên din… Di mûzîka wan de jiyana gel û evîna welat hene. Qehremaniya gel, şerê navbera êl û eşîran, helwesta li hemberî dewletên dagîrker, ango bi giştî panoramaya civaka Kurdistanê diyar dike. Klasîkên kurdî gelek bala min dikişînin, di her stiranê de destaneke jiyanê heye. Şoreşa me bi stiranan dest pê kir. Yek ji wan stiranbêjan jî Aram Tîgran bû. Şoreş bixwe jî rengekî huner e. Pêwîstiya wê bi huner heye, ku huner nebe şoreş jî çênabe.

Orhan hinekî şerm kiribû:

-Serokê min, ji niha pêve ezê pirtir guhdarî bikim.

Seyare li ser riya kevin ya ji Şamê diçe Beyrûdê bû. Du paytextên bedew yên şopên dîrokê li ser wan mayîn. Di ber wan rêzeçiyayên li peravên rojhilatê Derya Spî re derbas dibûn. Warên destanan, yên şûnpiyên xwe li Îbla hiştîn û li ser eniya wan şopên xemgîniyê diyar dibûn. Çavên wî ji wê bedewiyê venediqetiyan. Di geliyê Bîqayê re ber bi bajarokê Berliyasê ve diçûn, yê navê xwedayê xelaskirin û bereketê li xwe kirî. Li pişt xwe, Girê Serhûn, Keleha Romayê, Mizgefta Berliyasê, Dêra Mar Elyas, yên pala xwe dayîn çiyayên rojava û xweşikbûna geliyê Bîqayê kemilandîn,

dihiştin.

Her ku xwe berdida hafîze û bîra dîroka vî welatî, yê cengên giran li ser erdê wî qewimîn, hatina xwe ya vê neqeba bûyî pira Rojava û Rojhilat, baştir biwate didît. Ji Fenîkeyan heta Aşûrî, Misrî, Babîlî, Fars, Girek, Bîzans, Ereb, Osmanî û Fransiyan, xwe li erdê vî welatî rakişandibûn. Xweza û bedewiya welatê Lubnanê, Bûka Rojhilata Navî bala wî pir dikişand:

-Cihên dîrokî li van deran pir in, şopên kevnar li ser wan mane. Li pey xwe bajar û kelehên dîrokî hiştine. Cihên berxwedanê ne.

Berê xwe dabûn, ciyê çandeke dewlemend, ew ciyê bawerî, deng û rengên cuda lê heyî. Welatê bi daristanên ji darên Erizê hatî xemilandin û bêhna bixûra wan ji hawîrdor difûrî. Welatê navê xwe ji spîtayiya berfa serê çiyayan girtî û bi bêhna emberê hatî naskirin. Welatê kevirên kilsê û spîtayiya berfê jê re bûyîn kirasê bûkaniyê. Li gorî baweriyên berê welatê bûyî Dilê Xweda.

Bi ketina sînorê Lubnanê re, nexşên dîrokî, deverên perav, çiyayî, kelehên bedew, geliyên delal û şopên serhildêriya gelan heybeta xwe nîşan didan. Li dîwarên bajêr, yên bi durişmên berxwedana li hemberî Îsraîlê hatîn xemilandin dinêrî. Dengê çalakiyên li her qadê bilind dibûn, di warê siyasî de cudatiya nêrînan, nakokiyên partî û taîfeyan, bêistiqrariya herêmê hişê wî mijûl dikirin. Bêzarî û xemgîniya bajêr ya ji ber nakokiyên siyasî û şerê navxweyî ya ji sala 1975'an ve, didîtin. Ev pêlên deryaya nakokiyan hê ranewestiyabûn. Di nava dilê vî welatî de li ber pêlên wê bi hostetiyeke zemanan, ji nava bîra dîrokê, bi tayên serdeman, çand û berxwedana gelê xwe dihonand. Her ku diket ser rê, demên borî dianîn bîra xwe, li ser demên tê de dihizirî û vegera Kurdistanê xeyal dikir.

***

Nîvê Tebaxa 1991ê bû, rojê li nîvê asîman konê xwe vedabû. Her çiqas tirêjên wê dijwar bûn jî, lê ji nava çiyayên derdora Bîqayê bayekî honik dihat û weke hevrîşim xwe li bedena mirov dipêça. Ji şînkayiya çiyayan bêhneke pir xweş belav dibû.

Li ser riya Suriye-Lubnanê gengeşeyeke mezin ya seyareyan hebû. Derdorên rê bi darên fêkiyan hatibûn xemilandin. Ji ber bayê ji çiyayên bilind dihat, pêl diket simbêlên genim. Ji her du rexên çiya bahûreke narîn weke baweşînkekê li naverasta Bîqayê dixist.

Orhan bê ku bersivê bide, dixwest her gotina Apo di serê xwe de tomar bike. Ji gengeşeya seyareyan berê xwe da riya Enberê, ber bi Keleha Emewiyan ve çûn. Dîwarê kelehê bi hosteyiyeke pir mezin hatibû lêkirin û bi nexşên bedew hatibû xemilandin. Apo di pencereyê re bi baldarî lê temaşe dikir:

-Orhan, ti kes li van derdoran nîne, em hinekî li vê keleha bedew û dîrokî binêrin.

Lê ji ber ku ew tenê pê re bû, ev xwestek ne bi dilê Orhan bû, lê dîsa li ber deriyê kelehê sekinî. Bi derketina Apo re ew jî bilez derket. Li ber derî du kart girtin, derbasî hundir bûn. Çavên Orhan li ser derdor bûn. Apo li ber stûnekê sekinî, bi nêrîneke kûr lê temaşe kir. Bedewî û hosteyiya keleh pê hatî avakirin, di hizir û ramanê xwe de honandin û xeyalên wî çûn ser mezinayiya hunerê mirovayiyê:

-Orhan, li van erdan şerên pir dijwar çêbûne. Perestgeh û çiya bûne cihên parastinê. Bi her êrîşê re bajar û perestgeh hatine roxandin. Di şerê navbera Misilman û Xaçperestan de jî van erdan têra xwe êş kişandine. Lê ne şeran tenê, erdhejan jî pir zerer daye. Peravên deryayê ji laşên mirovan tijî bûne.

Her ku ber bi berhemekî dîrokî ve diçû, Orhan jî xwe bilez digihandayê. Hêdî hêdî dimeşiya û bi temaşekirineke hûrûkûr li derdor dinêriya. Piştî gera saetekê, ji kelehê derketin, li seyareya xwe siwar bûn. Li saeta xwe nêrî:

-Orhan, lezê bike, em xwe bigihînin Meşxelê. (Cihê perwerdeyê) Divê em careke din hevalan jî bînin vir. Bila ew jî bibînin û qîmetê dîrokê bizanin.

Berê xwe dan riya Berliyasê. Nîvro bû, dengê bangê ji mizgeftan bilindi dibû. Piştî bangê bi çend kêliyan dengê zengilê dêran hate wan. Zengilê şahiyê yê ku li pey hev bi awayekî lez lêdiket guhdar dikirin. Apo çavên xwe li ser zinarên asê nîşan û nîgarên hatîn verûtin rawestandibû. Ketin nava Berliyasê berê xwe dan avayiyekê. Avayiya ku berê wan lê, pir bêserûber bû. Derdora qata yekê bi bilokan hatibû girtin. Seyare di kêlekê re ber bi aliyê piştê ve çû. Ji seyareyê daket, ber bi deriyê vekirî ve çû. Ji bo pêşwaziyê, li ber derî yekî bejinzirav û esmer bi rêzdarî sekinîbû. Destê wî girt û himbêz kir:

-Agir, tu çawa yî, rewşa we çawa ye?

Digel ku her du hevalên hev yên destpêkê bûn, Agir bi axaftin, liv û tevgera xwe diyar dikir ku li hemberî mirovekî pir zana, mezin û serokekî dîrokî sekiniye. Dixwest wê çanda mirovayiyê ya dîrokê di şexsê xwe de nîşan bide. Rêzdariya wî bala yên derdor tevan dikişand. Di wî dîmenî de meznayiya hevaltiya wan didîtin. Her ku li Apo dinêrî, kêmayiyên xwe didîtin. Ji dana perwerdeya şevê, rûyê wî zer bûbû. Apo jî bi nêrîn û tevgerên xwe qîmetekî mezin didayê. Bi dîtina Apo rûyê wî geş bûbû:

-Spas serokê min, em hemû baş in.

Apo destê xwe danî ser milê wî:

-Ev demek e me hûn nedîtibûn, lê hûn dizanin, karê me pir bû.

-Serokê min, heta ji me tê em dixwazin bigihîjin tempoya we ya kar.

-Baweriya min bi xwesteka te heye. Em derbasî hundir bibin, paşê emê dîsa biaxivin.

-Temam serokê min, heval jî hemû amade ne.

Bikelecan ket hundir. Ji bo pêşwaziyê nêzîkî sih xortî li ser piyan sekinîbûn. Piştî silavdayînê derbasî pişta maseyê ala sor li serê sekinî. Xort jî bilez li ser darên li ser bilokan hatîn danîn rûniştin. Bi rûyekî geş berê xwe da wan:

-Kurd nû xwe ji siyaset û partiyên dijmin dûr dixin. Berê xwe inkar dikirin. Bi navê heqîqetê gelek kesan xwe inkar dikir. Demokrasî ew e ku Kurd bêje ez heme, ez Kurdekî bindest im û pêwîstiya min jî bi azadiyê heye. Sosyalîzm jî wekeheviya mirovan û xwenaskirin e.

Serê xwe hejand û hinekî jî berken bû:

-Gelo çend Kurdên wisa hene? Demokrasî ew e ku mirov ji bo xwe têbikoşe. Ez jî bi tevayiya hêza xwe têdikoşim. Gelê Kurdistanê, gelê herî fedakar e. Di vê dozê de pir şehîd dane. Ji derveyî serkeftinê ti rê nînin û jiyana em qebûl bikin jî li Kurdistaneke azad e...

Çirkênî ji hundir nedihat, bikelecan û xwestekeke mezin guhdarî dikir. Her gotina wî, liv û tevgera wî di hişê xwe de tomar dikirin. Piştî axaftina sê saetan, li saeta xwe nêrî:

-Hevalno, me hin tişt gotin. Carên bê jî emê gelek tiştan bêjin. Emê derfeteke herî piçûk jî binirxînin. Vê dewreya xwe bi serkeftî biqedînin. Ya girîng xwestek û hêza we ya xweguhertinê ye. Niha hûn dikarin pirsên xwe bikin?

Gelekî ji wan cara yekê bû serokê xwe didîtin. Di awir û temaşekirina wan de bixwebawerî û serbilindî hebû, temaşekirina berî bi hezarê salan bû. Dîtinê axaftin qedandibû. Rastiya jê re digotin “Kurd nebîne bawer nake”, ev bixwe bû. Pênûsa milîtanekî ji destê wî ket. Li cihê deng jê hatî nêrî. Vê şiyariya wî bala her kesî kişand. Xwediyê pênûsê bi nêrîna wî re peyama xwe girtibû. Li pişta mase hinekî çû hat dîsa li wan nêrî:

-Baş e, emê niha biçin, lê di demeke nêzîk de emê dîsa hev

bibînin. Derfetên di destên xwe de baş bi kar bînin. Ev derfetên perwerdeyê bi destê her kesî nakevin. We tevan silav dikim û ji bo we serkeftinê dixwazim.

Bi vê gotinê re her kes rabû ser xwe, li çepikan xistin. Wî jî bi wan re li çepikan xist û ji bo xatirxwestinê her du destên xwe bilind kirin. Piştî derket Agir jî bilez xwe gihandê. Lê vegeriya:

-Agir, divê em îro zû biçin, gelek karên em bikin hene. Dewre ber bi dawiyê ve diçe. Hûn dixwazin tiştekî bêjin?

Agir bi bejna xwe ya dirêj, pora xwe ya di milekî de şeh kirî, ceynikên spî, gumlekê gewr û pantolonê kitanê zeytî, bi rêzdariyeke mezin lê tenişta wî dimeşiya:

-Na serokê min, tiştekî wisa mirov bêje niha nîne. Em hewl didin bi hevalên akademiyê re perwerdeyê biqedînin. Hin pirsgirêk hebûn, em bi riya platforman li ser wan rawestiyan. Di vê demê de emê dîroka PKK'ê bidin û hevalan ji bo piratîkê amade bikin. Em hevalan tevan neşînin jî, wê qismeke mezin amade be.

-Baş e, di dîroka PKK'ê de pêwîst nake em bên, lewre hûn wê dersê baş didin. Piştî dîroka PKK'ê emê bên tevlî sozdayînê bibin.

Bi hev re ber bi seyareyê ve meşiyan. Xatirê xwe ji Agir xwest, bilez li seyareyê siwar bû. Heta seyare ji wir dûr ket, Agir ji cihê xwe nelebitî. Tevgerên Apo û naskirina wî ya roja destpêkê careke din anîn ber çavên xwe.

Seyare di geliyê Bîqayê re, di nava rezên tirî, darên zeytûn û porteqalan de ber bi çiyê ve diçû. Ji xweşikbûn û bedewiya xwezayê çavên wî ji cihekî diçûn ser cihekî din. Li ser rûyê wî nîşanên lezeke mezin xuya dikirin. Her ku seyare pêş ve diçû, baştir li derdora xwe dinêriya. Seyare ketibû riyeke ax. Di navbera du giran de, li keviya rê du kesên çekdar û bicilûbergên leşkerî sekinîbûn. Deriyê derbasbûnê bû. Li ser kevanê li ser derî, bi xetên stûr "DERIYÊ SERKEFTINÊ" hatibû nivîsîn. Bi naskirina seyareyê re çekdaran

xwe da aliyekî. Berî ku seyare bikeve qadê, peya bû. Silav da nobedaran û hêdî hêdî ber bi meydana fireh ve meşiya.

Meydan bi qasî qada futbolê hebû. Piyên xwe hêdîka diavêtin ser erdê wê yê hişk û rût. Hinekî li meydana merasim lê dihatin lidarxistin temaşe kir. Li cihê merasima Hesen Bindal lê hatî lidarxistin sekinî. Ji wir ber bi cihê çêkirina xwarinê ve çû. Piştî silavdayîna xwarinpêjan, berê xwe da depoya cilûbergan. Pişt re çû dibistana bi blokan hatî çêkirin. Li ber derî ala PKK, ARGK û ERNK'ê li ba dibûn. Mêvanxane jî li tenişta wê bû, hinekî jî li derdora wê geriya. Li ber wêneyê Egîd li derdora xwe temaşe kir. Çawa ku ji bo parastina akademiyê hatibin danîn, meydan weke çeperekê, bi girên tijî lat, kevirên gir yên weke kêran tûj û darên bistîrî hatibû pêçan. Li serê giran tevan nobet dihat girtin. Li kolikên milîtanan yên di pesarên giran de bi daran hatîn çêkirin nêrî.

Ji ber ku rêveberiya akademiyê bi hatina wî dereng hesiyabû, ketibû nava rewşeke awarte. Ji bo lidarxistina merasimê, her kes di nava tevgerê de bû. Milîtanên jin û mêr, biçek û cilûbergên leşkerî, kom bi kom ber bi qadê ve dibeziyan. Berpirsê akademiyê ber bi aliyê wî ve beziya, li pêşiyê bi awayekî leşkerî rawestiya. Xortekî porreş, rûxgeş û bimoral bû. Bejna wî jî ne kurt ne dirêj bû. Piştî standina tekmîlê berê xwe da merasimê. Li pêşberî wan silav da, pişt re yek bi yek destê wan girt. Piştî silavdayînê gazî yê berpirs kir:

-Rewşa akademiyê çawa ye, hûn çi dikin?

-Serokê min, em amadekariyê dikin.

-Baş e, lê divê di amadekariya we de ti kêmayî dernekevin. Heta ji we bê divê hûn pêşwaziyeke baş bikin.

-Serokê min, heval jî xwe li gorî wê amade dikin. Ji bo dawîkirina dewrê jî me ji hevalan rapor xwestine, emê platformên wan çêkin. Li gorî pêşniyaran emê wan li qadan belav bikin.

-Temam, divê hûn şiyar bin, dijmin dixwaze li vir jî me tengav

bike.

-Serokê min, li gorî wê jî em amade ne, ji bo bicihkirina hevalan me hin cihên bedîl amade kirine. Heval bi şev li wir dimînin.

-Temam, ezê niha bi cîhazê mezin bi hevalan re biaxivim, rewşa welat bipirsim.

Ber bi odeya li kêleka cihê rêveberiyê ve çû. Li hemberî cihê rêveberiyê li girikekî piçûk temaşe kir. Derê odeyê vekir ket hundir. Di hundirê odeya piçûk de, li ser maseyekî piçûk bêsîmek, hebû. Li ser kursî rûnişt destê xwe avêt mîkrofonê:

-Derya Spî, merheba, çi heye çi nîne?

-Rojbaş serokê min. Hin mijar hene, em dixwazin bi kinayî ragihînin. Ji bo perwerdeyê em pêncî kesî dişînin cem we. Ji Çelê hin heval hatine, tişteke neyînî nîne. Li Cûdî mayînek teqiyaye, leşkerek birîndar bûye. Berî du rojan hevalan li wir çalakî kirine, lê hê me encam negirtiye. Li gundekî, nêzî 35 çeteyan çekên dewletê danîne.

-Hat fêmkirin, min digot qey agahiya we ji Bakur heye. Tişta tê zanîn bi komên mezin û şerên berfireh dewam dikin. Ev jî guhertina tektîkên wan nîşan dide. Di tevgera hevalan de fêrbûna kevin xuya dike. Divê dijmin piçûk neyê dîtin. Rêbazên xwe biguherînin, weke berê nêzîk nebin. Ew şerê li Bidlîsê çawa çêbûye?

-Serokê min, me hê agahiyeke berfireh negirtiye.

-Hat fêmkirin, şer rojekê dewam kiriye. Komên mezin dikevin şer. Demekê li Botanê wisa dikirin.

-Serokê min, me hevalên Xerza jî li ser rêbazên wan yên kevin rexne kirin. Emê rewşa hin herêman ji nû ve binirxînin.

Diyar bû ku ji van gotinên dawiyê hêrs bûye.

-Çi dibe bila bibe, divê ji rewşên sûc hesab bê xwestin. Yên xwe didin jiyandin divê hesab ji wan bê xwestin. Pîvanên me hene. Hin kesayet dixwazin me jî û gel jî bidin îdarekirin. Lê emê destûrê

nedin. Piştî 15ê Tebaxê em dikarin rêveberiyê bi giranî biguherînin, yan jî xurt bikin.

-Serokê min, li Başûr gel nêzî me dibe. Me alavên girîng şandin her qadê. Lê Serxwebûn û dahûrîn hindik hatine. .

-Temam, emê li ser şandina wan rawestin. Xala herî girîng perwerde ye. Derfetên şoreşê di her warî de hene. Divê her kes karê xwe baş bike. Nehêlin ti kes bi van derfetan bilîze. Silavan li hevalan bikin. Silav û serkeftin.

Piştî ku bi qadên din re jî axivî, derket derve ber bi dibistanê ve çû. Dixwest hinekî bimeşe, lê dinya pir germ bû. Berê xwe da odeya xwe. Ber bi maseyê peykerê Lenîn li ser ve çû. Hinekî lê temaşe kir. Li ser kursiyê xwe rûnişt, lênûs û pênûs derxistin. Ji her milî ve dengê çekan dihat. Dengê çekan li girên derdorê dixist û olan dida. Li ber van dengan pênûsa di nava tiliyên wî de li ser lênûsê bilez diçû dihat. Serê xwe rakir li pencereyê meyze kir. Li ber pencereyê sê çûkan baskên xwe li camê dixistin. Bê ku wan bitirsîne, hêdîka ji cihê xwe rabû, li nêzî pencereyê sekinî. Rojên li gund, rojên bi zarokan re dibezî û çûna nêçîrê anîn bîra xwe. Di nava wan xeyalan de li bedewiya çûkan temaşe dikir. Vê carê dayîka wî hat ber çavên wî; ew heybet û gotinên jê re gotîn anîn bîra xwe: “Ku wiha biçe tuyê tenê bimînî.” Careke din berê xwe da girên derdora akademiyê. Di xeyalên xwe de dîmenê Rojhilata Navî çêkir. Ji xwe re got, em li navenda Rojhilata Navî ne! Vegeriya cihê xwe bilez dest bi nivîsê ê kir. Bi tîpên mezin "Tevgera me di heman demê de tevgera hesabxwestinê ye" nivîsî. Bi destekî pênûs girtibû, destê din di nava pora wî de diçû dihat. Pora li pêşiya eniya wî hinekî weriyabû. Saetên rojê didan pey hev û rojê berê xwe ber bi jêr ve kiribû. Çawa ku bi tirêjên wê re di pêşbaziyê de be, dixwest zemanê xwe tijî derbas bike.

Li dibistanê platforman dewam dikir. Navbera dawiyê bû; her kes

li qadê dimeşiya û kom bi kom di nava nîqaşan de bûn. Çawa ku ilhamê ji wan bigire, di nava nivîsên xwe de çavên xwe car bi car ber bi wêneyên şehîdan yên bi dîwêr ve dikirin. Nivîsa xwe qedand, pênûs danî ser lênûsê, devê wê girt. Saeta sporê bû, rabû ser xwe çû qadê. Pênc şeş milîtan bi topê dilîstin. Top ji wan girt hinekî pê lîst. Taximên bilîzin amade bûn. Li her du taximan nêrî:

-Ez di kîjan taximê de me?

Deng ji her du taximan jî nehat. Fêm kir ku kîjan taximê bixwaze dikare bikeviyê:

-Cesûr, ez di taxima li hemberî te de me, em bilîzin.

Nêzî saetekê lîstin.

Roja din serê sibê, ji bo dersê xwe amade dikir. Gumlekekî şînê asîmanî û pantolonekî şînê petrolî li xwe kirin. Tiştên li ser mase, yek bi yek tev li cihên wan bicih kirin. Berî ku derkeve careke din li pişt xwe nêrî, her tişt li cihê xwe bû. Li erdê peleke darê li ber çavên wî ket. Rakir xist nava pirtûka xwe, berê xwe da dibistanê. Bikelecan ket hundir. Li ser kursiyê li pişt mase rûnişt. Ji jor heta jêrê li rêza milîtanan temaşe kir. Sîstema hundirê dibistanê hem cihê rûniştinê, hem cihê axaftinê weke Arena Romayê hatibû çêkirin. Destê xwe ber bi eniya xwe ve bir, xwêdana li ser paqij kir. Çavên xwe gerandin, li ser Cesûr sekinandin. Bi nêrîna wî re rabû ser xwe. Cilûbergên leşkerî pir li bejna wî hatibûn.

-Hevalê Cesûr, nîqaşên doh ji hevalên bi tirkî nizanin re hatin gotin?

-Rast e, serokê min.

-We jî axaftinên min yên doh fêm kirin?

-Tê fêmkirin Serokê min!

-Ji bo axaftina doh heval çi dibêjin? We encameke çawa jê derxist? Jiyana me tê fêmkirin? Dibe ku di nava we de yên tevlî vê jiyana me nebûyîn hebin.

-Serokê min her heval li gorî xwe fêm dike û encamê jê derdixe.

-Gelo çi encamê derdixin, xwe çawa dibînin, mesafeya di navbera wan û partiyê de çiqas e?

-Serokê min, mesafeya di navbera xwe û partiyê de dibînin. Dixwazin xwe bigihînin bingehê wê.

-Tu wisa dibêjî, lê hê jî nêzîkbûnên zarokane hene. Lê baweriya me heye ku dixwazin bi rêxistinê re bibin yek. Ji ber wê tevlî me dibin. Bi ser kêmayiyên xwe de naçin. Serê xwe naêşînin. Xwe zarokên rêxistinê dibînin. Çawa ku ji dayîk û bavê xwe dixwazin, ji rêxistinê jî wisa dixwazin. Ev uslûb ne yê şoreşgeran e, yê axa û zarokan e.

Çavên xwe danîn ser hev, axaftina xwe domand:

-Berî 15'ê Tebaxê pêwîst bû çi bê kirin? Wê çawa û li ser çi hîman rapor nivîsîne? Kesên dixwazin pirsan bikin û li ser encamên konferasa zindanê biaxivin hene? Li ser hişmendiya me ya sosyalîzmê, demokrasiyê û lîberalîzmê hûn jî dikarin nêrînên xwe bêjin. Hevalên li zindanan jî dikarin li gorî derfetên xwe konferansan çêkin û bi wî awayî pêşbîniyeke nû derkeve.

Piştî axaftina çend milîtanan, li ser geşedanên li zindanan, 1984'an, zarokbûyînê, hestiyariyê, tevlîbûna rast, fedayîbûn û xwespartina hina, bi awayekî berfireh nirxandin kirin. Carna li wêneyê Mezlum, Kemal û şehîdên din yên bi dîwêr ve daleqandî dinêriya. Berê xwe da milîtanên jin. Di nava wan de yeke ku her kes li hemberî wê rêzdar bû, di rêza pêşiyê de rûniştibû. Çavên wê ji ser Apo nediçûn. Yeka porsor, bejinzirav, çavhingivî û narîn bû. Sekna wê ya keseke jixwebawer bû. Çavên wî çûn ser vê jina porxelek. Ew jî bi awirên wî re rabû ser xwe.

-Hevala Sara, jirêderketin baş tê fêmkirin?

-Rast e Serokê min.

-Tiştên ez dibêjim zelal in?

-Li zindanan çalakiyên ku dibin sedema rewşên derveyî xeta partiyê, pêş dikevin.

Vê carê berê xwe vegerand ser milîtanan:

-Ev sûcekî mezin e; yan divê hûn li ser vî sûcî bisekinin û bi bîranîna şehîdan ve girêdayî bin, yan ji me veqetin!

Dengê wî bilind û bihêrs derketibû. Fedekarî û berxwedana zindanan ya salên 1979, 80, 81ê anîn ber çavên xwe û careke din berê xwe da Sara:

-Ji bo serrastkirina van mijaran hêza we ya rêxistinê jî heye!

-Serokê min, di mijara zindanê de gelek nirxandinên Serokatiyê çêbûne, lê hin mijarên wê demê nehatîn fêmkirin hene.

-Kîjan mijar, eşkere bêje!

-1984'an li ser berxwedana zindanê serokatiyê nerînên hevalan tevan girtibûn û bi awayekî zelal hatibû diyarkirin.

-Rast e, em behsa wan salan dikin, li ser kesayetên xwe nepixandîn. Em tiştên baş naxin nîqaşê, ew nirxên dîrokê ne. Em li ser kêmayiyan radiwestin û dixwazin çareser bikin. Me li ser berxwedana zindanê dest bi pêngava 15'ê tebaxê kir. Sala 1986'an piştî şehîdbûna Egîd, me hin heval bi zorê li ser piyan digirtin. Eger ne ji rexne û dahurînan bûya, me nikariya kongreya 3. pêk bînin.

Çavên wî çûn ser wêneyê Xeyrî:

-Xeyrî dibêje, li ser kêla gora min "Deyndarê welat" binivîsin. Eger hûn bi bîranîna wî ve girêdayî bin, hûnê wî deynî bidin! Kemal jî dibêje, ev şer deh salan jî, bîst salan jî biajo, wê serkeftinê bi xwe re bîne. Deh sal derbas bûn û me evqas qezenc kir, divê di deh salên bê de jî teqez em bi ser bikevin. Ev e berxwedana em behsê dikin.

Piştî nirxandineke dirêj, navbera nîvro hat dayîn. Sara li derve li ser kursiyekî rûniştibû, kûr kûr dihizirî. Weke kulîlka şilêrê serê xwe ber bi jêr ve kiribû. Careke din hevriyên wê yên zindanê li ber çavên wê diçûn dihatin. Gotinên Apo di serê wê de olan didan. Çawa ku li

têlên tembûrê bikevin, tiliyên wê yên zerî zirav diçûn dihatin. Lênûsa xwe ji berîka xwe derxist, li wêneyê Xeyrî yê li ser bergê wê nêrî. Dihizirî ka wê çawa bibe layîqî hevriyên xwe. Serê xwe rakir, li refa kevokan ya li asîmanê akademiyê difiriya temaşe kir. Her carê bi rengekî difiriyan. Li wan temaşe kir heta ji ber çavên wê wenda bûn. Hê kela di dilê wê de sar nebûbû. Lênûsa xwe vekir, li notên girtîn temaşe kir. Di wê navê re yekî bicilûbergên sîvîl û li kêlekên wî du kesên çekdar ji aliyê akademiyê ve ber ve hatin. Rabû ser xwe bi rûyekî geş bixêrhatin da wan. Çavên mêvan li ser req rawestiyabûn:

-Hevala Sara, min navê te gelek bihîstiye, ez li Şamê dimînim. Ez bi hesreta dîtina te bûm. Va min tu dîtî. Em tev bi berxwedana te serbilind in. Te ruh da me. Eger jinekê ew berxwedan kiriye, bi nêrîna min Kurdistan ava bûye.

Çawa ku dostekî xwe yê kevin dîtibe, wê jî bi kelecaneke mezin bersiva wî da:

-Heval, tu pir bi xêr hatî, ez jî dixwazim gelek kesan bibînim. Piştî perwerdeyê, ezê serdana gel bikim. Tu çawa hatî vir, ne zor bû?

-Na heval, ez gelek caran têm vir. Eger dema te hebe ez dixwazim tu hinekî behsa jiyana zindanê bikî. Gelek kes dixwazin te bibînin. Dema ez vegerim wê gelek kes ji min bipirsin. Tiştên tu bêjî ezê jî ji wan re ragihînim.

Baldariya wî, hatina wî ya akademiyê û axaftina wî gelek bandor lê kiribûn. Destê xwe danî ser milê wî:

-Min pirsa navê we nekir.

-Bavê Cebar. Ez ji Dêrika Hemko me. Berî naskirina partiyê, ez di Cepheya Şebî ya Filistîniyan de bûm.

Tev de li wir rûniştin. Sara li ser hovîtiya li zindanê û berxwedana li hemberî dijmin hatî kirin dest bi axaftinê kir. Du saet derbas bûbûn lê hê Bavê Cebar bi kelecana despêkê guhdarî dikir. Çavên wî ji ser

qet nediçûn, dixwest bi awirên çavên xwe pê bide fêmkirin ku tişta kirî gelek mezin e. Lê dema wî jî bisînor bû, li saeta xwe nêrî:

-Vê rûniştinê têra me nekir, divê mirov bi rojan guhdarî we bike. Tişta we kirî, ji bo şoreşê û jinên Kurd pîroz e, em mêr nikarin weke we bikin. Gelo, ez dikarim careke din we bibînim?

Kelecana wê jî ne kêmê ya wî bû:

-Ez jî dixwazim, kengê tu werî ser çavan.

Mêvanê wê çawa ku nexwaze biçe li nava çavên wê nêrî:

-Dayîka min pir behsa heybeta te dike, ji min re got, eniya wê ya li hemberî dijmin netewiyayî maç bike.

Hê gotina wî neqediyayî wê bi kelecan mêvanê xwe himbêz kir û wî jî qewîtiya diya xwe pêk anî. Mêvan bi dilekî hem xweş, hem xemgîn ji wir dûr ket. Berî ku ji qadê derkeve, bi şûn xwe ve vegeriya, careke din li kelecan û kêfa milîtanan nêrî. Di dilê xwe de got, ev li hemberî her tiştî tekoşînê dikin, li vê çolê binêre û li kêfa ser rûyê wan binêre. Hinekî sekinî û riya xwe girt û çû.

***

Saet 12'ê şevê bû, asîmanê Berliyasê, xwe ji toza rojê weşandibû. Stêr diberiqiyan. Her serê çend kêliyan stêrekek digurijiya, xatir ji ji asîman dixwest. Ji hawîrdor bêhna axa aviyan dihat. Çiyayên wê jî ji qelebalixa rojê, derbasî bêdengiya şevê bûbûn. Ji milê Balebegê ve bayekî honik li derdoran dixist. Yê bi roj Berliyas bidîta, şevê ji bêdengiyê nas nedikir. Ji toza rojê xwe ber bi zelaliya şevê ve berdabû.

Li derdora avayiya perwerdeyê nobedar belav bûbûn. Ji cihê perwerdeyê dengê Agir weke pêlên deryayê geh bilind dibû, geh nizim. Rêwîtiya Lubnanê di wan şevan de dest pê dikir. Komên milîtanan bi şev xwe digihandin wir. Heyvê li nîvê asîman konê xwe vedabû. Perwerde ber bi dawiyê ve diçû. Dengê çîçirkan bilind bûbû.

Agir li pişta mase dîroka Kurdistanê dida. Kesên di dersê de bi roj kar dikirin, bi şev jî perwerde didîtin. Du xort li kêleka hev rûniştibûn; yê porzer û çavxumarî gotinên Agir yek bi yek dinivîsîn, yê esemer dixwest her tiştî di hişê xwe de tomar bike. Agir dengê xwe hinekî bilind kir:

-Li Kurdistanê bîst û neh serhildan çêbûne. Lê di van serhildanan de digel qehremaniyê xiyanet jî çûbêye.

Kesên rûniştî kesayet û milîtaniya PKK'ê di şexsê wî de didîtin. Her kesî di dilê xwe de digot, xwezî ez bibûma xwediyê vê kesayetê. Agir têgihîşt ku guhdarên wî westiyane:

-Em navberekê didin!

Xortê nedinivîsî berê xwe da destê hevalê xwe yê porzer:

-Hevalê Selîm, tu çima tiştên dîwan dibêje tevan dinivîsî?

Selîm bi dawîkirina notyê re bersiva wî da:

-Hevalê Zagros, tu jî dizanî, piştî perwerdeyê dibe ku em biçin xebata siyasî. Divê em baş fêm bikin û sedema binkeftina serhildanên çêbûyîn bizanin.

Zagros hem guhdarî dikir, hem dihizirî ku rojekê biçe bajarê xwe Efrînê wê çawa siyasetê bike:

-Hevalê Selîm bawer dikim ezê derbasî çiyê bibim. Ji ber wê ji bo min perwerde zêde ne pêwîst e. Jixwe di beşên leşkerî de ez baş im. Te îro dît min gule li diwazdehê da!

Tev de rabûn ser xwe. Dema Selîm dimeşiya, ji ber ku pêlavên wî mezin bûn ji piyên wî diketin. Zagros jî bejinkin bû, şalê xwe bi kemerekê li ser newqa xwe şidandibû. Hem dimeşiyan, hem li ser derên dîtîn nîqaş dikirin. Selîm lê vegeriya:

-Divê em ne ji bo qadekê tenê xwe amade bikin, dibe ku em biçin xebata gel jî. Ji bo wê pêwîstiya me bi zanebûnê heye.

-Tu rast dibêjî, lê meyla min li ser xebata leşkerî ye û dixwazim biçim Botanê. Di xeyalê min de fermandariyeke mezin heye.

-Ez weke te nahizirim, te dît Serokatî herî zêde li ser avakirin û pêşvebirina kesayetê disekinî.

Lê Zagros ji ya xwe nedihat xwarê:

-Divê ez bibim fermandarekî mezin, derveyî vê niha di serê min de tiştek nîne.

Berî ku Selîm bersiva wî bide, ji bo ketina hundir dengê çepikan hat, navber qediyabû.

Roniya odeya Apo hê pêketî bû, şewqa lembeyê di pencereyê re dida der. Perperokên agir xwe li camên pencereya wî dixistin. Ji cihê xwe rabû cilên xwe yên şevê li xwe kirin. Lembe vemirinad, serê xwe danî ser balîvê xwe. Geh xwe diquliband vî milî geh milê din. Diyar bû ku xewa wî nayê. Ma wê çawa xewa wî bihata, çareseriya welatekî li benda wî bû. Ji her qadê bi sedan milîtanan berê xwe dabûnê. Li ser milekî wî rizgariya welat, li ser milê din jî perwerde û guhertina kesayetê bû. Diviya wî barî bi saxlemî bigihîne cihê wî. Di nava dengê çîçirkan de çavên wî ketin ser hev.

Serê sibê ku çavên xwe vekirin, li saeta xwe nêrî. Hê çar bû. Rabû ser xwe çû ber pencereyê, li derve temaşe kir. Êdî ji bo wî rojê dest pê kiribû; betaniya xwe pêça, cilên xwe li xwe kirin. Li ber deriyê odeyê qeytanên sola xwe şidandin derket. Xwe ji bo meşeke dirêj amade kiribû. Du çekdar jî li pey diçûn, dixwestin xwe bigihîninê. Çawa ku bi bayê re ketibe pêşbaziyê dimeşiya. Piştî meşeke dirêj xwe berda qadê. Her kes di nava liv û tevgerê de bû, spora akademiyê jî qediyabû. Êdî dema taştê bû, ber bi mase ve çû, gazî yên li derdorê jî kir:

-Heval, werin taştiya xwe bixwin.

Çend kes çûn ser mase, tevî wî dest bi xwarinê kirin. Zeytûnên reş li ser mase diteyisîn. Penîr jî ji bîr nekiribûn. Bi şewqeke mezin destê xwe diavêt zaytûnan. Piştî taştê, tevî Cesûr di qadê de dest bi meşê kirin. Her du destên xwe bi şûn ve danîbûn ser hev. Destekî

tizbî jî di nava destê wî de bû:

-Divê platform baş derbas bibin û hêzê bidin hevalan. Berî pazdehê Tebaxê divê em bi deryayan tevan re biaxivin. Da hevalan rêkin qadan û li gorî pêwîstiyan nêz bibin.

-Rast e serokê min, em jî wisa difikirin. Gelek heval ji bo pratîkê amade ne. Emê hin hevalan ji Beyrûd û Berliyasê jî rêkin pratîkê. Asta wan ya perwerdeyê baş e, ji bo piratîkê jî amade ne. Pêşniyar ji qada Cizîr, Efrîn û Kobanê jî hene, gel di raporên xwe de dibêje bila hevalên kevin bên nava xebatê. Hevalên Şamê jî not şandine. Li wir jî di malan de perwerde tê dayîn. Gelek heval dixwazin werin vê qadê, hin jî dixwazin berî perwerdeyê derbasî qadên piratîkê bibin.

-Ya girîng asta wan ya têgihîştinê û sekna wan ya di jiyanê de ye. Tu û hevala Sara dikarin biçin serdana perwerdeyên di malan de bikin. Pêwîstiya me bi asta pêşengiyê heye. Hûn dikarin civînan jî ji xebatkaran re çêkin. Li ser şêwaz û tevgera Şener û xirabiya kirî hê rapor ji min re tên. Divê em firsendê nedin ti kêmayiyan. Li welat derfetên me çêbûne û me kongreya çaran jî li dar xist. Divê em dest bi pêngavên mezin bikin. Wê şerên mezin biqewimin, hûn rewşa Kendavê dişopînin. Rojhilata Navî di nava liv û tevgerê de ye.

Piştî vê axaftinê ketin dibistanê. Cesûr bilez çû li ser kursiyê pêşberî dîwanê rûnişt. Wî jî li ser rewşa gengaz û pêngavên pêwîst dest bi axaftinê kir.

***

13'ê Tebaxê bû. Ji Rojavayê Kurdistanê û tevayiya bajarên Ereban, Kurdan, hina bi seyareyên taybet, hina bi yên kirê berê xwe dabû Lubnanê. Akademiya Mahsum Korkmaz bi peyatî bi qasî çil û pênc deqîqeyî ji riya Şam-Lubnanê dûr bû. Du rê diçûn akademiyê; yek riya qaçax bû ji aliyê Suriyê ve diketiyê, -riyeke evraz û pir ne xweş

bû- ya din riyeke ax bû ji aliyê Lubnanê ve diçû. Pêwîstiyên akademiyê di vê rê de diçûn. Akademî li erdê Lubnanê bû lê di binê kontrola Suriyê de bû. Lê ne ew tenê, Lubnan giştî di binê kontrola wê de bû. Bi giranî malbat, bi hezaran jin, mêr, kal, zarok û ciwan ketibûn deşta Berliyasê. Geliyê Bîqayê ji deng û rengê Kurdan xemilîbû. Du xortan li aliyê sînorê Lubanê rê nîşanî gel dikirin. Temenê yekî li derdora bîstan, yê yekî nêzî siyan bû. Cilûbergên wan xakî û leşkerî bûn. Di piyên wan de solên sporê hebûn. Yê bîst salî, bejna wî narîn û weke tayê rihanê bû. Newqa wî weke qendîlekê zirav bû. Çavên wî yên şîn ji ber toza seyareyan bi zorê vedibûn. Li derdora xwe dinêriya. Bi zimanê erebî diaxiviya. Yê sîsalî hinekî esmer û ne kin û ne dirêj bû. Çavên wî kûr bûbûn û nîşanên westanê li ser qermîçkên eniya wî diyar dibûn. Bi kurdî û bi dengê bilind gazî gel dikir. Dema erebî diaxivî zimanê wî pêşûpaş dibû. Dema hin pê re bi erebî diaxivîn jî wî bersiva wan bi kurdî dida.

Xortê esmer bi dengekî bilind gazî hevalê xwe kir:

-Hevalê Ciwan, jimara gel pir zêde ye, ji bo alîkariyê divê em hin hevalên din jî bixwazin. Divê her kes bigihîje cihê xwe û rê şaş nekin. Me jimareke zêde derbasî meşxlê kir, niha em wan rêdikin Berliyasê. Ji texmîna me zêdetir gel tê. Em biçin akademiyê binerin ka çiqas di riya qaçax re derbas bûne, da li gorî wir û vir em veguhestineke rast bikin!

Ciwan çavên xwe ji toza seyareyan paqij dikir:

-Rast e hevalê Selman, Seroktiyê dixwest em hemûyan bibin Berliyasê, lê jimar gelek zêde dibe. Yên tên jî hemû dibêjin em ji bo Serokatiyê hatine, heta em nebînin em ji vir naçin.

Di wê navê re ji bo alîkariya wan du jin ber wan ve hatin. Yek bejna wê ne kin, ne dirêj, gewr, rûgurover, lihevahtî û çavhingivî, ya din porkin, bejinkin û nazik bû. Ciwan jî ber bi wan ve çû, berê xwe da ya çavhingivî:

-Hevala Şervîn, divê ez û hevalê Selman biçin akademiyê. Hûn jî li vir li cihê me bin, rê nîşan bidin heta em vegerin.

Pora Şervînê bi ser eniya wê de hatibû, bi tiliyên xwe yên zirav û narîn paş ve da:

-Temam heval, hûn dikarin biçin, lê divê hûn zû werin!

Ciwan û Selman bilez berê xwe dan geliyê Bîqayê.

Selman bi rûyê xwe yê tirş seyare ber bi bilindiyan ve ajot. Ji kelecanê nizaniya ka çawa bigihîje akademiyê û vegere cihê xwe. Kêfa Ciwan ji hatina gel re pir hatibû, dixwest berî gavekê vegere nava gel. Riya tê re diçûn, riyeke ax û ne xweş bû. Derdor hemû çiya û kendal bûn. Dema seyare gihîşt jorê çawa ku rê bi dawî bûbe. Çiyayên bilind û newalên kûr diyar dibûn. Berê seyareyê li Helwa bû. Nêzî saekê di newal û geliyan re çûn. Herî dawî rê ket qadeke fireh, qada Akademiya Mahsum Kurkmaz. Du nobedar li ber derî bûn. Li ser girên derora akademiyê jî reşên nobedaran diyar dibûn. Mirov digot qey nava qadê bi destan hatiye çêkirin, weke hêlînekî bû. Gelek welatparêzan xwe gihandibû wir, li nava latên wan derdoran belav bûbûn. Zarokan bi milîtanan re wêne dikişandin. Hin ji wan jî li dora doçka kom bûbûn lê dinêrîn. Li wan girên derdorê tevan, li bilindayiya wan, di nava darên wê yên pelstirî de tijî mirov bûn. Çawa li ber dara gulan bin, wêne li ber wan daran digirtin. Gelek ciwanan ji jor ve li qadê temaşe dikir. Li ser lata herî bilind doçka hatibû bicihkirin.

Ji seyareyê daketin, di qadê de meşiyan. Çavên wan li ser derdor bûn. Qad bi deng û rengê jin, mêr, zarok, xort û keçan şên bûbû. Milîtanên dewreyê bi cilûbergên leşkerî di nava tevgerê de bûn. Yên ji bo serdanê hatîn û çekdarên li akademiyê silav didan hev, hev himbêz dikirin. Cilûbergên milîtanên jin bala jinan pir dikişandin. Xortan jî bi balkêşî li ciwanên şoreşger temaşe dikir. Ji ber ku leşkerên Kurdistanê didîtin, kêfa kalan jî pir xweş bû. Dayîkan xwe

bi hezarê caran qurbana leşkerên xwe dikir.

Çavên Selman li ser derdor bûn û gavên xwe bilez diavêtin. Ciwan jî kêfeke xweş ketibû ser rûyê wî; li qiyameta gel ya hatî temaşe dikir û destê xwe ji wan re bilind dikir. Kêfa Selman jî xweş bû, çend zarokên li pêşiya xwe himbêz kirin. Li Ciwan vegeriya:

-Gelek heval van rojan hatin, jimara dewreya nû hema hema temam bû.

Ciwan bi bejna xwe ya narîn û dengê nazik bersiv da:

-Rast e, gelek hatine, diyar e ku wê jimara vê dewreyê ji ya derbasbûyî pirtir be.

Erkdar û rêveberiya akademiyê, kesên nû derbasî qadê dibûn hem pêşwazî dikirin, hem bi cih dikirin. Li milekî çadir dihatin vedan, li milekî bi seyareyên mezin xwarin derbasî qadê dikirin. Carna dengê çekan ji girên derdorê bilind dibû. Gir û daran qad dorpêç kiribûn û xemleke xweşik didanê. Qada akademiyê bi axa li ber tîrêjên tavê qemer bûyî, kevirên ji têhna tavê spîboz bûyîn, darên li hawîrdor li hemberî rojê serên xwe hildayîn, pelên wan yên li ber bayê dihejiyan û weke çirkeyan li hev diketin, bala her kesî dikişandin û ji bo wan cihekî pîroz bû. Kevir, dar, ax her tişa wir ji bo wan pîroz bû. Di cihê xwe de ranediwestiyan, ji cihekî diçûn cihekî din. Erkdaran cih nîşanî wan dikirin, lê çawa pişta xwe didan wan, li qadê belav dibûn. Wê rojê dema mirov li girên derdora qadê dinêriya, dîmenekî kevnar di neynikên çavên mirov de diyar dibû. Di qadê de şervanên nû û yên kevin, kom bi kom bi hev re dimeşiyan.

Milîtanek di nîvê qadê de sekinîbû. Car bi car destê xwe diavêt berçavka xwe rast dikir. Simbêlên wî bi ser lêvên wî de daketibûn û esmerekî xwînşîrîn bû. Temenê wî li derdora bîst û pêncan bû. Pora xwe jî di milekî de şeh kiribû. Geh dihizirî, geh tiştin dinivîsîn. Selman û Ciwan nêzîkî wî bûn. Piştî silavê Selman agahî danê:

-Hevalê Mezlum, gel pir derbas dibe, hevalên we ji bo rênîşandan

û bicihkirinê erkdar kirîn kêm in. Em dixwazin hûn çend hevalên din jî bi me re rêkin.

-Baş e, ezê deh hevalên din yên herêmê nas dikin rêkim. Ewqas bes in?

-Niha bes in, lê ber êvarê re emê careke din hev bibînin.

Mezlum berê xwe da çadiran. Cigareya Selman di destê wî de bû, çawa ku bi dizî bikişîne li derdora xwe temaşe dikir. Hê pênc deqîqe derbas nebûyîn, deh kesan bi bazdan berê xwe da wan. Li seyareyê siwar bûn, ketin ser riya deşta Bîqayê.

Mezlum berê xwe da lênûsa di destê xwe de. Li keviya qadê, li ser berekî rûnişt, dest bi nivîsê kir: “Ji dewreya perwerdeyê re rapora min ya şexsî ye.” Serê xwe hinekî hilda, hizirî ka wê çawa û bi çi rengî xwe bide nasîn. Piştî çend kêliyan pênûsa wî çû ser pelikê û ev hevok li dûv hev hatin. “Ez ji Dêrika Çiyayê Mazî me. Sala 1986'an tevlî bûme. Dêrik ji sê milên xwe ve bi çiyayên asê ve tê girêdan. Pala wê li çiyayê Mazî, berê wê li Wêranşarê ye. Havîn û zivistanên wê dijwar in. Pal û pesarên Çiyayê Mazî bi piranî dar û deviyên berû û mazî ne. Li pêşiya wê her çiqas deverên qeraç hebin jî, erdên bibereket jî pir in. Genim, nîsk, ce û nok lê tên çandin. Pembû, garis, kuncî, bostan, zeytûn û rezên tirî zêde ne...”

Şervîn û Rûken bi komeke gel re derbasî qadê bûn. Şervîn ber bi Mezlum ve meşiya. Li lênûs û pênûsa di destan de temaşe kir:

-Hevalê Mezlum, erka min û hevala Rûken bi dawî bû.

Çavên wê yên hingivî li ser lênûsa di destê Mezlum de rawestiyan. Mezlum lênûsa xwe girt:

-Qewet be ji we re, hevala Şervîn, min çend hevok ji bo rapora xwe dinivîsîn da ji bîra min neçin. Nebêjin erkdarê rojê di vê hengamê de çawa raporê dinivîse. Tiştên hatîn bîra min, min nivîsîn. Dewreya we xelas bûye. Hûnê biçin pratîkê, serê we rehet e. Lê serê min jî bi qasî qelebalixa îro tevlîhev bûye. Nizanim rapora xwe çawa

binivîsim.

Şervîn berken bû:

-Dema nû tevlî bûyîm min jî nizaniya ka rapora xwe çawa binivîsim. Bawer dikim tu ji Dêrika Çiyayê Mazî bûyî? Ma berê Xiristiyan li wir jî hebûne?

-Rast e. Dêrikê navê xwe ji Dêra Sor ya Ermeniyan girtiye. Bi qasî tê zanîn Dêrik di navbera salên 1390-1400 de, ji aliyê qebîleya Dawidê Kalo û Mala Qeya ve hatiye avakirin. Bavê min her tim ji me re behsa rezê Mala Dawidê Kalo û Mêrga Qeya dikir. Digot ew her du qebîle mecbûr mane koçî cihê îro navenda Dêrikê bikin. Navên wan cihên dîrokî ji min re pir gotine, lê ji bîra min çûne? Behsa wî mîrê zordest Hesoyê Rût yê li herêma Amedê û kuştina wî jî dikir.

Şervîn keniya:

-Maşele agahiyên dîrokê tev li cem te kom bûne.

-Min jî ji bavê xwe girtine. Deverên din jî yên dîrokî hene; yên weke Xirbeyên Qafiyê, Xirbeyên Fitnê, Keleha Rebetê, Keleha Dêra Metînan, Tilbisim, Qesra Qenco... Dêrik bi çanda xwe ya kurdî û welatparêziyê tê nasîn. Bandora şehîdan jî gelek li ser heye û gelek ciwanên wê tevlî têkoşînê bûne. Ji ber vê kurdewariya wê ez behsa bajarê xwe dikim. Tu ji kû bûyî?

-Ez jî ji Dêrikê me, lê ne Dêrika we, ez ji gundê Til Xenzîr yê Dêrika Hemko me. Ji bajar û gundê me jî pir tevlî bûne û welatparêz in. Min jî di rapora xwe ya destpêkê de li ser rewşa herêma xwe û welatparêziya wê nivîsîbû. Lê ji aliyê dîrokî ve min zêde nizaniya, paşê min pir xwend. Serokatî jî pir girîngiyê dide dîrokê, min jî kir hedefa xwe ku xwe baş pêş bixim.

Mezlum bi awayekî jixwebawer diaxiviya:

-Li ser kesayetê em nîqaş bikin wê baş be. Lê niha em biçin cem hevalan ka vegirtina çadiran xelas kirine yan na. Li wir teqez wê ji

bo te û hevala Rûken kar hebe. Hûn dibînin çiqas gel hatiye, kar zehf e, lê gelek ciwan jî ketine nava hevalan, kar dikin.

Her sê ber bi wir ve çûn. Rûkenê devê xwe bir ber guhê Şervînê:

-Hevala Şervîn, ev haziriya em dikin ne zêde ye, ma wê çiqas insan werin?

Şervînê li qadê temaşe kir:

-Diyar e ku wê vê carê gelek bên, wisa ji me re hat gotin. Par dema tevlî bûyîm, hingê jî gelek kes hatibûn.

-Ma wê gel ne ji Rojava tenê bê vir?

-Na. Ji Bakur û Ewropa jî gelek nivîskar û rojnemevan tên.

Rûken hinekî sekinî:

-Şansê min hebû ez hatim perwerdeyê. Gelek hevalên weke min hene dixwazin werin vir. Ev der cihê fermandarê mezin hevrê Egîd e. Bi taybetî hevalên jin hemû dixwazin werin, hesreta wan dîtina serok e. Lê derfet nînin. Tiştekî pir xweş e ku malbat me bi çek û cilûbergên leşkerî ve bibînin.

-Rast e, lê ne malbat tenê, her kesê tê vir, bi taybetî dema di nava refên şoreşê de hevalên jin dibînin gelek kêfxweş dibin. Ez jî dema cara yekê hatîm vir, ji bo min balkêş bû. Min ji xwe re digot qey jin di nava xebata siyasî tenê de dikarin cih bigirin. Ez û çend hevalên xwe ji zanîngehê hatin vir. Me xwe gelek xemilandibû. Serok bi me re li ser azadiya jinê û rola wê axivî. Ez hingê pir li ber xwe ketibûm û min fêm kiribû ku xweşikbûna jinê di tevgera wê ya xwezayî û kar de ye. Dema cara din hatim, ez tevlî bûm û li vir mam.

Rûken pir bi baldarî guhdarî dikir û xweziya xwe bi hevala xwe dianî:

-Hevala Şervîn va bû du roj ez hatime vir û hê min Serok nedîtiye. Gelo ezê kengê bibînim, ezê bikarim wiha rehet pê re bipeyivim?

-Ya dîtinê tuyê bibînî û wê gelek mijaran jî bi te û hevalan tevan

re nîqaş bike. Çawa tu texmîn dikî ne wisa ye, mirov dikare bi awayekî hêsan her mijarê pê re nîqaş bike. Serokatî gelek ji nêz ve bi hevalên jin re eleqedar dibe. Lê ez çi jî bêjim wê ne weke dîtinê be!

Rûken kesereke kûr kişand, ketibû heyecana kêliyên dîtina Apo. Çavên Şervînê çûn ser bilindiyên li derdora akademiyê. Tevgerek li ber çavên wê ket. Ji Rûkenê veqetiya, çavên xwe li ser wê tevgerê rawestandin. Temaşekirina Şervîn ya li jorê bala Rûkenê kişandibû. Wê jî berê xwe da jorê, lê derveyî nobedaran tiştek nedît.

Apo li jora akademiyê li ser berekî çok dabû. Berê wî li qada akademiyê bû kûr kûr dihizirî. Tîrêjên rojê jî qad ewqas hingaftibûn, tenûrok diketin erdê. Çavên wî di rêwîtiya leza demê de dibezîn. Cihê lê weke qadê ne germbû, bayekî honik li pora wî yê paş ve şehkirî xist. Weke pêlên deryayê xelekên pora wî her yek diqulibî ser ya din. Avdeyên spî yên ceynikên wî li ber tîrêjên rojê diteyisîn. Destek cilên leşkerî li ber bû û piştêneke qehweyî li ser nava xwe şidandibû. Pêlavên wî yên gewr, li ber şewqa tavê spî dikirin. Carna çavên xwe li ser cihekî radiwestandin û di xeyalên xwe de dîmen tomar dikirin. Çavên xwe li ser parêzvanên li derdorê belav bûyîn gerandin. Bi tevgereke nazîk û dengekî xurt:

-Heval, amadekarî baş tê kirin?

Parêzvan bi helwesteke leşkerî bersiv da:

-Belê serokê min, amadekarî baş tê kirin.

-Divê di aliyê ewlekariyê de jî şiyar bin. Ev roj ji bo me pir girîng in.

Bi gotina xwe re rabû berê xwe da jêrê. Ber bi odeya xwe ya xebatê ve çû. Odeyeke piçêk bû, deriyê wê yê ji hesin bi rengê kesk hatibû boyaxkirin. Ji rengê wê heta tiştên di hundirê wê de, odeyeke mûtewazî bû. Wêneyên şehîdên destpêkê bi dîwêr ve hatibûn daleqandin. Li ser maseyê darîn, peykerê Lenîn hatibû danîn, li tenişta peyker jî pirtûka Şer û Aştî hebû. Ji bo razanê jî textekî ji

hesin, li ber dîwarê taliya odeyê bû. Ji gelek deverên wî boyax ketibû. Doşekek û betaniyeke şînê asîmanî li ser bûn. Li ser kursiyê li pişta mase rûnişt. Rahişt pênûsê dest bi nivîsa çend notyan kir. Zerfeke tijî rapor li ser mase bû, piştî nivîsê raporên tê de derxistin. Bi baladarî dixwend û encama jê digirt di hişê xwe de tomar dikir. Carna serê xwe radikir di pencereya piçûk re li derve dinêrî. Ji ber hatina gel ya akademiyê wê rojê pir kêfxweş bû.

Mezlum û Ciwan li qadê hem dimeşiyan, hem diaxiviyan:

-Hevalê Ciwan, Serokatî îro hat akademiyê?

-Belê hat, lê fikarên me pir in. Me ji hevalê Cesûr re jî got gelek kes hatine vir. Îro me du kesên biçek jî girtin. Ji bo komkujiyê hatibûn.

Mezlum, ji bo heman tiştê pirs kiribû, gelek bifikar bû:

-Ez hê fêm nakim ka Serokatî çawa xwe diparêze!

Hê diaxivî, Koma Agirî ji otobûsê daket. Bi daketinê re dest bi lêxistina dahol û zirneyan kirin. Keç hemû bi cilên kesk, sor û zer, xort bi şal û şapik bûn. Ji zarokan heta kalan di komê de hebûn. Rengê cilên wan rengê biharê dabû wan deran. Ji bo pêşwaziya wan berê xwe dan wir. Kom derbasî nîvê qadê bû, milîtan û gel jî li ber stirana "Li Mêrdînê li Bagokê" govend girê dan. Dengê govendê li hawîrdorê akademiyê oldan dida.

Berêvar bû, rojê perên xwe kutabûn. Şervîn û Rûken qedehên çayê di destê wan de bûn, hûrik hûrik dimeşiyan. Rûkenê bi rûyekî bimereq berê xwe da Şervîn:

-Ji min re hinekî behsa dîroka vî welatî bike.

Kêfa Şervînê ji pirsên Rûkenê re pir dihat:

-Tu li vir bimînî tuyê jî nas bikî. Li vir her tim agirê şer diçirise, ev der qadeke navendî ye û cihê pirrengiya gelan e. Ji gelê me jî gelek kes koçberî vir bûne. Ne ji vê taybetiya wê bûya me jî nikariya

li vir bisekinin. Hem welatekî çiyayî, hem cihê bazirganiyê ye.

Mezlum ber bi wan ve dihat.

-Hevalên hêja, divê hûn her du biçin nobetê.

Rûken ji suhbetê têr nebûbû, dema behsa nobetê dihat kirin rengê rûyê wê dihat guhertin. Şervînê, êdî taybetiyên wê dizanîn:

-Dem heye tu nû hatî. Emê hê gelek nîqaşan bikin.

Mezlum ji wan dûr ket lê bi xwe re diaxiviya: “Min fêm nekir, ev hevalên jin timî bi hev re ne û nîqaşên wan jî xelas nabin.”

Axaftina wî ya bi xwe re bala Şervînê kişandibû:

-Hevalê Mezlum, te tiştek got? Jixwe nîqaşên me xelas nabin. Ma ji bo nîqaşan cihekî ji vir baştir heye?

Mezlum hinekî şerm kiribû, nizaniya dengê wî çûye wan:

-Min tiştek negot, ez dibêjim dema we pir e, hûn dikarin gelek nîqaş bikin!

Şervîn jî ji bersivan re amade bû:

-Nîqaş bi demê ve ne girêdayî ne.

-Temam heval, tu rast dibêjî. Mabesta min ew e ku em jî dixwazin tevlî nîqaşên we bibin.

Berê xwe dan cihê nobetê. Rûkenê mereqa her tiştî dikir û dixwest her tişta dibîne di hişê xwe de bihêle:

-Hevala Şervîn, tu dizanî ez ji Mereşê me. Di salên heftihî de hevalê Kemal Pir li wir kar dikir. Heta niha jî bandora wî li ser wir heye. Em di nava çalakiyên destpêkê de mezin bûn. Civaka me felsefeya xwe di nava PKK'ê de didît.

Çawa ku hina agaiyeke ne xweş dabûyê, xemgîniyê xwe avêt ser çavên wê:

-Hê jî komkujiya 1978an li ber çavên min in. Ji ber wê me koçî Ewropa kir. Li wir jî piranî Elewî û Êzîdî nêzîkî rêxisitinê bûn. Em di nava tekoşînê de mezin bûn. Eger PKK tinebûya, wê civaka me li wan deran kurdîtiya xwe jî, çanda xwe jî wenda bikira.

-Tu rast dibêjî, lê heman xeter li her derê li ser Kurdan hebû.

Rûkenê xebata xwe dianî ber çavên xwe:

-Min rojnameya Serxwebûn belav dikir. Nirxandinên Serokatiyê yên li ser jinê pir bandor li min kirin.

-Erê min jî xwendin, heştê Adarê ew nirxandin hatibûn kirin.

Rûkenê dixwest behsa salên borî bike:

-Ji bo mijara sosyalîmê nakokiyên min hebûn. Ji bo wê çûm Sovyetê. Li cem wan her tişt qedexe bû û desthilatdariyeke hişk hebû. Min ji xwe re got eger sosyalîzma PKK'ê jî wiha be, qet nabe. Piştî ku min nirxandinên Serokatiyê, yên di kongreya sisiyan de xwendin, êdî min her tişt fêm kir.

Ber bi cihê nobeta xwe ve diçûn, deh deqîqeyên wan mabûn. Çavên Şervînê bi perperokekê ketin. Du caran destê xwe avêtiyê da bigire, lê firiya, ji wan dûr ket. Ber bi dibistanê re derbas bûn. Wêneyê Apo yê li ser dîwarê wê Rûken bir salên borî:

-Destpêkê me wêneyên Serokatiyê salên heştihî dîtin. Ji ber ku di wêne de çavên wî girtî bûn, me pir mereq dikir. Bi derketina şerê çekdarî re durişma “Bijî Serok Apo” derket.

-Hevala Rûken, li vir jî destpêkê wêneyên wî tinebûn, paşê belav bûn. Lê ya durişmê nizanim, hema ji dema min partî nas kirî ve em dibêjin, “Bijî Serok Apo”

Rûkenê her li derdorên xwe dinêrî:

-Destpêkê dema ketim vê qadê, ya herî zêde bala min kişandî, her sê alên me bûn. Ma çiqas xweş bû ew dîtin.

Şervînê li saeta xwe nêrî:

-Wiha biçe tuyê me bikî sûc, dereng e, dema nobeta me hatiye.

Bi bazdan çûn cihê nobetê...

***

Çardehê Tabaxê bû. Saet pêncê sibê Apo ji bo meşê xwe amade dikir. Mêvan jî pirên wan wê şevê li qada akademiyê şiyar mabûn. Gelek ji wan cara yekê hatibûn, hin ji wan çend caran hatibûn. Lê ji bo hemûyan jî ew rojên li wir rojên dîrokî bûn. Ji ber sira şevê ya li wan bilindiyan dixist, li qadê agirekî mezin hatibû pêxistin. Ji hawîrdorê akademiyê dengê, gel bilind dibû. Apo ber bi cihê daristan ve bilez dimeşiya. Piştî meşa nîv saetê berê xwe da qadê, derbasî cihê xwarinê bû. Ji bo taştê penîr û zeytûn hatibûn danîn. Li cem komek milîtanên jin rûnişt:

-Kerem bikin heval, em taştê bixwin. Rewşa we çawa ye, kar û perwerde çawa diçin?

Milîtankê bikelecan bersiv da:

-Serokê min baş derbas dibe. Ya leşkerî jî hema hema bi dawî dibe.

Rahişt nan dest bi xwarinê kir:

-Divê hûn xwe ji bo serkeftinê amade bikin, weke berê nabe. Divê hûn bi hêzeke mezin biçin pratîkê. Hûnê perwerdeya herî mezin di jiyanê de bibînin. Barê we piştî vê perwerdeyê girantir dibe. Hûn dizanin ka me bi çi derfetan ev der ava kiriye! Divê hûn qîmetê her kêliya vir bizanin. Ev der bi xwîna şehîdan çêbûye. Va îro hûn dibînin, bi hezaran gelê me berê xwe dide vir û pîroz dibînin.

Piştî xwarinê, berê xwe da odeya mêvanan. Li hundir gelek dayîk rûniştibûn. Bi ketina hundir re tev rabûn ser piyan. Bi rûyekî geş berê xwe da wan:

-Kerem bikin rûnin. Hûn bi xêr hatine. Ji her derê hûn hatine vir û hêviya we ya ji vir gelek mezin e. Em jî hatina we pir binirx dibînin û hêviya me jî bi we mezin dibe.

Li milê rastê dayîkeke bi kirasê gulgulî yê ji kitanê spî û xiftanekî çox rûniştibû. Wê jî dixwest biaxive:

-Serokê min, ez dayîka Haşim im, ji bajarê Dêrikê hatime. Min berê xwe daye cihê azadiyê. Ti milk û malê min nînin, lê dikarim zarokên xwe diyarî şoreşê bikim. Ev xelata min ji bo şoreşê ye

Apo pir bi baldarî lê nêrî:

-Dayê, eger dayîkên me yên Kurd tev weke te bin, wê welatê me di bindestiyê de nemîne û serkeftin teqez pêk were. Ji ber ku dayîkên weke te erkên xwe dizanin, dixwazin barê şoreşê hilgirin. Ev ji bo me serbilindiyeke mezin e û giranbiha ye. Heta ji min jî bê ezê di vê şoreşê de xebata xwe kêm nekim. Hedefa min wê her tim serkeftin be. Emê çend rojan bi hev re bin û pir biaxivin.

Hê çavên dayîkê li ser bûn:

-Serokê min, ez dixwazim hûn ji bo jinê jî tiştekî bêjin.

Berê xwe da jinan tevan. Bi awirên xwe dida fêmkirin ku mijara wî ya sereke mijara jinê ye:

-Tiştên me ji bo partiyê û gel gotîn me ji bo jinê jî gotine. Mirina jinê mirina gel e. Rabûna jinê rabûna gel e. Azadiya gel jî azadiya jinê ye. Eger jina Kurd ranebe ne welat azad dibe, ne gel. Derdekî min yê mezin e ku em jinan bigihînin pêşengiyê. Em li ser vê mijarê disekinin da jin xwediya jiyanê be. Jin fetisîne, hûn miriyên miriyan in. Egîdiya jina Kurd jî heye. Ez ne peyayê berê me û weke wan nakim. Çi mafê peyayan hebe, yê jinê jî heye. Em ji bo wekheviyê têdikoşin. Kurdistana em çêkin ne ya peyayan e. Wê nîvenîv ya peya û jinan be. Mirinê qebûl nekin û nebin koleyên koleyan. Baweriya bi pêşengiya jinê heye. Peya nikare weke berê li jinê binêre, jin jî nikare weke berê li peya binêre. Her tişt li Kurdistanê guheriye; wê jin li ser jinbûna xwe, peya li ser peyabûna xwe bisekine û xwe kûr bikin.

Van gotinan di mejiyê wan de olan dida. Ji dilê wan dihat ku rabin bilîlînin. Di dilê xwe de digotin, êdî çerxeke nû ya cîhana Kurdan digere. Piştî axaftinê, yek bi yek pirsa navê wan, deverên jê hatîn û

rewşa wan kir. Li kêleka dayîka Haşim çend xort jî rûniştibûn. Yekî bejinbilind û rûgewr rabû ser xwe:

-Serokê min, navê min Selah e. Ez û hevalên xwe ji Şamê hatine. Me dixwest we bibînin û ji bo xebatê erkên dikeve ser milê me bigirin.

Bi vê axaftinê pir kêfxweş bûbû. Piştî pirskirina rewşa wan, xwest girîngiya erkê wan bi wan bide fêmkirin:

-Berî niha jî me dixwest bi kesên li Şamê dimînin re rûnin. Ev demeke dirêj e hûn ji welat koçber bûne. Du sed sal in Kurd koçber dibin. Em dixwazin hûn jî xebata xwe ya li Şamê pêş bixin. Hûn dikarin nêrînên xwe bêjin.

Selah wergêr û berdevkê komê bû:

-Ev dîtina we ji bo me şerefeke mezin e. Piştî dîtina vir baweriya me xurttir bû. Tişta ji me bê emê bikin.

-Ez fermanê nadim we, lê divê hûn ji bo hebûna xwe têbikoşin û di navbera me û gelê Ereb de bibin pir. Ev kar jî dikeve ser milên we.

Sê saet derbas bûbûn lê hê gelek kes li bendê bûn ku pê re biaxivin. Lê êdî dema firavînê bû, sifreya xwarinê ji serekî qadê heta serê din dirêj bûbû. Xwarin goşt û birinc bû. Bi hezaran insan li ser sifreyê li benda hatina Apo bûn. Ew jî bi mêvanan re ber bi sifreyê ve çû. Li kêleka dayîkan rûnişt. Di ser xwarinê de jî pirsên xwe jê dikirin. Ji bo wî ew kêlî, kêliyên serkeftina şoreşê bûn. Li wan dinêrî, bi wan re dikeniya. Li aliyekî jî bi destê xwe xwarin datanî ber dayîkan. Dayîka Haşim li milê wî yê rastê rûniştibû. Dayîkeke din bilez xwe gihand milê wî yê çepê. Li benda firsendekê bû ku berê xwe bidiyê û bi dizî tiştekî jê re bêje. Lê berî ku biaxive dayîka Haşim dest bi axaftinê kir:

-Serokê min te ji bo me jinan şoreşeke mezin pêk anî.

Nû ferq kir ku dayîkeke din hatiye li milê wî yê çepê rûniştiye. Berê xwe vegerand ser:

-Dayê, ji bo me tu çi dibêjî, dengê dayîka Haşim hat te?

-Serokê min, şoreşa we di riyeke rast de ye, lê xwestekeke min ji we heye?

-Kerem bike bêje!

-Kurekî min tenê heye, tevlî we bûye. Ez dixwazim hûn vegerînin.

Bi baldarî li her du dayîkan temaşe kir. Yekê digot, zarokên min tevlî şoreşê bike, ya din digot, zarokê min bidin min.

-Helbet dayê, ku kurê te yek tenê be emê biparêzin. Pêwîst bike emê vegerînin, bila li gorî hêza xwe xebatê bike. Berî tu biçî navê wî bide hevalan, ezê bixwe li ser bisekinim.

Bi gotina xwe re destên xwe danîn ser milê dayîkan:

-Hevalno, wêneyê me bikişînin.

Ji ser sifireya cifniyên goşt hin radibûn, hin dihatin şûna wan. Her kesî di dilê xwe de digot, Xwedê vê yekîtiya me xirab neke. Bi sedan milîtanên jin û mêr di nava gel de belav bûbûn, xizmet dikirin. Di nava gel de kesên ji bo xirabiyê jî hatîn hebûn. Ji ber wê hêzên parastinê di nava seferberiyê de bûn.

Seyareyên tijî mirov li ser riya Bîqayê bûn. Di seyereyekê de li ser kursiyên pêş, xortekî bîst û pênc salî li kêleka dayîkekê rûniştibû. Gumlekekî spî û pantolonekî reşê tozgirtî lê bûn. Cilûbergên dayîkê bala wî dikişandin. Li pişt xwe nêrî. Qelebalixa di seyarê de bala wî dikişand. Dîsa li dayîkê nêrî, di dilê xwe de got, ev ji Qamişlo ye. Di navbera wî û dayîkê de zarokekî heftsalî rûniştibû. Carna çavên wî xilmaş dibûn. Çavên wî li ser wî zarokî rawestiyabûn. Dixwest pê re biaxive. Destê xwe danî ser serê wî:

-Tu vir nas dikî?

Bi pirsa wî re dayîkê berê xwe dayê:

-Navê wî Heqî ye, neviyê min e. Nû ji Qamişlo derdikeve, ev cara

yekê ye bi xwe re tînim Lubnanê. Min kir nekir belaya xwe ji min venekir.

-Yadê, bi Xwedê zarokên me jî fêm dikin ka em diçin kû, ma ev ne ecêb e. Eger min bihişta wê yên me jî bihatan, ji êvarê ve min xwe ji wan vediziye.

Dayîkê, hirbiyeke hevrîşim û hemayîleke reşgulî li serê xwe pêçabûn, fîstanekî xemriyê gulgulî jî li xwe kiribû. Serê xwe hejand:

-Kurê min zarokên me jî weke me ne. Min digot qey min tenê neviyê xwe aniye, lê va gelek zarok hatine.

Yê xort devê xwe ber bi guhê wê ve bir:

-Dibêjin gelek zarokên me yên tevlî bûyîn li vir in, ez jî hatim da bizanim ka bi rastî li vir in, yan na.

Axaftina wî neketibû serê wê, hinekî lê nêrî. Di dilê xwe de got, heta niha ev di guhê ga de maye. Ma dema vê pirsê ye:

-Kurê min, tu ji kû hatî vir?

-Dayê, navê min Qadir e, ez ji Efrînê me. Ev cara yekê ye têm vir.

-Ji min re jî dibêjin Yadê Sitî, ez gelek caran hatime vir. Kurê min, zarokên me di riyeke rast de ne, li kû bin ferq nake, ya girîng ku di riya şeref û namûsê de ne. Kurê min jî li vir e, lê ne ji bo wî hatime. Bi hezaran zarokên Kurdan li vir in!

Qadir li derdora xwe temaşe kir:

-Min dixwest bizanim ka li vir perwerdeyê dibînin, yan hema wan ji malê derdixin û dişînin çiyayên Bakur.

-Lawê min, emê bi hev re biçin. Tuyê bixwe bibînî.

Qadir serê xwe xist ber xwe. Yadê ferq kir ku li ber xwe ketiye:

-Ma tu nabînî va Heqiyê min jî hatiye.

Destê xwe bi ser serê wî de anî:

-Kurê min, ka ji mamê xwe re bêje, tu ji bo kê hatî vir?

-Ji bo Serok Apo!

Ajokar bi aliyê wan ve nêrî:

-Kuro dengê xwe kêm bike, tuyê me li van sînoran bidî girtin!

Yadê axaftin ji devê wî girt:

-Kurê min tu ji çi ditirsî, her kes dizane ku em ji bo serokê xwe û partiya xwe hatine.

Qadir berê xwe da pencereya seyareyê, roja Apo li Helebê dîtî hat bîrê. Lêvên wî li hev diketin: “Min PKK jî weke partiyên me yên din dizaniya, ev çawa wiha mezin û şên bû?”

Apo li qadê di nava gel de rûniştibû, li kêleka wî jî dayîka Haşim bû. Keça wê ya bi navê Emîne jî li pişt wê li ser piyan sekinîbû. Apo bi ser milê xwe re lê nêrî:

-Emîne, dayîka te dibêje bila tevlî şoreşê bibe. Tu çi dibêjî?

Ji kêf û kelecanê xunaveke ji xwêdanê bi ser rûyê wê yê sorgevez de avêt:

-Serokê min, ez jî dixwazim tevlî bibim.

Xwest girîngiya mijarê pê bide fêmkirin:

-Ez dixwazim jin hemû tevli şoreşê bibin, ji binê darê zilaman derkevin. Lê divê di nava civakê de jî karê şoreşê bikin. Heta bi çêkirin û pêşxistina mala xwe jî xizmeta şoreşê bikin.

Di wê navê re jineke bi fîstanê Efrînê li aliyê din rabû ser xwe. Rûyekî gurover û poreke kin li ser bûn û ji xwe gelek bawer xuya dikir:

-Serokê min, ez ji Efrînê me, navê min Zelîxa ye. Çar zarokên min hene. Berî niha ji bo tevlîbûnê min rapora xwe dabû hevalan, lê hê bersiv nedane. Hemserê min gelek desthilatdariyê li ser malê dike. Ez vê qebûl nakim, naxwazim weke koleyan bijîm. Xwesteka min tevlîbûna partiyê ye.

Ji gotina desthilatdariyê hêrs bûbû, lê zarokên wê hatin bîrê:

-Tu rast dibêjî, divê jin zilma zilam qebûl neke. Hûn jin hemû li vir in û keçikên me jî dibînin. Bila peya hemû baş guhdarî min bikin!

Her kes li bendê bû ka wê çi bêje. Bi awirên kûr li pêşiya xwe nêrî, bi taybetî li zilaman dinêriya:

-Êdî jin vê paşverûtiyê qebûl nakin, divê hûn xwe biguherînin. Me jin gelek pêş xistine. Hûn dibînin, dayîka çar zarokan e dixwaze tevli refên şoreşê bibe. Li hemberî paşverûtiya li Kurdistanê ev helwestek e. Eger hûn xwe neguherînin wê jin hemû tevli şoreşê bibin.

Careke din berê xwe da dayîka çar zarokan:

-Heval, helwesta te jî û ya Emîne jî gelek binirx e, lê ezê erkekî din bidim we her duyan. Emîne jiyana berê naxwaze, bila li malê alîkariya hevalan bike. Ez dixwazim tu jî di mala xwe de şoreşê pêk bînî û hevalê xwe biguherînî. Ev jî bi serê xwe şoreş e.

Qadir di pencereyê re li Çiyayê Mesnea, Dehirbeyder, Sinînê, Raşiya û Cebel-Şêx yên weke xelekekê li dora gelî xwe ba dayîn, temaşe dikir. Gelî ji jor ve weke deryayeke şîn xuya dikir. Derdora çiyê bi darên mazî hatibû xemilandin. Di gelî de rezên tirî, darên gilyaz, hilû, hirmî, xox û sêvan, li deştê jî zeviyên dexil, rengê xwe dabûn xwazayê. Seyare ber bi gundê Aytafexar ve diçû. Hem Misilman, hem Xiristiyan lê hebûn.

Dayê Sitî ji rûniştina di seyareyê de westiyabû, mereqa rê dikir. Li milê ajokar ve nêrî:

-Em gihîştin kû kurê min?

-Em nêzîk bûne. Gelek seyare nikarin di vê rê de biçin, ji ber wê xelk bi piyan dimeşin.

-Kurê min, berê jî ez hatime vir, lê ji bîra min diçe.

Qadir ketibû nava xeyalan. Dîsa rojên borî hatin bîrê. Şervanekî PKKê yê birîndar jê re gotibû, em bi dewleta Tirkan re şer dikin. Wî jî gotibû, ma mirov dikare bi dewletan re şer bike? Di wê navê re dangê dayê bilind bû:

-Lawê min, ji dema em ketîn ser rê heta niha tu difikirî, xêr e?

Qadir nava xwe kişand, hinekî jî şerm kir:

-Yadê, roja min Serok li Helebê dîtî hat ber çavên min. Ez ji dibistana amadeyî dihatim malê. Li hundir sê kes rûniştibûn. Cara yekê bû kaxizên lîstikê li ber mêvanên me tinebûn. Ji wê min zanî ku ne mêvanên her roj in. Yê çavreş ez li cem xwe dam rûniştandin, li ser bîrkarî, destûra Suriyê û erdnîgariya wê çend pirs ji min kirin. Min jî li gorî zanebûna xwe bersiv da. Ji min re got, tu di xwendina xwe de jîr î, divê tu bixwînî.

Yadê serê xwe hejand, destê xwe da ber devê xwe:

-Xwedê emrê te dirêj bike, çima te xwe weke ne dostan nîşan dida?! Erê kurê min, yê carekê wî bibîne, qet ji bîr nake!

Tevgera li derve bala wê kişand. Kelecanê xwe li newal û baniyan belav kiribû. Tevî wê riya dirêj li ser rûyê ti kesî westanê xuya nedikir. Yadê bêsebir bûbû:

-Kurê min, ka em jî peya bibin bimeşin.

Ew jî daketin, dest bi meşê kirin. Çawa ku roja qiyametê mirov ber bi mehşerê ve dilezînin yên li ser devê rê jî wisa dimeşiyan. Yadê hem gavên xwe bilez diavêtin, hem dua dikirin:

-Xwedê tu mezin î, ev roj jî te nîşanî me kir, min Kurdistana xwe jî dît.

Selman û Ciwan di nava kêferateke mezin de bûn. Ji pirbûna mirovan, êdî nizaniyan ka wê çi bikin. Jixwe pêwîstiya gel jî pr bi wan nemabû, ew bi serê xwe diçûn xwe digihandin akademiyê. Selman destê xwe danî ser milê Ciwan:

-Em ji sala 1984'an ve ji Êlihê koçî vir bûne. Ji wê demê ve partiyê nas dikim û tevlî xebatê bûme. Ev cara yekê ye evqas milet tê vir.

Ciwan jî pir bikelecan bû, guhên wî li Selman, lê çavên wî li gel

bûn:

-Tevî ku her sal bi malbata xwe re ji Hesekê dihatim, lê cara yekê ye ez jî qelebalixeke wiha dibînim. Gelo, emê bikarin vî miletî tevî bi cih bikin?

Selman di hişê xwe de li çareseriyê digeriya:

-Divê em Serok ji vê qelebalixa zêde agahdar bikin, dibe ku bêje bila tev neyên akademiyê. Li seyareya sor siwar bûn, berê xwe dan akademiyê. Piştî demekê gihîştin ber derî. Apo bi parke û pantolonekî leşkerî, li keviya qadê di nava komeke kesên bitemen de diaxiviya. Hin bi kiras, cemedaniyên sorûspî û egal, hin jê bi pantolon û çakêt bûn. Li dora wî xelekeke ji mirovan hatibû çêkirin. Yekî bi kefî û egal, destê xwe ber bi Apo û asîman ve bilind kir:

-Tu ji bo me nîşan î, tu Rêber î. Roja min ev partî nas kirî, min zanî wê Kurdistan rizgar bibe. Ji bilî te ti kes nikare vê tekoşînê bi van keç û xortên me bide meşandin.

Selman û Ciwan jî li tenişta komê guhdarî dikirin. Selman devê xwe bir ber guhê Ciwan:

-Em çawa xwe bi Serok bidin hesandin?

Çawa ku dengê wî nebihîstibe deng jê nehat. Bala wî tev li ser axaftinên Apo bû:

-Emê vê şoreşê bi hev re bikin. Nabe ku hûn bêjin bila her tiştî ew bike. Îro şoreş li ser milê we ye û firsendeke Kurdan e. Eger hûn lê xwedî dernekevin, wê şoreş li paş bikeve.

Piştî vê gotina xwe bi ken û kêfxweşî xatirê xwe ji komê xwest. Bi xatirxwestinê re dengê çepikan û durişma “Serkeftin ya me ye, tu şêrê me yî, tu serokê me yî û bijî Serok Apo bilind bû. Wî jî her du destên xwe ji wan re bilind kirin û ber bi Selman û Ciwan ve meşiya:

-Hûn bi xêr hatine. Em biçin hundir binêrin ka we çi kiriye.

Bi gavên bilez berê xwe da mêvanxaneyê, wan jî da pey. Li dora maseyê di odeyê de şaş kursî hatibûn danîn. Li ser kuriyê xwe rûnişt:

-We çawa kir, we her kes bi cih kir? Çiqas kes hatine. Tev dikarin îşev li Berliyasê bimînin?

Rûyê Selman bifikar xuya dikir:

-Serokê min, gel vê carê pir hatiye. Me gelek birin meşxelê cihê perwerdeyê. Me çadir danîne. Lê ne li gorî hesabê me kirî hatine, qelebalixeke mezin hatiye.

Ew di nava fikaran de bûn, lê ew bi hatina qelebalixa gel pir kêfxweş bûbû. Di dilê xwe de got, jixwe me jî ev dixwest, ev şoreş bixwe ye. Bi vê hatinê şerê gel yê şoreşgerî, tê tenzîmkirin:

-Bila heval qîmetê wan pir bizanin. Gel berê xwe dide rastiya PKK'ê, divê her kes di wê zanebûnê de be. Di aliyê xizmet û mêvanperweriyê de divê kêmayî dernekevin.

Selman nû bi xwe hesiya ku di nava tozê de maye. Dixwest agahiya di binê zimanê xwe de hiştî bêje:

-Serokê min, bi hezaran gel hatiye Berliyasê. Tev li benda dîtina we ne, hin ji wan dibêjin, heta em Serokatiyê nebînin em ji vir naçin.

Hinekî hizirî, di ber re jî serê xwe dihejand:

-Silavên min li wan bikin, bila tev werin akademiyê, emê li vir hev bibînin.

-Temam serokê min, emê îro wan derbasî akademiyê bikin.

-Biçin wan pêşwazî bikin, seyareyan ji wan re bigirin. Çi pêwîst be bikin!

Her du bilez derketin, li seyareyê siwar bûn. Selman nefeseke kûr kişand. Ciwan biken lê nêrî:

-Ew çi xwêdan bû bi ser te ketî? Te ji me hemûyan pirtir Serokatî dîtiye û gelek caran pê re suhbetê dikî!

Erê di nava xwêdanê de mabû, lê ewqas jî kêfxweş bû ku wê gel tev wê rojê derbasî wir bibe:

-Hevalê Ciwan, ji te jî deng dernediket, çima?

-Heqê te heye; çiqas Serok bi rehetî bi me re dide distîne, lê dîsa

kelecan min digire. Dema ez ji hundir derdikevim çawa ku ez çend salan li cem mabim. Tiştên nû dibêje, ti rê namînin ku veneke. Bersiva xwestekên her kesî dide.

-Bi Xwedê ez jî weke hevalan tevan dibim. Tevî ku gelek caran têm cem jî, lê nizanim hema dibêjim sihrek di vê meseleyê de heye.

Hingî di axaftinê de germ bûbûn hew dîtin ku li Berliyasê di nava gel de ne. Ji seyarê peya bûn. Selman bi çend dengan gazî gel kir, lê ji ber gengeşe û kelecanê ti kesî deng nebihîst. Ciwan ferq kir ku wisa nabe, ji wir dûr ket. Piştî qasekî mîkrofonek di destê wî de bû bilez dihat:

-Hevalê Selman enceq gel wiha dengê te bibihîze.

Çavên Selman wisa ziq li mîkrofonê bûn, çawa ku jê bitirse:

-Heval, her di destê te de ye, hema dest bi axaftinê jî bike!

Lê niyeta Ciwan jî ya axaftinê tinebû, mîkrofon ber bi wî ve dirêj kir:

-Serok ji te re gotiye, divê tu peyama wî ji gel re ragihînî.

Selman neçar ma rahişt mîkrofonê:

-Gelê me yê hêja, silavên Serokatiyê ji we re hene!

Hê gotina wî di devê wî de, dengê çepik, tilîlî û qîran ji nava gel bilind bû. Çawa ku erdhej çêbûbe, tevgereke wisa hebû û deng nedisekinîn. Lê ji bo girtina peyamê diviya guhdarî bikin.

-Serokatî dibêje bila gel bê Akademiya Masum Kurkumaz!

Jixwe gel jî li benda mizgîniyeke wisa bû. Piştî vê gotinê weke pêlên deryayê gel ber bi Helwa ve herikî.

Piştî peyamê, çawa ku ji ciyekî bilind ketibe wisa li Selman hatibû. Di nava xwêdanê de berê xwe da Ciwan:

-Min peyama Serokatiyê ji gel re got?

Ciwan bi destê xwe pêlên mirovan nîşan da:

-Li gelê me binêre, çawa hildikişin, diçin!

Ev roj bûn ku bûbûn efsane, ketibûn ser zimanan. Apo bi şev û roj di nava gel de bû. Bi şev li qadê agirên mezin dihatin pêxistin. Yên hatîn ne germ û westan nas dikirin, ne ji wir têr dibûn. Her ku diçû jimara gel jî pirtir dibû. Apo li odeya xwe bi çend milîtanên jin yên nû hatîn re suhbet dikir. Mendîleke spî di destê wî de bû, saeteke qawîşa wê reş jî li ser destê wî bû. Kesên rûniştî, bi dîtina wî çawa ku pişta xwe dabin çiyayekî, baweriya wan ewqas bi wan dihat û di çavên xwe de, kesekî biheybet didîtin. Piştî ku her kesî xwe da naskirin, dest bi axaftinê kir:

-Hûn ji bo perwerdeyê hatine vir. Divê hûn xwe baş birêxistin bikin û ji bo pêşxistina xwe demê baş bi kar bînin.

Keçeka xwînşîrîn bala wî kişandibû. Rûyekî gewr, çavin belek, birhin weke kevanan û eniyeke fireh li ser bû. Bi qasî ku lihevhatî bû, ewqas jî dêmên wê xweşik bûn. Bedewiyeke xwezayî li ser bû. Çend kêliyan lê temaşe kir:

-Navê te çi bû?

-Serokê min, navê min Sema ye.

Bistebûna wê bala wî kişand:

-Xwendina te heye?

-Min zanîngeh xwediye. Ez li Mêrdînê tevlî bûm.

Di dilê xwe de got, ev weke keseke biaqil xuya dike:

-We gaveke mezin avêtiye û hûn heta vir hatine. We zor û zehmetiya çiyayan jî dîtiye. Sibê hûnê ji bo kar biçin gelek deverên Kurdistanê. Ji ber wê divê hûn pir bixwînin û baweriya we bi we hebe.

Sema ji her kesî pirtir ketibû nava kelecanê. Di dilê xwe de got, gelo, bi rastî ez gihîştime vir. Piştî qasekî derketin, berê xwe dan qadê. Her der, her tişt ji bo wan balkêş dihat. Li her tiştî temaşe dikirin. Erkdarê rojê birin qawîşên wan. Ranzeyên milîtanan yên bi awayekî birêkûpêk hatîn danîn bala wan kişandin. Li qawîşê pir tişt

tinebûn, lê her yekê çente, betanî û pirtûkên wan li ber serê wan bûn. Pergala qawîşê hemû di ber çavên xwe re derbas kirin. Sema li kêleka derî rûnişt. Li ser axaftinên Apo hizirî. Piştî ku çenteyên xwe bi cih kirin, xwe berdan nava meydana ji reng û dengan xemilî.

Êvar bû, şevê konê xwe vedabû. Li her devera akademiyê roniya elektrîkê pêketî bû. Pencereya odeya rêveberiyê vekirî bû. Zekî li ser kursiyê li ber mase rûniştibû, bi çavên xwe yên beloq li lênûsa di destê xwe de dinêrî. Carna jê di pencereyê re li derve temaşe dikir. Serê wî yê keçel ji ber şewqa hundir diberiqî. Çawa ku ji Afrîka hatibe, rengekî esmerê neşîrîn li ser bû. Ji nişka ve bişirînek ket ser lêvên wî. Lênûsa xwe danî ser mase, derket derve. Li dora qawîşê nêrî, bi dengekî bilind gazî nobedaran kir:

-Hûn li kû ne, çayekê bînin. Deh caran min gotiye ji vir dûr nekevin!

Gotinên wî weke yên axayê heft gundan bûn. Çavê wî bi reşê mirovekî ket, ji reşê wê nas kir:

-Hevala Sara, tuyê bi kû ve biçî?

-Gel li vir e, divê em bibînin. Tu çi dikî?

-Ez pirtûkekê dinivîsim. Dixwazim di demeke nêz de biqedînim.

-Gelek baş e, pêwîstiya me bi nivîsê heye.

Çawa ku tu du zebeşan bidî binê çengên wî, xwe vena:

-Ez li ser jiyana xwe û şer dinivîsim.

-Ya girîng nîvîs e, navê wê çi ye?

-Min hê nav lê nekiriye, ezê ji Serokatiyê bipirsim, ew tenê dikare nav li pirtûka min bike!

-Ez kêfxweş im ku hevalên me yên di şer de mayîn dinivîsin. Ezê ber bi qadê ve biçim, tu tiştekî dibêjî?

-Na heval. Ez jî kêfxweş im ku hûn bandora zindanê ji ser xwe diavêjin û hêdî hêdî tevlî gel û hevalan dibin.

Sara bihêrs lê temaşe kir, lê bê ku tiştekî bêje ji wir dûr ket. Di

dilê xwe de got, axaftinên wî ne weke yên hevalan bûn, gelo dibe ku Semîrin din ji nava me derkevin. Serê wê bi van fikiran tevlîhev bûbû. Zekî jî kêfxweş bûbû ku wisa jê re gotiye, didanên xwe qîç kirin û li asîman tamaşe kir. Ji xwe re got, ya herî girîng ez mezin bibim. Wê demê wê her kes li hemberî min raweste û hesaban ji min bike. Rojên xwe yên borî anîn ber çavên xwe. Destên xwe bi şûn ve danîn ser hev li qadê çû hat. Bê ku bi ti kesî re biaxive, yan biçe nava gel careke din vegeriya cihê xwe. Heta wê demê çaya wî jî jê re anîbûn.

Apo û du endamên rêveberiyê li tenişteke akademiyê tevgera gel temaşe dikirin. Yên ji Berliyasê dihatin hê dawiya wan nehatibû:

-Divê her kes bizane û bibîne; dema gelê Kurd rabe û weke pêlan bimeşe, ti hêz nikarin li hember bisekinin û bisekinîn!

Sala 1979'an hat ber çavên wî. Meşa destpêkê heta wê kêliyê di hişê xwe de honand. Di dilê xwe de got, diviya em bigihîjin van rojan, ev diyariya hevalên me yên şehîd e. Di wê navê re dengê durişma "Bijî serok Apo, Bijî Partiya Karkerên Kurdistanê!" bilind bû. Durişman bala wî kişandibû, li her du milîtanên li kêleka xwe nêrî:

-Dema em hatîn vê qadê, ez tenê bûm, lê me biryara mezinkirina têkoşîna gelê Kurdistanê dabû. Dijminê me hov bû, diviya em li ser piyên xwe bisekinin. Em niha bûne destan, her kes behsa me dike. Me li vir hêviya azadî û jiyaneke nû afirand. Me kabosa ser Kurdistanê rakir. Bi destpêkirina şerê çekdarî tevgera me li welat û dervayî welat deng veda û her ku çû gur û geş bû. Me wê rojê soz da, îro jî gel li me xwedî derdikeve. Hûn vê hevdîtina mezin dibînin, ne!

Rêveberiyê tekmîla xwe da:

-Serokê min, me îşev sê sîxûrên din jî girtin, yekî ji wan sîxuriya xwe qebûl kir, got, hedefa me kuştina serokê we bû. Yekî din jî agahî ji me re li ser hat, lê ji vir derketibû, me negirt. Pêşniyara me

Serokatî zêde dernekeve.

Çend kêliyan kûr kûr hizirî:

-Rast e, em jî di wê ferqê de ne ku dijmin li ser kar e. Dixwazin rojên wiha moralê gelê me xirab bikin, lê ez xwe diparêzim xema min nexwin. Hûn şiyar bin, li gel miqate bin bes e. Dema hûn çûn bêjin Cesûr bila bê odeya min.

Ew ber bi odeya xwe ve çû, ew jî çûn agahiyê bidin Cesûr.

Apo li odeya xwe rûniştibû. Li ser xelasiya xwe ya ji çembera felekê ya bi hezarê salan xwe li qedera Kurdan pêçayî dihizirî. Pênûs hêdîka rakir, xist nava tiliyên xwe. Pênûsê dest bi tevgerê kir û serê şûrê xwe li ser singa pelika spî xist: "Bingehê her tiştî avabûna kesayetê ye."Fikar û gumanên xwe yên têkildarî paşrojê yek bi yek herikandin ser rûpelê. Çawa ku çemê avê ber bi deryayê ve biherike, tiliyên destên wî berê pêlên xwe dabûn kesayet û jiyaneke nû. Werîsê bîra xwe yê biçilak, yê dîrokê avêtibû nepeniyên şevê. Weke xelekên zincîrekê ji serî heta binî bendên nîvîsa xwe bi hev ve kirin. Her ku xwe berdida kûrayiya dîrokê, veşartiyên wê baştir didîtin. Bi dengê derî serê xwe ji ser lênûsê rakir, pênûsa xwe li cihê gihatiyê hişt:

-Kerm bike, derbas bibe!

Cesûr bi baldarî û rêzdarî, derbasî hundir bû:

-Serokê min, we gazî min kiribû!

-Erê, fermo rûne!

-Wiha baş e serokê min.

-Rûne.

Li ser kursiyê li pêşberî wî rûnişt. Apo lênûsa xwe girt, pênûsa xwe danî ser:

-Berê jî me nîqaş kiribû, dibe ku dijmin êrîşî vir bike. Divê gel di ewlekariyê de be. Rewşên cuda hene?

Li ser tevgera dijmin dihizirî. Bi qasî ku ji hatina gel kêfxweş bûbû, ewqas jî bifikar bû. Rewş hatibû guhertin. Rojhilata Navî di

nava çembereke ji agir de bû. Diviya ew jî hesabê xwe li gorî wê bike. Cesûr bi gotina wî pirtir ket hesasiyeta geşedanên diqewimin:

-Serokê min, me xeber ji we re şand, ew çend sîxûrên me girtîn ji bo we hatibûn.

Apo dizanî dijmin nasekine. Lê ji tevgera dijmin zêdetir, ew di tevgerê de bû. Ji bo her pêngavê xwe amade didît. Berken bû, rahişt pênûsa xwe lê nêrî, dîsa hêdîka danî cihê wê:

-Ez xwe diparêzim, divê hûn jî gel biparêzin.

-Rast e serokê min!

Rabû ser xwe çû ber pencereyê, di dilê xwe de got, bi salan e em planên dijmin pûç dikin. Niha jî ji bo her pêngvê em amade ne. Bi qasî çend kêliyan li derve nêrî, berê xwe da Cesûr:

-Îşev şeva 15'ê Tebaxê ye, şeva guleya destpêkê. Me li qada Rojhilata Navî çerxeke nû gerand. Ji wan rojên bêdeng û tarî em gihîştin rojên ronahiyê, rojên ku dengê Kurdan bilind dibe.

Dengê çîçirkan weke dengê kemançeya Miradê Kinê ji dora odeyê dihat.

-Rojhilata Navî difetise. Welatê me jî li navenda wê ye. Gelek pirsgirêk li benda me ne, divê em di giraniya wê de bin. Pêwîstî bi çareseriyên zanistî heye.

Ji şeva guleya yekê heta wê şevê pêngavên gerîla hemû anîn ber çavê xwe:

-Weke me dixwest di partîkê de her tişt pêk nehat. Sedem tesfiyeya Memed Şener bû. Me qada Başûr vala hişt. Şener taktîkên Semîr li hemberî me dişixulandin. Di kongreya çaran de dixwest qada Rojhilata Navî bikeve lêpirsînê, ango min bike lêpirsînê. Lê di kongreyê de ew qediyabû. Divê em di aliyê îdeolojî de pêşketinan çêkin. Piştî Şerê Kendavê rewş aloztir bûye.

Gotina çareseriyê, çend caran di serê xwe de bir û anî, li cem xwe zelal kiribû:

-Li ser vê hûn çi dihizirin?

-Serokê min, di sedsala bîstan de tengayiyên rizgariya gelan pir in. Lê firsend jî heye ku em li meydana Rojhilata Navî cihê xwe bigirin.

Apo dixwest vê mijarê berfirehtir bike:

-Tengayiyên sosyalîzma pêkhatî pir in. Heftê sal derbas kirin, lê hêvî û daxwaziyên insaniyetê bi cih neanîn. Sîstema sosyalîzma pêkhatî xwe pûç kir. Çareserî û mizgîniya cîhaneke nû ji me tên xwestin.

Piştî nîqaşeke berfireh Cesûr derket, wî jî aşûrtmanê xwe li xwe kir, xwe dirêj kir. Serê xwe geh dibir vî alî geh aliyê din, lê dikir û nedikir xewa wî nedihat. Fikar jê nedigeriyan. Ji bo plana roja din fikirî heta bi xew ve çû.

Roja 15ê Tebaxê bû. Her kêlî ji kêliya din bikelecantir bû. Ji bo taştê sifreyên dirêj hatibûn raxistin. Apo ji sporê hatibû, bi gel re taştê dixwar. Taştê kartol û hêkên kelandî, penîr, zeytûn û nanê tenûrê bû. Sira şevê hê ji navpolên mêvanan derneketibû. Weke Çiyayê Şingalê, bi şev sar, bi roj germ bû. Ji Berliyasê û Helwe hê bi hezaran mirov dihatin.

Her kesî taştê xwaribû, êdî şahiyê dest pê kiribû. Ala PKK, ERNK û ARGKê hawirdorê qadê xemilandibûn. Dayîkên nû dihatin, destên xwe ji axa şûna piyên şehîdan tijî dikirin û maç dikirin. Hina jî ji bo tiberik bi xwe re dibir.

Yadê Sitî bi destekî dawa kirasê xwe girtibû, bi destê din destê Heqî. Piştî meşeke dirêj gihîştibûn ber derî. Pişta xwe rast kir, li derî nêrî. Rengê wî yê kesk, sor û zer westana wê ji bîrê bir. Heybeta meydanê ji derî ve xuya dikir. Li nobedarên jin nêrî:

-Keça min merheba ji we re!

Piştî silavên germ û himbêzkirinê berê xwe dan hundirê qadê. Ji derî borî neborî xwe daqolî erdê kir. Kulmek ax rakir xist tûrikê li ser

piştêna xwe. Lê axê têrê nedikir, tovê kulîlkên hişk jî kom dikirin. Qadir jî li tenişta wê, li qadê û girên derdorê dinêriya. Li jorê çend xanî ketin ber çavên wî:

-Heyra, ev ne akademiyeke leşkerî tenê ye, cihê her tiştî ye. Min digot qey weke tevgerên din perwerdeyekê dibînin û diçin şer. Ev gelek mezintir e!

Çavên Heqî ketibûn ser zarokên li qadê dilîstin.

Şervîn ber bi wan ve hat, dayê nas dikir, hê tovê kulîlkan kom dikir. Çend stirî jî ketibûn tiliyên wê. Lê xem nedikir.

-Dayê tu çi dikî?!

-Keça min, ev ax dewsa şehîdan û serokê me ye. Kulîlkên vir hemû bi xwêdana wan şîn bûne, ezê bizrê wan bi xwe re bibim.

-Dayê, em biçin ber sîtêra avê hinekî li ser çavên xwe bike.

Piştî av vexwarin, rûyên xwe şûştin, berê xwe dan qadê. Rojên destpêkê PKK nas kirî anîn ber çavên xwe. Li Qadir vegeriya:

-Kurê min, sala 1980î bi navê “Telebe” min ev partî nas kir. Wê demê lawê min dianîn malê. Çawa min li wan guhdarî kir, min ji lawê xwe re got, Ednanê min, wê hevalê te Xelîl agir bi mala me bixe. Lê ew jî tevlî bû. Piştî şehîdbûna wî heta salekê jî, min ji xwe re digot çima lawê min çû Kurdistanê şehîd ket! Lê bi serê te yê delalî, ku niha min qebûl bikin ezê jî tevlî bibim! Par jî ez hatibûm vir.

Qadir bê ku biaxive guhdarî dayê dikir. Hêdî hêdî diketin nava qadê, nizaniyan ne li milîtanan binêrin, ne li gel. Ew qada mezin bûbû weke moristanê. Li cihê pêşwaziyê rawestiyan. Milîtenekî erkdar ber bi wan ve hat:

-Dayê, hûn bi xêr hatine, heval, ka avê ji wan re bînin!

Dayê bi çavekî tijî hesret li wan dinêrî:

-Lawê min, ez ne tiya avê me, ez tiya Apo û şoreşgerên azadiyê me!

Ciwan li odeya piçûk li ber pencereyê bû. Bi bihîstina dengê wê re, ji bo pêşwaziyê bilez derket:

-Dayê, dewreya borî jî tu hatibûyî vir, ez we nas dikim!

Tevan destê wê maç kir. Rondikên kêfxweşiyê ji çavên wê dibariyan:

-Lawê min, hûn hemû zarokên min in. Xwêdana lawê min li ser vê axê ye, hûn îro hemû di şûna wî de ne. Lê min dixwest qawîşa lê mayî bibînim.

Ciwan lawê wê nas dikir, berî ku tevlî bibe çûbû cem wan. Berê xwe ber bi jor ve kir:

-Dayê, tu jorê dibînî, qawîş li wir in.

Dayê destekî xwe da ber çavên xwe li jorê temaşe kir:

-Lawê min, teyr jî nagihên wir!

Di wê navê re dengek bilind bû. "Ji kerema xwe re kom bibib," Ew jî hema li cihê xwe li ber dîwarê wê odeya piçûk rûniştin. Tevgereke mezin ket qadê, mirov digot qey bi rojan perwerde dîtine. Gelekan xwe ji qadê nedida aliyekî, dixwestin xwe bigihînin Apo. Hêzên parastinê li seranserê qadê belav bûbûn. Li hawîrdorê qadê jî nobedar hatibûn bicihkirin.

Saet heştê sibê bû. Ji her alî ve gel ber bi qadê ve diherikî. Dengê durişma, Bijî 15'ê Tebaxê, Bijî Serok Apo, Bijî PKK, li baniyan dixist û olan dida. Dayîk û zarok li nîvê qadê rûniştibûn. Du sed milîtanên biçek, li nîvê qadê li hemberî gel ketibûn rêzê. Milîtanên jin di rêza pêş, yên xort di rêza din de bûn. Wî dîmenî çavên gelekan tijî rondikên kêfxweşiyê kiribûn. Hêdî hêdî hem milîtanan cihê xwe digirt, hem gel. Dîmen temam dibû.

Li nîvê qadê maseyekî çarkoşe danîbûn û du mîkrofon li ser bûn. Wêneyên şehîdên destpêkê jî li ser kursiyên li pişt mase hatibûn rêzkirin. Ji nişka ve dengê "Bi can, bi xwîn em te re ne ey Serok" bilind bû. Her kes li ser piyan bû. Yadê, Heqiyê piçûk û Emîne li

cem hev bûn. Emîne, kefiyeke kesk, sor û zer li ser eniya xwe girê dabû. Devê xwe bir ber guhê Yadê:

-Yadê, ez çavên xwe li cihê serok jê were digerînim. Dibêjin ka ji kû ve bê ti kes nizane!

Hem diaxiviya, hem çavên xwe li her çar aliyan digerandin. Dengê durişman bilindtir bû. Apo ber bi qadê ve dimeşiya. Emîne, dengê xwe bilindtir kir:

-Dîsa min nizanî ka ji kîjan alî ve hat!

Yadê destê xwe bi îşareta serkeftinê bilind kiribû:

-Keça min, ya girîng çawa em xwe îro bigihînin cem!

Du milîtanên biçek li pêşiyê dimeşiyan. Dengê çepik û durişman nedisekinî. Her kesî dixwest xwe bigihîne nîvê qadê. Erkdaran gel paş ve dida. Li milekî wêne dihatin kişandin, li milekî tiliyên destan bi nîşana serkeftinê bilind dibûn. Dengê himîn û zimînê bi ser qadê ketibû. Derdor bi her sê alan û bi rengê gel hatibû xemilandin. Di navbera wî û gel de milîtan di merasimê de bûn. Di awirên çavên xwe de ew coş û kêlî hemû tomar dikirin. Li gel temaşe dikir û carna jê bi destan gel silav dikir. Ji bo axaftinê xwe pir baş amade kiribû. Lewre dizaniya çav û guhên her kesî li ser wî ne. Dengê li qadê hêdî hêdî kêm dibû.

Li pişt mase sekinî, berê xwe da gel:

-Bijî Partiya Karkerên Kurdistanê!

Bi durişmê re dengê çepikan careke din bilind bû. Piştî çepik û durişman dest bi axaftinê kir:

-Em pêngava 15'ê Tebaxê û hatina we ya ser axa şehîdan silav dikin û salvegera 15'ê Tebaxê ya heştan li we pîroz dikin!!!

Her du çavên xwe yên reş li ser mase çikandin û danîn ser hev. Dengê tilîliyên jinan û çepikan bilind bû. Her ku deng bilind dibû wî jî bi her du destan gel silav dikir. Bi coşeke mezin axaftina xwe domand:

-Di rojeke weke îro de, divê mirov li ser qedera gelê Kurdistanê bi kûrayî raweste û xwe bigihîne biryarên mezin. Em ji kû hatin? Me çi kir? Piştî niha emê çi bikin? Divê em bersiveke xurt bidin van pirsan!

Dengê bayê jî nedihat, dinya kerr bûbû. Dengê wî tenê ji qadê bilind dibû. Çawa ku roja mehşerê her kes li bendê be ka wê kaxiza wî bidin kîjan destî, gel jî wisa bi baldariyeke mezin û bêpêjin guhdarî dikir.

-Dijminekî me yê wisa heye, jiyanê ji me re qet qebûl nake. Ji siyonîstên Îsraîlê bihêztir û ji Hitler xurttir bûn. Ji bo me digotin, bermayiyên şûr. Lê ya tewrî xirab ew e ku mirov vî dijminî nas neke, xwe jî nas neke. Berî PKK'ê, hebûn û tinebûna Kurdan ne diyar bû. Ji xwe fedî dikirin û direviyan. Ya herî xirab ew e ku mirov ji bo azadiya xwe tiştekî neke. Berî her tiştî divê hûn xwe nas bikin! Hatina we ya vir cihê rûmetê ye. Hûn dixwazin barê PKK'ê daynin ser milê xwe!

Bi vê gotinê re dengê durişm û çepikan careke din bilind bû. Di çavên gel de hêviya jê dikin didît û vê, barê wî girantir dikir, lê kêfxweşiyeke mezin didayê.

Li qadê axatineke dîrokî hatibû kirin, her kesî bersiv û hêviya ji bo wê hatî girtibû. Lê gel hê li qadê bû. Meydan ji toza ji binê piyan radibû li jorê bûbû xumam. Digel wê germa Tebaxê ti kesî nedixwest biçe. Germayiya ji axaftina Apo girtîn kelecaneke mezin bi wan re çêkiribû. Dîtina pergala milîtanan ji bo wan dîtineke dîrokî bû. Ew cara yekê bû ku serhildanekê dewam dikir û nîzama şoreşê danîbû. Li dora meydanê bost bi bost digeriyan. Rêwîtiya Kurdan ya vî cihê pîroz ji hesreta salan bû. Di çavên wan de hêvî mezin bûbû. Çawa ku li devê deriyê xwe bin, zarok jî li meydanê wisa bi kêfxweşî dilîstin. Dayîk jî kom bi kom rûniştibûn, axavtinên Apo ji hev re digotin. Hê

jî gelek kes li benda hevdîtinê bûn. Rojê têra wan nekiribû, wê şev li wir biman.

Êvar bû. Apo di odeya xwe de li ber mase diçû dihat. Di serê wî de bablîsokeke ramanan serî hildabû. Dengê gel dihatiyê. Perde ji ber xeyalên wî yên çil rojên li bajarê pêxemberan Riha rabûbûn. Lêvên wî dilepitîn. "Ji dîrokeke tarî em gihîştin rojên ronahiyê." Ji bo wî rojên girîng bûn. Ji odeyê derket çû qadê. Bê ku kes wan birêxistin bike, gel ket rêzê silav dan. Gel bawer nedikir ku destê wan bigihîje destê wî. Heta sisiyê şevê kom bi kom bi wan re axivî. Piştî axaftina bi koma dawî re çû odeya xwe. Kêfxweşî û hizran xwe lê civandibûn. Ji milekî ve dixwest bersiva her kesî bide, ji milekî din ve dixwest pêşbîniya xwe ya rojên bê zelal bike. Xwe ji bo pêngavên nû amade dikir. Bi cilên xwe yên leşkerî ve serê xwe danî. Ji westana rojê piştî çend kêliyan çavên wî ketin ser hev.

Li çoleke bêdar û bêav dibeziya. Derdora wî qelebalix bû. Li wê çola rût û tazî cilûbergên her kesî reş bûn. Diviya ti kes wî nebîne û nas neke. Eger bihata dîtin xelasiya wî tinebû. Ji nişka ve dengek hatiyê. Diyar bû ku dîtine û nas kirine. Tû kir nava destê xwe û dest bi revê kir. Lê neçar bû di ber wan re biçe, lewre weke din ti rê tinebûn. Lê dema dîtin kesekî biheybet ber bi wan ve tê, ew jî pir tirsiyan, xwe dan aliyekî. Hew dît ku ji çolê derbas bûye û xeter nemaye. Lê hê kutekuta dilê wî bû. Ew rûyên bitirs li pişt xwe hiştibûn. Reşên wan jî li wan derdoran nemabûn.

Bi dengê çivîkan ji wê xewna bitirs şiyar bû. Di dilê xwe de got, ez tenê jî bim ezê vê dozê bimeşînim. Rabû ser xwe, berê xwe da qadê, gel piranî li wan deran bû. Hinekî meşiya. Çû nîvê qadê sekinî. Gel li pey hev xwe ber bi aliyê wî ve berda. Ew jî li benda rojê bû ku dema xwe bi wan re temam bike. Hem bi wan re diaxivî, hem li ser xetera mayîna wan ya li wir dihizirî.

Ji civîneke piçûk, ber bi hezaran ve hatibû. Fişeka yekê wisa

mohra xwe li dîrokê xistibû û hilhatina wê li vê qadê şîn bûbû. Ne wî dixwest ji gel qut bibe, ne jî gel dixwest wî li wir bihêlin biçin. Lê dema çûnê bû. Li ber deriyê akademiyê sekinî, kom bi kom xatirê xwe jê dixwestin. Her koma xatirê xwe dixwest, heta ji wir dûr diket destên xwe jê re dihejandin. Her du destên wî jî li hewa bûn. Çawa ku, her tiştê xwe li pey xwe bihêlin, biçin, wisa xemgîn û bêdil ji wir dûr diketin.

***

Havînê xatirê xwe xwestibû, payîzê jî hêdî hêdî reng û dengê xwe didan deşt û baniyan. Lê hê sibehan honik, nava rojê hê germ bû. Şev jî êdî dirêj dibûn. Bayekî narîn yê xwe li germê pêçayî li darên derdora akademiyê dixist. Pelên bûyîn xezêm li ber diketin, li babeniyan kom dibûn. Qulingên koçber ref bi ref ji zozanan ber bi germiyanan ve dihatin. Hatina wan jî agahiya demsala nû bû. Silsileya çiyayên Bîqayê rengê wan yê spî baştir xuya dikir. Bayê şevê li bilûreke xemgîn dida. Zulfên milîtanên jin ji ber germa havînê qemer bûbûn.

Baniyên derdora akademiyê germ bûbûn, lê hê tavê nedabû qada merasiman. Dewreya havînê qediyabû, ya payîzê dest pê kiribû. Apo li pêşiya odeya xwe rûniştibû li milîtanên jin yên di perwerdeya leşkerî de temaşe dikir. Li milekî dihizirî ka wê artêşeke jinan çawa ava bike, li milê din li ser têkiliya rast ya di navbera mêr û jinan de dihizirî. Ji aliyê dibistanê ve milîtanek bilez ber ve hat:

-Serokê min, hevalan ji Helebê notek aniye, wê dîsa biçin.

Bilez not ji destê wî gir:

-Bila neçin ezê wan bibînim.

Piştî xwendina notê, dîsa pêça xist berîka xwe. Çavên wî li moristana li tenişta wî ketin. Li barê wan yê giran û riya dûr temaşe kir. Ji bo rê ji wan re veke, piyên xwe hêdîka kişandin ber xwe. Piştî

çend kêliyan rabû berê xwe da odeya mêvanan. Hin milîtanên dewre qedandîn li wir bûn. Bi vekirina derî re tev rabûn ser xwe. Piştî silavê rûnişt dest bi axaftinê kir:

-We perwerdeya xwe qedand. Niha hûnê derbasî qadên xebatê bibin. Divê hûn rola xwe bilîzin û perwerdeya we dîtî pêk bînin. Me doh heval şandin Efrîn, Qamişlo û Kobanê jî. Hûnê biçin Dêrikê, ji wir jî derbasî çiyê bibin. Dêrik pira Bakur, Başûr û Rojava ye. Erdnîgariya wê jî cihekî hesas û navendî ye. Eger gotineke we, pêşniyareke we hebe bêjin.

Milîtanekî esmerê bejinzirav û bi simbêlên reşê tarî, bi rûyekî jixwebawer rabû ser piyan:

-Serokê min, hem di perwerdeyê de, hem piştî perwerdeyê Serokatî li ser her mijarê rawestiya. Ji ber wê tiştekî em bêjin nîne.

Apo ew nas dikir, li ser erkê ku wê bike hizirî:

-Haşim, gundê we jî nêzîkî sînor bû, ne wisa?

-Serokê min navê gundê me Pilêsiyê ye, nêzîkî sînor e. Ez par ji wir tevlî bûm.

Yekî bi temenê xwe jê mezintir rabû ser xwe. Her du jî pir baş nas dikirin:

-Ebû Ehmed, divê tu biçî bijîşk tenduristiya xwe baş bikî paşê tevlî kar bibî.

Yek bi yek bi her kesî re axivî. Di wê navê re nobedar ket hundir:

-Serokê min, we gazî hevalê Mezlum kiribû, amade ye.

-Bila bê vir.

Piştî çend kêliyan Mezlum hat, lê ji ber kelecanê dengê kutekuta dilê wî dihatiyê.

Bi baldarî li serûberên wî nêrî, ferq kir ku pir bikelecan e:

-Tu biçe Helebê. Li gorî agahiyên hatîn di xebatê de kêmayî derketine. Bi gel re civînan çêke. Paşê me agahdar bike. Gelê me yê wir welatparêz e. Piştî hilbijartinên Suriyê divê em şêwazê xebata

xwe di ber çavan re derbas bikin.

Hinekî berken bû:

-Dewlet carna çavê xwe ji hevalên me re digire. Ev jî dibe sedema sistbûn û tevgera wan ya rehet. Weke din gelek hevalên me di binê bandora partiyên reformîst de ne. Hebûn û tinebûna gelê Kurd ketiye destê me. Te li vir dît, ez dîrokê bi destê xwe dinivîsim.

Kelecana Mezlum hinekî çûbû:

-Naskirina Serokatiyê di her warî de zor e.

-Ne hûn tenê min nas nakin, dijmin jî min nas nake. Eger ez nas bikiram, niha ez tine kiribûm. Tu diçî wir, divê hûn di nava gel de ne bibin axa, ne jî dûvik.

Her kes çûbû lê Haşim hê li cihê xwe bû. Axaftina Apo ya li qadê ji gel re kirî dianî bîra xwe. Lênûsa xwe vekir, hevoka di hişê xwe de tomar kirî nivîsî: "Karê me yê bingehî rêxistinkirina Kurdên nû di nava PKK'ê de ye. Ne berxwedan tenê, divê bizane ka çawa bimeşe û avaker be." Gotinan di guhê wî de olan didan. Rabû ser xwe li wêneyê Egîd yê daleqandî temaşe kir. Di wê navê re Ebû Ehmed ket hundir:

-Hevalê Haşim, tu li vir çi dikî? Tu amadeyî em îşev bi rê bikevin?

-Ez amade me. Axaftina îro têrê dike ku em bi salan jî bixebitin.

Derketin berê xwe dan qawîşê.

Roja din saet heft û nîvê sibê bû. Li dibistanê ders dida. Her du çavên wî li ser hev bûn. Adetê wî bû; her ku ders dida çavên xwe digirtin, lê car bi car yên di dersê de di ber çavên xwe re derbas dikirin. Bi hosteyiyeke mezin her sê zeman di nava hev de dihonandin. Ji ber ku mijar li ser jinan bû û behsa kesayeta wan dihat kirin, xortan mêrtiya xwe ya borî dianî ber çavê xwe, keçan jî xwe serbilind didît ku jin in. Xwest mijarê kûr bike:

-Emê xwe bigihînin kesayeta jinê ya em dixwazin ava bikin, ne

ew jina hûn nas dikin. Avakirina jinê, mijareke girîng e û şoreşeke mezin e. Divê jin vê bizane; eger jineke tenê jî di nava refên PKK'ê de hebe, wê di nava têkiliyên wekhev, azad de be. Ma dijberiya we ji têkiliyeke wisa re heye?

Rûken bi awayekî jixwebawer destê xwe bilind kir:

-Serokê min, têkiliya nava PKK'ê di cîhanê de mînak e. Lewaziya jinê di aliyê raman de ye, ne di aliyê fîzîkî de.

Çavên xwe li ser Milîtanên jin gerandin:

-Şêwazê ez behsê dikim tu têdigihîjî?

-Belê serokê min.

Berê xwe vegerand ser Sara. Bi nêrîna wî re rabû ser xwe.

-Li ser van mijaran tu pir dihizirî, tu dixwazî tiştekî ji me re bêjî?

Sara bi sekneke şoreşgerî berê xwe dabûyê:

-Serokê min, mijar diyar e û tê fêmkirin. Eger jin têbigihîje wê kesayeta rêxistinî, ti pirsgirêk namînin.

-Gihîştina jinê ya van taybetiyan tiştekî biwate ye. Di nava PKKê de rewş çawa ye, gelo zilam serdest e?

-Serokê min, ji ber ku rêbertî li vir e rewş cuda ye.

Dixwest navenda lê dimîne bi awayekî rast bê fêmkirin.

-Navendeke germ e, ne wisa?

-Rast e serokê min.

-Ango hûn bi rewşa li vir razî ne?

-Rast e serokê min, ti nêzîkbûnên şaş xuya nakin, lê eger jin nikaribe di her warê têkoşînê de xwe bihêz bike, zilam firsendê bibîne wê serdestiya xwe bike.

-Ev tê fêmkirin. Jina ne di wê tigihîştinê de be, zilam jî tine dike. Ez bawer dikim tu niha baştir ji min fêm dikî. Gelo hevalên din jî fêm dikin? Divê mirov hestên sexte tesfiye bike. Bila yek ji we li ser hestan romanekê binivîse. Hestên Kurdan yên têkiliyan hemû di xeterê de ne.

Navbera nîvro bû, ji dibistanê derket berê xwe da qadê. Jin jî li dû derketin. Bi ser milê xwe re li wan nêrî:

-Werin em meşa xwe ya azadiyê bidomînin!

Tev li dorê kom bûn û bi coş û kelecan ketin meşê. Ji rûyên tevan tîrêjên kêfê belav dibûn. Ew jî bi wan re dikeniya. Dîmenekî pir biheybet û dîrokî bû. Berê xwe da riya banî.

-Zû bimeşin, meşa azadiyê bi gavên lewaz pêk nayê.

Çawa ku pê re ber bi asîman ve bifirin, piyên wan erd nedigirtin. Milîtanên xort li dû wan ketin tevgerê. Li paş xwe temaşe kir:

-Heval hûn biçin, ez dixwazim îro bi jinan re bimeşim. Ev meşa min ya îro, meşa min û jinan e.

Li ser vê gotinê tişta ji xortan re mayî xwerandina pişta stû bû. Li wan temaşe kir û hinekî berken bû. Pişt re berê xwe da keçên li kêleka xwe:

-Hûn dibînin, xort nahêlin em meşa xwe ya azadiyê bi we re bikin!

Xortê kameraya resman di destê wî de, li ser devê rê rawestiyabû, nizaniya ne bi wan re biçe, ne vegere.

Li rewşa wî ya perîşan nêrî, gazî kirê:

-Netirse, tu were wêneyên me bikişîne. Bila dîrok şahida vê meşa me be.

Wênekêş xwe bilez gihand wan û dest bi kişandina wêneyan kir. Rûken li kêleka wî dimeşiya. Bi ser milê xwe re lê nêrî:

-Hevala Rûken, malbata te hê ti name ji te re rênekirine?

Rûken ji naskirina wî ya malbatê mabû şaş:

-Serokê min, malbata min naxwaze min bi xwe ve bide girêdan.

Ji bo ku tev bibihîzin, dengê xwe bilind kir:

-Hûn dizanin ka malbat çiqas dibe asteng? Dijmin malabata Kurd perçiqandiye, kiriye mîna zindanê. Weke xefikekê lê kiriye û nahêle kesayeta Kurd pêş bikeve...

Berêvar bû, milîtan li qadê kom bi kom dimeşiyan. Darikek di destê Zekî de bû, li ser erdê wêneyê tiştna çêdikir. Ji ber bayê simbêlên wî yên zirav toz girtibûn. Bi awirên dijwar li derdora xwe dinêrî. Rûyê wî cemidî bû, ne bi ti kesî re dimeşiya ne jî suhbet dikir. Lê pir bifikar bû. Rûyê wî yê tirş, wisa dikir ku mirov jî li hemberî wî bikeve gumanan. Şervîn ji milê qadê yê din ve dihat. Li cem sekinî:

-Mereheba hevalê Zekî.

Bê ku serê xwe bilind bike û bi dengekî nizim bersiv da:

-Merhaba heval.

Li ser kursiyê li tenişta wî rûnişt:

-Hevalan îro rewşa cîhanê û guherînên dibin nîqaş dikirin. Lê herî zêde nêrînên Serokatiyê hatin nirxandin. Nêrînên 1984'an li ser Sosyalîzma pêkhatî kirîn, îro rast derdikevin.

Zekî, dîmenekî wisa dabû xwe çawa ku ew jî bizane ka dinya çawa dizîvire. Li darikê di destê xwe de temaşe dikir:

-Heval, ya ji me tê xwestin israra ser vê nîzama heyî ye. Em hêzeke şer in. Ev nîzam êdî şerê sar û germ bi hev re dike.

Şervînê di dilê xwe de got, gelo behsa Sosyalîzma pêkhatî dike, yan nîzama li Rojhilata Navî. Di wê navê re Sara ber bi wan ve hat:

-Hevalê Zekî, ez jî li te digeriyam. Divê em li ser rewşa akademiyê biaxivin. Eger karê te tinebe em biçin rêveberiyê.

Her duyan berê xwe da odeya rêveberiyê, Şervîn li cihê xwe ma. Li dora xwe nêrî, di dilê xwe de got, ez vî qasî li vir im bala min nedikişand, her der ji vir ve xuya dike. Lênûsa xwe ji berîka xwe derxist. Lê hê li ser gotinên Zekî û helwesta wî dihiziriya. Lênûsa xwe vekir notyên giritîn xwendin.

Gotinên Zekî di nîvî de mabûn, diviya ji hina re bêje. Di ser milê xwe re li Sara nêrî:

-Nîqaşên li ser Sosyalîzmê dirêj in, divê em qebûl bikin ku

Sozyalîzmê iflas kiriye.

Bi gotina “Sosyalîzmê iflas kiriye” Sara sekinî:

-Nirxandinên îro pir kûr bûn, berê jî nîqaşên partiyên çepgir li ser nirxandina Serokatiyê pir çêbûne. Em li zindanê jî pê hesiyan. Çawa ku me êrîşî Sosyalîzmê kiribe. Serokatiyê hê wê demê digot, yan divê xwe nû bike, yan jî wê hilweşe.

Ku dît Zekî dengê xwe nake, dewam kir:

-Dinya hemû hilweşîna sîstema Yekîtiya Sovyetan nîqaş dike. Çawa ku tê zanîn me li ser şopa Sosyalîzmê dest bi tekoşînê kir. Eger demokrasiya gel pêş bixistan, ev nedihat serê wan. Piştî 70 salî dibêjin em Kapîtalîzmê dixwazin. Xiyaneta li Sosyalîzmê û pêlîstin ev bixwe ye. Dijminê gelan Emperyalîzm e. Tekoşîna me ya li vir li hemberî Emperyalîzmê ye.

Çawa ku ev gotin ne bi dilê wî bin. Xwest berê nîqaşê bide aliyekî din:

-Hevala Sara, ji bo me guhertinên hundir pêwîst in.

Sara fêm kiribû ka armanca wî ji guhertina hundir çi ye:

-Divê em xwe ji fikrê Kapîtalîzmê rizgar bikin û ji xwe re li hukumranan negerin. Hedefên me bi destpêkirina tevgerê re diyar kirîn hene; ew jî demokrasî ye, Sosyalîzm e, wekhevî ye û azadî ye. Bêguman wê berdêlên wan jî giran bin!

Rûyê wî hinekî tirş bûbû:

-Hevala Sara, bi vî rengî nîqaş nabin. Serokatiyê bixwe ji bo me nêrîn hiştine ku em li ser nîqaş bikin.

-Rast e hiştine, lê nîqaşa li ser çareseriyê ji me re hiştiye.

Zekî dixwest pê bide qebûlkirin ku piştî serokê partiyê ew heye, lê bi ser neketibû. Di dilê xwe de got, serok serok e, lê em jî di piratikê de her tiştî pêk tînin.

***

Orhan li pêşiya komek ciwan bû di çiyayê navbera Şam û Lubnanê de bilez dimeşiyan. Sisê keç, çar jê xort bûn. Zarokekî dozdehsalî jî bi wan re bû. Xwêdan bi ser eniya Orhan ketibû. Riya tê re dimeşiyan û derdora wê tev daristan bû. Û her ku diçû riya wan pirtir dibû evraz. Yê zarok bi dengekî nizim di ber xwe de diaxiviya. Ji westanê kufekuf pê ketibû:

-Hevalê Orhan, ka jixweve te digot akademî li pişta vî girê ha ye. Em ji çend giran derbas bûn lê hê em negihatînê!

Çawa ku Orhan bizane wê pirske wisa jê bê kirin, ji bersivê re amade bû:

-Rast e hevalê Sîpan, girê min gotî ha wa ye, tu dibînî? Ev girê em li pêşiyê min ne behsa wî dikir, te şaş ji min fêm kiriye.

Sîpan xwest rûne. Orhan bi destê wî girt rakir ser piyan:

-Hevalê Sîpan, hindik maye. Piyên xwe bide ber xwe va em gihîştin cihê xwe. Pêwîst nake êdî tu giran bijmêrî.

Berê xwe da yên din jî:

-Hevalno, hûn dizanin em bi qaçaxî derbasî Lubnanê dibin.

Xwest westana Sîpan pê bide jibîrkirin:

-Hevalê Sîpan tu jî diçî akademiyê?

-Erê. Bavê min li wir e ezê biçim bibînim.

Destê xwe danî ser milê wî.

-Ma bavê te gerîla ye?

-Rast e, ev demek e ji çiyê hatiye perwerdeyê. Niha betlaneya dibistanê ye. Ezê jî biçim tevlî dewereya perwerdeyê bibim.

Zarokên wî hatin bîrê; ew jî çûbûn akademiyê, nexwestibûn ji wir biçin.

Ew demeke dirêj bû dimeşiyan, rûniştin bêhna xwe vekirin. Piştî bêhnvedanê Orhan li pêşiya wan sekinî:

-Hevalno, divê em piştî niha pir bi baldarî bimeşin. Hin rêbazên

meşê hene ezê ji we re bêjim.

Bi gotina wî re her kesî dest avêt qeytanên pêlavên xwe girê dan.

-Meşa me û dema wê girêdayî tevgera we ye. Divê hûn bêdeng bimeşin, ji rêza xwe dernekevin û ji hev qut nebin. Hûn amade bin emê dest bi meşa xwe bikin.

Ket pêşiyê, Sîpan da pey, yên din jî ketin rêza xwe. Sîpan ketibû kelecana kêliya dîtina Apo. Roja bavê wî tevlî bûyî û ji Bakurê Kurdistanê bi dapîra xwe re derbasî Binxetê bûyî anî bîra xwe. Zordariya dewleta tirk, êrîş û şewitandina gundan yek bi yek anîn ber çavên xwe. Rojên bi hesreta dîtina bavê xwe derbas kirîn, di hundirê xwe de weke sirekê veşartibûn. Piştî meşa saetekê, ji bo bêhnvedanê Orhan bi destê xwe nîşana rûniştinê da:

-Hevalno, em hinekî bêhna xwe vekin.

Pir westiyabûn. Her kes di cihê xwe de rûnişt pala xwe da çenteyê li pişta xwe. Orhan milê Sîpan guvaşt:

-Tu pir westiyayî?

-Erê. Li Cizîrê çiya tinebûn, meşa li çiyê zehmet e.

-Tu pir dixwazî hevalan bibînî, yan bavê xwe?

Sîpan bersiveke ku ne li bendê bû da. Êê, ji malbateke siyasî bû:

-Herî zêde ez dixwazim Serokatiyê bibînim. Ezê li wir bim, êdî venagerim.

Dem derbas dibû, diviya êdî rabin. Bi dengekî nizim gazî kir:

-Hevalno, vêca em rabin.

Sîpan ew şev û meşa bi şoreşgeran re ji bo xwe weke macerayekê didît. Heskirin û elaqeya pê re pir bandor lê kiribû. Dîsa her yek ket rêza xwe ya meşê. Pir bêdeng dimeşiyan, lê êdî hêz bi Sîpan re nemabû. Bi zorê lingên xwe diavêtin. Orhan bi destê wî girtibû hêdî hêdî dimeşiyan. Ji westanê milemil bi her kesî ketibû. Orhan kêfxweş bûbû ku kom bi selametî aniye:

-Em gihîştin cihê xwe, êdî hûn dikarin rehet biaxivin.

Bûbû serê sibê. Çar çekdar hatin pêşiya wan:

-Hûn çi kes in, parola.

Hê Orhan bersiv nedayî, dengekî bilind hat:

-Hûn bi xêr hatine hevalno!

Dengekî biheybet bû û ji Sîpan re ne biyanî bû. Lewre gelek caran guhdarî wî dengî kiribû û xwestibû xwediyê wî bibîne. Bi deng re, di hişê wî de çiyayên bilind nizim bûbûn, meşa dûr û dirêj ji bîr kiribûn û şeva ku bawer nedikir wê dawiya wê were qediyabû. Êdî her tişt asayî bûbû. Deng bû nuqteya yekê ku di hizir û ramanên wî de bimîne. Ew deng dengê Apo bû. Çawa ku bi salan li bendê bin û ji bo bersivê amade bin, bi hev re bersiva deng dan:

-Spas serokê min!

Yek bi yek bi destê wan girt, himbêz kirin. Pişt re li Sîpan vegeriya:

-Tu westiyayî?

Biken bersiv da:

-Erê, hinekî zehmet bû.

Gazî Orhan kir:

-Bila hevalan bibin akademiyê, lê tu bimîne! Gelek heval li Şamê mane, van rojan hemûyan bîne! Lê şiyar bin bila di karê we de kêmayî dernekevin. Xwestekeke we heye?

-Na serokê min, tiştek nîne.

-Baş e, lê dereng nemînin û li xwe miqate bin. Silavan li hevalên Şamê bikin. Serkeftin.

Destê xwe dirêjî Orhan kir, xatir xwest:

-Sibê jî em li benda we ne.

Piştî çûna Orhan berê xwe da riya diçe akademiyê.

***

Cesûr li qadê sekinîbû, li derdora xwe temaşe dikir. Bejneke tenik, ne kurt ne dirêj û rûyekî esmer li ser bûn. Birhên wî jî gur, reş û dirêj bûn. Şanika li ser hinarika rûyê wî ya milê rastê ji dûr ve xuya dikir. Her tim bi zimanekî xweş û zelal diaxivî. Qad bêdeng bû. Ber bi odeya Apo ve nêrî. Di dilê xwe de got, sala tevlî bûyîm, wê salê Serokatî hat vê qadê. Li saeta xwe nêrî, dema dersê bû. Berê xwe da dibistanê. Bi ketina hundir re rûyê wî keniya. Weke rûyê wî, kenê wî jî pir xweş bû. Derbasî cihê dîwanê bû. Milîtanekî xort, yeke jin jî li teniştên wî cihê xwe girtin. Lênûsa xwe vekir, lê bê ku lê binêre dest bi dersê kir:

-Dersa me ya îro li ser girîngiya perwerdeyê ye.

Hinekî sekinî, li hundir temaşe kir:

-Perwerde çima evqas pêwîst e? Çima em li vir in? Divê em van pirsan ji xwe bikin. Pirsgirêkên li pêşiya me çi ne û emê çawa çareser bikin? Pirsgirêkên me hem bîrdozî, hem rêxistinî ne. Erkên me yên dîrokî hene. Perwerde, li hemberî hişmendiya dijmin di kesayeta me de ava kirî, têkoşîn û terbiyeya nefsê ye.

Piştî navberekê xwest dersê bi nîqaşê bidomîne. Ji dawiyê Rûken rabû ser xwe. Pora wê ya reşê tarî bi ser eniya wê de dihat xwarê. Çawa ku bitirs be û bi xwe ne bawer be diaxiviya:

-PKK tevgereke perwerdeyê û şoreşa kesayetê ye. Berê min ji perwerdeya kesayetê fêm nedikir, lê niha ferq dikim ku kesayeta bê perwerde bi ser nakeve.

Hê axaftina wê di devê wê de, Mezlum rabû ser xwe:

-Ez dixwazim ji heval bipirsim ka çiqas kariye kesayeta xwe biguherîne.

Ji bo bersivê amade bû:

-Ez di kesayeta xwe de kêlî bi kêlî guherînê dibînim. Berî niha min nikariya bi awayekî serbest nirxandinekê bikim.

Li kêleka wê milîtanekî bi navê Rizgar rûniştibû. Li ser deftera

xwe “Ev heval nikare du gotinan bêje, vêca wê çawa şoreşgeriyê bike? nivîsî. Piştî axaftina wê navber hat dayîn, lê ew û çend kesên din derneketin derve. Şervîn bi rûyekî biken hat cem wan:

-Hevala Rûken, îro tu gelek xweş axivî!

Rûyê wê ne xweş bû, li ser gotinên xwe yên di dersê de difikirî:

-Tu dixwazî bêjî min nikariye nirxandinên xwe baş bikim?

Rizgar ket navbera axaftina wan:

-Hevala Rûken, min ji ber axaftinên te notên gelek baş girtin. Xîtaba te jî baş bû. Lê dengê te hinekî dileriziya.

Şervînê awirek dayê.

-Perwerdeya heval ya yekê ye. Bi min nirxandinên xwe pir baş anîn ziman.

-Min jî heman tişt gotin. Tu hema li min û kêmayiyekê digerî.

Şervîn ji wî uslûbî hêrs bûbû:

-Heval, li te û kêmayiyan nagerim. Eger tiştekî te ji bo min hebe bêje?

-Na hevala Şervîn, tiştên ez bêjim dikarim di fermiyetê de jî bêjim.

Dengê çepikan hat, navber bi dawî bûbû.

Bê ku bersivê bidiyê lê nerî, derbasî cihê xwe bû.

Cesûr dest bi axaftina xwe kir:

-Bê perwerde kesayet nikare di nava civakê de gavên girîng biavêje û di şer de jî bi ser nakeve...

Wê rojê heta êvarê dersa li ser perwerdeyê dewam kir.

Ders qediyabû, Apo li dibistanê li benda Orhan bû. Ew jî bilez ber bi dibistanê ve dihat. Parkeyekî leşkerî li ber bû û kefiyek jî li serê xwe pêçabû. Hê ji dûr ve nobedar gazî kirê:

-Hevalê Orhan, Serokatî li benda te ye.

Silav dayê û bilez ket hundir. Her du destên xwe kiribûn kulm, di teniştên xwe de berdabûn. Ev jî rêbazeke sekna li hemberî Apo bû.

Bêguman ji bo rêzgirtinê bû û dihat wateya ku ez ji bo her tiştî amade me. Di heman demê de sekneke leşkerî jî bû. Bixwe ji Tirbespiyê bû û demeke dirêj bû ajokariya Apo dikir:

-Rewşa te çawa ye Orhan? Çend roj in tu ji Cizîrê hatî? Malbata te çawa ye? Gelê wir çawa ye? Me baş dişopînin?

-Serokê min, kesên hatîn vir bi dîtina we pir kêfxweş bûne. Gelek kesên din jî dixwazin we bibînin. Tevlibûna keç û xortan jî wek efsane dinirxînin. Lê herî zêde jin ketine binê bandora tevgerê. Lê hin jê hê me û partiyên din weke hev dibînin û li dijî me diaxivin. Hin ji wan alîgirên PDKê ne, hin jê bi rejimê ve girêdayî ne. Lê gel bi giranî bi me re ye û ji tevger û exlaqê me bawer e.

-Gelek baş e. Helbet şoreşa PKK'ê efsaneyek e. Lewre ti kesî bawer nedikir em dest bi şoreşê bikin û niha van pêşketinên mezin li ber çavên xwe dibînin. Lê pêwîstiya me bi kadroyên pêşeng heye. Gelek kes hatin vir, jiyan û têkoşîna me dîtin. Li çiyayan jî gerîla berxwedaneke mezin dikin. Kurd dibînin ku zarokên wan ji bêhêziyê bûne hêz, ji leşkerbûna dijmin bûne leşkerên xwe. Jina Kurd nikariya ji hundir derkeve, îro tevlî her xebatê dibe.

Rabû ser xwe hinekî çû hat. Ew demeke dirêj bû Orhan li cem bû:

-Eger tu amade bî hin not hene bibe Efrînê. Bide rêveberiya wir û bersivê jî bîne!

Li ser fedekarî û karê dikir gelek caran şiyar kiribû, di dilê xwe de got, divê ev insanên wiha durist û fedakar bizanin xwe biparêzin:

-Divê tu li xwe pir miqate bî. Gelek kar bikin û kêfa dijmin li xwe neynin. Divê parastin ser her tiştî re be. Ma asayiş di riyan de we nerehet dike?

-Serokê min, gelek caran me nerehet dikin.

-Em neçar in gelek şiyar bin. Divê ti notên me nekevin dest.

Piştî derketina wî nobedar ket hundir:

-Serokê min, hin rojnamevanên Tirkiyê hatine.

-Temam. Bila bi merasimekê wan pêşwazî bikin û li akademiyê bigerînin. Bila nîzam û jiyana me bibînin. Sibê piştî nîvro emê wan bibînin.

***

Meha Îlonê bû. Serê sibê zû Orhan bi seyareyê ber bi bajarê Suriyê yê herî kevin Helebê ve diçû. Bajar bi rê û rêbarên xwe tê nasîn. Berê jê re digotin, Heleba Şewitî, Heleb Eşşehba, ango Heleba Gewr. Ji aliyê Eyûbiyan ve hatiye nûkirin. Ereb, Kurd, Ermen, Turkman, Sûryan, Çerkes, Çaçan û Ernewût li vî bajarî bi hev re diman. Dema tê gotin Helab bazirganî tê bîra mirov. Orhan hem seyare diajot, hem axaftinên Apo yek bi yek dianîn bîra xwe. Ew demek bû di rê de; hem westiyabû, hem bêxew mabû. Seyare sekinand, xwest hinekî çavên xwe germ bike. Pişta xwe da kursiyê xwe, berê xwe da roja sor û çavên xwe danîn ser hev. Gotina dayîka wî hat bîrê: “Roja sibehan li mirov nexe, ya êvaran bêxêr e.” Di dilê xwe de got, divê ez zû karê xwe biqedînim, vegerim Lubnanê. Gelek kar li wir jî li benda min in. Çavên wî hêdî hêdî ketin ser hev. Piştî qasekî Ji xewneke xweş şiyar bû. Li saeta xwe nêrî. Seyareya xwe xebitand ket ser riya xwe.

Piştî demekê ket nava bajêr. Li Taxa Suryan, di balkona qata çaran de, jineke porkin, bejinbilind û esmer sekinîbû. Çavên wê li ser rê bûn. Diyar bû ku li benda hina ye. Ji hundir hemserê wê bi çavên xilmaş gazî kirê:

-Dînê, xêr e tu derketî balkonê?

-Ez li benda hevalê Orhan im. Gotibû ez sibê zû derdikevim ser rê. Ditirsim tiştek hatibe serê wî, yan hatibe girtin.

Nirçînî ji nava lêvên wê derket.

-Na, Orhan xwe nade girtin. Ha, va hat, mala Xwedê ava. Dilê

min niha rehet bû.

Bi axaftina wê re zarokên wê jî bi bayê bezê ketin balkonê. Zarok ji pêşiya xwe dan aliyekî, bilez xwe di pîpelkan de berda xwarê. Bi kelecan çû ber pencereya seyareyê. Mereq dikir ka Orhan tenê ye, yan hin din jî pê re hene:

-Tu bi xêr hatî hevalê orhan! Tu tenê yî?

Bi peyabûnê re xwe avêt stûyê wî maç kir.

-Belê, lê ji bo we gelek silav hebûn.

-Em biçin jorê, niha tu gelek westiyayî.

Orhan ket pey, derketin jorê. Zarok yek bi yek maç kirin û bi wan şa bû.

Dînê ji wir wenda bû, li metbexê dengê teqereqa firaxan dihat.

-Hevala dînê, tiştekî çêneke divê ez zû vegerim.

Deng ji metbexê bilind bû:

-Heta tu xwarinê nexwî tu ji vir naçî. Tu dizanî li vir ez biryaran didim, fermandar ez im.

Dînê çay danî ser êgir, ew jî derbasî eywanê bû. Dixwest bizane ka çima ew nav lê  kirine:

-Hevala Dînê, ji sala 1979'an ve tu partiyê nas dikî. Serokatî jî û hevalên kevin jî tev te nas dikin! Tu ji me pirtir partiyê nas dikî! Lê dîsa ji te re dibêjin Dînê.

Dînê hinekî keniya, kêfa wê hatibû:

-Serok ew nav li min kir, tu dizanî çima?

Ew jî keniya:

-Bi rastî min pir mereq dikir, lê min şerm dikir bipirsim.

-Te behsa sala 1979'an kir, wê demê li Kobanê şerm bû jin biçin nava peyayan. Dema destpêkê Serok derbasî Kobanê bûyî, Şehîd Ethem yê pismamê min anî mala me. Min çay ji wan re bir. Çawa Serok çav bi min ket, got, ev dîn e çi ye? Min li derî nexistibû. Ez 16 salî bûm û tevgera min jî weke ya niha bû. Berî hingê ez qet

neçûbûm cem mêvanan. Tu dizanî wê demê metbex û hemam li kêleka hev bûn. Cara yekê min dît ku peya kincên xwe dişûn. Kêfa min ji Serok û hevalên wî re pir hatibû. Ethem timî ji bo Serok digot ev heval ozel e, onemlî ye û ez jî fêrî wan gotinan bûbûm. Piştî gotina Ethem, min zanî hevalekî girîng e. Di nava her kesî de ew diyar bû, diaxivî, yên din guhdarî dikirin. Birayê min destûra min dabû biçim cem wan rûnim. Bi tirkî diaxivîn, lê min guhdarî dikir. Dema bi min re diaxivîn bi kurdî digotin. Kesê yekê bû ku ji min re digot, tu di karê malê de pir diwestî, karê tu dikî pir zehmet e. Min jî digot, na ez nawestim. Ji ber vê bersiva min dikeniya, digot bi rastî jî tu dînê yî! Ez qet te ji bîr nakim!

Orhan bi baldarî guhdarî dikir:

-Ku tu wiha behsa hevalên destpêkê û Serokatiyê dikî, kêfa min pir tê. Ez dibînim jî lê bihîstina ji hina pir cuda ye.

Kêfa wê jî ji axaftinê re pir dihat:

-Ez biste bûm, tişta di dilê min de li ser zimanê min bû. Niha jî wisa me.

-Ango tu dibêjî hûn kêmayiyan bikin ezê ji Serokatiyê re bêjim.

-Erê wileh ezê bêjim. De ka rabe em biçin metbexê nanê xwe bixwin.

Tev de derbasî metbexê bûn; hem dixwarin, hem diaxivîn. Lê Dînê rê nedidayê:

-Ji ber ku ji min re gotibû dînê, pişt re doza lêborînê li min kir. Lê kêfa min jî û yên me jî ji wî navî re dihat.

Orhan li benda qedandina axaftina wê bû:

-Hevala Dînê, va min nanê xwe jî xwar. Riya min dûr e, divê ez biçim.

Dînê rabû ser xwe:

-Ez qurban, çavên te dikevin ser hev. Tu nû ji Qamişlo, nizanim ji Efrînê hatî û dibêjî ezê biçim!

-Karê me pir e. Tu hew binêrî ez sibê dîsa li vir im.

-Bi ya min be tu niha naçî.

Orhan xatirê xwe xwest, bilez derket. Piştî ku li seyareya xwe siwar bû, Dînê di balkonê de destê xwe jê re hejand.

Roja din serê sibê, Dînê bi dengê telefonê ji xew rabû. Wisa çavlixew berê xwe da salonê.

-Eloo, belê kerm bike, çii, qeza kiriye?

Dengê qîran pê ket. Hemser û zarokên wê li dorê kom bûn. Hemserê wê bi milê wê girt hejand:

-Çi bûye, çi qîreqîra te ye? Ew kî bû?

-Mûxaberat bû, dibêjin Orhan qeza kiriye. Reqema telefona me li cem dîtine. Ka telefona mala Serokatiyê bîne. Gelo dibe ku Serok jî pê re be?

Êdî nikariya li ser xwe bisekine, di cihê xwe de xumiha erdê.

Hemserê wê bilez li telefonê xist:

-Eloo, mamê min li mal e?

Telefon danî, her du destên xwe di rûyê xwe de anîn:

-Mala Xwedê ava, tiştek bi Serok nehatiye, lê mixabin hevalê Orhan şehîd bûye.

Dînê hinekî hat ser hişê xwe:

-Di telefonê de gotin wê cenazeyê wî bînin Helebê. Em zû dostan agahdar bikin.

Wê cenaze ji Helebê bibiran Tirbespiyê. Ji Lunban heta Şamê Kurd bi cenaze re hatibûn. Ji bo merasima cenaze bi hezaran mirov kom bûbûn. Te derzî biavêta nedikat erdê. Dengê lîliyên jinan bi ser Helebê diket. Gelek kes ji Helebê jî bi cenaze re ketin ser riya Tirbespiyê. Li Berkevirê bi merasimeke biheybet spartin axê. Orhan bûbû şehîdê sêyemîn yê Êzîdiyên herêma Tirbespiyê, piştî Nezîr û Sebîr dihate veşartin. Gelê Êzîdî êdî xwedî li şehîd û şoreşa xwe di merasîmê de derketibûn.

Hefteyek bi ser şehîdbûna Orhan re derbas bûbû. Sibê zû deriyê mala Dînê lê xist. Bilez rabû ber bi derî ve çû. Bi vekirina derî re Apo li pêşberî xwe dît. Bi merehebayê re xwe avêt stûyê wî û dest bi girî kir:

-Serokê min, min jê re got neçe, lê bi ya min nekir.

Rûyê wî jî pir ne xweş bûbû. Her ku Dînê diaxî dilê wî dikizirî:

-Diviya tu nehêlî biçe. Bêxew dikevin ser van riyên dirêj!

-Serokê min, guhdarî min nekir, got karê min heye.

-Te telefon dabûya min, min nedihişt ji vir derkeve.

Hem xemgîn bû, hem hêrs bûbû. Bê ku biaxive li eywanê çû hat:

-Em tevgereke mezin in û dozeke mezin li pêşiya me ye. Partiya me ya şehîdan e, lê divê em nehêlin li cihên wiha hevalên me şehîd bibin. Nakeve serê min, çima li xwe miqate nabin? Mirovên wisa durist ji bo me wendayiyên mezin in. Mirovekî welatparêz ji bo welat zaroyên xwe, mala xwe dihêle, diviya xwe biparêze!

Çavên wê li ser Apo req rawestiyabûn. Çawa ku emrek jê çûbe, hêrs û xemgîniyeke mezin di rûyê wê de xuya dikirin. Cara yekê bû ku Apo di rewşeke wisa de didît. Wî jî li nava çavên wê dinêrî:

-Emê îşev komek heval bişînin qadên şer. Soza min ji şehîdan re dayî xebat e, lê ez şehîdbûna bi vî awayî qebûl nakim. Divê her kes xwe baş biparêze...

***

Saet nehê sibê bû. Sîpan li meydana akademiyê sekinîbû li tevgera milîtanan temaşe dikir. Mereq dikir ka çawa perwerdeyê dibînin. Çavê xwe li bavê xwe gerand, lê li ber çavê wî neket. Di dilê xwe de got, ezê ji Serok bipirsim. Lê neçar bû pirsa xwe bihêle êvarê. Lewre perwerdeyê dest pê kirbû.

Danê êvarê piştî perwerdeyê amadekariya lîstika topê dihat kirin. Apo bi parêzvanan re berê xwe da qadê. Ji bo serkeftina taxima xwe

pir xwe diêşand. Lê ne taxima wî bi ser ket, ne ya din. Lê ev rewş ne bi dilê wî bû. Bi gotina “Hûn îro baş nelîstin, kesê dakeve meydanê divê xwe baş amade bike” taxima xwe rexne kir. Ji taxima xwe dûr ket, berê xwe da Sîpan:

-Tu çima nelîstî? Ji niha pêve tu di taxima min de yî, ji bîr neke! Divê tu pir sporê bikî da mezin û bihêz bibî.

Dizaniya ku ji bo dîtina bavê xwe hatiye:

-Te bavê xwe nedît?

-Na serokê min!

Berken bû, destê xwe danî ser milê wî:

Li gorî planê diviya bavê te li vir be, lê wisa xuya dike ku di rê de pirsgirêk derketine. Wê di demeke nêzîk de were. Wê demê tu dikarî werî bibînî.

Sîpan xemgîn bûbû. Heta çend kêliyan ma bêdeng. Piştre serê xwe bilind kir:

-Serokê min, ez dixwazim li vir bimînim.

-Baş e, li vir bimîne. Jixwe niha betlaneya dibistananê ye. Lê piştî betlaneyê divê tu biçî dibistana xwe. Pêwîstiya me bi mirovên xwenda û zana heye.

-Temam serokê min.

Careke din destê xwe danî ser milê wî û ji wir dûr ket. Ji bo guhdarîkirina nûçeyên BBC radyoya xwe ji berîka xwe derxist. Spîker nûçeya şerê di navbera gerîla û artêşa Tirk de dida: “Li gundewarên navçeya Silopya milîtanên PKKê bi ser tabûrê de girtin. Li Qilaba jî bi ser navçeyê de girtine û pênc saetan bajar di destê wan de maye. Li Îzmîrê itirafçiyekî bi navê Mehmet Girgin, li Stenbolê jî Îbrahîm Güngör hatin kuştin. Li girtîgehan jî greva birçîbûnê dest pê kiriye. Niha jî emê nûçeyên rojnameyan pêşkêş bikin. Nivîskar Semra Sumersan di sernivîsa xwe de dibêje, gelê Tirk û neteweya Tirk di binê xetera paşrojê de ye." Radyo girt, kir berîka

xwe. Li ser nûçeyên guhdarî kirî hizirî. Gazî çend milîtanan kir, ber bi derî ve çûn. Ji wir jî berê xwe dan serê girê li hember.

***

Serê sibê bû, milîtanan tevan ji bo pîrozbayiyê xwe amade kiribû. Kî rasta kê dihat pîroz dikir. Dibistan bi rengê kesk, sor û zer hatibû xemilandin. Wêneyên şehîdên destpêkê, bi dîwarê pişt mase ve hatibûn daleqandin. Destegulek li ser mase bû, li tenişta wê jî şûşeya avê hatibû danîn. Li ser cawekî sor, 27'ê Mijdarê pîroz be hatibû nivîsîn.

Apo li odeya xwe bû, ji xwe re got, me 13 sal li pey xwe hiştin. Ji bo civîna pîrozbayiyê amadekariya xwe dikir. Bayekî sar yê payîzê li derdorê dixist. Cemedaniyeke sor û spî li stûyê xwe pêça. Bi dengekî bilind gazî erkdarê rojê kir. Şervîn bilez ket hundir:

-Her tiş amade ye?

-Belê serokê min.

Bi rûyekî pir cidî lê ewqas jî bicoş li nava çavên wê nêrî:

-Di dîroka me de ev rojên girîng in. Divê ti kes li derve nemîne.

-Serokê min, me ji hevalan re gotiye.

Ji odeya xwe derket berê xwe da dibistanê. Saet heştê sibê bû. Bi ketina hundir re her kes rabû ser piyan. Her kes bi kelecan bû, çavên wan li liv û tevgera wî bûn. Li pişta mase diçû dihat û çavên wî li ser hev bûn. Kongreya yekê anî bîra xwe. Destê xwe danî ser stêra sor ya ala PKKê ya li ser zemînê zer û bi xelekeke kesk hatî dorpêçkirin. Pirsgirêkên Kurdistanê û Rojhilata Navî û çareseriyên wan di hişê wî de weke lodekê kom bûbûn. Milîtan careke din di ber çavên xwe re derbas kirin. Destê xwe ji ser alê rakir, bi kelecaneke mezin dest bi axaftinê kir:

-Roja 27'ê Mijdarê li gelê me yê hemdem pîroz be. Di van sêzdeh

salan de geşedanên pir girîng çûbûn. Çalakiya PKK'ê li her derê belav bûye û dewam dike. Gelê Kurd nû radibe ser piyan. Li hemberî siyaseta nijadkuj û tinekirinê, me bawer nedikir em bigihin van rojan.

Piştî axaftineke dirêj, bi gotina “Ev cîhan bê Sosyalîzm nabe û jiyan jî bê wê nabe. Bijî PKK û salvegera 13. ya avabûnê, bijî enternasyonalîzm”, axaftina xwe qedand. Dengê çepik û durişman bilind bû.

Piştî civînê li qadê pîrozbayiyê bi stirana “Îro çerxa şoreşê fireh digerîna” dest pê kir.

Heta nîvro şahiyê dewam kir, piştî nîvro dîsa ders hebû. Sîpan li qada akademiyê digeriya. Bi mayîna xwe ya li wir pir kêfxweş bûbû. Dar, ber, xwezayê her tişta li akademiyê bala wî dikişand. Azad bû, li her dera wê digeriya. Çavê wî li Apo ket. Ew jî ber ve çû û bi rûyekî geş berê xwe dayê:

-Tu dixwazî tiştekî bêjî?

-Belê serokê min, ez dixwazim tevlî perwerdeyê bibim.

-Tu dixwazî were, lê perwerde ji bo kadroyan e.

Apo ket hundir, Sîpan jî çû li rêza dawiyê rûnişt. Sê saet derbas bûn, hê li ser piyan diaxiviya. Çavên Sîpan çûbûn ser hev. Xwe nêzîk kir:

-Rabe here raze, hê wextê te nehatiye. Ev ders ji bo te giran in.

Bê ku tiştekî bêje bilez derket derve, milemila wî bû: “Serokatî çawa dikare bi saetan li ser hev biaxive.” Bi wan hizran ket hundirê qawîşê. Destek cilûbergên leşkerî li ser cihê xwe dît. Ji bo ku her kes bi wan cilan ve bibîne, bilez li xwe kirin, derket qada akademiyê. Apo jî ji dersê derketibû. Hem bi yên li derdora xwe re diaxiviye, hem dimeşiya. Çav bi leşkerê piçûk ket. Erê bejna wî kurt bû, lê cil lê hatibûn. Geh li xwe dinêriya, geh li derdora xwe. Biken çû cem:

-Cil pir li te hatine, lê divê tu xwe nîşan bidî. Berpirsiyariya van

cilan giran e!

Sîpan ne li benda wê gotinê bû, lê di hişê xwe de fikirîbû ku wê bi çavê leşkerekî lê binêre. Careke din lê temaşe kir:

-Niha dema we ya zarokatiyê ye, dema hûn mezin bûn emê bi hev re biçin welat!

-Serokê min emê kengê biçin?

-Hinekî din jî mezin bibe emê biçin. Emê bi komên mezin re biçin.

-Temam serokê min, ez ji niha ve amade me.

Piştî meşê derbasî cihê xwarinê bûn. Xwarin tirşika fasûlyeyan û birinc bû. Li hemberî Rûken rûniştibû:

-Divê tu xwe kêmî hevalên xwe nebînî û xwe pêş bixî. Ji bo pêşketina kadroyên jin ev der cihekî guncaw e û xwedî wateyeke dîrokî ye. Divê her kes van derfetan binirxîne û hevalên jin bi hêzeke mezin ji vir derkevin. Di nava civakê de we pir diçewisînin?

-Rast e serokê min. Heta niha min derfeteke wiha nedîtibû. Li malê nedihiştin em tevlî her karî bibin. Ezê hewl bidim çalaktir tevlî bibim.

-Hewldan têrê nake, divê tevlîbûneke bihêz çêbe. Me hûn ji malbatê, zilamê feodal û desthilatdariya li ser jinê dûr xistine. Êdî dem dema we ye.

-Raste serokê min, ezê vê carê bi hêzeke mezin tevlî bibim.

Piştî xwarinê careke din xwe berda qadê. Li ser kursiyekî rûnişt. Hem rojname dixwend, hem guhdarî nûçeyên radyoyê dikir. Tîrêjên rojê germayiya xwe berdabûn ser qadê.

Çavên nobedarên li jorê weke radarê li derdor digeriyan. Sîpan bi kêfeke mezin av li wan belav dikir. Li ber lingê wî marekî gewrik dûvê xwe kiribû kofendîl, serê xwe jî bostekê bilind kiribû. Ji bo nêçîrê xwe amade kiribû. Hê piyê wî li hewa mar xwe zer kirê. Şerbikê avê li milekî ket, ew li milê din. Hawarhawara wî bi ser

akademiyê ketibû. Bi qîrinê re Apo li pêşberî xwe dît. Berî nobedaran xwe gihandibûyê û ferman da ku demildest bibin nexweşxaneyê.

Piştî sê saetan seyareya çûyî nexweşxaneyê ket qadê, Sîpan jê hat xwarê. Dît ku kîsek di destê Apo de ye bilez ber ve tê. Bi destê wî girt, biken li rûyê wî yê zer bûyî temaşe kir:

-Niha te xwe nîşan da ku tu şoreşgerekî ji Partiya Karkerê Kurdistanê yî!

Kîsê di destê xwe de dayê.

-Ev cilûbergên leşkerî ji bo te ne.

Dema mar pê ve dayî şalê wî birîbûn.

-Spas serokê min.

-Niha istirahet bike, emê hev bibînin. Li nava van latan jî zêde negere!

Sîpan û Ciwan berê xwe dan qawîşê. Her ku diçû Sîpan Apo baştir nas dikir. Berê xwe da Ciwan:

-Dema ez çûyîm Serok li qadê bû, em hatin hê li qadê li benda me bû.

Ciwan destê xwe danî ser milê wî:

-Serok bi her kesî re mijûl dibe, hevalê Sîpan. Dema ez jî weke te piçûk, Serok ji min re got, tu çi dixwazî, min got ez Kurdistanê dixwazim.

-Çawa bersiva te da?

-Keniya, got çima tu ji min Kurdistanê dixwazî, biçe ji bavê xwe bixwaze. Bavê min jî di nava xebatê de bû, lê min her tişt ji Serok dixwest. Em gihîştin qawîşê, li ser piyên xwe negere!

-Temam heval. Lê dema topê min bibe qadê.

***

Çiyayên Bîqayê ji mij û moranê tarî bûbûn. Her ku baran dibariya, avê xwe ji avrêjan berdide û di Geliyê Bîqayê de digihîştin hev. Gelî zivistanan bi pirbûn û dijwariya şapeyên xwe ne kêmê Geliyê Cehenemê bû. Yê bi bedewî, kûrbûn, deverên xewle û efsaneyên olî dagirtî. Yên ev nav lê kirîn, rast lê kiribûn, bi rastî jî zivistanan ji ber dijwariya xwe rengê cehenemê dida. Weke din bi çîroka kuştina Yezîdê kurê Mûawiye jî, ku dema diçe nêçîrê bi destê parêzvanê gelî tê kuştin, tê naskirin. Piştî kuştina Ehlil Beyt ev çîrok belav bûye.

Baranê çemê El-Îtanî, yê li dora Berliyasê dorpêç kiribû. Wê rojê çem pir bitirs bû. Pêlên wê li Geliyê Bîqayê dixistin. Gelî bi qasî germa xwe ya havînê, bi sir û seqema xwe ya zivistanê jî binavûdeng bû. Li serê bilindiyên çiyayên wê ba û bahozê xwe kiribûn yek. Ji berbangê ve baranê lez dabû xwe. Derdora akademiyê bûbû çeqan û bayekî kur li girên derdor dixist. Milîtan bi bez ji qawîşên xwe derdiketin diçûn dibistanê. Şilî û firtûne ne li xema wan bûn, ew jî zarokên welatekî asê û çiyayî bûn. Bernameya rojê weke xwe dewam dikir.

Du beroşên nîskê li ser agirê daran dikeliyan. Ji ber ku ter bûn, darên wir zû pê nediketin. Lê piştî ku agir bi wan diket jî, weke benzînê pê ve diçû û qiçeqiç ji wan dihat. Lê tevgera herî zehmet ya şevê bû. Pir dibû tarî û ji ber dengê fîzefîza bayê, ti kesî nizaniya ka yê din çi dibêje. Mirov digot qey guh ker bûne. Çawa ku cûzan li rûyê mirov bikeve, sira wê jî ewqas dijwar û tûj bû.

Dîsa reş ketibû erdê û baran pir dihat. Apo parkeyekî leşkerî li xwe kiribû, cemedaniya xwe jî li dora serê xwe pêçabû. Ji odeya xwe ber bi qawîşên milîtanan ve diçû. Ji bo parastinê li pesarên giran di nava latan de, ji dar û pejingan hatibûn çêkirin. Ji wan re digotin kulik. Hin jê çadir bûn, lê ew jî bi çilo hatibûn nixumandin. Wê zivistanê naylonên li ser wan qetiyabûn, careke din danîbûn ser. Di nava wê baran û bagerê de, xeyalên xwe dibirin çiyayên Kurdistanê,

dijwariya zivistanê dianî ber çavên xwe. Hêlma wî ya germ li simbêlên wî yên bor dida. Bilez ket qawîşekê. Di hundir de deh-diwazdeh milîtan li ser betaniyan rûniştibûn. Bi ketina hundir re, dido ketin ber çavên wî; yek lênûs di dest de bû dinivîsî, yê din cilên xwe yên qetiyayî didirûtin. Sê-çar kesan bi hev re suhbet dikir, sisiyan jî bi hev re li kovarekê dinêrî. Yek jî li ber çaydana çayê bû, bi dengekî nizim ji xwe re stiran digotin. Çavê wî bi reşê li ber derî ket. Hinekî din temaşe kir û bê xwesteka wî dengê wî bilind bû:

-Hevalno, Serokatî hat!

Yên din jî ketibûn kelecaneke mezin, ne li benda hatina wî bûn.

Bi dengekî xweş silav da wan. Li pişt derî parkeyê xwe ji baranê daweşand, derbasî hundir bû. Li ber sobeyê çarmêrgî rûnişt. Hemû li derdorê kom bûn. Li ber ronahiya lembeyê yek bi yek di ber çavên xwe re derbas kirin:

-Rewşa we çawa ye? Van rojan emê saleke din li pey xwe bihêlin. Ji bo vê sala borî nêrînên we çi ne? Çawa ku hûn dibînin tiştek nemaye Tirkan nekirî. Lê hevalên me jî berxwedanke bêhempa dikin. Zivistaneke zor li pêşiya me ye. Em îro li ser çi biaxivin?

Her kesî bi rêzdarî û baldariyeke mezin guhdarî dikir.

-Pêwîstiya gelê me bi Kongreya Neteweyî heye. Ji bo me ev bivênevê ye. Bi navê mecilisê, desteya bilind jî dibe. Jixwe yek ji hedefên me yên sala nû, avakirina meclisa neteweyî ye. Cihekî ku gelê me îradeya xwe lê diyar bike, pêwîst e. Ew gelê hatî lanetkirin û kolekirin, êdî xwe nas dike û niha pêşengiya mirovayiyê dike. Sala li pêşiya me wê bibe sala şkestina şerê taybet.

Geh suhbeta siyasî dikir, geh ya civakî, geh ji bo pêvajoya bê nîrînên wan digirtin. Berê xwe da milîtanê li ber çeydanê:

-Êê, çay li ser agir ma, ma tu çayekê nadî me?

Tevan li aliyê çaydan nêrî. Yek bilez rabû qedeh dagirtin anîn. Li derve her ku diçû baran pirtir dihat. Ji ber hatina wî û rûniştina di

nava wan de, rûyên milîtanan geş bûbûn. Xeyalên wan tev li ser kêliya tê de bûn.

Derngê şevê ji cem wan rabû. Sobeya odeya wî pêketî bû, mazot girt, xwe kir binê betaniyê.  Serê sibê cilên xwe yên germ li xwe kirin, berê xwe da qadê. Piştî taştê, ew û Cesûr li qadê meşiyan. Agahiyên ji qadên çiya hatîn Cesûr jê re ragihandin. Serê xwe hejand û çend kêliyan wisa bêdeng sekinî:

-Baş e, hûn dersê bidin, ezê jî bi koma biçe re biaxivim.

Cesûr berê xwe da dibistanê, cihê kom lê ew jî ber bi wir ve çû.

Dewreyeke din ya perwerdeyê qediyabû. Digel ku di sermayê de ji ber nexweşiya sînozîtê bêhna wî teng dibû, yên biçin xebata siyasî, kom bi kom bi wan re diaxivî. Li odeya rêveberiyê Sîpan û çend kesên din rûniştibûn. Ket hundir li ser kursiyê li hemberî wan rûnişt. Hinekî li wan nêrî:

-Demeke dirêj e hûn li vir in. We perwerde dît û ezmûnek ji we re çêbû. Em dixwazin hûn biçin qada xebatê. Wê Sîpan jî biçe dibistana xwe.

Berê xwe vegerand ser:

-Divê tu bixwînî, dema bû betlane tu dikarî dîsa werî vir. Ezê wê demê ji bo te li cem xwe cihekî çêkim! Tu li vir fêrî çi bûyî?

Rabû ser xwe bi awayekî leşkerî sekinî. Hinekî li banî nêrî, çend tiştên fêr bûyî anîn bîra xwe:

-Ez fêr bûm ku Serok, hem hevalan fêr dike, hem ji wan fêr dibe. Apo berken bû:

-Wê demê tu fêrî gelek tiştan bûyî. Baweriya me bi ciwanên weke te heye ku paşroja gelê Kurd ronî bikin. Tu dikarî çi karî bikî?

-Min zarok fêrî zimanê kurdî dikirin. Niha jî dikarim ji wan re behsa jiyana Serokatiyê bikim.

Kêfa wî ji wê bersivê re hatibû, bi baldarî lê temaşe dikir:

-Haa, tuyê wan birêxistin bikî? Ev karekî pir baş e. Ciwanên mîna

xwe birêxistin bike! Bixwîne, da tu zana bibî û cîhanê binasî.

***

Çiyayên li derdora akademiyê ji berfê spî bûbûn. Berfê bi spîbûna xwe re bêdengî jî anîbû. Çivîkek jî nedifirî. Nobedarên li dora dibistanê ti tevger ji ber çavên wan nediçûn. Li aliyekî jî çaydanên çayê dikeliyan. Germa agirê metbexê berfa li ser banê wê helandibû. Ji serê sibê ve Apo li dibistanê bû. Piştî axaftina bi milîtanan re çû odeya bêsîmê. Bi qadên welêt re diaxivî. Piştî axaftinê rabû ser xwe berê xwe da odeya rêveberiyê. Lênûs û pênûs di destê Cesûr de bûn dinivîsî. Bi dîtina wî re rabû ser xwe. Li ser kursiyê li pişt mase rûnişt. Hinekî bêdeng sekinî. Cesûr dizanî tiştek heye. Lê wisa difikirî ku li welat tiştek qewimiye. Çend mûyên spî yên li pora wî zêde bûyîn, ketin ber çavên wî. Dîsa rabû çû li ber pencereyê li derve nêrî:

-Êrîşên dewleta Tirk yên siyasî yên li ser akademiyê pir dibin.

Piştî wê hevokê bêdeng bû, di hundirê xwe de kûr kûr hizirî. Pişta xwe da pencereyê:

-Pêwîstî bi cihekî din yê perwerdeyê heye.

Cesûr fêm kir ku êdî xetera li ser wê qadê teqez e. Lê nizanî çi bêje.

-Divê hûn ji pêvajoya nû re amade bin.

Qederekî ji bo pêvajoya nû axivî. Pişt re bi hev re derketin. Wî berê xwe da odeya xwe, Cesûr li nîvê qadê çû hat. Gotinên Apo yên weke bombebaranê li hişê wî bariyayîn, xistibûn nava fikarên kûr. Hizrek li ser hizrekî diket bîra ramanên wî. Ji gotina “Divê hûn ji pêvajoya nû re amade bin”, fêm kiribû ku pêvajoyê dest pê kiriye jî. Ber bi dîwarê dibistanê ve meşiya. Destê xwe danî ser wêneyê Egîd. Di dilê xwe de got, ev der cihê hevalên me yên destpêkê ye, cihê

serleşkerê me ye.

Apo li odeya xwe rûniştibû, li ser rewşa heyî difikirî; li aliyekî ragihandina Hukumeta Şer ya Botan-Behdînan û pêvajoya li Kurdistanê, li aliyê din geşedanên li Rojhilata Navî weke moriyan di serê wî de diçûn dihatin. Di nava hizirîna wan pirsgirêkan de derket ber derî. Berê xwe da xal û xetên berfê yên li ser dar û berên derdorê. Lê weke zûriya di binê ziman de, pirsgirêkan belaya xwe jê venedikir. Çawa ku cihê çareserkirina pirsgirêkan ode be, careke din berê xwe da hundir. Li ber pencereyê sekinî, çavên xwe danîn ser hev. Diviya pirsgirêkên di serê wî de bûyîn gêrêk, ji nava hev derîne. Çareseriya wan di serê xwe de dihonand û dîmenên çareseriyê dianîn ber çavên xwe. Di nava aramiya çareseriyê de, dengê lêxistina derî hat:

-Kerm bike heval, were hundir!

Selman hêdîka derbasî hundir bû:

-Tu bi xêr hatî. Çi heye, we çi kir?

-Serokê min, ji qadan gelek rapor hatine. Hevalên ji Ewropa hatîn jî dixwazin we bibînin.

-Bila bên vir. Weke din çi heye?

-Serokê min, li ser pêngava nû gel pirsan dike. Weke din dipirsin ka wê partiyên Başûrê Kurdistanê bi Tirkan re hevkariyê bikin yan na. Dibêjin em naxwazin birakujî çêbe.

Hê rengê hizirîna li ser pirsgirêkan ji ser rûyê wî neçûbû:

-Çawa ku tê dîtin rewş ne wisa ye. Ji gel re eşkere bêjin; em jî vî şerî naxwazin û ne birakujî ye. Bi awayekî fermî bi dijminê me re hevkariyê dikin. Ji gel re vê rastiyê bêjin. Wê ev şer kûrtir bibe. Pêngava nû wê li Iraqê dest pê bike. Partiyên Başûr û dewleta Tirk bi hev re planên xirab çêkirine.

Destên xwe bi şûn ve danîn ser hev. Geh dimeşiya, geh disekinî. Dema diaxivî disekinî:

-Qeyrana li Tirkiyê bi derbên gerîla kûrtir bûye. Bangên çareseriyê bilind dibin. Salek di ser şerê Kendavê re derbas nebûye û li ser Rojhilata Navî ewrên têkoşînê kom dibin. Emerîka bi egera pirsgirêka Iraqê, leşkerên xwe şandine herêmê. Bi Tirkiyê re jî stratejiya parastinê dirêj dike û pêvajoya hilbijartinan, li Kurdistanê qadeke nû tîne pêşberî me...

Piştî ku sekinî, Selman raporên li cem xwe raber kirin û ji hundir derket. Piştî derketina wî destpêkê rapora konferansa zindanê vekir. “Şoreş pêkanîna hunerê herî baş û xweşik e û tevgera xweavakirina ji nû ve ye. Konferansa zindanê bi ruhê çardehê Tirmehê pêk hatiye." Li ser van hevokan kûr kûr hizirî. Gavên pêwîst e bên avêtin di serê xwe de baş honandin û xal bi xal li ser rûpela spî rêz kirin...

***

Roja qedandina dewreya Şehîd Ehmed Gûler bû. Apo bilez ket dibistanê. Kelecana dawiya dewreyê li ser rûyê wî baş xuya dikir. Piştî silavê dest bi axafinê kir:

-Em sala 1991ê li pey xwe dihêlin û di pêvjoyeke hesas re derbas dibin. Siyaseta dijmin iflas dike. Em bibiryar in û di demeke pir bihêz de ne. Sala li pêşiya me wê bibe sala pêşxistina şerê gerîla.

Van çend hevokan kelecaneke mezin di nava milîtanan de afirand. Lê dixwest erka wan jî bîne bîra wan:

-Ji bîr nekin, fermandarên esîl, ew in ku di dîrokê de navê xwe hiştine, xwe pêş xistine û heta dawiyê bi dozê ve girêdayî mane.

Di nava milîtanan de yên fermandarî kirin, fermandarên dîrokî yên cîhanê anîn bîra xwe.

-Wezîfe li kû dibe bila bibe, bê ku em bêjin ev piçûk e, ev mezin e, astengî ji kû û çawa werin bila werin, ku hûn bêjin, serkeftina teqez soza min e û bi ser de biçin, hûnê bikarin bi ser bikevin.

Piştî axaftineke dirêj merasima dayîna dîplomeyan dest pê kir. Yek bi yek dîplome didan wan. Her kes ketibû nava kelecana dereceya xwe; ka wê dereceya baş bigire, yan ya îdare. Dereceya pir baş ya şedîdan bû.

Çawa ku rojê lez dabe xwe, dem wisa zû derbas dibû. Çawa ku ji nava qeşayê derkeve, sireke wisa dijwar li bilindiyên Bîqayê û derdora wê dida. Li asîmanê wê ref bi ref balinde difiriyan. Carna jê çawa ku xwe noqî deryayê bikin xwe berdidan binê gelî. Hêlmeke germ ji ser banê dibistanê bilind dibû û di nava mija bi ser erdê ketî de wenda dibû. Digel vê sermaya dijwar, dilên milîtanan germ bûn. Li ser rûyên wan hêviyên paşrojê geş bûbûn û çirîskên awirên wan diteyisîn. Li ser agirê darên bistirî, birebira qoçxaneyan bû. Biqbiqok bi ser fasûlyeyan ketibûn. Ji ber dûyê agir çavên xwarinpêjan tijî rondik û rûyên wan sor bûbûn. Çirîskên agir naylona li ser cihê xwarinê kunkunî kiribûn û di wan kunan de jî dilop dihatin xwarê. Lê ya herî zehmet şkandina daran bû. Darin çir û pir hişk bûn. Ji ber teniya qoçxaneyan rûyên her du xwarinpêjan reş bûbûn. Tiliyên destên wan jî ji serma req bûbûn.

Apo li odeya xwe pirtûka “Şer û Aaştî” dixwend. Pel li ser pelan diqulibandin. Wê rojê gumlekekî keskê zeytûnî yê rîs û pantolonekî qehweyiyê li xwe kiribûn. Di piyên wî de jî cotek goreyên şînê tarî bûn. Li ser mase her tim desmalên kaxiz û şûşeya avê hebûn. Li dora odeyê nêzîkî du bostan berf stûr bûbû. Çawa ku gule derbas bibin, dengê vizêniya bayê bakur ji pencereyê dihat. Wî dengê ne xweş nedihişt li ser xwendinê kûr bibe. Rabû ser xwe di pencereyê re li mija weke şaşikan xwe li dora girê li hember pêçayî temaşe kir. Bayekî sar li rûyê wî xist. Li saeta xwe nêrî. Di dilê xwe de got, dema dersê hatiye. Cam girt, pirtûka di destê xwe de danî ser mase. Derket derve û bilez berê xwe da dibistanê. Parêzvanan bi kotekî xwe digihandê. Di deriyê dawî re ket hundir. Piştî silav û dembaşê.

Li pişta mase hinekî sekinî. Geh li maseyê li pêşiya xwe dinêrî, geh li nava dibistanê. Her du destên xwe bi şûn ve danîn ser hev. Di nava kefa destê xwe de tizbiyên kehrîbar yên sorê tarî dibir dianîn. Tizbî li tiliya xwe ya beranekê alandin. Mijarên ku bêje tev di hişê xwe de nexş kiribûn. Berê xwe da milîtanan:

-Weke hûn jî dibînin, êrîşên dijmin bi serhildanên gel û têkoşîna gerîla pûç dibin! Axaftina serok hindik e.

Mijarên di rojevê de yek bi yek nirxandin.

Riyên ji akademiyê diçûn tev ji berfê hatibûn girtin. Ji ber wê mazot nemabû û dar jî bitedbîr dişewitandin. Nava dibistanê sar bû, lê digel wê perwerdeyê dewam dikir. Saetek bû ders dihat dayîn, milîtanek hêdîka rabû çend dar xistin sobeyê. Li akademiyê her tişt dibû, lê sekinandina perwerdeyê nedibû. Qiyamet jî rabûya diviya her roj saet heft û nîvê perwerde dest pê bike. Apo jî deqîqeyekê ji dema perwerdeyê nedima. Perwerde danê sibê teorî, danê êvarê leşkerî bû. Êvaran jî li qawîşan nirxandinên rojê dihatin kirin. Bi şev jî her kesî saetekê nobet digirt.

Ji bilî nobedaran herkes nivistibû. Li ber ranzeyê mezlum milîtanek sekinîbû gazî dikirê:

-Heval, tu nobedar î.

Rabû ser xwe, wisa çavlixew li saeta xwe nêrî:

-Heval, saet diwazdeh û nîv e! Ez di xew de mame?

-Na heval, tu di xew de nemayî. Lê ji ber ku qawîş ji hev dûr in û min cihê te jî nas nedikir. nîvê nobetê derbas bû.

Mezlum bilez xwe şidand, berê xwe da derî:

-Hindik maye nîvê din jî derbas bibe.

## BEŞA DUYEMÎN

Ji bo roportajan çar rojnamevanên biyanî li akademiyê bûn. Saet didoyê piştî nîvro bû. Kamerayên xwe bi cih kiribûn li benda hatina Apo bûn. Ew jî ber bi wan ve dimeşiya. Çavên her kesî li ser tevgerên wî bûn. Soleke sporê wergirtibû, qazaxeke leşkerî û pantolonekî qehweyî li ber bûn. Gumlekê di binê qazax de jî xakî bû. Bilez dimeşiya. Piştî silavê, her du destên xwe xistin teniştên xwe, li pêşberî wan rawestiya. Cilûberên wî yên normal bala wan dikişandin. Xuya bû ku li benda dîmenekî din bûn. Bi tevgerên wî yên xwezayî ew jî rehet bûbûn. Piştî axaftineke kurt rojnamevanan dest bi pirsan kir:

-Hûn nahizirin ku Tirk ji bo derxistina we zorê li vir bike?

Bê ku bihizire, yekser bersiv da:

-Ji roja me dest pê kirî ve me xwe spartiye hêza gelê xwe. Li hemberî dewleta Tirk em îro şerê hebûn û azadiyê dikin. Çawa me karî li vir derfetan biafirînin, emê bikarin li her derê biafirînin.

Rojnamevanan mijar guhert:

-Çima ji te re dibêjin Serok Apo?

Biken li milîtanên li akademiyê temaşe kir, pişt re berê xwe da rojnamevan:

-Ez jî nizanim gotina “Serok Apo” ji kû derket. Kurd zûbizû serokan qebûl nakin. Lê wisa xuya dike ku ez pir hilteqilandime, pîvame û di ber çavên xwe re derbas kirime. Piştî ku dîtine ez bi kêrî karê wan têm, gotine “Serok Apo”. Weke din ez nabêjim ji min re wiha, yan wiha bêjin. Ya herî rast dibêjin “Serokatiya Partiyê”, navê saziya rêbertiyê li min dikin.

Rojnemevan jî keniya:

-Xwezî tu serokê me bûyayî.

Berken bû, lê bersiv neda.

Selman ji aliyê deriyê akademiyê ve bilez û pora wî tevlîhev ber bi mase ve hat. Dixwest mecalê bibîne tiştekî jê re bêje. Rûyê wî weke simaqê tirş bûbû. Hinekî din xwe nêzîk kir. Apo ferq ki ku dixwaze tiştekî bêje:

-Tiştek heye?

-Serokê min, du rojnemevanên Tirk ji rojnameya "Huriyet"ê hatine. Me birin Berliyasê. Li benda me ne ka emê çi bêjin wan.

-Dibe, bila bên. Sibê wan bîne vir.

Berî ku li seyareyê siwar bibe, Zekî xwe gihandiyê:

-Hevalê Selman, dema tiştek hebe ji me re jî bêje, em jî di rêveberiyê de ne. Serokatî bi îdeolojiyê ve mijûl e, emê jî karê pratîk bikin.

Bi rûyekî ne xweş bersiva wî da:

-Ez ji we re jî dibêjim, lê bi taybetî dixwestin Serokatiyê bibînin!

-Baş e, tu dikarî biçî.

Gotina Zekî di dilê wî de neçûbû xwarê, lê bê ku bersivê bide li seyareya xwe siwar bû ket ser riya Berliyasê.

Piştî ku gihat bajêr yekser çû cem rojnamevanan. Yek jin, yek mêr bû. Xwestin wan li nava bajêr bigerîne. Ket pêşiya wan derketin. Ji ber ku wî jî bi tirkî dizaniya, bi dilê wan bû. Rojnamevana jin dest bi pirsan kir:

-Apo timî li akademiyê dimîne?

Selman ne mirovekî xeşîm bû ku bersiva her pirsa wan bide:

-Ew ne karê me ye ku em cihê Serok bizanin.

Rojnamevanê din bê ku biaxive bi rûyekî ne xweş lê dinêriya. Rojnamevana jin xwe û hevalê xwe dan naskirin:

-Navê min Nûran, yê havalê min jî Cîhan e. Ez bawer dikim navê te jî Selman e.

Roja din berêvarê her du rojnamevan gihandin akademiyê. Bi daketina ji seyareyê re dest bi kişandina wêneyan kirin. Çavên rojnamevana jin bi wêneyê Egîd yê li ser dîwarê dibistanê ket. Bi baldarî lê temaşe kir, lê rûyê wê ne xweş bû. Li nava qadê komek milîtan li dora Apo kom bûbûn. Ku dît mêvan tên, ji bo pêşwaziyê çend gavan ber bi wan ve çû. Rojnemevanan bi baldarî lê dinêriya. Piştî bixêrhatin û kêfxweşiyê hem rojnamevanan, hem kameravanên akademiyê dest bi kişandina wêne û dîmenan kirin. Pişt re ji bo roportajê derbasî cihê mêvanan bûn…

***

Li dibistanê Apo li ser piyan bi Şervîn, Rûken û Mezlum re diaxivî:

-Şervîn, tu herêma Cizîrê baş nas dikî? Tu û Rûkenê biçin wir! Hem dostan bibînin, hem civînan çêkin!

Berê xwe vegerand ser Mezlum:

-Tu jî biçe Efrînê hevalan bibîne! Rewşa gel bişopînin û bizanin ka xebat çawa diçe. Silavên me li gel û dostên me bikin!

Hinekî çû hat dîsa berê xwe da Şervînê:

-Piştî vê pêvajoya serhildanê rewşê bi gel bidin fêmkirin. Piştî demekê tu vegere, lê bila Rûken heta demekê li wir xebatê bike. Cizîr cihê siyasetê ye, kesê bixwaze kesayeta xwe xurt bike, divê Cizîrê baş nas bike û li ser piyên xwe bisekine.

Berê xwe ji Şervînê vegerand ser Mezlum:

-Efrîn cihekî xweş e, gelê wê jî bi me ve girêdayî ye.

***

Mezlum û Qadir ji Efrînê ber bi Bilbilê ve diçûn. Mezlum bi baldarî li xwezayê temaşe dikir:

-Hevalê Qadir, vir buhişt e, çiqas çiyayên bilind û xweş li van deran hene!

-Hevalê Mezlum, vir hem çiya, hem deşt e. Çiyayê Kurmênc û Çemê Reş jî li jêra wê ne. Ezê rojekê te bibim Çiyayê Kurmênc. Tuyê li wir gelî û darên zeytûnan baştir bibînî. Tu çi rengê dar û kulîlkan bixwazî li wir hene.

Mezlum hê li derdor dinêriya:

-Dema em ji Helebê dihatin çiyayekî bilind xuya dikir.

-Haa, tu behsa Çiyayê Lêlon dikî. Ma ew çi ye, hê sûlavên Meydanka hene, kaniya Basotê, Îndarê hene. Te navenda Efrînê dît? Cindirês, Mabeta, Reco, Şeran û Bilbilê. Eger dema me çêbe em biçin tevan bibînin.

-Tu dikarî ji min re hinekî behsa Rojava bikî?

-Destpêkê vê bêjim; mirov nikare Rojava ji Bakur qut bike. Heta şerê cîhanê yê yekê jî ti sînor di navbera wan de tinebûn. Li Peymana sala 1921'an li Broksalê ji hev cuda bûn, berî wê her du jî Kurdistan bûn. Eger em ber bi dîrokê ve biçin, ji Dêrikê heta Efrînê, ji wir heta Helebê û Reqa jî di navê de, ev herêm cihê danûstandina çanda Aryenî û Semîtîk bû. Her du çand jî tê de hebûn.

-Tu dixwazî em ji Efrînê dest pê bikin.

-Efrîn, ango Avarîn, yan jî Avrîn. Li hin deveran bi navê Çiyayê Kurmênc tê naskirin. Berê Tirkan jê re digot Kûrddax, Ereban jî digot Cebel El Ekrad, ango çiyayê Kurdan. Navê niha jî bi fermî Efrîn e. Avrîn peyveke Kurdî ye, tê wateya cihê biav. Erfîn hem navê bajar e, hem yê heremê ye. Cihê Horiyan e, çawa ku tê zanîn Horî pêşiyên Kurdan in. Hem çanda Horiyan, hem ya Mîtaniyan lê heye. Cihê çandinî û bereketê ye. Cihekî çiyayî û pir xweş e. Bilindayiya çiyayên wê di navbera 700/m û 1269/m de ye. Çiyayê herî bilind çiyayê Hawar e. Jixwe zeytûnên wê binavûdeng in. Behsa sabûna Helebû dikin, ji zeytûnûn Efrînê çêdibe. Ew Islahiye heman herêm

in.

-Cihê rêveberiya wê berê kû bû?

-Di dema Osmaniyan de navenda rêveberiya wê herêmê tevê Kilîs bû.

***

Şervîn û Rûken, piştî rêwîtiya ji Şamê ya dozdeh saetan, li termînala Hesekê li ber sir û seqema zivistanê li ser kursiyên hesinî rûniştibûn. Gumlekekî spî, pantolonekî reş û parkeyek li Şervînê bûn, Rûkenê jî pantolonekî reş, gumlekekî şînê tarî û parkeyekî risasî li xwe kiribûn. Ji aliyê çemê Xabûr ve yê ji Serêkaniyê berê xwe dide Hesekê, ji wir derbasî Dêrezorê dibe, bayekî dijwar li wan dixist.

Rûkenê pir dixwest erdnîgariya herêmê nas bike:

-Di rê de dema em nêzîkî bajêr bûn, çiyayekî bisilsile xuya dikir, ew çi çiya ye?

-Ew Çiyayê Edbulezîz e, hin jê dibêjin Çiyayê Kizwanan.

-Vêca kizwan lê hene?

-Ez jî neçûyîmê, lê dibêjin hene.

Ji serma zirezira çokên wan û reqereqa didanên wan bûn. Rûken car bi car radibû ser xwe, dîsa rûdinişt. Ji bêxewiyê çavên wan sor bûbûn. Her çend kêliyan li saetên xwe dinêriyan. Şervînê destê xwe da çoka wê:

-Hevalan got wê seyare bê we bigire. Ji kengê ve em li vir in hê nehatine.

-Dibe ku pirsgirêkek derketibe. Mûxaberat jî li van deran digerin. Tu bi ya min bikî em li seyareyekê siwar bibin biçin.

Şervînê hinekî li derdorên xwe nêrî:

-Tu jî rast dibêjî, teqez tiştek qewimiye. Wa seyareyek sekiniye,

ezê jê bipirsim ka naçe Qamişlo.

Ji cihê xwe rabû ber bi seyareyê ve çû. Kefiyek li serê ajokar bû li ser kursiyê xwe guhdarî stiranan dikir, wî jî pê re digot. Destê xwe li camê xist:

-Mamo tu diçî Qamişlo?

Ajokar serê xwe ji ser dîreksiyonê rakir:

-Erê ez diçim, tu tenê yî?

-Em du kesin.

Ajokar li pêşiya xwe dinêriya, diyar bû ku li benda hina ye:

-Hinekî bisekinin, wê keçika min bê emê biçin.

Jineke ciwan zarokek li ber singa wê bû ber bi seyareyê ve dihat.

-Haa, wa hat, vêca em dikarin biçin.

Şervînê bangî Rêkenê kir. Piştî seyare bi rê ket, ajokar di ser milê xwe re li wan nêrî:

-Keça min, hûn xwendevan in?

Şervîn berî bersiva wî bide li Rûkenê nêrî. Pê da fêmkirin ku divê wan nas neke:

-Belê mamo, em li Şamê dixwînin.

-Baş e keça min, xwendin pir baş e, hûn xwîşkên hev in?

-Em dotmamên hev in.

Rûyê ajokar xweş bû.

-Helbestvanê me yê mezin Cigerxwîn dibêje, zû bixwînin hev bibînin. Eger me Kurdan bixwenda, emê ne di vî halî de bûna. Lê mala felekê xirab bibe, belaya xwe ji me venake. Em feqîr û jar hiştine.

Dengê stirana Fatima Salih Axa bilind kir.

Ji ber xirabbûna rê seyare hêdika diçû. Dayîk û zaroka xwe bi xew ve çûbûn. Çavên Şervîn û Rûkenê jî diketin ser hev.

Seyare nêzîkî Qamişlo bûbû. Mijê xwe li dora bajêr pêçabû. Şervînê çavên xwe vekirin devê xwe bir ber guhê Rûkenê:

-Xweşikbûna Qamişlo serê sibehan diyar dibe. Ji Dêrik, Tirbespiyê, Dirbêsiyê, Serêkaniyê, Amûdê û gundên derdora wan, berê her kesî lê ye. Qamişlo dilê Kurdistanê ye. Navenda Cizîrê ye. Bajarê evîn û ilhamê ye. Lê bêxwedî ye. Te Hesekê dît, ji ber ku Ereb tê de ne, dewleta Surî çiqas girîngiyê didiyê.

Bayê çiyayê Bagokê li bajêr dixist. Şervînê berê xwe dabû kolanên bajêr. Ji pencereyên malan dengê Mihemed Şêxo bilind dibû. Ajokar bi şûn xwe ve nêrî:

-Keça min, camê bigirin hûnê bicemidin. Çawa ku hûn nû vî bajarî bibînin. Ev çiqas e hûn ji vir dûr ketine?

-Mamo, bajarê me şîrîn e, bêhna wî bi me xweş e.

-Keça min dibêjin sala 1926'an Qamişlo hatiye avakirin. Tu van kolanan dibînî? Berê Suryan, Ermen lê pir bûn. Bavê min digot, berê li Qamişlo av pir bû. Tu niha dibînî, çemê Ceqceqê hema bêje dimiçiqe. Weleh pîrika min digot, ji bo qamîşan em ji gundan dihatin van deran. Jixwe navê Qamişlo jî ji wê hatiye. Berhemên dîrokî yên Kurdan, Yahûdiyan û Ermeniyan li vir pir in. Tu vê Qehweya Gerbîz dibînî? Ji bo vexwarina qehweyê em dihatin vir. Hê jî tama wê li ser zimanê min e. Ev der navenda rewşenbîr, hunermend û helbestvanan e. Jixweve negotine bajarê evînê. Bavê min ji vir re digot deşta Mêrdînê. Timî qenalên avê di navbera me û wî milî de hebûn. Sedema ku dibêjin Serxet û Binxet jî xeta tirênê ye.

Şervînê xwest meyla wî ya siyasî nas bike:

-Mamo, li vir partiyên siyasî hene?

Bi gotina xwe re ferq kir ku xwe daye dest, lê ji dest derketibû. Di wê navê re seyare li ber deriyê malekê sekinî. Ajokar berê xwe da dawiya seyareyê:

-Em gihîştin malê. Hûn jî dakevin em çayekê vexwin, pişt re ezê we bibim cihê hûn bixwazin.

Şervîn û Rûken li hev nêrîn, bi serê xwe erê kirin:

-Dibe mamo, em çayeke we vexwin.

Ajokar ket pêşiya wan ketin hundir. Hundirê malê bi kulavên koçerî hatibû raxistin. Bi singa xênî ve jî wêneyê Mele Mistefa daleqandî bû. Rûkenê xwe nêzîkî Şervînê kir:

-Ev Berzanî ne!

Rûniştin rûneniştin, çay ji wan re anîn. Ajokar jî li hemberî wan rûnişt. Bi baldarî li wan dinêriya:

-Hûn bi xêr hatine. Ji min re dibêjin Bavê Serbest. Çawa hûn axivîn, min zanî hûn ne ji vir in. Reng û tevgerên we weke yên Apociyan in. Em kurdewar in, çi kesê ji bo kurdîtiyê kar bike, em pê re ne. Lê li vir hema her kesî ji xwe re partiyek çêkiriye. Di dema Fransa de Kurdan bi navê "Naydiyên Riyadî û Cemiyatên Xêyrî" tevger ava kiribûn. Ji sala 1957'an ve jî Partiya Demokratên Kurdistanê PDK heye. Sekreterê wê Nûredîn Zaza û Osman Sebrî bûn. Ji sala 1954an heta 1958'an kêm be jî serbestî hebû. Vê jî pêşiya partiyan vekir. Paşê hatin qedexekirin û serokên wan jî tev hatin girtin.

Axîneke kûr kişand û girêk ket qirika wî:

-Keça min, bi girtin û qedexekirinê re, navê Kurdistanê ji navê partiyan hat rakirin. Peyva Kurd tenê ma. Pişt re PDK bû du parçe; rastgir û çepgir. Serokê rastgiran Hemîdê Hecî Derwêş, yê çepgiran jî Osman Sebrî bû. Sala 1970'î ji bo ku dîsa bibin yek, rehmetiyê Berzanî, li Başûr anîn cem hev.

Şervîn bi baldarî guhdarî dikir:

-Vêca bûn yek?

-Ez ji keça xwe re bêjim, bûn sê parçe! Kesên hiyadî, ango çîna navî jî derketin. Wisa xwelî li serê me bû. Berzanî mora xwe da Dehamê Mîro. Jê re got, tu skretêr î wan bike yek. Lê Dehamê Mîro axa bû, ti eleqeya wî bi siyasetê re tinebû. Çû partiyek ji bo xwe çêkir. Jixwe axayên me pir bûn, wî tew mohr jî kir berîka xwe! Navê

partiya xwe jî kir Partiya Demokratên Kurdên Sûrî-El Partî. Ma axa dibin serokên partiyan, wê ji bo me çi bikin?!

Şervînê bi serê xwe gotinên wî erê kirin:

-Belê mamo, axa û begên Kurdan pir in, lê ji bo me tiştekî nakin. Divê em ji bo xwe bikin.

Bi axaftina xwe re li saeta xwe nêrî:

-Mamo, ku destûra te hebe em vêca dixwazin rabin.

-Min dixwest hûn bimînin, lê madem hûn dixwazin em rabin. Kêfa min ji gotinên we re hat. Çi gava hûn bên, mal mala we ye. Divê em ji bo yektî û rizgariya Kurdistanê bixebitin. Ne ji bo partî û serokan. Mamê we jî têra xwe emir kiriye û dinya dîtiye. Ezê seyareyê bixebitînim heta hûn hatin. Piştî çend kêliyan wan jî xatirê xwe ji malê xwest, derketin. Seyareyê berê xwe da Qenatsiwêsê. Li ber deriyê maleke li ser riya giştî sekinî. Peya bûn, xatirê xwe ji ajokar xwestin.

***

Li Akademiya Mahsum Korkmaz Apo li ser dîroka PKKê û Kurdan diaxivî. Teybeke tomarkirina deng, şûşeya avê û desmalên kaxiz li ser mase bûn. Sara li rêza pêşî rûniştibû. Rojên despêkê yên koma Apoyî, êrîşên dewleta Tirk û zehmetiyên wê demê, weke şerîta fîlmekî di ber çavên xwe re derbas dikirin. Cesûr jî bi çavên xwe yên qehweyî û rûyê xwe yê biken li nava çavên wî dinêrî. Ketibû nava derya zanîn û wêrekiya PKKê. Her ku Apo xwe berdida nava dîrokê, ji bo ku endamekî wê tevgerê ye, bi wî re jî hestên serbilindiyê çêdibûn. Mezlum jî li ser rûpeleke spî taybetiyên milîtanên PKK'ê yên destpêkê rêz dikirin: "Fedakar, zana, wêrek, hestiyar, welatparêz, exlaqî...” Li kêleka wî Rizgar rûniştibû, çavên wî li ser pênûsa Mezlûm bûn. Serê wî jî pê re nizim û bilind dibû. Çavên Apo li ser

rawestiyan, ji bo şiyarkirin û xemsariya wî dengê xwe bilind kir.

-Di rabûna me de ne dijmin tenê, malbatê û gel jî tiştek qebûl nedikirin. Xortên fedakar li dora me kom bûn. Min jî xwe spart wan. Destpêkê çend kesên lewaz jî li derdora me hebûn. Min destpêka salên 1960-1970î biryara xwe da. Ji sala 1975'an heta 1980î min komên piçûk li dora xwe çêkirin. Eger we berhem û şehîdên PKK'ê li ber çavên xwe nedîtibûna, hûn nêzîkî me nedibûn! Salên 1970-1980'î em neketibûn nava gel, komên piçûk bûn. Em li riya rast digeriyan ku biryarê bidin. Di dawiyê de em ketin ser riya serxwebûnê. Me bi Sosyalîzmê dest pê kir û ji bo xwe Sosyalîzma zanistî kir rêber...

Zekî di rêza pêşî de weke mirîdekî rûniştibû, lê di hundirê wî de birûskên desthilatdariyê vedidan. Carna jê di binê awirên çavên xwe de li Cesûr dinêrî. Çawa ku çavê xwe berdabe cihekî jor lê yên weke wî li pêşiya wî asteng bin. Liv û tevgerên wî, awirên çavên wî û xwemelisandina wî bala Apo dikişandinin. Lê wî jî ferq kir ku çavên wî li ser in.

-Li Tirkiyê bi derbeya 12'ê Îlona 1980î heta 1990'î, faşîzim pir pêş ket. Ev salên pir bixeter bûn. Li hemberî mirinê me li ber xwe da, wisa em li ser piyan man.

Heta nîvo ji roja destpêkê heta wê rojê dîroka PKKê hat dayîn. Li saeta xwe nêrî. Êdî dema navberê bû.

Girên li derdora akademiyê yên ji berfê spî bûyîn, ji ber tîrêjên rojê diteyîsîn. Berfa li ser şaxên daran bedewiyeke cuda dabû derdor. Şînbûna asîman xemla wê temam kiribû. Apo li serê latekê rûniştibû. Ji ber kefiya li dora serê xwe pêçayî rûyê wî xuya nedikir. Li xwazeyê temaşe dikir û kûr kûr dihizirî. Civînên sala 1977'an, li Agirî, Xarpêt, Dêrsim û deverên din çêkirîn, yek bi yek anîn bîra xwe. Di xeyalên xwe de wêne û dîmenên belavbûna fikrê PKKê, bahoza Apoyiyan ya dewleta Tirk hejandî û fedakariya milîtanên wê demê çêdikirin. Wêneyê Haki Karer li ser rûpelên berfa spî

dineqişand. Bîneke kûr kişand hundirê xwe. Awirên çavên wî li ser tevgera li akademiyê rawestiyabûn. Dengê Kemal û Haki di guhên wî de olan dida. Pênûs û lênûs ji berîka xwe derxistin: “Şoreşa Kurdistanê şoreşa azadiya jin û civakê ye.” Pênûs rakir, destê xwe avêt eniya xwe. Çawa ku çakûçek lê ketibe, ji nişka ve jan ketibû eniya wî. Dema sermayê didayê sînozîta wî giran dibû. Wisa xuya dikir ku êdî nikare binivîse. Rabû ser xwe berê xwe da parêzvanan.

-We ne sar e?

-Na serokê min, dinya xweş e.

Li rûyên wan yên ji sarma sor bûyîn temaşe kir:

-Madem we ne sar e, hûn li vir bin ezê biçim.

Ev gotina xwe bi henekî gotibû.

-Em hinekî bimeşin, xwe germ bikin.

Piştî meşeke deh deqîqeyî berê xwe da dibistanê. Saeta dersê jî hatibû. Li pişta mase hinekî çû hat:

-Eger mirov gavên mezin neavêje, tê wateya ku xiyanet li şehîdan hatiye kirin. Şerê Hilwanê şerekî mezin bû û gelê wê bi me re bû. Sala 1978'an hevalê Halil Çavgun di salvegera şehîdbûna hevalê Haki de karekî mezin dikir û wê demê şehîd bû. Yên şehîd xistîn axayên xayîn bûn. Di wan rojên teng de me tola hevalên şehîd rakir.

Heta êvarê bê navber dîroka PKKê hatibû dayîn. Ew jî bi milîtanan re li qadê, dimeşiya. Radyo vekir guhdarî nêçeyên BBC kir. Derê radyoyê girt, gazî Selman kir:

-Tu û Ciwan xwe amade bikin, emê ji bo hevdîtinê biçin cem wan dostên me yên Ereb. We ji wan re gotibû?

-Rast e serokê min.

-Bila Ciwan wergerê bike, tu çi dibêjî?

-Serokê min, ezê gazî hevalê Ciwan bikim.

-Temam lê lez bikin!

Piştî çend kêliyan Selman û Ciwan ji dibistanê derketin. Li ber

seyareyê li bendê sekinîn. Bi siwarbûna wî re Selman seyare xebitand. Ciwan li pêşiyê rûniştibû, wî jî li dawiyê li notên di destê xwe de dinêrî. Piştî qasekî seyare li benda trafîkê sekinî. Polîs li nava seryareyê nêrî:

-Camên paş veke, kî bi te re ye?

Ji ber ku gelek caran li ser rê hatibû sekinandin, aram bû û bersiva bide jî ji ber kiribû:

-Mamê min û birayên min in. Her roj em di vir re diçin, ma tu me nas nakî?

Bersiva wî li xweşê polîs neçûbû:

-Em karê xwe tenê nas dikin.

Bi vebûna camê re polîs bi şûn ve vegeriya:

-Min hûn nas kirin, ma kî mamê te nas nake? Wêneyên wî li her derê hene. Bi xêr biçin.

Apo silav dayê û berken bû. Seyare ket ser riya xwe.

Li Berliyasê Selman li ber dikaneke berçavkan seyare sekinand derket. Hê du deqîqe derbas nebûyîn derket. Berî ku seyareyê bixebitîne kîsikê di destê xwe de raber kir:

-Berçavka rojê ye serokê min. Bi vê berçavkê ti kes we nas nake.

Hinekî lê meyze kir, da ber çavên xwe:

-Çawa ye baş e?

-Gelek baş e serokê min, wiha baştir e.

Berken bû:

-Hem me eşkere dike, hem li ber siyê berçavka rojê dide ber çavên me.

Seyare xebitand, bi rê ketin. Li ser devê rê dîsa polîsên trafîkê sekinîbûn. Selman di neynikê de berçavka li ber çavên wî dît. Hê polîs pirs nekirî tiştek xist destê wî. Her du jî keniyan. Pirsnekirina polîs bala Apo kişandibû:

-Te çi got tu berdayî?

-Min pênûsek dayê serokê min.

-Wê demê bila kartoneke pênûsan li cem we be da me nas nekin.

Nêzîkî cihê xwe bûbûn. Cihê biçûyayê di hişê xwe de tomar dikir.

-Em diçin mala Ferhan Ebdurehîm?

-Rast e serokê min.

-Temam ez baş nas dikim. Erebê Lubnanê ye. Gelek caran em bi hev re rûniştine. Ji şerê Kelha Şiqêf ve me nas dike. Heyranê PKK'ê ye. Tevlî her pîrozbayiya me dibe û alîkariyê jî dide.

-Serokê min, ji bo dîtina we, got ezê hin dostên xwe jî amade bikim.

-Ji bo me jî baş e. Emê gelek kesan bi riya wî nas bikin.

Li ber deriyê qesreke ji keviran hatî çêkirin sekinîn. Li hawîrdorê xênî ji her nifşê daran  hebûn. Xemleke pir xweşik dabûnê. Lê bi giranî mêwên tirî bûn. Hewşa wî jî pir mezin bû. Ji mêwên tirî asîman xuya nedikir. Di nava wê de ji bo seyareyê jî cihekî xweş çêkiribû. Deriyê hewşê yê mezin hat vekirin. Ji bo pêşwaziyê Ferhan di hewşê de li benda wan bû. Şalwalekî reş û gumlekekî spî li ber bûn. Kembereke ji zîv û zêr li pişta wî bû û kefiyeke reş û spî avêtibû ser milên xwe. Bi wê heybeta xwe berê xwe da deriyê seyareyê:

-Tu bi xêr hatî birayê Ebdullah, bi ser çavan hatî!

Bi axaftina xwe re hembêz kir. Apo jî bi dilxweşiyeke mezin merheba dayê û pirsa rewşa wî kir. Ji bo rêzdayînê, li ber derî xalîçeyek hatibû raxistin, lê pê lê nekir. Di tenişta wê re meşiya. Li ser serdera deriyê qesrê re gelek entîkeyên weke şûr, qendîl, rim û mertalê ji sifir hatibûn daleqandin. Ji bo pêşwaziyê jinên malê li ber deriyê eywanê rawestiyabûn. Hemsera Ferhan bi pêşiyê ve çû. Kirasekî reşê hevrîşim li bejna xwe ya bilind kiribû, gerdeniyeke ji zêrê helandî jî li ser gerdena wê ya spî bû. Zendên xwe bi bazinên dêrî xemilandibûn. Pora wê jî vekirî û kurt bû. Wê ji hemserê xwe

biheybettir xuya dikir. Bi rûyekî biken destê xwe dirêjî Apo kir:

-Tu bi xêr hatî serokê Kurdan. Te bereket û selametî anî mala me. Tu bi xêr hatî serokê partiya keç û xortên qehreman!

Apo bi wê pêşwazî û serbestiyê pir dilşa bûbû û bi kêfxweşiyeke mezintir silav dayê:

-Ez spasiya we dikim. Hûn çawa ne, baş in? Ev demeke dirêj e tu nehatî akademiyê, çima?

Ciwan di nava keftûleftê de bû ku wergerê bike, lê pêwîstî pê nemabû, her duyan jî ji tevgerên hev fêm kiribû.

-Birêz serokê bedew, ez nexweş bûm. Lê min pirsa te ji Ferhan dikir.

Piştî vê pêşwaziya germ û biwate, yek bi yek silav da yên din, derbasî cihê rûniştinê bû. Hundirê eywanê bi lembeyên elektrîkê, her çar taqên dîwêr jî bi ayatên Quranê yên ji zêr hatibûn xemilandin. Di binê ayetekê re jî wêneyên bav û kalên Ferhan û şecereya jiyanê - dara jiyanê- hatibûn darvekirin. Ferhan cihê rûniştinê nîşan kir, ew jî li teniştа wê rûnişt. Jin li milekî, mêr li milekî tev li hemberî wî rûniştin. Eywana mezin ya weke koçkekê ji mirovan tijî bûbû. Şûmîneya bi êzingan pêketî xemleke cudatir dida eywanê. Bîna bixûrê jê difûriya. Piraniya mêvanan cara yekê ew didîtin. Hemsera Ferhan li ser piyan bixêrhatina mêvanan dikir. Du kesan jî qehweya tehl digerand. Piştî vexwarina qehweyê Ferhan berê xwe dayê:

-Hatina we ji bo me rûmeteke mezin e!

Apo serê xwe bi jêr ve hejand:

-Ji bo me jî dîtina we rûmet û biratiyeke hêja ye. Gelek caran me û birayê Ferhan hev dîtiye.  Sala 1988'an suhbetên me pêr çêbûn. Tê bîra te ne? Wê demê min gotibû tiştek weke berê namîne, wê her tişt bê guhertin. Va hûn dibînin em ji kû gihîştin kû.

Ferhan bi wateya erêkirina gotinên wî serê xwe dihejand:

-Birayê Ebdulah, cara pêşî min hûn di nava tevgerên Filîstînê de

dîtibûn. Lê berî hingê jî ji dûr ve min hûn nas dikirin. Ew rojên berê ji bîra min naçin. Wê demê serokê tevgera Filîstînê Yasir Erefat gotibû, bila sih milîtanên Apo bidin min, ezê Filîstînê rizgar bikim. Ev piştî şerê Kelha Şiqifê gotibû. Baweriya min bi vê gotina wî û berxwedana we kirî dihat.

-Haa, Erefat wisa gotibû? Rast e, ji bo dostayî û biratiyê hevalên me berxwedaneke mezin kiribûn.

-Birayê Ebdulah, berî hingê Israîl heta Beyrûdê hatibû û gelek komkujî kiribûn. Salin zor û zehmet bûn. Bi tevgera we re me zanî ku Kurd bi ti kesî ve ne girêdayî ne, dikarin serbixwe tevbigerin. Ji bo me hûn weke afsaneyekê ne.

Apo berê xwe da kesên rûniştî:

-Pirsên we hebin bikin.

Ji nava civatê yek rabû ser xwe:

-Navê min Ebû Ednan e. Mala min li Beyrûdê ye. Min pir dixwest we bibînim. Min pirtûka we ya Polîtîk Rapor xwend. Li hemberî nîzama heyî hûn çawa dikarin vê siyasetê û van nirxandinan bikin?

Nirxandinên xwe yên di pirtûkê de, anîn bîra xwe:

-Pirsa te gelek girîng e. Çawa ku li ser pişta şêr bim wisa siyasetê dikim. Me xwe spartiye gelê xwe û dostayiya gelên Rojhilata Navî.

-Dixwazim tişteke din bipirsim. Çima hûn di serê daxuyaniyên xwe de bismilahê nanivîsin?

-Em tevgereke ilmî, madî û siyasî ne. Em nikarin rengekî din bidin xwe. Em ji bo gelan tevan têdikoşin. Di nava me de gelek kesên ne Misilman şehîd bûne. Em bi Islamê ticaretê nakin. Emê Misilmantiyeke rast bikin.

Kêfa Ferhan ji wê bersivê re pir hatibû:

-Rast e, gelek partiyên me bi navê Islamê ticaretê dikin.

Hinekî sekinî, destê xwe danî ser milê Apo:

-Em dixwazin ji bo te li vir xaniyekî amade bikin. Li kêleka me

be û ji vir neçe. Emê li te biparêzin.

Apo bi dilsoziya wan kêfxweş dibû, berken bû:

-Ez ne ew serok im ku di hundirê malan de xwe veşêrim. Eger ez xwe veşêrim, wê gelê Kurd çawa be?

Li yên hundir temeşe kir, têgihîştibû ku kesayeta wî baş nehatiye fêmkirin:

-Eger ez xwe veşêrim, wê dewleta Tirk hem li Suriyê bixe, hem li Kurdan. Wê gelê me tine bibe! Ezê wê demê serokê çi bim? Çima serok bim? Min ti caran xwe veneşartiye û ez nahêlim gelê Kurd bikeve wê xeterê. Bila gelê min nebe qurbana min, bila ez bibim qurban.

Kêfa hemsera Ferhan ji vê bersivê re pir hatibû. Rabû ser xwe:

-Birayê Ebdulah, Xwedê ev mejî daye te, tu weke teyrekî baz î. Mirov ji awirên çavên te heybetê digire. Pirsên tu bersiva wan nedî nînin. Tu her kesî iqna dikî. Eger tu serokê me bûyayî, teyê gelên Rojhilata Navî tev rakiran serhildanê û rizgar bikiran. Lê dixwazim pirsekê bikim, ji bo jina Ereb tu çi dibêjî?

Di kesayeta wê de cesaret, fedakarî û wêrekiya jinên Rojhilata Navî didîtin:

-Ka ji bo jina Kurd çi dihizirim û pêşkêş dikim, ji bo jina Ereb jî heman tiştî dixwazim. Di navbera koletiya jinê de ferq nîne. Li her derê rewşa jinan dişibihe hev. Di dîroka Ereban de jî jinê di her warî de cihê xwe girtiye, lê rêxistineke jinan çênebûye. Em dixwazin wê çerxê biguherînin. Ji bo min şoreşa herî mezin şoreşa jinê ye. Em li ser mijarên jin û malbatê pir radiwestin û nîqaşan dikin. Eger tu werî sîstema me bibînî, tuyê bibînî ku ev şoreş şoreşa azadiya jinan tevan e.

Ferhan pir kêfxweş bûbû:

-Em gelê Kurd pîroz dikin ku serokekî weke te ji nava wan derketiye. Tu ji bo insaniyetê tekoşînê dikî, em jî bi mal û canê xwe

bi te re ne.

-Ez ne ji bo Kurdan tenê me, em ji bo gelên mezlum tevan têdikoşin. Sala 1982'yan li Lubnanê li hemberî êrîşa Israîlê dozdeh hevalên me şehîd bûn. Xwîna me û gelê Ereb bi hev re rijiyaye.

Piştî vê gotinê yên li eywanê tev rabûn ser xwe li çepikan xistin. Ew jî bi wan re rabû ser xwe. Piştî çepikan axaftina xwe domand:

-Gelê Filîstînê di binê destê siyonîstan de pir bedelan dide. Heta dawiyê em bi doza wan re ne. Em hevaltiyê wisa fêm dikin û wisa dimeşînin. Me bi gelek partî û gelê Lubananê yê welatparêz re dostayî kir. Welatê wan jî parçe ye û rewşa wan weke ya me ye. Mana me ya li vir, bi şoreşa Filîstînê û gelê Lubnanê ve girêdayî ye.

Destekî din bilind bû:

-Navê min Ebû Nîdal e. Ez ji Sûriyê me, mala min li Şamê ye. Sûriye karê we asteng nake, heta alîkariyê jî dide we. Hûn ji bo vê çi dibêjin?

-Me li vir jî û li Sûriyê jî karekî mezin kir. Ev bi serokatiya Sûriyê Hafiz Esed pêş ket. Li dijî emperyalîzm, siyonîzim û kevneperestiyê serokatiyeke hêja ye. Ev dostayiya di şexsê Hafiz Esed de rast bû. Derfetên ketîn destê me bi vê dostayiyê çêbûne. Divê mirov vê ji bîr neke. Dostayî zehmet çêdibe, ji ber wê divê mirov qîmetê wê bizane. Ji bo alîkariya şoreşa Fîlîstînê, gelê Lubnanê û serokatiya Sûriyê em pir spas dikin...

Piştî axaftin û xwarinê seyareya wî ket ser riya akademiyê.

Ji civînê pir kêfxweş derketibû, di dilê xwe de got, ev dostûbiratiya gelan ya bi hezarê salan ava bûyî, wê dewam bike. Ji bo ku deng biçe yên li pêş dengê xwe bilind kir:

-Eger em van gelên Berliyasê bikin dost û baş birêxistin bikin, wê ji bo me bibin bingeh û hêza têkoşînê. Selman, gelo dostên me weke din jî hene?

-Belê serokê min, gelek dixwazin we bibînin.

-Baş e, emê xwe plan bikin û bi hemûyan re bidin bistînin. Divê em bi şev û roj kar bikin.

Şevê kirasê reşê tarî li xwe kiribû. Seyare di riya ax û bizixur de ber bi deriyê akademiyê ve diçû. Hêdîka çû heta li ber derî sekinî. Nobedar du milîtanên jin bûn:

-Parola!

Selman serê xwe di pencereyê re derxist:

-Heval, ez îşev parolayê nizanim!

Nobedarek li dora seyareyê zîvirî:

-Kî bi te re ye?

-Mêvanek e, lê ku tu pir israr dikî binêre!

Nobedarê fenera di destê xwe de da dawiya serayeyê. Apo silav dayê. Xwe da paş û bi awayekî leşkerî sekinî.

Selman seyare bir ber derê rêveberiyê. Di hundir de sê endamên rêveberiyê nivistibûn. Selman gazî wan kir:

-Hevalno rabin!

Hê gotina wî di devê wî de Zekî serê xwe bilind kir:

-Ev çi ye nîvê şevê tu me ji xew radikî, ma emê şev û rojên xwe li gorî te eyar bikin?

Berî ku Selman bersivê bide, Apo ket hundir li ser kursiyê li pişt mase rûnişt. Dengê axaftina Zekî kiribû. Ku Apo li hemberî xwe dîtin tev rabûn ser xwe. Li Zekî temaşe kir, di dilê xwe de got, li ber min dibe milyaket, li pişt min jî dibe şeytan:

-Erê, kengê bixwaze wê bê û biçe! Ji vî karî re cidiyet pêwîst e. Cidiyeta we jî wiha diyar dibe!

***

Serê bibehê bû, perwerdeyê dest pê kiribû. Derveyî erkdarên rojê û nobedaran, her kes li hundir bû. Ji derdora akademiyê pêjin

nedihat. Bayê hizirînê li wan navan belav bûbû. Apo li odeya bêsîmê bi qadên şer re diaxivî. Hem agahî digirtin, hem perspektîf didan. Dengê wî ji odeyê weke pêlan geh bilind dibû, geh nizim. Piştî axaftinê çû odeya xwe. Bi sergotina “Ji bo rêveberî û şervanên hêja”, dest bi nivîsa perspektîfan kir. Çawa ku li cem wan be û dest avêtibe birîna pêwîstî bi dermankirinê heyî dinivîsî. Ji kûrbûna li ser mijarê çaya xwe ji bîr kiribû. Serê xwe ji ser rûpelê rakir, destê xwe avêt qedehê, lê sar bûbû. Careke din danî ser mase. Piştî kêliyekê dîsa rahiştiyê vexwar û rabû ser xwe. Li ser rûyê wî nerehetiyekê konê xwe vedabû. Tiliyên destên wî bêtebat diliviyan. Tizbiyên kehrîbar bilez dikişandin. Çavên xwe li nava odeyê digerandin. Dîsa rûnişt rahişt pênûs û lênûsê. Lê bê ku tiştekî binivîse ji nişka ve serê xwe bilind kir, berê xwe da derî. Di wê kêliyê de dengê lêxistina derî hat. Bi lêxistinê re nobedar ket hundir:

-Serokê min, hevalên qasid (kurye) amade ne.

-Baş e, bila derbasî hundir bibin.

Piştî derketina nobedar Haşim û Ebû Ehmed ketin hundir. Bi germî her du himbêz kirin û pirsa rewşa wan kir.

Her du li ser kursiyên li hemberî wî rûniştin.

Bi rûniştina wan re dest bi axaftinê kir:

-Em hevalan amade dikin, rojên me pir tijî derbas dibin. Hûn jî li vir man we bi çavê xwe dît.

Berê xwe da Ebû Ehmed. Ew çend car bûn ditibû, lê ne wî pirs kiribû, ne Ebû Ehmed jê re gotibû ez ji filan cihî me:

-Tu jî ji Dêrikê bûyî ne?

-Rast e serokê min.

-Demeke dirêj e hûn xebata qasidiyê dikin. Perwerdeya qasidan dest pê kiriye. Me dixwest hûn jî tevlî bibin, lê ji ber ku heval zêde diçin tên û hûn jî sînor baş nas dikin, divê hûn xwe zû bigihînin herêmê. Rewş ne weke berê ye.

Ebû Ehemd jî lê dinêrî, ew cara yekê bû ewqas ji nêz ve li cem rûniştibû. Karê xwe di ber çavan re derbas kir. Di dilê xwe de got, Serok evqas şiyar e, çima em wiha xemsar in û di xefletê de ne. Dil û mejiyê wî ketibûn nava lêgerîn û mûqayesekirinê. Mejiyê wî bangî dil û hestên wî dikir:

-We dît, bernameya me tijî ye. Em dixwazin lezê bikin da heval bi awayekî çalaktir tevlî kar bibin. Divê hûn jî qîmetê ked û hesasiyeta karê xwe bizanin. Li malbatên xwe jî binêrin. Eger pêwîstiyên we hebin ji hevalan re bêjin. Tişta we ji vir girtî bigihînin civakê. Karê we hesas e, divê hûn pir şiyar bin û karekî serkeftî ji we tê xwestin.

Berê xwe vegerand ser Haşim. Kêfa wî ji disiplîn û fedekariya wî re pir dihat. Berê Haşim jî lê bû. Bi sekna xwe nîşan dida ku ji her karê rêxisitnê re amade ye. Ji bo derbaskirina koman çend perspektîf dan wan. Ferq kir ku Haşim dixweze tiştekî bêje:

-Kerem bike, tu dixwazî tiştekî bêjî?

Gotinên wî tev ji bîrê çûn, gotinek tenê hat bîrê:

-Serokê min, carna tiştin pir girîng diqewimin, di demên wisa de emê çawa xwe bigihînin we?

Serê xwe hejand:

-Ev mijareke girîng e; berî niha Şener berpirsê qasidan bû. Gelek agahî li gorî xwe ji me re dişandin û gelek zerer da karê me. Ji bo wî karî û karên din jî, emê hevalê Cesûr rêkin wir. Divê xeberê me ji her tiştî hebe, da em jî li gorî wê nêzîk bibin.

Haşim xwest gotina xwe zelaltir bêje. Di wê navê re milîtanekî fêkî anî danî ser mase.

-Serokê min, eger em agahiyan yekser ji we re bêjin wê baştir be.

-Tu rast dibêjî. Min ji hevalan re gotiye qasid kengê pêwîst bibînin wê bên vir. Jixwe hûn bi hevalan re tên vir. Dema tiştek hebe ji me re bêjin.

Du saet derbas bûbûn hê li ser derbaskirina şervanan û

erdnîgariya herêmê diaxivî. Haşim mabû şaş: “Serok çawa evqas bi hurgulî êlan û erdnîgariyê dinase, em ji wir in, lê dîsa em hinge wî herêmê nas nakin. Navê qasidan yek bi yek got:

-Silavên min li tevan bikin. Bila her carê hin ji wan bên vir. Nuqteyan zêde bikin û ji bo dema pêş riyên nû bibînin. Li gorî hin raporên ji wir hatîn, hin kes ketine binê bandora Şener, hin jî ji me qut bûne. Yên qut nebûyîn jî baş tevlî xebatê nabin. Pêşniyara hevalan ew e ku werin vir bi Serokatiya Partiyê re nîqaş bikin.

-Serokê min, Şener dixwest gelek kesan bi xwe ve girê bide.

-Rast e, dixwest bi keda me ya salan bilîze. Ji ber wê gelek durûtî dikir. Hin kesên xafil û saf kiribûn binê bandora xwe. Li vir nikariya ewqas rehet tevbigere. Li wir meydan jê re mabû. Ji kesayetên weke wî re meydan bimîne, wê her tiştî bikin û bi nirxên gel bilîzin. Lê di destpêka xebata wî de gelek malbatan li ser tevgera wî ji min re raporên şaş nivîsîn. Kesên Serokatiyê nas dikin, tavilê ferq kirin, lê yên nas nakin dikevin binê bandora kesayetên wisa sexte. Ya girîng ne tevlîbûn e, mejî û dilê li azadiyê digerin girîng in. Ev hebe hûnê bi ser bikevin.

Her duyan jî bi sekna xwe nîşan dida ku ew xwestek bi wan re heye.

Piştî axaftinê, dest bi xwarina fêkî kirin. Lê suhbet jî nedisekinî. Lê êdî dema çûna wan bû, xatirê xwe xwestin derketin. Berî ji akademiyê derkevin, berê xwe dan pîpelkên diçin goristana şehîdan. Ji wir jî berê xwe dan welatê rê û rêbaran. Du kesên şehreza bûn; hem rojane şervan derbasî çiyayên Kurdistanê dikirin, hem riya navbera Şam û Lubnanê ji bo wan bûbû weke riya malê.

Piştî nîvro bû. Li meydana akademiyê perwerdeya leşkerî dihat dayîn. Çekek di destê Apo de bû, ji bo berdana nîşanê wî jî xwe amade dikir. Kundikî rûnişt, qûntaxa çekê bi milê xwe ve şidand,

çavekî xwe girt û yê din li ser nîşanê rawestand. Bêhneke kûr kişand û tiliya xwe avêt tetik. Bi dengê çepikan zanî ku li nîşanê daye. Mezlum li kêleka Zekî sekinîbû. Hê destê wî li hev diketin:

-Hevalê Zekî, te dît Serokatiyê çawa li nîvê nîşanê xist!

-Min dît heval, ew serok e, divê li nîşanê bixe.

-Ez ne wisa dibêjim, ez dibêjim Serokatî di her karî de serkeftî ye.

-Hevalê Mezlum, Serok her tiştî dizane.

Di wê navê re dengê wî bilind bû:

-Zekî ka were em li nîşana te jî binêrin!

Zekî bilezûbez çû cem. Wisa li ser piyan berê çekê da nîşanê. Ewqas ji xwe bawer bû pêwîst nedît bêhna xwe bikişîne. Bi wê lezê gule berda.

Apo keniya:

-Diviya tu baştir nêşanê bigirî.

Serê Zekî li berê bû:

-Serokê min, ez her tim li nîşanê dixim, îro nizanim çima wisa bû.

-Îro doh nîne, divê bi şiyarî nîşan bê girtin. Xwe bi girtina nîşanê re bike yek, di wê kêliyê de li ser tiştekî din nefikire. Rast e, te gelek çek bi kar aniye, lê ev nayê wê wateyê ku tuyê her carê li nîşanê bixî. Divê her roj tu xwe li gorî wê amade bikî.

Çavên Mazlum li Apo bûn, dixwest wate û girîngiya nîşanê fêm bike. Di hundirê xwe de got, Serokatî dixwaze bêje nîşan ne nîşana çekê tenê ye. Beşa nîşanê qediyabû, beşa meşê dest pê kiribû. Bi dehan keç û xort li kêlekên wî bûn, bilez dimeşiyan. Li pêşiyê hem dibezî hem diaxivî:

-Hevalno bila ti kes li dawiyê nemîne, em bi hev re bimeşin. Ev meşa jiyanê ye! Emê rojekê li Botanê jî bi hezaran wiha bi hev re bimeşin. Roja em dakevin Botanê wê bi hezaran gel jî bi me re bimeşe!

***

Mala Şervîn û Rûken biçûnayê deriyê wê vekirî bû. Şervîn destpêkê li derdora xwe nerî, pişt re ketin hewşê. Xaniyekî ji kelpîçan bû. Dareke hinaran, yeke tûyan di hewşê de bûn. Keçikeke sê-çar salî ji hundir derket:

-Pîrê, heval hatin!

Gotina xwe qedand neqedand, jineke bitemen di derî de xuya kir. Çarikeke spî li serê wê bû. Kirasê wê şînê tarî bû. Rûyekî esmer li ser bû. Pora wê ya spî û çarika spî rengekî nûranî didanê. Bejna wê jî ne kurt ne dirêj bû. Jineke jixwebawer û devtidar bû. Heman demê serwera malê bû. Jê re digotin Letîfe. Çawa çav bi wan ket, ji kêfa rûyê wê geş bû. Bi kelecan ber bi wan ve çû:

-Hûn bi xêr hatine heval, kerem bikin?

Piştî bixêrhatinê derbasî hundir bûn, li eywanê rûniştin. Keçika piçûk jî li tenişta Şervînê rûnişt. Sobeya mazotê pêketî bû û gumgumekî mezin yê avê li serê bû, birebira wî bû. Di wê navê re du keçên kame û xame ketin hundir. Her du jî keçên dayê bûn. Yek li tenişta Şervînê, ya din li cem Rûkenê rûnişt. Şervînê bi rûyekî biken li ya kêleka xwe nêrî:

-Hevala Necah tu çawayî?

-Min hûn dîtin ez baştir bûm. Ez jî hatime Xedîce rêkim, wê derbasî qadên çiya bibe.

-Min nizanî hûn hatine cem yadê.

Necah yeka çavkesper, pora wê zerê zêrîn û rûyê wê gewr bû. Çawa ku çavên xwe nû kil dabin, mûjankên wê wisa reş bûn. Her du birhên wê yên weke kevanan ji bo çavên wê yên bedew bûbûn çeper. Dêmên wê yên şîrîn bi dîtina wan geştir bûbûn. Çavên xwe ji ser wan ranedikirin.

Şervînê berê xwe da ya din:

-Tu çawayî hevala Xedîce. Ez nizanim, kî ji we ji ya din mezintir e?

Çawa ku Necah û Xedîce ne xwîşkên hev bin. Çavên Xedîce hingivî bûn. Dev û lêvên wê tenik û esmereke pir xwînşîrîn bû. Lê bi qasî Necahê ne biste bû:

-Hevala Şervîn**,** Necah 1974an çêbûye. 1989an jî dest bi xebata nava gel kiriye. Ez sala 1976an çêbûme. Ev salek e em her du tevlî bûyîn. Elî ji me mezintir e, ew 1967an çêbûye. Ew salekê berî me tevlî bûye.

Şervînê berê xwe da diya wan:

-Dayê, silavên hevalê Elî ji te re hebûn. Ez bawer dikim wê çend rojên din ew jî were vî alî.

Dayê keserek anî xwe:

-Eva li cem te Necaha wî ye. Ez pir kêfxweş im ku zaroyên min di nava partiyê de ne. Elî wehîdê min e, me carna bidîta baş bû.

Şervînê her du çavên Necaha piçûk maç kirin.

-Bavê te çavên te maç dike.

Bi bihîstina silavên Elî re rûyê her kesî geş bûbû. Ferq kir ku dayê dixwaze hevala pê re nas bike:

-Dayê, ev hevala Rûken e, wê demekê li vir bimîne.

-Ser çavan bimîne. Emê hevaltiyeke xweş bikin.

Xwest derbarê geşedanan de dayê agahdar bike:

-Dayê, hevalan gelek çalakî kirine, wê daxuyaniya leşkerî were. Silavên Serokatiyê ji bo we hene, dibêje divê her kes li gorî hêza xwe xebatê bike.

-Ew silav ji bû me peyam e, em ji serokê xwe fêm dikin. Heta ji me bê, emê tevlî bibin û zarokên xwe jî bidin.

Ji ber ku wê Xedîce derbasî qadên çiya bibûya, ji kêfa lingên wê erd nedigirtin. Her siyan xweziya xwe pê dianî. Piştî suhbeteke dirêj, Şervînê destûra çûnê xwest:

-Dayê, vêca divê em biçin.

Berê xwe vegerand ser yên din:

-Me pirtûka Serok ya ji bo kongreya çaran aniye. Necah, tu û Xedice bi hev re biwînin. Me çend pirtûkên din jî anîne, bila niha li vir bin.

Xatirê xwe ji malê xwestin derketin. Ji bo çûna Dêrikê berê xwe dan termînalê.

Şervînê dixwest derbarê herêmê de Rûkenê agahdar bike:

-Tuyê li vir gelek tecrûbeyan ji gel bigirî. Bi taybetî derbarê çanda gel de. Ev qada Serokatiyê ye, li gorî wê nêz bibe.

Êvar bû. Şervîn û Rûken li Dêrikê li mala Ebû Ehmed rûniştibûn. Şîva xwe xwaribûn ketibûn nava suhbetê. Ji ber ku Rûkenê herêm nas nedikir ketibû kelecanê:

-Hevalê Ebû Ehmed, Dêrik bajarekî piçûk e, lê me gelek bermayiyên Fransa lê dîtin.

-Berê Fransa li vir bû. Ev der sala bîst û yekê baregeheke leşkerî bû. Cihên wan yên leşkerî li Endîwer û Tilîlûnê jî hebûn. Ew cihê we dîtî, cihê ala Fransa bû. Ji Qereçoxê heta çiyayên derdorê, ji wir heta Xanikê cihên tevgera wan ya çavdêriya sînor bûn. Mûsteşar jî li Endîwerê bû. Dibêjin bi navê Hemko yekî Xiristiyan Dêrek ava kiriye. Lê Hemko Kurd bûye. Ji ber wê heta îro jî hem Xiristiyan, hem Misilman diçin wê dêrê. Ji ber wê dibêjin Dêrika Hemko.

Kêfa Rûkenê ji Dêrikê û çîroka wê re hatibû:

-Min navê Dêrikê bihîstibû, lê min nizaniya wiha xweş e.

-Her ku tu bimînî, wê kêfa te pirtir jê re were. Cihekî pir xweş e û li cihekî pir girîng e. Di sêkoşeyê de ye; aliyek Bakur, aliyek Başûr, aliyê din jî Binxet e. Ma te nedîtin, ji vir Cûdî, Gabar û Bêxêr xuya dikin. Û nêzîkî Ava Mezin e. Taybetiyên weke din jî hene.

Her ku Ebû Ehmed bersiv dida Rûkenê pirseke din dikir. Suhbetê

dewam kir heta bû dema razanê.

Şervîn bi dengê dîkê serê sibê ji xew şiyar bû. Pora wê ya xelek weke xirnîfê lê hatibû. Hemû belav bûbû, her tayekî bi aliyekî ve çûbû. Hê pixepixa Rûkenê bû. Xuya dikir ku di xeweke şîrîn de ye:

-Hevala Rûken rojbaş, rabe em xwe amade bikin. Wê niha hevalê Haşim bê.

Çawa ku moriya xewê di guhê wê de be, xwe nelivand jî. Lê Şervînê belaya xwe jê venekir. Rûkenê çavekî xwe vekir li saeta xwe nêrî:

-Heval, hê saet pênc e, ma çawa çêbû?

Şervîn rabû ser xwe di pencereyê re li derve nêrî. Deng ji bajêr nedihat. Bi şev baran hatibû. Berê xwe da asîman. Careke din ewran xwe komî ser hev dikir. Çavên xwe şûştin, didanên xwe firçe kirin, careke din gazî Rûkenê kir. Taştê hatibû amadekirin. Mastê miyan, penîrê kiraskirî, yê helandî, firû, lorik, to û hêkên dilmê li ser sifreyê danîbûn. Nanê sêlê jî hê germ bû. Ebû Ehmed û hemsera xwe li benda wan bûn. Bi hatina wan re tev de li dora sifreyê rûniştin.

Seyareyeke spî li ber derî li benda wan bû. Piştî taştê Şervîn, Rûken û Haşim siwar bûn, ketin ser riya Mêrga Mîran. Seyare nesekinî heta gihat gund. Gund pênc-şeş mal bûn û tev xizmên hev bûn. Berê xwe dan mala Ebdurehmanê Temê. Mal li serê girê nava gund bû. Seyare li ber deriyekî mezin yê ji hesin sekinî. Xanî ji kelpîçan hatibû çêkirin. Li tenişta xênî jî cihekî kevokan hebû. Deng ji malê nedihat. Haşim kilîtek ji berîka xwe derxist, deriyê hewşê vekir. Bi vekirina dêrî re xwediya malê ya bibejin û dagirtî derket hewşê. Kirasê wê yê reşê çemçemî li bin gozekên wê diket. Kefiyeke spî li serê wê bû û di ser de jî şareke reş girê dabû. Piştêneke stûrê ji çerm li ser navkêla xwe girê dabû. Çavên xwe bi kilê subhanî kil kiribû. Erzeniya wê ya gurover deqdeqî bû. Deqên wê hê ji dûr ve xuya dikirin. Êê, Ereb bû, diviya li çanda xwe xwedî derkeve.

Şervînê berê jî nas dikir. Sibê zû rabûbû dest bi karê malê kiribû:

-Hûn bi xêr hatine, heval li benda we ne. Ezê li derve li ber derî bim.

Bi dengekî nizim diaxivî:

- Dema hûn ketin hundir ti kes van derdoran hebû? Van rojan leşkerên dewletê pir digerin.

Haşim berken bû:

-Dayê Uweyş, tu hebî kî dikare nêzîkî vir bibe!

-Kurê min, Xwedê ji kesên xayîn re nehêle, dewlet belaya xwe ji me venake.

Haşim hizirî ka çawa bikin wê baş be:

-Zarokan rêke ser riya xwarê, bila venirin. Eger tiştek hebe da xeberê bidin me.

Bi zimanê erebî gazî hundir kir:

-Kurê min Mihemed, were hevalê Haşim gazî te dike.

Mihemed bibez derket li ber Haşim sekinî. Yekî dehsaliyê reşesmer bû. Bawer nekir ku Haşim dîtiye:

-Hevalê Haşim, te ji min re tifing anî?

-Destpêkê bixwîne. Tifinga bavê te heye, tuyê çi jê bikî?

-Ezê bi hevalan re derbasî çiyê bibim, li wir pê şerê dijmin bikim.

-Haa, tu dixwazî bibî şoreşger. Wê demê divê di serî de tu nobetê baş bigirî. Biçe binêre ka li ser rê ti kes heye.

Mihemedê piçûk deriyê hewşê vekir û ber bi jêr ve beziya. Dayê Uweyş ket pêşiya wan derbasî hundir bûn. Çend kes rûniştibûn. Lê ne di wê odeyê tenê de, di her odeyê de şervanên  derbas bibin hebûn. Di wê navê de dengê teqînekê hat.

***

Meha Sibatê bû. Ji her milî ve bayê li girên derdora akademiyê

dixist. Ji guveguv û vizîna wê mirov digot wê niha qiyamet rabe. Carna jê dibû bablîsok, tiştên li erdê ber bi asîman ve dibirin. Aloziya  ji ber şerê Kendavê derketî û tevlîheviya li Rojhilata Navî di rojeva her kesî de bû. Apo di odeya xwe de guhdarî nûçeyan dikir. Nûçeya di dorê de li ser Kurdan bû. Radyo nêzî guhê xwe kir, dengê wê jî hinekî bilind kir. “Li Tirkiyê bi egera ku du kesên bi navê Salih Talayhan û Şeyhmûs Yurga hatine kuştin alozî derket. Li ser vê, operasyon hatin destpêkirin. Di operasyonan de gelek kes hatin girtin.” Bi bihîstina vê nûçeyê re rûyê wî ne xweş bû. Pênûs kir nava tiliyên xwe, ji bo Bakurê Kurdistanê dest bi amadekirina perspektîfan kir. Piştî qasekî pênûsa xwe danî ser mase. Perspektîfên amade kirîn dilê wî hinekî rehet kiribûn. Gerdenşala xwe li stûyê xwe weranî, parkeyê xwe yê leşkerî li xwe kir, derket berê xwe da dibistanê. Li saeta xwe nêrî, hê çend deqîqe ji bo dersê mabûn. Li nîvê qadê sekinî. Bayekî sar li rûyê wê dixist. Lê ba jî ne ba bû, firtûneyeke bênav bû. Gerdenşala xwe li stûyê xwe baş pêça, zincîra parkeyê xwe jî girt. Kêfa wî ji mehên biharê re dihat û bi hatina Sibatê, çawa ku bihar li ber derî be. Ber bi keviya meydanê ve çû li ber kevirekî sekinî. Hişê wî li ser hatina biharê û rewşa gerîla bû. Ji wir berê xwe da dibistanê.

Her kes li bendê bû. Li ser kurisiyê li pişt mase rûnişt, ji rêveberiyê agahiyên rojê girtin. Agahiya “Rewş aram e” hatibû dayîn. Rabû ser xwe. Çend kêliyan li wêneyê Mazlum Dogan temaşe kir. Di dilê xwe de got, Newroza te bi sê derbikên ji agir pîroz kirî, emê bi rabûna milyonan pîroz bikin. Pişt re berê xwe da nava dibistanê:

-Newroz nêzîk dibe. Serhildanan dest pê kiriye û ji bo her qada welêt me heval şandine. Hêviya ji vê Newrozê serkeftin e. Gelê me bi durişma "Yan Kurdistan, yan neman" dest pê kiriye! Ev ji bo me fermana azadî û serxwebûnê ye.

Ev durişim li gorî perspektîfên wî bû jî. Axaftina xwe bi germî domand:

-Bi hezaran mirov dilê wan li ser me dilerize. Gelo ji bo daxwaziyên wan em amade ne? Eger girêdana bi gel ve hebe, wê girêdana her kesî ya bi rêxistinê ve bigihe asta herî jor. Di dîroka partiya me de, ya herî xirab hevaltiya kêm e!..

Heft saetan axaftina xwe li ser kesayetê kir. Berî ku navberê bide, ji xwe re got qezenckirina kesayeta rast qezenckirina şoreşê ye. Bi van hizran navbera nîvro hat dayîn. Bi milîtanan re çû ser sifreyê. Zekî li pêşberî wî bi awayekî leşkerî li ser piyan rawestiyabû. Destên wî jî di ber de bûn. Çavên Apo çûn serê:

-Xwarina xwe bixwe heval. Bila rêveberî piştî xwarinê li dibistanê amade be, emê hinekî nîqaş bikin.

Zekî çawa ku li benda fermanan be erê kir.

Piştî xwarinê ber bi qada sporê ve çû. Rahişt topê û bi dengekî bilind gazî kir:

-Mezlum, tu taxima xwe derxe, emê jî ya xwe.

Di nava çend kêliyan de taxim hatin destnîşankirin. Top girt, ber bi qadê ve beziya. Erê lîstik bû, spor bû, lê bi girîngiya çawa ku di şer de be, her liv û tevgera topê dişopand û çawa ku fermandarekî leşkerî fermanan bide leşkerên xwe, ji bo gihîştina armancê, wî jî wisa perspektîf didan taxima xwe:

-Eger taxima me bi ser nekeve, nabe. Ji bilî serkeftinê riyeke din nîne. Divê liv û tevgera me tev ji bo serkeftinê be.

Kêfa Mezlum li cih bû. Di dilê xwe de dihizirî ku wê baştir bikare di taxima li hember de liv û tevgerên wî bişopîne û bizane ka rêbaza wî ya lîstinê çawa ye. Temaşevanên lîstikê bala wan li ser tevgerên Apo bû. Top li dora wî diçû dihat. Mezlum di qelayê de bû. Her cara Apo top diavêt, wî digirt. Di ber xwe de got, eger wiha biçe em bi ser nakevin. Lê deng çûbû Mezlum. Xwest fêm bike ka çima ewqas

hêrs bûye. Top careke din li ber piyê wî bû û nêzîkî qelayê bû:

-Mezlum ezê lê bixim ha!

Bi gotinê re top ket qelayê:

-Mezlum, divê tu zagonên topê bizanî û li gorî wê bilîzî!

-Serokê min, eger min bizaniya wê bibe gol, min nedihişt.

Bi vê gotina wî keniya:

-Min dizanî tu bi min re ketî rikê. Te xwe amade nekiribû, ew jî asta tevlîbûna te nîşan dide.

Berê xwe da lîstikvanan:

-Hevalno, em sibe dîsa heman taxim bilîzin û teqez qezenc bikin! Divê em ji vê pirtir komînal bilîzin. Bizanin ka çawa derbê lê bixin û qezenc bikin! Bê serkeftin milîtanî nabe, vê ji bîr nekin!

Bi serkeftina taxima wî lîstik qediyabû. Temaşevanan hemûyan li çepikan dixist. Wî jî bi ken û kêfxweşî berê xwe da odeya xwe.

***

Bi dengê teqînê re şervan tev rabûn ser xwe. Ti kesî wate nedida teqînê. Di wê navê re dengê Haşim bilind bû:

-Hevalno, bila her kes li cihê xwe rûne. Tiştek nîne zarokan bi sîleh lîstiye.

Ji bo yên tevlî şer nebûyîn, ev guleya yekê bû.

Reş ketibû erdê. Şêst şervanên jin û mêr di nava kelecana dîtina çiyayan de bûn. Pir bi xwe bawer bûn. Xwe ji bo her tiştî amade didîtin. Hin cilên gerîla di destê wan de bûn, hina çenteyên xwe amade dikirin, hina jê li çekên xwe vedinêrî. Gelekan ji wan jî şûtikên xwe girê didan. Kêfa wan ji şûtikê re pir hatibû, lê her kesî nizaniya girê bide. Di wê navê re pirtûkên Apo yên hatîn piçûkkirin û saet hatin belavkirin. Piştî ku her kes amade bû, dest bi kişandina wêneyan kirin.

Haşim û Ebû Ehmed li pêşberî wan rawestiyabûn. Ebû Ehmed qirika xwe paqij kir:

-Hevalno, emê îro bi rê bikevin. Li ser rê û rêbazên meşê em dixwazin hin tiştan bêjin. Meşeke dirêj û hesas e! Divê hûn bizanin bi derketina ji vê hewşê re têkoşîna çekdarî dest pê kiriye. Em şêst heval in û wê gelek ji we cara yekê derbasî çiyê bibin. Heta ji me bê divê em li gorî rêbazan tevbigerin! Ji bo kemîn û şer jî amade bin. Eger di rê de hin ji we qut bibin di cihê xwe de bisekinin, da em bikarin we bibînin. Çi dibe bila bibe divê ti kes çeka xwe daneyne erdê! Emê di rê de alîkariya hev bikin. Hevalên tecrûbeya wan ya meşa şevê heyî divê alîkariya hevalên nû bikin. Manga û taxim hatine çêkirin û fermandar jî hatine diyarkirin.

Piştî axaftinê navên manga û fermandaran hatin xwendin. Yek jî bûbû fermandarê giştî.

Piştî xwendina lîsteyê, fermandarê giştî gazî Haşim kir:

-Hevalê Haşim, emê di kîjan rê de biçin?

-Du riyên me hene. Yek jê kin e di Pilêsiyê re derbas dibe. Gundê me ye. Em çek û pêwîstiyên din di wir re derbas dikin. Bîrîndaran jî em di wir re tînin. Lê em hevalan di riya dirêj re derbas dikin. Bi meşê çar saet heye. Ew rê di Giresorê Hiso re derbasî herêma Ereban ya Iraqê dibe. Ji ber ku Ereb in rejima Sûriyê bawer nake ku em di wir re derbas bibin. Ji ber wê ew rê saxlemtir e. Piştî ku em ji avê derbas bibin, emê biçin Çiyayê Bêxêr.

-Li wî milî kesê bibe alîkar heye?

-Li wî milî zilamên Sadiq Umer alîkariyê bi me re dikin.

Rûyê fermandar bifikar xuya dikir:

-Heta niha ez di avê de derbas nebûme, emê bi çi derbas bibin? Kelek in, çi ne?

-Ew jî weke kelekan in; em hin dep li ser kundên seyareyan girê didin û siwar dibin diçin. Lê di riya kin de em bi kayîkan diçin.

Reş ketibû erdê. Ji bo xwarinê li hewşa malê sifreyeke dirêj hatibû raxistin. Cifniyên goşt û birincê hatibûn rêzkirin û hin xwarinên bêgoşt û seleteyeke pir xweş jî danîbûn. Savara Cizîrê ya zerê zêrîn jî nehatibû jibîrkirin. Piştî xwarinê çaya dawî vexwarin.

Şeveke pir tarî bû. Mêrga Mîran amadekariya şandina karwanekî din yê şoreşgeran dikir. Her kesî rextê xwe girê dabû li benda çûnê bû. Her ku diçû kelecana meşê pirtir dibû. Şervînê nedixwest ew dîmenên dîrokî bên jibîrkirin, diviya li derekê bên tomarkirin. Jixwe ew bixwe jî rewşenbîrek bû û tiliyên wê yên zirav û nazik yên nivîsê bûn. Jineke pir lihevhatî û xwînşîrîn bû. Pora xwe ya xelek ji paş ve girê dabû. Çavin hingivî, rûyekî gewrê gurover û bejneke narîn li ser bû. Destek cilên ku bedewiya wê bixemilîne li ber bû. Deftera xwe vekir, weke kulîlka şilêrê serê xwe tewand û bilez dest bi nivîsa kelecan û kêfxweşiya hevalên xwe ya ber bi çiyayên azad ve kir. Li ser bergê lênûsa wê wêneyê Apo hatibû danîn. Di bin re jî gotina "Ji bo ku em hemû bi şeref û namûs tê de bijîn, ez dixwazim maleke mezin ava bikim. Abdulah OCALAN". hatibû nivîsîn. Li aliyê din yê bergê, ala ARGK'ê hatibê danîn. Li lênûsa xwe dinêrî û gotinên Apo yek bi yek bi yek dianîn bîra xwe.

Di wê navê re dengê Haşim hat:

-Bila heval rabin, emê bi rê bikevin!

Deriyê hewşê hat vekirin. Kamyoneke mezin li ber derî sekinîbû. Bêdeng û bilez siwar bûn, berê xwe dan ser riya diçe ber Ava Mezin. Şervîn û Rûken destên wan di teniştên wan de bûn, wisa bê liv û tevger rawestiyabûn. Mirov digot qey du peyker in danîne wir.

Rûkenê rondikên çavên xwe paqij kirin, destê xwe danî ser milê Şervînê:

-Hevala Şervîn, piştî çûna hevalan êdî sebra min nayê.

Çawa ku ji xew rabe, Şervîn ji nava xeyalên xwe şiyar bû:

-Hee.

Rûkenê xwe avêt stûyê wê:

-Ez wisa hest dikim ku ruhê min jî bi wan re çûye, lê dihizirim ka wê bedena min kengê biçe.

Çend rondik ji çavên Şervînê jî ketibûn ser hinakirên rûyê wê:

-Bawer bike ez jî di heman rewşê de me.

Wê jî rûyê Rûkenê maç kir û rondikên xwe paqij kirin:

-Hevala Rûken, êdî karê me yê vir qediya, em biçin.

***

Odeya Apo tê de dixebitî sar bû. Zincîra parkeyê xwe kişand, serê xwe pêça û rûnişt dest bi xwendina raporan kir. Bi sedan rapor li ser mase bûn. Hin ji wan hatibûn vekirin, hin jê hê girtî bûn. Rêbazeke wî bû; kesên li akademiyê perwerde didîtin, her hefte raporên xwe jê re dişandin. Di raporên xwe de diyar dikirin ka ji dersên wê hefteyê çi fêm kirine. Wî jî yek bi yek ew rapor dixwendin. Bi wî awayî têdigihîşt ka kî çiqasa pêş ketiye. Rapora dawiyê xwendibû dipêça. Dengê lêxistina derî hat. Parêzvan ket hundir:

-Serokê min, hevalên rêveber li dibistanê li benda we ne.

-Baş e, em biçin.

Li ber derî qeytanên sola xwe girê dan, berê xwe da dibistanê. Cesûr û rêveberên din li ber derî li ser piyan bûn. Silav da derbasî hundir bû. Cesûr dest bi dayîna agahiyên xebata akademiyê kir:

-Serokê min, dersên hevalan baş derbas dibin, li akademiyê pirsgirêkeke cidî nîne. Ji ber rewşa siyasî û êrîşên dewleta Tirk yên ser vir, derbarê jiyana Serokatiyê de em bifikar in. Pêşniyara me ku Serokatî li vir nesekine. Di vê dema dawiyê de sîxûr li van derdoran pir digerin. Hukumetê jî gotiye em nikarin we biparêzin.

Apo destê xwe danîbû ber erzeniya xwe, bi baldarî guhdarî dikir. Bi gotina Cesûr ya dawiyê re dest bi axaftinê kir:

-Em xwe diparêzin. Lê ji bo perwerdeyê divê em cihin nû bibînin. Vir ji bo me cihekî binirx e. Me xebata welat û dervayî welat jî li vir dida meşandin. Me li vir serkeftinên pir mezin bi dest xistin.

Berê xwe vegerand ser Cesûr:

-Hûn bi hevalên welat re axivîn?

-Rast e serokê min. Lê dixwazin li welat jî me dorpêçê bikin. Dijmin dixwaze ji du milan ve êrîşê hevalan bike. Hêzên me jî ji bo şerekî mezin xwe amade dikin, lê ji ber rewşa hewayê hê jî gelek riyên welat girtî ne.

-Rast e, wê îsal li welat şerekî mezin biqewime. Wê dijmin û hevakar li dijî me bibin yek. Emê sibê vê mijarê bi hevalan re jî nîqaş bikin.

Li saeta xwe nêrî:

-Baş e, hûn karê xwe bikin, ezê biçim bi hevalên ji welat hatin re biaxivim.

***

Zekî li derve li ber dîwarê dibistanê sekinîbû, li tevgera milîtanan temaşe dikir. Rizgar bilez çû cem:

-Hevalê Zekî, we bangî min kiribû.

-Rast e hevalê Rizgar, min bangî te kir. Êê, rewşa te, rewşa qawîşa te çawa ye, ti pirsgirêk hene?

Rizgarê ku di qawîşê de her roj di rojeva tekmîl û civînan de bû, çawa ku di har warî de ew qawîşê dide mşandin, bi wê pirsê re rûyê wî vebû û kêfxweşî ket ser lêvên wî:

-Belê hin pirsgirêkên rojane hene, lê ne pir cidî ne. Ji niha pêve ezê şiyar bim.

-Li qawîşan heval çi nîqaş dikin? Çi bala wan dikişîne? Çi dixwazin? Têkiliyên wan çawa ne? Bi hevalên jin re têkiliyên wan

çawa ne?

-Hin tiştên bala mirov dikişînin hene. Hin heval bi hev re zêde diaxivin, li nava qawîşan jî zêde digerin. Weke din hevala Sema hevalên jin pir diparêze. Wisa nîşan dide çawa ku em ji hevalên jin aciz bin û nexwazin pêş bikevin.

Di destekî wî de qedeha çayê bû, bi destê din jî bi simbêlên xwe dilîst:

-Tu hevalan baştir bişopîne û bizane ka kesek ji wan li ser rêveberiyê diaxive yan na. Ev gelek girîng e. Divê tu navê wan jî bidî me. Ji niha pêve divê tu xwe berpirsiyar bibînî û rola xwe bilîzî, nexwe wê ti kes li cem te neaxive.

Dixwest xwe bide pêş û çawa ku li Apo xwedî derdikeve xwe nîşan dida. Ew ne cara yekê bû ku sîxurtî bi milîtanan dida kirin. Li milekî jî dixwest bizane ka Rizgar çiqas bi xwe ve girê daya. Sehwa wî li ser çêbûbû, lê ji aliyekî ve jî Rizgar kêfxweş dibû ku yek weke Zekî pê re elaqedar dibe:

-Temam heval, ji niha pêve tiştek bibe, ezê we agahdar bikim.

Ew ber bi cihê xwe ve çû, Zekî jî bi dilxweşî ber bi qadê ve meşiya.

Sema jî pirtûkek di destê wê de bû ber bi aliyê wî ve dihat. Ji dema hatî ve pir zindî bûbû û pir jî bikelecan bû. Çavên wî li liv û tevgera wê bûn. Çawa ku kêfa wê ji awirên çavên wî re nehatibe. Berî ku nêzîk bibe, wî silav dayê:

-Merheba hevala Sema, tu çawa yî?

-Ez baş im, tu çawa yî heval?

-Em baş in spas dikim. Bawer dikim tu ji bo tekmîlê hatî, kerem bike?

-Li ser çalakiyên leşkerî me ji çapemeniyê re daxuyaniyek amade kiriye.

Daxuyanî ji destê wê girt hinekî lê nêrî. Bi rengê rûyê xwe nîşan

dida ku ne pir girîng e.

-Bila niha bimîne, ti eceleya wê nîne.

Sema şaş mabû, xwest vegere lê careke din berê xwe dayê:

-Gotibûn zû amade bikin. Danezana Hukumeta Botan-Behdînan jî amade ye. Ji bo wê jî gotibûn bila zû amade bibe.

-Dema pêwîst bû, emê we agahdar bikin. Lê dixwazim tişteke din bêjim; tu dizanî li eyaleta Mêrdînê pirsgirêk derketibûn. Tu jî ji wir hatî. Eger tu û hevalên din yên ji wir hatîn hûn xebata we ya wir di ber çavan re derbas bikin wê baş be.

Sema hêrs bûbû. Bi rûyekî ne xweş lê nêrî:

-Berî niha jî we gotibû. Tu jî dizanî derbarê mijarê de me rapor daye Serokatiyê. Dubarekirina wê tê çi wateyê? Eger li vir kêmayiyên me derketibin hûn dikarin ji me re bêjin!

Çawa ku serê wî li latekî ketibe, bi xwe ve çû:

-Heval, ya min şiyariyeke hevaltiyê ye!

Sema jê dûr ket berê xwe da qawîşa xwe. Li ber derî ew û Şervîn li hev rast hatin. Kêfxweşî li hev dan, lê Şervînê acizbûna li ser rûyê wê ferq kir:

-Çima wisa rûyê te ne xweş e, tiştek bûye?

-Na heval tiştek nîne. Hevalê Zekî careke din pratîka me li rûyê me da.

-Pêwîst nake tu xemgîn bibî, dema Serok hat mijarê jê re bêje. Ez bawer dikim Serokatî bibihîze wê nerehet bibe. Gotina Serokatiyê ya “Li vir ne kêlî dîrok, ne kes civak tê dahûrandin” ji bo me rênîşan û perspektîf e.

-Hevala Şervîn, ez ji rexneyan aciz nabim, lê çawa ku ev heval li şaşîtiyeke min bigere û bixwaze ez bikevim rojevê.

Şervîn jî hinekî hêrs bûbû:

-Ev nêzîkatî nayê qebûlkirin û divê em çavkaniya vê hişmendiyê nas bikin. Lê ku em jin bibin yek, tişteke ku neyê çareserkirin

namîne.

Sema keniya, kêfa wê ji wê gotinê re hatibû. Hinekî li dora xwe nêrî. Di dilê xwe de got, dinyaya vir çiqas mezin e, ez her roj tiştekî nû dibînim. Di wê navê re çend milîtanên jin li dora wan kom bûn. Sema danezana Hukumeta Botan-Behdînan ji wan re xwend. Bi rakirina serê xwe re çavên wê bi Apo ketin. Ber bi qadê ve dihat.

***

Nava rojê bû. Apo li nîvê qadê sekinîbû, li tevgera akademiyê temaşe dikir. Wê rojê ders tinebû. Qad û derdorên wê weke moristanê bûn. Hem çûna ji kampê hebû, hem hatin. Yên desvala jî hebûn, yên bisîleh jî. Hina nîqaş dikir, hina çekên xwe paqij dikirin. Li qawîşan tevan hem paqijiya hudir, hem ya cilan dihat kirin. Kişandina avê û anîna daran jî hatibû parvekirin. Yên xwarin çêdikirin wê rojê karê wan girantir bûbû. Çend milîtanan dibistan paqij dikir, çend kesan jî pirtûk di refan de serrast dikirin. Li depoya cilan jî hem paqijî dihat kirin, hem cilûbergên jin û mêran ji hev dihatin cudakirin. Hina amadekariya çûna Şamê dikir, hin li ser riya Berliyasê bûn. Çend kes jî bi xwendin û nivîsê ve mijûl bûn. Karê nobetê jî birêkûpêk dimeşiya; yên diçûn nobetê û yên dihatin jî bala wî dikişandin.

Çavên wî çûn ser pesarê tenşita qadê. Cesûr çeka doçka nîşanî şervanan dikir. Doçka di nava tozê de mabû. Destpêkê nîşanî wan dida ka wê çawa were vekirin û paqijkirin. Çawa ku li ser lênûsekê binivîse wisa bi hêsanî parçeyên wê vedikirin. Rêbaza perwerdeya wî bala Apo dikişand. Ji bo rûniştinê kursiyek xwest. Heta qasekî hosteyiya Cesûr şopand. Piştî paqijkirinê parçeyên wê li hev dan û li ser kursiyê wê rûnişt. Şervanên ciwan bi mereqeke mezin lê dinêrîn. Kursî wisa dizîvirand û wisa li hev dihatin, her ciwanî ji xwe re digot, xwezî ez jî di çekê de wiha serdest bûma. Çawa ku li ser dika

şanoyê pêşkêşiyê bike li ser kursiyê doçkayê wisa xuya dikir. Apo hê bi kêfxweşî lê temaşe dikir. Di dilê xwe de got, kesê şerê gerîlatiyê bike, divê wiha be. Her ku Cesûr li dora doçkayê dizîrî ciwan jî ji kêfa pê re dizîvirîn û pirs li ser pirsan jê dikirin:

-Hevalê Cesûr, avêtina guleyan jî nîşanî me bide!

Cesûr keniya, çawa ku bêje ezê guleyan ji kû bînim:

-Eger berpirsê rojê destûrê bide we, em dikarin çend guleyan jî biavêjin.

Weke tîra ji devê kevan bifilite, du ciwanan berê xwe da cihê rêveberiyê. Piştî çend kêliyan bêhnbirhayî hatin cihê xwe. Ji ber ku destûr girtibûn, pir bikelecan bûn:

-Hevalê Cesûr, rêveberiyê got hûn dikarin çend guleyan biavêjin.

-Temam. Bila her kes amade be ezê dest pê bikim.

Hina xwe tewandibû li tiliya wî temaşe dikir, hina li cihê nîşanê. Gule da ber û tiliya xwe avêt tetik. Dengê doçkayê weke tilîliyan bilind bû û şirqênî ji latên hember hat. Newayê wê li girên derdor belav bû. Bi teqînê re dengê çepikan jî bilind bû. Lê dilê ciwanan bi çepikan rehet nedibû, li dora doçkayê dizîvirîn û hêlehêla wan bû. Bi wî dengê bikelecan re Apo jî ber bi wan ve çû. Ji ber kelecanê jixwe haya wan jê tinebû ku li pişt wan sekinye. Bi dîtina hatina wî re Cesûr ji ser kursiyê doçkayê hat xwarê. Apo jî bi kêf û kelecana ciwanan pir kêfxweş bûbû. Biken berê xwe da Cesûr:

-Te ev ciwan jî li dora xwe kom kirine.

-Serokê min, ciwan ji macerayê hes dikin. Dîtin ez bi çekê ve mijûl dibim li dora min kom bûn.

Berê xwe vegerand ser ciwanan:

-Divê hûn her tim rast bin, li xeta rêxsitinê û nirxên şoreşê xwedî derkevin. Wê rojê min hûn di pencereyê re dîtin. We çêlîka mirîşkê ya ketî nava mazotê şûşt û bêhna xweş lê kir. Ji ber ku dayîka wê ew qebûl nekir, mir. Li heywanekê binêrin, dema ji xwezaya xwe

derdikeve dayîka wê qebûl nake. Hûn bi hezaran şaşîtiyan dikin, ez dîsa we qebûl dikim.

***

Wê şevê dinya pir tarî bû û reqereqa ewran bû. Carna jê birûskan vedida. Çend kêlî derbas nebûn baranê jî lê kir. Haşim li ber Ava Mezin sekinîbû, berê xwe dabû aliyê din. Çawa ku bixwazin xwe bi ser hev re biqevêzin, pêlên Dîcle bilind dibûn û dengê mişemişa wê heta Dêrikê diçû. Diyar bû ku wê şevê mala hina xirab kiriye, canên bêguneh li ber xwe anîne. Çi biketa pêşiyê di nava pêlên xwe de dadiqurtandin û bi xwe re dianîn. Ava wê xwe bi axa Kurdistanê şêlo kiribû. Heybeta wê bi qasî bi qasî çiyayê Cudî û pêlên wê weke bedewiya kurdistanê çavbir bûn. Ji heybeta wê her kesî newêriya li nêzîk raweste. Lê Haşim zarokê Botanê bû, çawa ku li ser kaniyekê be, guregur û himehima wê ne li xema wî bû. Awirên xwe kiribûn nava pêlên wê, jê re digot, çemê Firatê jî were ser te, ezê îşev van hevalan derbas bikim.

Mihyedîn, Ehmed û Zinar hatin bîra wî. Axîneke kûr kişand. Pir dixwest çend rondikan birijîne û tevî pêlên wê li ser axa xwe bigerîne, lê dema wî tinebû. Şeva şehîdbûna wan her sê pakrewanan weke wê kêliyê li bîrê bû. 4ê, meha dozdehan ya 1989an bû û şeveke pir sar bû. Wê dîsa komek ji bîst û şeş şervanan derbasî çiyê bibûna. Leşkerên Tirk li wan reşandibûn û şerekî pir dijwar derketibû. Şer heta serê sibê dewam kiribû. Haşim wê saetê li Sermila Endîwerê guhdarî dengê çekan kiribû. Çawa ku li ser agir be wisa lê hatibû, lê nizaniya ka wê çawa alîkariyê bide wan. Mihyedîn, Ehmed û Zinar di nava wî şerê dijwar de bûn. Wê şevê agirê şoreşê dilê gelê Dêrikê ji nêz ve şewitandibû. Di bîra wan de, cihê xwe çêkiribû. Yên şiyar yên razayî jî şiyar kiribûn. Gelekan ji wan dizanî ku her sê

qehremanên wan jî di wan kêliyan de bi dijmin re şer dikin. Pir ji wan hes dikirin. Berxwedan û qehremaniya wan dizanîn, lê hêza li hemberî wan artêşek bû û tank û topên wan hebûn. Yên qehremanên wan klaşînkof tenê bûn. Yek ji wan qehremanan Mihyedîn, mamoste bû. Gelek şagirtên wî tevlî şoreşê bûbûn.

Ji ber vê qehremaniya wan wê pişt re stirana "Ava Mezin" li ser wan bihata gotin. Gotinên stranê yên bûyîn dîrok ketin ser lêvên wî "Min dî îro Ava Mezin sor bi xwîn e, min dî îro Ava Mezin kul û kîn e..." Dengê durişma "Bijî Serok Apo" ya her sê qehremanan ya di nefesa xwe ya dawiyê de, di guhên wî de olan didan. Didanên xwe bi ser hev ve birin anîn: "Te her sê heval ji me standin, lê ez careke din destûrê nadim te." Wê şevê heta serê sibê gelê Dêrikê ranezabû û bihîstina şehîdbûna her sê zaroyên wan bandoreke mezin li wan kiribû. Berxwedana her sê şehîdan wê ji bo wan bibûya efsane. Haşim li ber peravên wê, kêlî bi kêlî ew roj dianîn bîra xwe.

Çawa ku mirov tiliyên xwe dirêjî çavên yekî bike, wisa bi awirên dijwar li çem dinêrî. Ji hêrsa çavên wî sor bûbûn. Di dilê xwe de got, te sê qehreman ji me stantin. Tu di Kurdistanê de rêwîtiyê dikî û mirovên me yên herî bedew bi xwe re dibî.

Dem derbas dibû. Bi şûn ve vegeriya berê xwe da cihê koman. Şervan kom bi kom û hinekî ji hev dûr li binê latê rûniştibûn, li benda wî bûn. Ebû Ehmed jî li cem wan rûniştibû. Ku çav bi reşê Haşim ket rabû ser xwe ber ve çû:

-Hevalê Haşim, ma em dikarin hevalan derbas bikin? Çawa ku tofan rabûbe îşev wisa lê hatiye. Mirov dibêje qey wê qiyamet rabe.

-Ebû Ehmed, di şevên ji vê xirabtir de jî me heval derbas kirine. Dema Manî bi kêştiyê diçe Hindistanê di rê de bahoz radibe. Hindik dimîne kêştî binav bibe. Kaptan jê re dibêje, tu çawa wiha rehet î?

Destê xwe danî ser milê wî:

Tu dizanî çi bersivê didiyê? Dibêje, karê min li Hindistanê heye û

wê ev kêştî biçe Hindistanê. Rast e, av pir rabûye, lê emê bikarin bi awayekî derbas bibin. Eger em botê pir bi jor ve bibin, cihê ku em dixwazin emê li wir rawestin. Ezê botê amade bikim tu jî hevalan kom bi kom bîne. Bila bi ser deh kesan nekevin.

Çawa ku pir bi serê Ebû Ehmed neketibe, pişta stûyê xwe dixwerand.

-Tu baştir zanî. Tu û Ava Mezin ji hev fêm dikin. Baweiya min bi te tê. Lê ez dibêjim koma em siwar bikin bila nîvî jin, nîvî mêr bin.

-Ji her taximê pênc hevalan bîne. Em cara yekê binêrin ka emê li kû xwe bigihînin wî milî. Lê heta ji te bê bila hevalên rê nas dikin di koma yekê de bin.

Di nava çend deqîqeyan de, bot hatibû amadekirin û deh kes li ber avê sekinîbûn çenteyên xwe datanîn. Komên din jî hêdî hêdî ber bi avê ve dihatin. Haşim bi destekî benê botê girtibû, di destê din bêr bû:

-Hevalno, divê mirov ji avê netirse. Bi hezaran heval di vir re derbas bûne.

Piştî ku her kes siwar bû, lingên xwe ji erdê birîn. Di nava çend kêliyan de bot weke guleyekê berbijêr bû. Deng ji ti kesî nedihat, her kesî bêhna xwe girtibû, di kelecana derbasbûnê de bûn. Lê hin jê, -bi taybetî yên avjeniyê nizanin- pir ditirsiyan. Haşim bi her du destan bi bêrê girtibû li nava wan pêlên biheybet dida. Ew û Ava Mezin ketibûn nava şerekî pir dijwar, lê Haşim pişta wê tewandibû û nêzîkî bejê bûbûn. Li milê din çar kes li benda wan bûn. Bot li ber berekî sekinand, jê peya bû. Yên din jî yek bi yek peya bûn. Li aliyekî kêfxweş bûbûn ku weke Nuh ji tofanê rizgar bûne, li aliyekî jî li ser hevalên xwe dihizirîn.

Piştî ku tev derbas bûn, çenteyên xwe dan pişta xwe û bêdeng berê xwe dan Çiyayê Bêxêr. Her ku diçû baran dijwartir dibû. Derziya ziwa li ser ti kesî nemabû. Kom di nava zeviyeke şov de

dimeşiya. Erd wisa bûbû herî solên gelekan ji piyên wan diketin.

Wê şeva reş û tarî û li ber wê baranê -çawa ku tu ji devê lûlika misîn berdî wisa dibariya- ew heşt saet bûn dimeşiyan. Haşim li pêşiyê bû. Car bi car vedigiriya dawiya rêzê, careke din diçû pêş. Bi wî awayî meşiyan heta gihîştin Çiyayê bêxêr, ciyê gerîla lê dimînin.

Roja din serê sibê Haşim û Ebû Ehmed piştî ku taşiya xwe xwarin xatirê xwe xwestin, ketin ser riya Dêrikê.

***

Bayê Sibatoka Dînik ji her alî ve li girên deroda akademiyê dixist. Ji ber barana zêde riya dihat akademiyê xirab bûbû. Êdî seyareyan nikarî derbas bibin. Ji ber wê ji bilî erkdarên rojê, yên din tev ji bo kişandina erzaq û pêwîstiyên din derketibûn derveyî akademiyê. Selman pir westiyabû, hilehil bi ser dilê wî ketibû. Li ser devê rê barê xwe danî, li serê rûnişt. Makîneyeke resman di destê Sema de bû ber ve diçû.

-Hevalê Selman wisa bisekine, ezê wêneyekî te bikişînim!

Selman dengê xwe nekir lê rabû ser xwe:

-Hevala Sema, her roj em bi hev re ne tu nakişînî, tu dixwazî di vî halî de bikişînî. Dibêjin, agir bi riha yekî ketibû, yê din digot, ezê firîkên xwe li ber biqelînim. Ya te jî ew e.

Ji bo wêneyan du kesên din jî xwe dabûn tenişta Selman, bi zorê xwe dikenandin. Di wê navê re Şervîn hat cem wan:

-Hevala Sema, îro akademiya me weke moristanan dixebite. Erkdarê rojê got piştî kişandina erzaq banyo serbest e.

-Pir baş e, hema em bigihîjin wir, emê biçin.

Barê Sema jî giran bû, her kes jê derbas bûbû, bi zorê xwe gihand wan. Şervîn jî her carê li benda wê dima. Her du tenê mabûn li

dawiyê. Di wê sermayê de di nava xwêdanê de mabûn. Bi wê kêferatê xwe gihandin akademiyê. Digel ku ewqas westiyabûn jî barên xwe danîn û bi bayê bezê ber bi cihê şûştinê ve çûn. Sê kes li ber varêla avê ya li ser agir sekinînbûn agir xweş dikirin. Dû bi ser wan ketibû. Ji pifkirinê çavên wan sor, firnikên pozên wan tijî tenî bûbûn. Dema Sema dît ku wisa perîşan bûne çû alîkariya wan.

Tiqetitiqa kenê Şervînê bû:

-Hevala Sema te rûyê xwe dîtiye? Berê tu gewr bûyî, niha tu reş î.

Sema xwest neynikê ji berîka xwe derîne, li destên xwe yên tenî nêrî:

-Ka neynika te nîne, ez li rûyê xwe yê xweşik binêrim.

Şervîn hem dikeniya, hem dar dikişnadin ber êgir.

-Hevala Şervîn, min xwest agir bikim. Her tu wisa bi min dikenî, were tu jî xwe reş bike.

Çar kesan bi bîdonan ava germ dikişand, yên din cil dişûştin û bi hev re diguvaştin.

***

Li akademiyê roja karê piratîk bû, her kes di tevgerê de bû. Pênc milîtanên ji çiyayan hatîn li odeya rêveberiyê li pêşberî Apo rûniştibûn. Dengê wî weke pêlên avê ji odeyê bilind dibû. Parêzvanan hem nobet digirt, hem guhdarî axaftina wî dikirin. Her pêncan xwe kiribû lepek; hem guhdarî dikirin, hem ji ber pêkneanîna erkên xwe xemgîn xuya dikirin.

-Li hemberî kêmayiyên derketîn çima hûn bêdeng man? Hûn dizanin, li Kurdistanê komploya feodalî xetek e û dijmin wê bihêz dike! Li hemberî wê xetê helwesta we çi bû? Hûn dizanin, hin hevalên me yên ji zindanê derketîn, li vir mafê xwe yê her tiştî didîtin. Mafê pêlîstina xeta rêxistinê jî. Wisa dizanîn ku bi mayîna

çend salên li zindanê wê bikarin bi nirxên gel û Serokatiyê bilîzin. Hûn xeta zindanê ya Kemal û Mezlum jî dizanin. Xeta berxwedanê û fedekariya mezin bû. Wan her tişta xwe ji bo avabûna rêxistinê da. Lê yên weke Şener dixwestin rêxistin mafê her tiştî bide wan!

Piştî vê axaftinê xwest guhdarî wan bike:

-Seîd, li welat tu di nava pratîkeke giran de mayî, li ser pêşniyara te me tu kişandî vir. Em li vir ji we re dibêjin wê di piratîkê de gelek tişt bên pêşberî we û hûn li ser wî bingehî soz didin. Lê dema hûn zehmetiyê dibînin, hûn hawara xwe digihînin me?

Yên li pêşber kûr kûr dihizirîn. Karên kirîn û kêmayiyên derketîn tev di ber çavên xwe re derbas dikirin.

Pirs li ser pirsan ji wan dikirin:

-Li hemberî tesfiyê we çi kir? We xeta partiyê çawa parast? Tiştên we kêm hiştîn çi ne?

Çawa ku ji serê zinarekê ketibe wisa li Seîd hatibû. Lê diviya tiştna bêje:

-Serokê min, ya min kirî xweparastin bû.

Bi vê gotinê hêrs bû:

-Hûn dizanin, di dîroka me de gelek kesayetên xwestîn tevgerê bikin binê venêrîna xwe derketine, lê PKK nas nekirine. Ji ber wê xwestine bi nirxên heyî bilîzin! Divê hûn li ser lewaziyên xwe bisekinin. Divê hûn hevalên xwe û nirxên şoreşê biparêzin. Berî her tiştî divê hûn bizanin xwe biparêzin. Hûn dibînin li vir ka em çawa kadroyan amade dikin û dişînin qadên piratîkê. Lê li wir kesayetên komploger wan kadroyan tine dikin!

Rayên hêrsê yên di eniya wî de stûr bûyîn ji dûr ve xuya dikirin û dengê wî jî pir bihêrs derdiket. Ji cihê xwe rabû derket derve. Bi derketina wî re rewşa wan bi tevayî hat guhertin. Çawa ku çar kevir bin di odeyê de. Girêk li ser girêkan diketin gewriyên wan. Geh li hev dinêriyan, geh li erdê. Çavên wan tijî bûbûn. Dixwestin bigirîn,

lê giriyê wan jî nedihat. Seîd di dilê xwe de got, divê ez careke din bi vê kesayeta belengaz û bêpergal dernekevim pêşberî Serok.

***

Ebû Ehmed û Haşim ber bi mala Fatima Edû ve diçûn. Berî ku li derî bidin, bê ku bide hestkirin Haşim derdor di ber çavên xwe re derbas kir. Bi lêxistina derî re, jineke bejinkin, bi çarika cizîrî û rûsora gevez derî vekir. Bi vebûna derî re rûyê wê geş bû:

-Hûn bi xêr hatine, kerem bikin.

Bilez ketin hundir. Bi ketina hundir re jineke temenê wê li derdora çilî, her du bi germî himbêz kirin. Yeka bejinbilinda esmer bû. Di ser fîstanê xwe de jî xiftanekî koçerî li xwe kiribû. Haşim bi rêzdarî û bi rûyekî xweş li hember sekinîbû:

-Dayîka Harûn, tu jî li vir î, tu çawa yî? Berî demekê me Dilbirîn derbas kir. Tiştên xwe hiştibûn we girtin? Ji bo te nameyek jî nivîsîbû?

Piştî ku wisa li ser piyan pirsa hev kirin, tev de rûniştin.

-Me name jî, tiştên din jî girtin. Dilbirîna min di riya şeref û namûsê de çûye. Harûnê min jî di wê rê de çû. Zarokên me hemû jî biçin em nabêjin neçin. Ev doza me ye û wê zarokên me jî tevli bibin. Harûn jî nameyek rêkiriye. Dibêje ez li Heftenînê me. Wê derbasî Cûdî bibe.

Li ser makîneya dirûtinê ya di koşeyê odeyê de tijî paç û qumaşê xakî bûn. Fatima Edû ji hev cuda dikirin:

-Hevalê Haşim, we not dest cil ji min xwestibûn, lê bi makineyeke tenê ev kar nabe. Em qumaş parçe parçe tînin. Tu dizanî Enwerkoyê sîxur li dora mala me timî digere. Min heftê û pênc dest dirûtine. Çend rojên din tu werî ezê yên din jî amade bikim. Ji bo neyên girtin yên dirûtî me li malan belav kirine.

-Yadê, destên we sax bin. Karê hûn dikin zehmet e, lê van rojan pêwîstî zêde ye.

-Kurê min, ku bê xwestin emê bi şev û roj bixebitin. Divê keda me jî di vê şoreşê de hebe.

Haşim li berîkên xwe vedinêriya ka tiştin ji bîr kirine yan na:

-Yadê emê biçin. Min belavokên leşkerî anîne, wan belav bikin. Ezê nîvî bidim te, nîvê din bidim Dayîka Harûn.

Xatir xwestin, ber bi navendê ve çûn...

***

Li adademiyê li odeya rêveberiyê Zekî li ser kursiyê li pişt mase rûniştibû tekmîl digirtin. Li gorî agahiyên tekmîlan li ser lênûsa li ser mase hin tişt dinivîsîn. Piştî tekmîlê diviya dersên bên dayîn nirxandin li ser wan bihatan kirin:

-Emê sibê dest bi dîroka Kurdistanê bikin, divê heval tev di dersê de amade bin.

Ji bo endamên rêveberî yên din jî fermana xwe ji bîr nekir:

-Hûn dikarin biçin ser karê xwe, hinekî karê min heye.

Piştî derketina yên din, gazî Rizgar kir. Bi gazîkirinê re ket hundir. Kêfa wî pir dihat ku Zekî pê re biaxive. Her du destên xwe bi şûn ve danîbûn ser hev, di nava odeyê de diçû dihat. Bi liv û tevgerên xwe dîmenekî generalan dida xwe. Di axaftinên xwe de jî her tim dixwest xwe wisa nîşan bide. Lê ne her general, weke generalekî serkeftî. Yê nas nekiribûya, wê bigota qey weke Napolyon her roj welatekî rizgar dike. Di heman demê de hem kesên li derdora xwe bi gotinên xwe yên piçûkxistinê dişkandin, hem bi awirên çavên xwe dixwest tirsê li derdora xwe belav bike. Her kesî xwe jê vediçinî. Jixwe ti kesî newêriya li cem behsa kêmayiyeke wî bike, lê ku ne li cem bûna jî bifikar rexne lê dikirin. Ew jî kesên her tişt didan ber

çavên xwe dikarîn rexne bikin:

-Heval, berî vê jî em axivîbûn; di qawîşan de nîqaş pêş dikevin. Çi dibe, çi nabe divê tu min agahdar bikî. Ji bo ku ti kes ji xeta rêxistinê dernekeve, divê haya min ji her tiştî hebe. Gelek heval nû ne, partiyê nas nakin.

-Tu qet mereq neke; piçûk, mezin her tişta dibe ez dişopînim, tiştek ji ber çavê min naçe.

-Berê jî me ev ji te xwestibû.

-Temam heval, hin kêmayiyên min derketin, ezê li ser wan rawestim.

-Temam, tu dikarî biçî ser karê xwe.

Derket yekser berê xwe da qawîşa xwe. Dihizirî ka wê çawa xwe bike çavên hevalên xwe. Êvarê her kes hatibû qawîşê. Tepsiya çayê di destê wî de bû çay li hevalên xwe belav dikir. Vê tevgera wî bala Mezlum kişandibû, devê xwe bir ber guhê Selman:

-Ez dibînim hevalê Rizgar tevlî jiyanê dibe. Xuya ye li ser kêmayiyên xwe radiweste. Gelo dibe ku em zêde bi ser de çûbin?

Selman jî weke pisporekî di bin çavên xwe de her gotin û tevgera wî dişopand:

-Ez dibêjim dixwaze xwe bike çavên me. Ma tu nabînî roja rêveberî bangî wî dike wiha xizmetê dike!

Di wê navê re derê qawîşê vebû. Zekî ket hundir. Ji rûyê wî yê reşqemer, simaq dibarî. Her kes ji ber ve rabû ser xwe. Li nîvê qawîşê rûnişt. Du betanî jê re anîn pişta xwe da wan. Berî ku tiştekî bêje, yên li wir tev di ber çavên xwe re derbas kirin. Bala Mezlum li ser tevgerên wî bû. Careke din devê xwe bir ber guhê Selman:

-Hevalê Zekî gelek jixwerazî ye. Ev çawa li welat bûye fermandar?

Selman serê xwe hejand:

-Wisa bawer dike ku bi avêtina çend guleyan mirov mezin dibe.

Ma tu nabînî, Serok her tim wî rexne dike. Li cem Serokatiyê bêdeng dibe, lê dema tenê dimîne weke xwe tevdigere. Di baweriya min de, derdekî wî yê mezinkirina şoreşê û azadiya Kurdistanê nîne. Sirf dixweze xwe mezin nîşan bide. Dema tê vir xwe berdevkê Serok dibîne.

Hem çay vedixwar, hem diaxivî. Piştî axaftinê xwest nêrîna yên li qawîşê bigire. Axaftina wî di serê Mezlum de hin guman çêkiribûn. Ji bo axaftinê destê xwe bilind kir:

-Ji bo nûkirina kesayetê û israra di serkeftinê de, dahurîna doh ya Serokatiyê li ser kesayetê kirî gelek kûr bû.

Ka çawa axaftina Zekî bala Mezlum kişandibû, axaftina Mezlum jî bala wî kişandibû:

-Em çi jî bikin wê Serok ji me ne razî be, ev tiştekî xwezayî ye. Lewre ew serok e.

Mezlum vê carê dengê xwe bilindtir kir:

-Ne ku Serok ne razî ye. Tiştên em dikin divê em bes nebînin. Divê em bikarin ji wan pirtir bikin û xwe pêş bixin.

Ev axaftina Mezlum pir li xweşê wî neçûbû. Heta ji tevgera wî xuya dikir ku hêrs jî bûye. Wisa bêdeng rabû ser xwe berê xwe da derî. Parêzvanên wî jî ketin dû derketin. Selman destê xwe li milê Mezlum xist:

-Te gotinên wî bihîstin, çawa ku welat rizgar kiribe diaxive. Divê mirov li ser van gotinên wî baş bihizire.

Mezlum bersiva wî neda, hê li ser gotin û tevgerên Zekî dihizirî.

Roja din di tekmîlan de Zekî bihêrs dest axaftinê kir:

-Hin heval di qanûnên leşkerî de kêmayiyan dikin, divê em wan ceza bikin.

Sara li tenişta wî bû, bi dengekî nizim jê re got, tu nav bidî wê baş be. Zekî awirên çavên xwe tûj kirin:

-Weke hevalê Mezlum. Wê rojê di erka xwe yê rojê de kêmayî

kiribû, di nobeta de jî razabû. Pêşniyara min çend rojan ji tiştên kêfî bê qutkirin. (çay, cigare)

Piştî axaftina wî Sara jî yekser nêrîna xwe got:

-Ez tevlî dibim. Lewre ewlekarî karê herî girîng e. Eger bêceza bimîne wê sûc bê dubarekirin. Mijar ne hevalê Mezlum e û divê neyê fêmkirin ku hevalê Mezlum pirsgirêk e. Lê ez tevlî hevalê Zekî nabim ku nirxandina xwe ewqas bihêrs dike. Kesên tevlî vê nêrînê dibin bila destê xwe hildin!

Pêşniyar bi tevlîbûna her kesî hat qebûlkirin. Tekmîla rojê bi wî awayî qediya.

Li dibistanê wê Zekî agahiyên wê rojê yên derbarê akademiyê de ji şervana re ragihandana:

-Me tekmîlên hevalan nirxandin. Çawa ku hûn dizanin em di rewşeke gelek hesas de ne. Dewreya me ber bi dawiyê ve diçe. Di qawîşan de hin nîqaşên ne xweş tên kirin, divê ew heval bên şiyarkirin. Doh hevalê Mezlum di nobeta xwe de razaye. Ji ber wê hefteyekê ji tiştên kêfî hatiye qutkirin. Bila li vir jî rexnedana xwe bide.

Piştî ku Mezlum rexnedana xwe da, Zekî dîsa dest bi axaftinê kir:

-Eger heval tiştekî nebêjin em tekmîla xwe biqedînin. Lê bila heval îşev di qawîşan de li ser rewşa malabata Kurd suhbetê bikin! Heval dikarin nêrîn û pêşniyarên xwe bikin.

Piştî tekmîlê her kes derket. Mezlum tenê li hundir mabû. Serê xwe xistibû ber xwe dihizirî. Berçavka xwe ji ber çavên xwe rakir, her du destên xwe danîn ser çavên xwe: "Min çawa li cihekî weke akademiyê, li qada Serokatiyê ev kêmayî kir". Gotina Apo anîn bîra xwe: “Mirî tenê kêmayiyan nakin” Pir xemgîn bûbû, lê yên bi vê xemgîniya wî kêfxweş bûyîn jî hebûn. Li nava qadê Zekî weke her car destên xwe bi şûn ve danîbûn ser hev, dimeşiya. Û bi dengekî bilind dikeniya.

***

Li akademiyê tîrêjên rojê xwe di ser girên derdorê re berdabûn nava qadê. Apo li ser kursiyekî ji daran rûniştibû. Li pêşberî wî jî du kesên bicilûbergên sîvîl rawestiyabûn. Yek bitemen, yê din li derdora bîst û pêncan bû. Milîtanekî du kursî anîn ew jî li pêşberî wî rûniştin. Ji bo ku bizane ka berê dîtine yan na, çavên xwe hinekî kuskusandin:

-Hûn ji zû ve li Libya dixebitin?

Yê ciwan ku dît hevalê wî dengê xwe nake, wî bersiv da:

-Navê min Siwar e. Ez ji Kobanê me. Nêzî şeş salî ye li wir im.

Pişt re yê bitemen jî xwe da naskirin.

-Navê min Îbrahîm e. Ez ji Hesekê me. Nêzî çar salî ye ez li wir im. Hem ji bo debara malbatê kar dikim, hem li ser dîroka partiyê perwerdeyê didim.

Bi heskirin li wan dinêrî:

-Li Lîbya, firsendeke mezin ketiye destê me. Serokê wir jî dostê me ye. Divê em vê firsendê ji destê xwe bernedin. Divê em Kurdên li wir perwerde û birêxistin bikin. Ev çend roj in hûn li vir in. Divê perwerde û tecrûbeya we ji vir girtî têra pêşxistina xebata we bike.

Du saet bûn bi wan re diaxivî. Rûyê Siwar ne pir xweş bû:

-Serokê min, berî vê jî min rapor şandibû. Ez dixwazim li vir nêzî we bim.

-Heval dibe, lê li wir jî xebata me ye!

-Belê serokê min. Lê ez dibêjim wê mayîna min li vir baştir be.

-Dibe. Lê biçe karê xwe teslîmî hevalên wir bike, paşê tu dikarî werî.

Rûyê Siwar geş bûbû. Apo ji pakêta li ser mase du rozet derxistin, her yek da yekî. Yek ya Mazlum Dogan, ya din ya ERNKê bû. Her du jî pir kêfxweş bûbûn. Ku perên wan hebûna wê bifiriyan. Piştî ku

xatirê xwe xwestin çûn, wî jî berê xwe da dibistanê. Di hundir de Seîd û her çar hevalên xwe rûniştibûn. Hê xwe ji wê rewşa berî hingê rizgar nekiribûn û nizaniyan ka vê carê ji bo çi gazî wan kiriye. Bi ketina hundir re tev bi hev re rabûn ser xwe. Li ser kursiyê li pişt mase rûnişt:

-Kerem bikin rûnin.

Bi dîtina wî re weke yên din rûyê Seîd jî vebûbû û bi ser xwe ve hatibû. Her pênc jî di kelecaneke mezin de bûn. Seîd di dilê xwe de got, min bawer nedikir serok careke din li rûyê me binêre.

Li wan nêrî û berken bû:

-Hevalê Seîd, berî ku derbasî xebatê bibî biçe bijîşk. Piştî tedawiya xwe derbasî qada Efrînê bibe. Tu li Amanosan jî mayî, we li wir zehmetî kişand.

-Serokê min, me nikarî pêwîstiyên perwerdeya me li vir dîtî, pêk bînin.

-Eger hûn xwe mezin nekin û perwerde nekin, li hemberî xetên şaş hûnê nikaribin xwe biparêzin. We li wir dît; bi egera sîxûriyê gelek heval hatine kuştin.

Bi wê gotina xwe re rabû ser xwe, xemgîniyeke mezin di dilê wî de çêbûbû. Di pencereyê re li milîtanên li qadê nêrî. Hê di hişê wî de ew gerîlayên hatîn kuştin hebûn. Hinekî serê xwe hejand, berê xwe vegerand ser wan:

-Ew heval, ne bi şêwazê PKK'ê hatine derizandin. Yên ew darizandîn, niyeta wan pak e, lê ferq nekirine ku ew şêwazê işkenceyê derveyî insaniyetê û xeta rêxistinê ye. Û bê agahiya rêxistinê nikarin darizandineke wisa bikin.

Careke din yek bi yek di ber çavên xwe re derbas kirin, di dilê xwe de got, emê van hevalan çawa biparêzin:

-Berî hûn biçin ez timî dibêjim hûn diçin welat û dikevin nava guran, komploya feodal nahêle hûn tiştekî bikin. Baş e te xwe

parastiye? Emê li ser wan kesayetan bisekinin û hesab ji wan bixwazin. Ev partiya hesabdayîn û hesabxwestinê ye! Baweriya min bi we heye ku piştî niha hûnê layîqî gel bin. Divê hûn milîtanên pêşneg bin û hest û têkiliyên xwe li gorî şerê li Kurdistanê birêxistin bikin...

Hinekî sekinî. Derê şûşeya avê vekir bi ser xwe de kir:

-Hevalê Xalid, tu jî biçe Dêrikê. Tu dizanî, Dêrik ji bo me derî ye.

Hinekî li rûyê wî nêrî, xemgînî û bêçareserî li ser rûyê wî xuya dikir. Xwest hinekî mijarê veke:

-Haa, tu jî ji Amanosan hatî. Ew der çawa bû?

Diyar bû ku Xalid bi Amanosan ve pir girêdayî ye:

-Serokê min gelek xweş bû. Çiyayên wê asê ne.

Rabû ser xwe li derdora xwe nêrî. Di dilê xwe de got, em van hevalan dişînin, gelo emê kengê hesreta gihîştina wan çiyayan pêk bînin? Nava serê xwe xwerand dîsa rûnişt:

-Wê demê ezê destpêkê biçim Botanê, paşê biçim wir.

Piştî axaftina wî her pêncan jî konê xemgîniyê ji ser xwe avêtibû. Her ku pirsa xwazaya Kurdistanê dikir, ew baştir têdigihîştin ka çiqas dîtina welat ji bo wî hesret e. Çavên xwe vekirin. Ji nava xeyalên dîtina çiyayên Kurdistanê derketibû:

-Li kû dibe bila bibe ya girîng xweparastina we ye. Li min binêrin, ez xwe diparêzim. Her tişta welat xweş e. Germa wir jî, serma wir jî xweş e. Li welatê mirov her tişt xweş e. Li vir ez bi serê xwe her tim di nava parastin û çêkirinê de me.

Hinekî sekinî. Keserek anî xwe û li wêneyên li hemberî xwe temaşe kir. Di wê navê re parêzvanan di du sîniyan de meywe anîn, danîn ser mase. Apo porteqalek qeşart her yekî zolek dayê. Hem dikeniya hem dixwarin. Çawa ku çend kesên dostên hev yên salan bin ew jî ewqas rehet bûbûn.

***

Saet heştê sibê bû. Apo li dora qadê dimeşiya. Piştî tora sisiyan berê xwe da dibistanê, ket hundir.

Piştî silavdayînê her kes li cihê xwe rûnişt. Çawa ku dem bireve û ji bo xwe xwegihandinê ew jî di nava kêferatê de be, lezeke wisa li ser rû û tevgerên wî xuya dikir:

-Emê îro nîqaş bikin. Nûnerên kovareke Ewropî, dixwazin bi me re roprtajê bikin. Mijar doza jinê ye. Divê em peyam û heqîqeta tevgera xwe nîşan bidin. Çawa ku hûn dizanin ez ji vê qadê re (mijara jinê) dibêjim qada mayînkirî. Ez gelek hesas û şiyar nêzîkî vê şoreşa wekheviyê dibim. Bi qasî vê mijarê ez bi ti mijaran re mijûl nebûme.

Çend gavan çû hat berê xwe da milîtanên jin:

-Hatina jinan ya nava refên şoreşê bingehê avakirina kesayeta azad e û jinê dike xwedîrol. Wê şoreşa PKKê bibe bingehê wekhevî û azadiyê. Ev rewşa heyî bala kê dikişîne? Li hemberî pîvanên me yên heyîn hûn çi dibêjin?

Awirên wî çûn ser Cesûr. Demildest rabû ser xwe:

-Serokê min, di vê mijarê de pîvanên PKK'ê di asta cîhanê de, pîvanên herî pêşketî ne. Sedema kêmayiyên derdikevin kesayeta kevin e. Lewaziya jinê ne di aliyê fizîkî, di aliyê têgihîştinê de ye.

Vê carê berê xwe ber bi Sara ve vegerand, bi nêrîna wî re ew jî rabû ser xwe:

-Ez bawer dikim di vê mijarê de tu pir dihizirî. Tu çi dibêjî?

Hem dema Apo pê re diaxivî pir qîmet dida nêrînên wê, hem ew pir rehet û jixwebawer diaxivî:

-Mijar diyar e serokê min, tê fêmkirin. Ji destpêka perwerdeyê ve em li ser negihîştina kesayeta birêxistin diaxivin. Eger jin bigihe kesayeta birêxistin pirsgirêkên neyên çareserkirin namînin. Ev

kesayet di heman demê de ya têkoşer e û kesayeteke siyasî ye.

Mijjara rêxistinnê ji bo wî gelek girîng bû, bi nirxandinên wê re Berken bû:

-Xwestekeke te heye tu bibî jineke wisa?

-Serokê min, têkoşîn û xebata min ji bo wê ye.

-Xwegihandina jineke xwediya van teybetiyan tişteke mezin e. Tu rewşa di nava me de çawa dibînî? Gelo zilam serdest e?

-Serokê min ev jî nêrînek e.

-Li akademiyê rewş çawa ye?

-Li akademiyê rewş cuda ye, lewre Serokatî li vir e.

-Tu dixwazî bêjî vir navenedeke azad e?

-Rast e serokê min.

Derbarê bersiva dawî de çawa ku gumanên wî hebin, serê xwe rast û çep bir û anî:

-Kêm be jî hûn razî ne?

-Min ti têkiliyên neyînî nedîtine, lêbelê divê hişmendî bê guhertin. Eger jin di her qada têkoşînê de xwe bihêz neke, zilam çiqas azad û demokrat be jî, ku firsendê bibîne wê bibe desthilatdar. Ji ber wê ev doz ne ya jinê tenê ye, doza zilam e jî.

-Mijareke din jî ya girîng tesfiyekirina hastên sexte ye? Ya em dixwazin roxandina qeyd û bendên di zêhnê civaka me de ne. Di nava PKK'ê de peyva eşqê ne tiştekî hêsan e. Ez jî dixwazim cîhaneke xwe ya têkiliyên pêşketî ava bikim. Di nava me de gelek kes weke serokeşîran tevdigerin. Sara xwest nêrînên xwe zelaltir bêje:

-Serokê min, jina têkoşînê neke û nebe xwedî îrade, wê neçarê bindestiya zilam be.

Destanên kurdî yên li ser eşqê hatin bîra Apo:

-Serhatiya Xecê û Siyabend di dema Feodalîzmê de ye û Xecê xwîşka heft birayan e. Siyabend jî evîndarê wê ye. Divê e em vê

çawa şîrove bikin? Gelo bûyereke wiha qewimiye, yan xeyalî ye, senaryoyek e?

-Serokê min, hirs e, lê hirseke kor e. Ew girêdana Kurdan û fedakariya jinê hatiye bêwatekirin.

-Çima behsa pezkûviyê tê kirin? Pezkûvî sembola çi ye?

-Pezkûvî hinekî sembola azadiyê ye. Sembola azadiya li çiyê.

-Pezkûvî dişibihe Siyabend, dibêje eger pêwîst bike ezê xwe feda bikim, wisa?

-Serokê min, li gorî min wê demê Kurd dixwazin bibin hêz, lê bi ser nakevin. Ev destan behsa wê demê dike.

-Siyabend, ji birayên Xecê ditirse, ne wisa? Bira li dij derdikevin.

-Rast e serokê min.

-Ev serhatî behsa derbasbûna ji sîstema neolîtîk ya ber bi qonaxa feodal ve dike û Siyabend hewl dide xwe bigihîne Xecê ya di nava têkiliyên feodal de girtîn. Eger Siyabend pezkûvî bigire wê çi bi dest bixe, eger pezkûvî wî bikuje wê çi bikeve destê wê?

-Siyabend li hemberî heft bira serê xwe radike.

-Serî radike? Li hemberî civaka feodal serî radike? Wê demê tişta Siyabend li pey ketî ev e: Dixwaze di civaka feodal de bibe serdest. Lê pir lewaz e, belengaz e. Xecê dibîne ku Siyabend nikare bi ser bikeve, li hemberî xeterên civaka feodal nikare serdest bibe. Siyabend jî nikare vê daqurtîne û xwe dikuje. Çawa ku tolê ji xwe bistîne, bêhêzî û belengaziya xwe bi xwekujiyeke wisa pêk tîne. Xecê jî bi xwekujiyê nîşan dide ku wê nikaribin têkiliyeke azad ava bikin. Ev serhatiyek, yan jî efsaneyek e, lê dema xwestine rêbazeke nû ya têkiliyê pêk bînin di ber de jiyana xwe dane. Serê xwe hinekî rast û çep bir anî û hinekî jî berken bû:

-Ev hemû jî bedelên pêşxistina têkiliyên nû nîşan didin. Ango ne bi şer be têkiliyên paşverû nayên serrastkirin. Eger hûn li hemberî koletiyê tênekoşin, firsenda xwekujiyê jî nakeve destê xwe.

Dema xwarina nîvro hatibû. Piştî van gotûbêjên germ ji dibistanê derket, berê xwe da metbexê. Rûkenê ji bo wî xwarin çêdikir. Ew jî li pişt sekinîbû temaşe dikir:

-Heval, bi vî agirî xwarin çênabe.

-Na serokê min, emê niha çêkin.

Lê neket serê wî ku bi wî agirî zû çêbe. Berê xwe da ciyê xwerekan. Li nava kîsan geriya ku tiştekî bibîne bixwe. Ji kîsên dendikên gulberojan çengek derxist, derket derve. Piştî çend kêliyan careke din vegeriya cem. Haya wê ji hatina wî tinebû. Ketibû şehê xwe. Ji ber piyê xwe kevirekî hinge nokekê rakir hêdîka avêtiyê û keniya:

-Heval, te xwarin dereng hiştiye. Min ji we re gotiye ji bo min tiştên cuda çênekin. Ya girîng di dema xwe de amade be.

Rûken ji wan tevgerên wî gelek şaş mabû, lê di heman demê de rehet jî bûbû.

Piştî ku dendikên xwe xwarin ber bi qawîşan ve çû. Her kesî xwarina nîvro dixwar, haya wan ji wî tinebû. Berî ku bigihe qawîşan cemedaniya xwe li dora serê xwe gerand û rûyê xwe jî hema hema nîvî girt. Li ber derê qawîşê kîsekî spî ket ber çavên wî. Nanê tê de hişk bûbû. Rahiştiyê  li nava wî nêrî. Rojên xwe yên destpêkê ku zeytûnek dikirin sê parî anîn ber çavên xwe. Di dilê xwe de got, me li vir hindik zehmetî nekişandiye. Lê ka, niha derfetên me çêbûne û qîmetê wê nizanin. Careke din çû metbexê. Rûken hê bi xwarinê ve mijûl bû. Ji serê metebexê diçû binê wê. Geh pif dikir agir, geh çavên xwe ji rondikên ji ber dû paqij dikirn. Haya wê ji dora wê tinebû, ku çav pê ket xwe nêzîk kir:

-Serokê min xwarin amade ye.

Kîsê di destê xwe de nîşan da:

-Tu vî nanî dibînî? We avêtiye, ezê jî bixwim. Diyar dibe ku hûn nizanin ka bi çi rengî me peyda kiriye. Dema me ev der ava dikir me

nanê ji ber şervanên Filîstinê dima dixwar. Divê qimetê wan rojan were zanîn. Hûn nirxan yan naparêzin, yan jî nizanin!

Nanê bi xwe re anî danî ser mase, dest bi xwarinê kir. Hem xwarin dixwar, hem li ser plana xwe ya piştî nîvro dihizirî. Rûkenê li metbexê hem karê xwe dikir, hem li ser helwesta wî dihizirî. Ji ber ku cara yekê bû ji nêzîk ve didît, serê wê ji pirsan tijî bûbû; "Gelo Serok insanekî çawa ye? Wî jî xwarina xwe xwaribû. Wê jî çay jê re bir û berê xwe da qawîşa xwe. Pênûs û lênûsa xwe derxistin dest bi rojnivîska xwe kir. Nivîsa wê li ber qedandinê bû, rahişt wî kevirê piçûk yê Apo ji bo şiyariyê avêtiê. Kevir kir berîka çenteyê xwe. Di wê navê re Şervîn bilez derbasî hundir bû:

-Hevala Rûken, heval hemû derketine intîşarê, qey dengê balafiran nayê te? Lezê bike em derkevin!

-Balafir? Deng nehatiye min, ma balafir li vir jî êrîşî me dikin?

-Heval dev ji pirsan berde em derkevin!

Bilez derketin, berê xwe da nava latan.
Milîtan ji qadê derdiketin, berê xwe didan girên derdor. Xwe ji bo her rengê êrîşan amade kiribûn. Ew jî li ber lateke nêzî akademiyê sekinîbû. Parêzvan jî li derdora wî di rewşa parastinê de bûn. Weke moza li dora gurbikê digere xarikên çavên wan wisa li dora hev dizîvirîn. Geh li jorê dinêrîn geh li serê baniyan, geh li Apo bixwe. Selman jî li cem bû. Çawa ku çeka xistina balafiran li cem be, çavên wî jî li jorê li balafiran digeriyan. Û di nava kelecaneke mezin de bû:

-Serokê min, em ji vir dûr bikevin baş e.

Wisa çavên wî li jorê, diaxivî. Apo hê li milîtanên di qadê de dinêrî. Piştî ku yê taliyê derket bersiva wî da:

-Balafir gelek nizim difirin. Bi behaneya Filîstînê dibe ku li me jî bixin.

Hê çavên wî li akademiyê bûn. Carna jê balafir dişopandin. Hişê Selman li ser balafiran bû. Hew dît ku Apo bilez ber bi jorê ve diçe.

Êdî dev ji şopandinê berda ew jî ket pey. Bi zorê xwe digihandiyê. Gotinên wî di guhê wî de deng vedan: “Divê em cihekî din ji xwe re bibînin.”

Ew saetek bû dimeşiyan, qederekê ji akademiyê dûr ketibûn. Hilehil bi ser dilê Selman ketibû. Li dawiya rê li ber latekê Apo rawestiya. Li ser berekî rûniş. Li xwezaya li derdora xwe temaşe kir. Kulîlkeke di nava qelîştekên latê de serê xwe dayî der ket ber çavên wî. Binefşeke narîn û nazik bû. Pelên wê nû derketibûn. Bi şûn xwe ve li Selman nêrî:

-Tu vê kulîka ha dibînî?

Selman çavên xwe hinekî kuskusandin, lê tiştek nedît. Hinekî din çavên xwe gerandin. Binefşa aravî ket ber çavên wî:

-Rast e serokê min, ez dibînim. Lê em ji hevalan pir dûr ketine. Em hinekî vegerin aliyê hevalan ve wê baş be. Dibe ku balafir li stargehên Filistînê bixin, vir gelek nêzîkî wan e.

Hişê Selman li ser balafiran bû, lê di serê Apo de tiştên ji wê pir mezintir digeriyan:

-Selman, PKK weke vê binevşê ye, tu dibînî di cihekî çawa asê de serê xwe hildaye. Li kû dibe û çawa dibe bila bibe, wê PKK bikare cihê xwe çêke û serî hilde. Ti hêz nikarin li pêşiya meşa wê ya biheybet bibin asteng.

Bi ser xwe re li asîman nêrî:

-Em hinekî din jî li vir bisekinin. Bila balafir biçin emê paşê vegerin.

Çavên wî careke din çûn ser binefşê. Carna jê çavên xwe li tevgera balafiran digerand.

***

Nîvro bû. Têhna rojê li derdora akademiyê xistibû. Apo ji odeya

bêsîmê ber bi cihê rêveberiyê ve dimeşiya. Çar parêzvanên wî bilez li pey diçûn. Di hundir de Zekî û çend kesên din rûniştibûn guhdarî nûçeyên radyoyê dikirin. Bi hatina wî re her kes rabû ser xwe. Ji liv û tevgerên wî û ji qermîçekên li ser eniya wî diyar dibû ku nerehet e. Piştî silavê li ser kursî rûnişt. Çavên xwe li ser tevan gerandin. Awirên çavên wî li ser Zekî sekinîn. Xwêdanê di eniya Zekî de avêt. Birhên Apo jî ketibûn nava hev, di dilê xwe de got, ev min Xweda xwe jî pêxember dibîne. Ma nabîne em di nava xwîn û xwêdanê de çalê bi derziyê dikolin. Çend carekê serê xwe bi jêr û jor ve bir anî:

-Berî niha jî me rewşa vir ji we re gotibû. Emê ber bi Şamê ve biçin. Dibe ku em li wan deran hin cihên ku hukumeta Suriyê qebûl bike peyda bikin.

Pirtûka li ser mase rakir dîsa danî cihê wê:

-Dibe ku cih nedin me jî, lê emê peyda bikin. Li wir hin dostên me hene. Ji bo dema pêş divê em amade bin.

Zekî dixwest xwe nîşan bide ku pêvajo fêm kiriye.

-Serokê min, di demeke wiha de çûna Şamê dibe ku ji bo we bixeter be.

Hinekî li ser gotinên wî hizirî:

-Di aliyê ewlekariyê de ti cih bi qasî vir ne bixeter in. Li her derê xeter heye. We sîxurên hatîn vir dîtin.

Di wê navê re Sara ket hundir. Wî jî dixwest rêveberî tev hazir be:

-Were heval. Me ji hevalan re jî got, divê em biçin Şamê. Hûn jî dibînin pêvajo hatiye guhertin.

Hinarikên rûyê Sara sor bûbûn û ji awirên çavên wê diyar dibû ku li ser pêvajoyê pir dihizire:

-Serokatî baştir dizane.

-Ya ji me tê xwestin emê bikin. Hûn jî li vir perwerdeya xwe bidomînin. Lê dengê hevalên dersan didin tomar bikin, da ez jî guhdarî bikim.

Piştî gotina xwe derket, berê xwe da odeya xwe. Li ser kursî rûnişt, dest bi nivîsê kir. Rûpelên lênûsê bilez dihatin qulibandin. Nobedarekî destê xwe li derî da hêdîka ket hundir:

-Serokê min, hevalên rêveberiyê dibêjin me hevalek bi zimanê erebî baş dizane peyda kiriye.

Pênûsa xwe danî ser lênûsê:

-Bila bê vir ez bibînim.

Piştî derketina nobedar rabû ser xwe çû ber pencereyê. Hê çar deqîqe derbas nebûyîn nobedar û xortekî zerê zirav û dirêj xuya kirin. Ji wan re derî vekir:

-Tu bi xêr hatî Siwar. Te xebata Lîbya teslim kir?

Ji kelecanê xwêdan dabû. Vekirina derî jê re û jibîrnekirina teslîmkirina xebata Lîbya bala wî kişandibû.

-Rast e serokê min. Weke we gotî min xebat teslîmî hevalekî din kir.

-Baş e. Tu Şamê jî baş nas dikî?

-Baş nas dikim, min li wir zanîngeh xwendiye serokê min.

-Dizanî seyareyê jî biajoyî, di ajotinê de serdest î?

-Rast e serokê min.

-Emê bi hev re biçin Şamê. Tu xwe amade dibînî? Ti pêşniyarên te hene?

-Serokê min, ev ji min re şensekî mezin e.

-Ya girîng divê tu bizanî ku ev xebateke hesas e û siriyeta wê heye. Emê di nava xebatê de bi hev re bin.

-Ezê heta dawiyê bibim layîqê vî şansê rêxistinê dayî min.

-Wê demê xwe amade bike, emê sibê zû derkevin.

-Temam serokê min.

-Haa, te rapora xebatê teslîm kir?

-Rast e serokê min, îro min da rêveberiyê.

Rabû ser xwe ber ve çû. Bestûka gumlekê wî ya ketî binê çakêt

rast kir. Tevzînek ketin laşê  wî û ji ber ku nikariya li nava çavên wî binêre awirên wî ketin ser zikê xênî.

-Divê displîna we ya lixwekirina çekan baş be. Hûn kadroyên PKK'ê ne; divê hûn biserûber, birêkûpêk û lihevhatî bin. Û divê hûn cilên xwe jî li xwe bînin.

-Belê serokê min.

Lê gotina wî bi kotekî ji qirika wî derketibû.

-Hadê heval, serkeftin.

***

Dewreya perwerdeyê bi dawî bûbû. Dema spora serê sibê bû. Apo li qadê çavên xwe li kesên bên sporê gerandin. Gazî berpirsê rojê kir:

-Çima heval hemû nehatine sporê?

-Serokê min, hevalên nehatîn nexweş in.

-Biçin gazî wan bikin, bila hemû werin!

Piştî çend kêliyan yên li qawîşan mayîn tev li qadê de kom bûn. Li pêşberî wan sekinî:

-Bila hevalên nexweş werin pêş emê bi hev re sporê bikin. Divê em pirsgirêkên xwe yên fîzîkî bi sporê çareser bikin!

Bi gotina xwe re dest bi meşê kir. Yên din jî ketin pey. Piştî qasekî ji nişka ve sekinî. Bi baldarî li pêşiya xwe dinêriya:

-Hevalno, werin li vê hêlînê binêrin!

Hêlîn hema li keviya rê bû. Sê çêlîkên piçûk yên pir xweşik tê de bûn. Devên wan vekirî bûn, li benda maka xwe bûn ku tiştekî ji wan re bîne. Her kes li derdora wî kom bû. Wan jî li hêlînê temaşe kir. Bi hatina wan re çivîk ketin rewşa xweparastinê, xwe bi erdê ve melisandin. Her kes li bendê bû ka wê li ser hêlînê çi bêje. Li wan vegeriya:

-Şêwazê vê çûkê weke yê we ye, hêlîna xwe li ser darê

çênekiriye, hatiye li erdê çêkiriye. Hûn jî li wan çiyayên Kurdistanê yên weke kelehan xwe naparêzin, diçin li gund û deştan cihê ku destê dijmin bigihîje cihê xwe çêdikin!

Her kesî cihê lê mayî û şêwazê parastina xwe dianî ber çavên xwe.

Dîsa dest bi meşê kir.

-Xwe nêzîk bikin, bila di navbera me de mesfe ne pir be.

Bi coşeke mezin ketin rêzê, meşiyan. Piştî qasekî dîsa berê xwe dan qadê. Piştî taştê, ji bo merasima qedandina dewreyê her kes ketibû nava tevgerê. Roja sozdayînê bû. Saet heştan her kes di rêza merasimê de amade bû. Ji ber germa meha Tebaxê kevirên li derdora akademiyê spîtir xuya dikirin. Her sê al li banî dihejiyan. Li ser her kursiyekî wêneyê şehîdekî hatibû danîn. Wêne çawa ku zindî bin û çavên wan li ser merasimê bin. Maseyê axaftinê aliyekî wî bi ala ERNKê, aliyek bi ya ARGKê, aliyek jî bi ya PKKê ya das û çakûç li serê hatibû xemilandin. Li ser mase jî pirtûkek û çekek hatibûn danîn. Mîkrofon jî amade bû.

Kaxizek di destê Zekî de bû ji cihê rêveberiyê bilez ber bi aliyê merasimê ve dihat. Li pişta mase sekinî berê xwe da milîtanên di merasimê de:

-Emê dest bi sozdayîna qedandina dewreyê bikin! Qawîşa Şehîd Besê!

Ji milê çepê ve sê jinên porên wan ji pişt ve girêdayî li pey hev bi bazdan çûn li tenişta mase sekinîn. Şeşên din jî ji aliyê rastê ve çûn li tenişta wan rawestiyan. Ji bo sondxwarinê Zekî ferman da:

-Rawestin. Amade bin. Şiyar bin!

Bi gotina dawî re her nehan bi hev re destên xwe yên çepê danîn ser mase, yên rastê danîn ser dilên xwe. Tiliyên destan li ser sîleh, pirtûk û alê rawestiyabûn. Ji kêf û kelecanê kutekuta dilê wan bû. Li ser eniyên wan jî xwêdaneke weke xunavê danîbû. Biskên porên wan

li ber bayê li derdora xwe difiriyan. Çavên wan li ser alê rawestiyabûn û wê soza meşeke dirêj bidan. Êdî kêliya dawî hatibû, gotinên Zekî dubare kirin:

-Perwerdeya min li akademiyê dîtî ezê di jiyana xwe de pêk bînim! Xeta partiyê bê şaşîtî derbasî jiyanê bikim! Li hemberî dijminê hundir û derve ezê heta dawiyê şiyar bim. Heta dilopa xwîna xwe ya dawiyê ezê têbikoşim. Li ber ronahiya riya partiyê di her şertî de ezê wezîfeya xwe ya şoreşgerî pêk bînim. Ezê bi partiyê, Serokatiya Partiyê, şehîdên serxwebûn û azadiyê, berxwedêrên li çiya û zindanan, çek û gel ve, girêdayî bim! Di vê çarçoveyêde, li ser şerefa xwe ya mirovayiyê sond dixwim, sond dixwim sond dixwim!

Bi dawîkirina sondxwarinê re dengê çepikan bi ser qadê ket. Yên din jî kom bi kom sond xwarin, çûn cihên xwe. Piştî sondxwarinê. Zekî careke din fermana “Rawesetin! Amade bin! Şiyar bin!” da.

Apo bi gavên hêdîka ji aliyê rojhilat ve ber bi qadê ve dihat. Ji ber tirêjin tavê pora wî dibiriqî û coşeke mezin li ser rûyê wî bû. Zekî ber ve bezî. Bi awayekî leşkerî bixêrhatin dayê û weke leşkerekî sekinî. Çawa ku mirovekî nefspiçûk be, tevgereke wisa nîşan dida. Weke mirîdekî li pêşberî şêxê xwe kemberbest, wî jî di rewşeke wisa de silav dabûyê. Halbiku sekna wî ya berî çend kêliyan ya li pêşberî şervanan pir cuda bû. Çawa ku generalekî pir mezin be sekinîbû.

Piştî ku derbarê akademiyê de çend agahiyên kurt jê girtin, hêdî hêdî ber bi merasimê ve meşiya. Cilûbergên wî yên wê rojê ji rengê tirêjin roja Tebaxê bûn. Gumlekekî gewrê bi ser spî ve û pantolonekî xakî li ber bûn. Rengê kembera wî jî qehweyî bû. Pêlaveke sporê di piyên wî de bû. Keneke sivik ku didanên wî yên spî xuya dikirin li ser lêvên wî bû. Li pêşberî merasimê rawestiya:

-Merheba! Hûn çawa ne hevalno!?

Bi dengekî bilind bersiva “Spas serokê min!” hat. Berî ku biaxive çend kêliyan çavên xwe li ser merasimê gerandin.

-Sersala 15'ê Tebaxê li we û gelê me pîroz be. Îsal sala serkeftinê ye. Şerê me yê herî mezin li hemberî ketina kesayeta li Kurdistanê ye. Di van salan de me her tişt ji tinebûnê çêkir. Kurd ne xwediyê tiştekî bûn. Li vir em ne şervanan tenê digihînin, em insanê Kurd jî bikesayet dikin û xizmetê ji insansiyetê re dikin.

Çawa ku ahenga axaftina wî temam bikin, dengê çûkan mîna senfoniyekê ji derdorê bilind dibû. Ev deng pir lê xweş hatibû. Her du destên xwe li ser singa xwe di ser hev re derbas kirin:

-Têkoşîna me ne têkoşîneke şexsî ye, ya gel e. Divê hûn nekevin xefletê. Divê hûn li ser armanc û jiyana xwe bibin xwediyê meşeke rast. Ev derfet ne ji bo min, ji bo dîrokê bûn! Dersa herî mezin ku hûn bizanin, ev têkoşîn ne ji bo şexsê we ye, ji bo dîrokê ye. Berê her kesî ji me re digot, hûn mirine, me jî digot na em sax in. Niha em bihêz in. Karê dijmin tinekirna me ye. Karê me jî li hemberî dijmin berxwedan û serkeftin e. Hûn niha soz didin, tişta tê xwestin avakirina jiyanê ye. Divê soza we li ser rastiya şer be.

Desmaleke kaxiz ji ser mase rakir, xwêdana li ser eniya xwe paqij kir:

-Hûn nû tevlî şer dibin. Divê hûn her gava xwe bi zanebûn biavêjin. PKK partiya azadiyê ye. Di nava partiyê de jiyanek tenê tê qebûlkirin, ew jî jiyana nû ye. Gelê me jî bibiryar bi ser dijmin û xayînan de diçe. Emê li ser wezîfeya xwe bin, hûn jî li ser ya xwe bin. Bila ev salveger ya gelê Kurd be. Şerê bi pêşengiya Serokatiya partiyê çêbûyî şerê Sosyalîzmê ye, yê gelan tevan e. Ev bixwe serkeftin e!

Çar saetan li ser hev û li ser piyan axivî. Êdî dora dayîna dîplomeyan bû. Ji destê berpirsê rojê lîsteya navan girt:

-Emê dîplomeyên dawiya dewreyê bidin hevalan!

-Hevala Sema.

Bi axaftina wî re Sema ji milê çepê ve bi bez ber bi mase ve çû.

Destpêka hatina wê ya akademiyê hat bîra wî. Ji hatinê heta kêliya xatirxwestina her milîtanî dihatin bîrê. Di tevger û pêşketina wan de çi guhertin çêbûbe didît. Hem hatina milîtanan ya akademiyê, hem xatirxwestina wan hestên cuda pê re çêdikirin. Ya yekê; hatina wan ya heta wê qadê û amadebûna ji bo qadên Kurdistanê, ya din; bingehê jiyaneke nû dihat danîn.

Keziyên Sema li ser pişta wê ji milekî diçûn milê din. Bi awayekî leşkerî li pêşiya mase sekinî. Wî jî bi coşeke mezin destê wê girt, dîplomeya wê dayê. Bi girtina dîplomeyê re, êdî di her warî de riya wê zelal bûbû. Bi sekneke jixwebawer li pêşber rawestiyabû. Bi kelecana girtina dîplomeyê, careke din bi bez çû ket rêza xwe.

Piştî qedandina dayîna dîplomeyan bi rûyekî geş berê xwe da merasimê:

-Pîroz be ji we re. We rastiya xwe ji akademiyê girt. Em dixwazin meşa we bibe meşa serkeftinê.

Piştî merasimê êdî karê wî li akademiyê nemabû, wê biçûya Şamê. Di ber dibistanê re borî. Awirên çavên wî ketin ser wêneyê teyrê baz. Qasekî xweş lê temaşe kir. Serê xwe hilda li tîrêjên rojê temaşe kir. Diyar bû ku dema çûnê hatiye. Gazî Siwar kir, bi seyareya xwe ketin ser riya xwe. Di rê de li ser dewreyên li akademiyê dayîn dihizirî. Şehîdên li wir spartîn axê careke din anîn bîra xwe. Li nêzîkî xwaringeheke li ser devê rê, Siwar meşa seyareyê hinekî kêm kir.

-Serokê min, em li vir dikarin hinekî bisekinin? Hê riya me maye.

-Temam baş e.

Berçavka xwe ya reş da ber çavên xwe. Siwar jî berî ku peya bibe li derdora xwe temaşe kir: “Gelo dibe ku hin li van deran Serok nas bikin?” Bi şûn xwe ve nêrî:

Ew jî peya bûbû li derdora xwe dinêrî. Siwar bev ve hat:

-Serokê min, bi vê berçavkê ti kes we nas nake.

Berçavka xwe li ber çavên xwe rast kir:

-Hûn xwe biparêzin, ez xwe diparêzim, xema min nexwin!

Li ser kursiyên li derve rûniştin, xwarina xwe xwarin. Siwar mereq dikir ka xwarin bi dilê wî ye, yan na:

-Serokê min, ev xwarin ji bo we baş e?

-Li pey xwarinê nekeve, çi hebe emê bixwin. Min berê jî gotiye xwarin ne girîng e. Dev ji xwarinê berde, tu li Libya pir mayî, gel çiqas me nas dike?

-Serokê min her kes şêwazê we yê jiyanê mereq dike.

-Te çi digot wan? Ez jî insanekî weke wan im, lê ez xwe birêxistin dikim û leşkerê gelê xwe me.

Pariyê nanê di destê Siwar de ket erdê. Bi awireke tûj lê nêrî:

-Heval, nanê xwe ji erdê rake, ew nirxek e.

Ji şerma rûyê wî sor bûbû. Wî jî ferq kir ku pir li ber xwe ketiye:

-Heval rehet be! Lê divê hûn qîmetê her kêliyê û her nirxî bizanin.

Hê xwarina xwe dixwarin, lê Siwar bifikar bû, çavên xwe ji ser derdor kêm nedikirin. Li hemberî wan çend ciwan bi kurdî diaxvîn. Carna jê di bin awirên çavên xwe re li Apo dinêrîn.

-Serokê min, yên li derdora me li we dinêrin.

-Tu dixwazî bêjî em zû ji vir biçin?

-Belê serokê min, Kurd hemû we nas dikin.

Rabûn li seyareya xwe siwar bûn, ketin ser riya xwe.

Bi şev gihîştin taxa Ruknedin. Bilez derketin qata sisiyan. Milîtanekî xort derî vekir. Bi ketina hundir re yên li wir tev ketin tevgerê. Çend milîtanên nû ji çiyê hatîn û çend xebatkarên nava Şamê li wir bûn. Bi qasî saetekê li eywanê bi wan re axîvi. Rabû çû li ber derî sekinî. Berî hingê li wir bi Hasan Bindal re wêneyê xwe kişandibû. Mayîna wan ya bi hev re û hevaltiya wan ya li gund hatin bîrê. Ji wir vegeriya gazî Siwar kir:

-Biçe dostên me yên ji Başûr hatîn bîne vir.

Piştî çûna Siwar çû odeya xwe. Saet 12'ê şevê bû. Dest bi xwendina notan kir. Serê sibê piştî taştê gazî milîtanên nû hatîn kir:

-Hûnê niha li vir bin. Gelek hevalên birîndar jî ji welat hatine. Emê dewreyan biqedînin. Heta dewreya nû li vir pirtûkan bixwînin. Bê kar û bê xwendin nesekinin. Pêwîstiyek çêbe heval li vir in. Bernama xwe daynin û li gorî wê tevbigerin.

Tv dubare dîmenên erdheja li Misrê didan. Piştî wê nûçeya aloziya li Los-Encilos ya ji ber lêdana zenciyekî û kuştina pêncî û çar kesên di wê aloziyê de hatîn kuştin dan. Piştî nûçeyan bi dostên hatîn re hevdîtin kir. Dîsa gazî Siwar kir ketin ser riya davenda Şamê. Li gelek deverên bajêr di perwerdeya milîtanan hebû. Êvarê careke din ketin ser riya Lubnanê.  Leza li ser rûyê wî pirtir bûbû. Bê ku li deverekê bisekinin yekser çûn akademiyê. Cesûr li qadê li ser piyan li lênûsa xwe dinêrî. Berê xwe da wir:

-Rewş çawa ye?

-Baş e serokê min.

Hinekî li milîtanên di nava tevgerê de nêrî:

-Me hevalên nû hatîn dîtin, gelek hevalên birîndar jî hatine. Xwe ji bo pêngaveke girîng amade bikin, emê biçin Şamê. Hatina me ji bo wê bû. Me komên di perwerdeya malan de dîtin. Gelek ji wan wê vegerin nava xebatê. Di vê çûna xwe de me wardoziyek kir, lê çûna bê girîng e.

Ber bi nava qadê ve hinekî meşiyan:

-Ji bo hevîdinê hin dost ji Başûr hatibûn. Divê em mijara serhildan û koçberiyê bi wan baş bidin fêmkirin. Em niha dikarin bi hevalên rêveberiyê re biaxivin. Sibê emê biçin.

Şevê kirasê reş berdabû ser rûyê erdê. Li odeya xwe li ser kusî rûniştibû destekî xwe dabû ber erzeniya xwe. Ketibû nava rêwîtiya hizrê. Ji bo mezinbûnê pêwîstî bi biryaran hebû. Rahişt pênûsa xwe, dest bi nivîsê kir.

***

Dema razanê bû, lê hê di odeya xwe de bi gavên hêdîka dimeşiya: “Pêvajoyek aloz û tijî pirsgirêk li pêşiyê me ye, yan divê em riyeke din bibînin, yan riyeke din vekin.” Berê xwe da kursiyê li pişt mase. Di nava wan hizran de rûnişt. Miremira baranê û dengê ewran bû. Ev deng li guhên wî xweş dihat. Ji hizir û bixewiyê çavên wî kûr bûbûn. Mûjankên wî nediketin ser hev. Çawa ku perdeyeke xatirxwestinê ketibe ser çavên wî, rojên borî yek bi yek di neynika çavên wî de diçûn dihatin. Serhatî û rojên destpêkê hatin bîrê. Rabû ser xwe ber cihê nivistinê ve çû. Digel ku xewa wî nedihat jî, serê xwe danî ser balîv, betanî kişand serê xwe. Lê dikir nedikir çavên wî nediketin ser hev. Çawa ku mertalên perdeyên xeyalên wî bin, mûjankên wî serên xwe qulibandin aliyê din. Weke kevirê di êtûnê de kelijî, bayekî kizrîner xwe berdabû ser dilê wî. Di nava bîranînên biharên borî de çavên wî ketin ser hev.

Bihar bû. Li binê çiyayekî bilind di mêrgeke bi nefel û hendeko de çar xezal diçêriyan. Hawîrdorê wê jî bi kulîlkên rengûreng xemilîbû. Di nava sosin, beybûn, sînem, xangulî, şûşan û xecxecokan de gulexwînan bejin dabû. Ji serekî heta serê din keskesorê weke kevanekê xwe bi ser de berdabû. Li pey Apo bi sedan milîtan bûbûn rêz, li hawîrdorê mêrgê dibeziyan. Piştî bezê taxim çêkirin, dest bi lîstika birê kirin. Ew di nava taxima êrîşê de bû. Bi serê xwe ji taxima din bi dehan lîstikvan qut kiribûn. Hingî beziyabû di nava xwîdanê de mabû û ji tîna qirika wî ziwa bûbû. Ji ber dengê xîzexîza qirika xwe ji xew rabû. Destê xwe li şûşeya li ber serê xwe peland. Dengê çîweçîwa çûkan dihat. Kundekî jî bênavber dixwend. Xwendina kund bala wî kişandibû, di dilê xwe got, gelo ev dixwaze peyamekê bide me. Li saeta xwe nêrî, tam çar û nîv bû.

Rabû ser xwe, çû odeya xwe, dîsa rewşa akademiyê hat bîrê. Di quncika dilê wî de tevzînokeke sar ya xatirxwestinê weke singekî çikyabû. Lê xwe lê nekir xwedî. Betaniya xwe pêça derket ber derî. Li ser dara li hemberî odeyê dengê bilbilekî hat. Stirana Aram Tîgran hat bîrê. Wî jî xwest li ber dengê bilbil stiraneke wî bêje. Lêvên wî hêdî hêdî lepitîn: "Te ez kal kirim bi ciwanî, lê ez xort bûm tu baş zanî. Pelê dara min te weşand, bihar çû te payîz anî..." Dengê wî pir xweş û zelal bû. Çawa ku bilbil jê re li tembûrê bixe û ew li ber bêje, wisa distirand.

Nobedar wisa guhê xwe dida stiranê, çawa ku kevirek be wisa di cihê xwe de sekinîbû. Lê ewqas jî kêfxweş bûbû. Di dilê xwe de got, dengê Serokatiyê çiqas xweş e, stiranan jî baş dizane! Pê re jî serê xwe dihejand. Ji pişt ve dengek hatiyê:

-Dengê min çawa bû, xweş bû? Tu jî vê stranê dizanî?

-Na serokê min, min guhdarî kiriye, lê gotinên wê nayên bîra min. Dengê we gelek xweş e.

Bi dengekî bilind keniya:

-Divê tu wate û gotinên wê jî bizanî. Ev stiranên kurdî ne, destpêkê min guhdarî dengê Aram kiriye. Min wê demê ji xwe re got, divê ev deng wenda nebe.

-Rast e serokê min.

-Tu dibêjî rast e, lê stiranê jî nizanî. De em biçin meşê, lezê bikin!

Ew jî di qadê de bilez diçû dihat. Li kêlekên wî jî Sara, Cesûr, Siwar û parêzvanên wî dimeşiyan. Hem dimeşiya, hem li derdor dinêrî. Çavên wî ketin ser wêneyê Mahsum Kurkumaz yê li ser dîwarê dibistanê. Bi qasî nîv saetê wisa li ser piyan li pêşberî wêne sekinî. Çawa ku tîrek di hedefa xwe de biçike, çavên wî jî wisa li ser dîwêr çikiyabûn. Bê ku li tiştekî din binêre bi çavên dilê xwe li wêne û navê hatî nivîsîn temaşe dikir. Bi sedan milîtan û fermandarên li ber wî wêneyî bi wan re wêneyên xwe girtî û rêkirîn qadên têkoşînê

yek bi yek anîn ber çavên xwe. Dema ew wêne dihat çêkirin û navê "Akademiya Mahsum Korkmaz" dihat nivîsîn, weke wê kêliyê li bîra wî bû. Çawa ku di deqîqeya rêzgirtinê de bin, yên din jî wisa di cihê xwe de rawestiyabûn. Roj, saet û her kêliya Mahsum Korkmaz li wir derbas kirî anîn ber çavên xwe. Her kesî di dilê xwe de digot, wisa xuya dike ku emê vêca xatirê xwe ji fermandarê xwe yê efsaneyî bixwazin. Û xemgîniya di dilê wan de her ku diçû kûrtir dibû. Di çavên wî de jî xemgîniya veqetînê ya dijwar diyar dibû.

Derdor jî ji sekin û bêdengiya wî bêdeng bûbû. Bi tiliya destê xwe riya diçe Şehîdgeha Şehîd Hemze nîşanî yên liderdora xwe da:

-Hûn wir dibînin? Ez û hevalê Kemal li ser wan keviran rûdiniştin me nîqaş dikir.

Berê xwe da qadê. Çend gavan çû sekinî. Bi tiliya xwe jî cih nîşan da:

-Ez û Egîd ha li vir sekinîbûn, me bi hev re plana şerê çekdarî çêdikir!

Bi şûn xwe ve zîvirî cihekî din nîşanî wan da:

-Ha li vir jî, ez û Bêrîvan li ser xebata bajaran diaxivîn. Jineke Êzîdî bû. Li Cizîrê şehîda me ya destpêkê ye. Di dîroka gelê me de cihê xwe yê pîroz girt û bû perçeyeke azadiyê. Ev pêşketin hem hebûna neteweyekê, hem rûmeta jinê ne. Divê em bi rêzdariyeke mezin bîr bînin.

Bê ku kêliyeke wê demê ji bîr bike dianî ber çavên xwe û bi gotina xwe wisa dikir ku her kes vegere wê dîrokê. Cihê nîşan dayî her kesî lê temaşe dikir û di xeyalê xwe de dîmenê wan kêliyan çêdikir. Pişt re bi serê xwe dibistan nîşan da:

-Li wir me kongre û konferans pêk anîn. Biryara vegera welat li wir me da...

Hestên kesên guhdarî dikirin bi du aliyan ve diçûn; hem agahiyên ji dîroka têkoşîna li welatekî biyanî û behskirina ji fermandarên

weke Egîd, Kemal, Bêrîvan, Hemze û hwd. kelecan didan wan, hem fikarên ku wê ji wî ciyê dîrokî bar bikin di dilên wan de deryaya xeman çêdikirin.
Axaftin û tevgerên wî yên wê rojê ji yên demên borî pirtir bala milîtanan dikişandin. Lewre ne axaftinên wî, dişibihiyan yên berê, ne liv û tevgerên wî.

Çawa Îbrahîm Xelîl ji Rihayê çûbû wan diyaran, ew jî ji heman cihî çûbû heman warî û wê weke Mûsa Pêxember wî jî hevriyên xwe ber bi warekî din ve bibiran. Çawa ku xatirê xwe ji dar û berên wir bixweze çend kêliyan li derdora xwe û li girên derdora akademiyê temaşe kir. Dîsa berê xwe da yên li cem xwe:

-Heta ji me bê emê ji Şamê zû vegerin. Bê encam jî em venagerin. Lê diyar e ku emê saleke dijwar derbas bikin. Di vê povajoyê de pîwîstiya me bi kadroyên pêşeng heye. Li vir jî divê tişteke me nekeve destê dijmin, her tiştî rakin. Lê dest nedin goristanê.

Her sê hevokên dawiyê bandoreke mezin li kesên li cem kiribû. Çawa ku çavên Cesûr şil bûbin wisa xuya dikir. Lê zû bi xwe ve hat:

-Rast e serokê min, demeke zor û zehmet li pêşiya me ye. Heta ji me bê emê jî li gorî wê tevbigerin. Di aliyê ewlekariyê de jî emê şiyar bin.

Piştî van axaftinan xatir xwest, bi gavên bilez ber bi seyareyê ve çû.

Seyare ketibû ser riya Şamê, di camê re li derdorê dinêrî. Siwar stirana Cemîl Horo danîbû ser. Gotina "Dilê min liyane, kekê dilê min liyane", weke newayeke ji honikayiya bayê biharê derkeve li guhên wî diket. Piştî wê, stirana Ayşe Şan “Welatê min Diyarbekir, ew şîrîn e mîna şekir”, danî ser. Van dengan dilê wî mest kiribû. Kêfa wî ji her du dengbêjan û her du stiranan re jî pir dihat û bi baldarî guhdarî dikir. Çawa ku temaşekirina dîmenên xwezayê û guhdarîkirina wan newayên xweş hev temam bikin, wisa bi hev re

dihonandin. Jixwe çawa ku her tişt di nava wan de veşartî be, her tim behsa stiranên kurdî û reseniya wan dikir.

Dengê mûzîkê qut bûbû. Li ser rewşa akademiyê dihizirî. Di çavên wî de fikarên pir kûr xuya dikirin. Ji bo çareseriyê di hişê wî de fikir li pey fikir, gotin li pey gotinê dibûn rêz. Gelo wê kîjan bineqandan. Di dilê xwe de got, ev dergahê me bi xwîn û xwêdana xwe ava kirî, gelo wê ji destê me derkeve? Emê van keç û xortan li kû perwerde bikin? Emê dergahekî din li kû peyda bikin? Kurdên li ber destê dijminê xwe mezin bûyîn û ji xwe dûr ketîn, wê çawa bê dergah werin ser hişê xwe...?

Seyare ji Lubnanê derbasî erdê Suriyê dibû û hêdî hêdî çiyayên Bîqayê li pey xwe dihiştin. Piştî saetek û nîvê ketin nava Şamê. Çavên wî li ser tevgera nava bajêr bûn. Bi awirên kûr li sûrhên derdora wê temaşe dikir û cihê lê dinêrî di hişê xwe de tomar dikir:

-Siwar, li gorî dîroka te xwendî ev sûrhên Şamê kengê hatine avakirin?

-Serokê min, dibêjin piştî tofana Nûh Pêxember hatiye avakirin. Hin jê dibêjin di dema Romayê de. Jê re dibêjin Kelha Heftderî jî. Hz. Muhemed behsa berketa Şamê kiriye.

Çavên wî li hin dîwarên sûrhê yên roxiyayîn ketin:

-Hûn dibînin, cihên dîrokî nayên parastin. Ti kes li dîrokê xwedî dernakeve.

Çawa ku ji xwendina pirtûkên dîrokê û şîrovekirina wan hes dikir, wisa hes dikir ku li bajar û deverên dîrokî jî bigere. Heta kesên diçûn cem, ji wan re jî tewsiye dikir ku biçin li cihên dîrokî bigerin. Bi taybetî Şama dîrokî ya Berî Mîladê 9000 salan hatî avakirin, pir bala wî dikişand. Lewre jê re digotin cihê şaristaniyan. Berî Mîladê 2500î, ji Amûrît, Kenan û Babîl re paytextî kiribû. Berî Mîladê 1200î ji Babîl û Fenîke re, Berî Mîladê 720î ji şaristaniya Aramiyan re paytextî kiribû. Şkefta Xwînê ya Qabîl û Habîl xwîn lê rijandîn, li

wir bû. Ji ber ku Qabîl li wir Habîl kuştibû navê Şkefta Xwînê lê hatibû kirin.

Her ku firsend didît, serdana dibistan, xan, mizgeft, dêr û sûrhên wê yên dîrokî dikir. Digel ku gelek caran dîtibûn jî, lê her ku derbas dibû dîsa li wî bajarê kevnar temaşe dikir. Ma wê çawa li vî bajarê yasemînan û warê çand, bawerî û gelên dîrokî û cuda temaşe nekirbûya? Şam, Şama Şerîf, bi navê din Dîmeşq, gelek serdem û sir û razên dîrokê di nava xwe de vedişartin. Di serdemên nêzîk de jî bûbû cihê xwespartin, şoreş, şer û serhildêriyê. Hê jî xemla wê ya çand û zimanên cuda dewam dikir. Şûnpiyên dîrokî û fethan hê li ser diyar bûn. Hem temaşe dikir, hem carna behsa girîngiya wê dikir. Berê xwe ber bi pencereyê ve vegerand, serê xwe hejand:

-Şam di dema xwe de bajarekî girîng yê çand û bazirganiyê ye. Bajarekî hînker e. Şêweyekî wisa yê avayiyên biyolojîk û fizîkî heye çawa ku di ketina çolê de devê deriyê buhiştê be. Ez çend caran çûme mizgefta Emewiyan. Dîrokeke mezin di hûndir wê de ye. Zexrefeyên pir xweş, ji qanûn û fermanan bi zêr hatine nivîsîn. Aramiyan perestgeha yekê li wir ava kiriye. Piştî wan Yunanî Berî Mîladê 333yan li wir bûn. Piştî wan desthilatdarên Romayê hatin li vir perestgehek çêkirin. Ji xwedayê Jûbîter re çêkirin. Hê jî bermayiyên wê gelek hene. Dîwar û stûnên wan jî hene. Meqam û gora pêxember Yehya li wir e. Gora wî di nîvê wê de ye. Bîrek tê de ye, meqamê Yehya tê de ye. Serê Huseyin ji Kerbelayê anîne wir. Resmên di xweşikbûna cinetê de tê de hatine çêkirin. Mizgefta eshabeyan li Salihiyê ye.

Çi dema çav bi çiyayê Qasyon yê raserî bajêr yê ji pêxemberên weke Adem û Îbrahîm Xelî re malvanî kirî diket, heta ku seyare derbas dibû çavên xwe ji ser nedibirin. Jixwe çawa ku dibêjin, Şamê jî navê xwe ji peyva Kenanî ya tê wateya çiyayê asê girtiye. Lê ne wê carê tenê, her cara diket vî bajarî li ser dîroka wî dihizirî. Lê ne

Şam tenê, her cihê dîrokî ku serdana wî dikir, weke arkeologekî li ser difikirî û jiyana mirovên wê demê dianiyê ber çavên xwe. Lê ji bo wî Şam girîng bû. Lewre malvanî ji gelek serhildêr, şaristanî û desthilatdaran re kiribû û di dema Islamê de bûbû paytexta Emewiyan.

Sê caran li ser hev çavên xwe girtin vekirin. Kêfa wî ji zemanê di seyareyê de derbas dibû nedihat. Çawa ku di zindaneke gerok de be, jê re wisa dihat. Ji ber wê bêsebir dibû. Dixwest berî gavekê bigihe malê:

-Gelek maye em bighîjin malê?

-Serokê min pir qelebalix e, lê emê saetekê bigihinê.

-Te got, min li vir zanîngeh xwendiye ez baş nas dikim, baş e tu dîroka wê jî dizanî?

-Serokê min, li dibistanê didan lê li gorî xwe didan.

-Rast e, lê divê em dîrokê ne ji serdestan fêr bibin. Divê di aliyê dîrokê de tu xwe kûrtir bikî. Pir bixwîne. Erkên dîrokî li benda me ne.

Seyare di ber peykerê Selahedînê Eyûbî re derbas bû. Çavên Apo li ser peyker yê li pêşiya sûrên Şama kevin rawestiyabû. Li yektiya gelê îslamê ya wê demê, şerên dijwar yê li hemberî xaçperestan kiribû, dihizirî. Peykerê li ser hespekî û şûrê wî li hewa rawestiyabû, fikirê wî biribûn kûrahiya wan deman. Li mezinbûn, hilweşîna dewlet û xanedaniyê di dîrokê de çêbûyî, roleke çawa lîstine û bûye bingehê dewletê, dihizirî. Dixwest bi roja îroyîn ve bide girêdan. Di hundirê xwe de got, hê ew kukumraniya wan li ser van axan dewam dike. Gotinek di hundirê xwe de dubare dikir, malbata herî xurt ya bavikanî dibe dewlet bi xwe.

Li derdora sûrê û tevgera heyî temaşe dikir:

-Siwar, dema tu vî peykerî dibînî çi tê bîra te?

Siwar agahiyên dizanî anîn bîra xwe:

-Serokê min, çanda Îslamê pêş ve birine. Piştî mirina wî dewleta Eyûbî di navbera kurên wî de hatibû parvekirin. Êrîşên Mongolan ji dest pê kiribûn. Ji ber sedema şerê desthilatdarîyê Kurên wî lawaz mane, ji hêla Mongolan dewletên wan hatin ruxandin. Ev jî bûye eger ku Kurd paşkevtin, bê dewlet man.

Siwar di neynikê re li Apo dinêrî. Lê Apo çavên wî li ser liv û tevgera bajêr û peyker bûn. Gelek tişt di hundirê xwe de komî ser hev kiribûn, xwest çend jê bêje:

-Xanedanî saziyeke welê ye, mirov dikare berî hezarsalan jî wê bibîne. Di nav dewlet û civakê de şopên wê yên mezin hene. Aliyekî din yê xanedaniyê ew e ku bi rêya sulaleyê bandorê li demên dirêj dike. Niha jî çavên me bi vî peykerî dikeve, heybet dijwariya tekoşîna ji bo yektiya mislmanan tê bîra me.

Siwar weke çawa divê ew jî tiştekî bêje:

-Serokê min, gelek cihên wan hene. Lê kelha herî bi nav û deng ya Selahdîn Eyûbî, li Laziqiyê ye.

Apo bala wî li ser dirêjiya dîrokê bû, wate û ruhê wê demê dixwest bide. Serê xwe hejand:

-Berê demekê dema em wir re derbas bûn, me dît. Li cihekî bilind çêkirine, gelek bedew bû.  Wê demê, bi zewacên di nava xanedaniyan de dikarin li ser cografyayeke berfireh belav bibin. Ev taybetî nîşan didin ka çima xanedan beriya her tiştî di nav dewletê de hatine damezrandin. Ji ber ku xanedanî bi qasî ku di pêşketina civakê de rolek wan heye, di pêşketina dewletê de jî xwedî rol e. Şaristaniya Rojhilata Navîn hinekî jî bi xanedaniyan diherike heta îro. Di şaristaniya Rojava de zêdetir xanedaniyên li derveyî dewletê giraniya xwe hene, lê li Rojhilat xanedaniyên bi ser dewletê ve li pêş in, cihên fêrkirinê ne. Modelekî civakî ne. Bûyerên girîng berê li xanedan û modelên wê pêk tên, paşê derbasî nava civakê dibin. Di nav sûrê de xanedaniyên Emewî, çand û belavbûna xwe nîşan didin.

Ebbasî, Eyûbî, Selçûkî, Osmanî û Barmekî di heman demê de têne wateya netewên Ereb, Kurd û Fars. Pêwîst e mirov ne pir mezin bike, ne jî înkar bike. Divê mirov bi awayekî erênî nêzîk bibe û çareser bike.

Guhê Siwar li ser gotinên Apo bûn, çavên wî li rê bû, lê hê jî rê venebûbû:

-Avakîrina eyaleta Kurdistanê cara yekem di dema Selçûqiyan de çê bû. Xanedanên Kurd piştre di wan dema de, devletên Kurdî çêkirin, wekî, Eyûbiyan. Lê di rastiyê de van dewletan, di hin aliyên de pêşî li pêşketina Kurdan girtin. Lê çanda Kurdî di dema Eyûbiyan de bi siya Îslamê pêkanîn. Avakerên wê Kurd bûn, ne ji bo Kurdan, ji bo Îslamê bû. Eslê xanedana Eyûbiyan Kurd bû, lê her tiştên xwe xistin xizmeta serdestiya Ereb ya sunî. Aliyê wê yê erênî ev e ku ti ferq nekirine nav gelan.

Piştî ku rê vebû, ketin ser rê û berê wan ketibû ser rêka giştî. Li aliyê rastê çiyayên bilind yên Şam dorpêç kirîn û bajar bûyî weke hêlînekê, ketin ber çavên wî:

-Siwar, ev çiyayê Kurdan e! Her cara ez têm baş lê temaşe dikim.

Piştî qasekî seyare ket kolanên teng. -Şamî ji van kolanan nerehet nedibûn, heta kêfxweş dibûn. Digotin, riyên teng dilên mirovan nêzî hev dikin.- Dengê stiranên Feyrozê bi ser bajêr ketibû. Êê, Şam bê dengê Feyroz nedibû.

Gihîştin ber deriyekî dîrokî. Bi baldarî lê temaşe kir:

-Siwar, tu dizanî çend deriyên Şamê hene?

-Serokê min, deriyê Kîsan, Şerqî, Tûma, Selamê, Ferdûs, Cabî û Ferec binavûdeng in. Dibêjin di dema Romayê de her deriyek navê gerstêrekê lê hatiye kirin.

Gelek caran ew derî dîtibûn, lê her cara di ber wan re diborî bala wî dikişandin. Dixwest bizane ka hatine guhertin yan na. Guherîneke piçûk jî bala wî dikişand:

-Şam navenda siyaseta Rojhilata Navî ye. Ji qedir û qîmetê navendîbûna wê tiştek kêm nebûye.

Li taxa Mezê li ber derê apartmanekê Siwar seyare sekinand. Bilez peya bûn berê xwe dan hundir. Asansor li qata dehan sekinî. Xaniyekî xweş bû; çar ode -yek ji wan pirtûkxane bû- û eywaneke mezin bûn. Du balkonên wê jî hebûn lê her tim girtî bûn. Deriyê eywanê ji du parçeyan hatibû çêkirin. Ji her du aliyan ve parçeyên wê ber bi dîwêr ve dihatin vekirin. Di eywanê de taximek kursiyên rûniştinê, televizyonek, teybek, çend sehpayên cam û li du koşeyên wê jî du çîçekên pelên wê weke yên lavlavkê hatibûn danîn. Li koşeyekî jî bazek hatibû danîn. Her du baskên wî vekirî bûn, mirov digot qey zindiyê wê niha bifire. Li ser taqekî eywanê wêneyekî xwezayê yê pir bedew hebû. Di wêne de sûlavekî xwe ji jorê berdida û derdor tev darên pir xweşik bûn. Li ber pencereya wê jî perdeyeke bi rengê şîr hebû. Şervîn û du milîtanên din li ber derî sekinîbûn. Silav da wan, berê xwe da eywanê. Piştî hinekî rûnişt şûşeyeke avê jê re anîn. Rabû ser xwe çû ber destşûyê, vek avêt ser çavên xwe, derbasî pirtûkxaneyê bû. Derê berkêşka arşîfê kişand. Hin rapor jê derxistin dest bi xwendina wan kir.

Êvar bû, Siwar û Ciwan li eywanê rûniştibûn, milîtanên jin jî li odeya xwe bûn. Siwar pirtûk dixwend, Ciwan jî pelên albûma xwe tev didan, li wêneyên xwe yên kevin yên li Lubnanê kişandîn, dinêrî. Digel ku w çend roj bûn ji akademiyê dûr ketibû, lê jê re weke salan dihat. Albûma xwe da hev li Siwar nêrî:

-Hevalê Siwar ew çi pirtûk e tu dixwînî?

Hê ku bersiva xwe negirtî, dest bi stirana Koma Berxwedan kir. Siwar bilez serê xwe ji ser pirtûkê rakir:

-Heval, dengê xwe kêm bike. Serokatî li pirtûkxaneyê ye. Pirtûka min li ser dîroka Sûriyê ye. Îro di rê de min dît, Serokatî pir girîngiyê dide dîrokê.

-Êê, ew pirtûk li ser dîroka Suriyê çi dibêje?

-Agahiyên pir girîng tê de hene. Navê wê yê berê Bîlad Şam e. Şam bi zimanê erebî tê wateya rexê çepê. Ji ber ku dikeve aliyê çepê yê Berê Şeş ev nav lê hatiye kirin. Navê Suriyê jî ji peyva Asûrî yan jî Suryanî tê. Girên li derdora wê hemû xwediyên dîrokên kevnar in.

-Hevalê Siwar, te behsa giran kir hat bîra min; rojekê Serokatiyê ji hevalên çûyîn Cizîrê pirsa erdnîgariya wê kir. Gotin, ciyên dîrokî Girê Mozan û Til Helef tenê hene, ya din tev deşt e. Serokatiyê got, hûn tiştekî ji dîrokê nizanin, girên li herêma Cizîrê tev dîrok in.

-Serokatî her derê nas dike. Min pirtûk xelas kir, tu jî dixwazî?

-Na, jixwe te gelek tiştên wê gotin. Ezê pirtûka “Şer û Aştî” bixwînim. Serokatiyê ji hevalan re jî gotibû bixwînin.

Di wê navê re ji pirtûkxaneyê derket hat eywanê. Bi hatina wî re rabûn ser xwe. Destpêkê çû ber pencereyê. Perde rakir hinekî li derve nêrî. Bi ronahiya rojê re teveke germ jî di camê re derbasî hundir bû. Perde dîsa kişand, bi aliyê wan ve çû:

-Siwar, te ji dostan civan girt? Biçin cihên ji me re gotîn (ji bo perwerdeyê) bibînin. Heta ji we bê bila mezin bin. Çiqas fereh bin wê ewqas baş be.

-Temam serokê min, jixwe me agahî daye hevalên li vir.

-Wê demê dest bi karê xwe bike. Bila li vir ti kar dereng neyê hiştin.

-Temam serokê min. Dostê me jî li benda me ye.

-Piştî ku we cih dît zû vegerin.

-Temam serokê min.

-Serkeftin. Şiyar bin. Bangî hevalên Şamê jî bike, bila bên vir.

Piştî derketina Siwar Şervîn û her duyên din ji odeya jinan derbasî eywanê bûn. Û bi kelecan çûn pêşberî wî sekinîn. Yek rûyê wê gurover, bejna wê navî, esmer, çavhûrik, ya din jî yeka bejinbilind û porkej bû. Her du jî pir xwînşîrîn bûn. Çend kêliyan li pêşiya wan çû

hat. Ji piyên wan heta pora serê wan, ji sekna wan, heta nêrîna çavên wan, ji cilûbergên wan heta liv û tevgerên wan di ber çavên xwe re derbas kirin. Pişt re li hemberî wan sekinî; her du destên xwe xistin teniştên xwe, li nava çavên wan nêrî. Pişt re li ser kursiyekî rûnişt. Şervîn bilez şûşeya avê bir danî ser maseyê li pêşiyê. Berê xwe da ya bijinbilind:

-Navê te çi bû heval? Tu ji kû hatî?

-Navê min Dîcle ye. Ez ji Dêrikê me.

-Kîjan Dêrik?

-Dêrika Hemko serokê min.

Çend kêliyan lê nêrî. Di sekna wê de tirs û jixwebêbawerî gelek diyar dibûn:

-Xwendina te heye?

-Min şeş salan xwendiye.

-Hûn ji bo perwerdeyê hatine vir. Bernameya xwe çêkin, dest bi perwerdeya xwe bikin. Hevala Şervîn berî we tevlî bûye. Di perwerdeyan de maye, dikare bi we re bibe alîkar.

Pişt re berê xwe da ya çavhûrik. Ku dît çavên wî lê ne, çawa ku meha Tabaxê tîrêjên rojê hatibin serê, di ser eniya wê re xwêdanê avêt. Ne bi zanebûn be jî berê çavên wê ketibûn zikê xênî. Rabû ser xwe ber ve çû. Bi rabûna wî re ew jî rabûn ser xwe:

-Berî vê jî li akademiyê tu li cem me bûyî. Lê tu di nîvê dewreyê de derketî. Ji ber wê divê tu xwe pir baş perwerde bikî, pişt re derbasî xebatê bibî. Tu ji Kobanê bûyî. Divê tu wê şermokiya xwe ji ser xwe biavêjî û xwe bigihînî kesayeta tê xwestin.

Wê jî bê ku çavên xwe ji zikên xênî daxîne bersiv da:

-Ezê di nava wê hewldanê de bim serokê min.

-Li gorî berê te hin gav avêtine, lê têrê nakin. Divê tu ji bo karên mezin xwe amade bikî. Navê te Rihan bû. Emê bi hev re bin, paşê dûvdirêj biaxivin.

Rihan hinekî aram bûbû, çavên xwe ji jorê anîbûn jêrê, lê vê carê jî li aliyekî din dinêrî:

-Serokatiyê şansekî mezin daye me. Heta ji me bê emê qîmetê wê bizanin û xwe bihêz bikin.         Hinekî serê xwe hejand, ber bi pirtûkxaneyê ve çû. Pirtûkxaneyeke pir xweş bû. Li milê rastê ji serekî heta serê din refên pirtûkan bûn. Binê refan jî cihê rapor, rojname û arşîvê bû. Li ser maseyekî mezin, rengê wî qehweyî ala PKK, ERNK û ARGKê hatibûn danîn. Ji bilî wan, kasetên vîdeoyan, yên teyban, raporên herêman, albûmên şehîdan, rojnivîsên wan, pêwîstiyên wan, (çeqmeq, pênûs, lênûs, wêneyên wan, û hwd.) li ser bûn. Derbasî hundir bû, li ser kursiyê li pişt mase rûnişt. Dest avêt pirtûka Dîroka Şaristaniyê, dest bi xwendinê kir. Çend pel xwendin, Şervîn li derî xist ket hundir. Tepsiya qedeha çayê li serê danî ser mase:

-Serokê min, min çay anî. Piştî qasekî wê xwarin hazir bibe. Pêwîstiyeke din heye?

Berçavka xwe hinekî nizim kir:

-Na, tu dikarî biçî. Lê bernameya xwe ya malê bîne da lê binêrim.

-Temam serokê min.

Derket bilez çû odeya jinan. Rahişt lênûsa li ser mase, dîsa bilez çû pirtûkxaneyê. Lênûs raber kir:

-Serokê min, ev bername ji bo me her sê hevalan e. Danê sibê emê dahurînên Serokatiyê bixwînin. Piştî nivîro jî emê pirtûkên şoreşên cîhanê, dîroka jinê û pirsgirêkên civakê bixwînin. Êvarê jî saet heta dehan wê xwendina romanan û girtina notan be.

-Bernameya we baş e, lêbelê kêm e. Divê hûn nîqaşan jî bikin. Guhdarî nûçeyan bikin. Biçin cihên dîrokî bibînin. Çanda wan nas bikin. Dîroka dinyayê nas bikin. Divê hevala Dîcle, giraniya xwe bide ser naskirina rêxistinê. Hevala Rihan jî, divê di aliyê teorîk de xwe pêş bixe. Divê tu jî di her warî de xwe pêş bixî. Serê xwe li ser

pirsgirêkên rêxistinî yên vir biêşîne. Dema em hatin, divê hûn tekmîla lêhurbûna xwe bidin me. Emê hin hevalên din jî bînin vir.

-Temam serokê min.

-Dîcle heta niha tevlî ti perwerdeyan bûye?

-Na serokê min, perwerdeya li malan dîtiye.

-Perwerdeya herî mezin li vir e. Divê pir bixwîne û binivîse. Pê re nîqaş bikin. Di xebata wan ya gel de hin pirsgirêk derketine. Hina bi navê hevaltiyê xwestiye wan bikin binê bandora xwe. Ji ber wê min xwest were vir, Serokatiya partiyê ji nêz ve nas bike, bizane ka çawa dijî û çawa kar dike!

-Serokê min, ji tevgera wê diyar dibe ku ne rehet e. Serokatiya partiyê jî nas nake. Her tim dibêje, em ne mecbûr in kesekî bi her awayî qebûl bikin. Mebesta wê hûn in.

Berê xwe da cihê arşîfê, di dilê xwe de got, ev gotin ne yên wê ne, xuya ye ku ketiye binê bandora hina. Ew nizane me çi firtûne û çi şerên dijwar derbas kirine. Careke berê xwe da Şervînê:

-Hûn dibînin. Keç berê xwe didin azadiyê, hin kesên sextekar dixwazin wan bi kar bînin. Dixwazin di binê navê rêxistinê de û bi derfetên rêxistinê, wan bikin binê venêrîna xwe. Ev heval jî mînakek e.

-Serokê min, di aliyê ewlekariya Serokatiyê de ez hinekî jê bigûman im.

Biken bersiva wê da:

-Ew guneh in, ne fikrê wan e. Ez dizanim ka kî vî fikrî dixe serê wan. Divê bizanin. Bila heval rehet be. Ji bo pêşketina wê heta ji we bê derfetan bidinê. Diyar e ku bifikar e jî, wê demê di binê bandor me de ye. Dema em dîtin ket kelecanê, ev jî şêwazeke gerêdanê, yan jî hêvîkirinê ye.

-Temam serokê min. Weke we gotî emê nêzîk bibin.

-Xwarinê daynin, em bi hev re bixwin.

-Temam serokê min.

Derket çû metbexê. Dîcle û Rihan li bendê bûn:

-Em lez bikin, Serokatî di aliyê demê de pir hesas e.

Piştî çend kêliyan xwarin li ser mase hat danîn.

Tîrêjên rojê di pencereyê re xwe ber bi eywanê ve berdabûn. Li pirtûkxaneyê li ser kursiyê xwe yê qehweyî rûniştibû. Zerfeke tijî rapor li ser mase bû. Yek bi yek û bi baldarî dixwendin. Ji bo ku xalên girîng ji herêman re bişîne, ji raporan not digirtin, di lênûsekê de dinivîsîn. Destê wî li ser rûpela spî bilez diçû dihat. Destnivîsa wî pir xweşik bû. Ne hûr, ne gir bû û xweş dihat xwendin: "Ji bo rêveberiya Rojava." Ez raporên hevalan tevan yek bi yek dixwînim. Li herêman herî zêde pirsgirêka biryarê û qutbûna ji malbatê diyar dibin. Ji ber wê divê hûn giraniya xwe bidin ser dahurîna malbat û jinê. Divê her kes bizane ka em çawa nêzîkî malbatê dibin. Ka çima û çawa me xwe ji malbatê qut kiriye û ji bo kîjan armancan em van dikin, divê wê jî bizanin..."

Rapor tev hatibûn xwendin û notyên girîng tev hatibûn tomarkirin. Perspektîfên ji bo qadan jî hatibûn amadekirin. Ji bo bêhnvedanê berê xwe da eywanê. Li ser kursiyê di nîvî de rûnişt. Radyoyeke piçûk di destê wî de bû, vekir guhdarî nûçeyên BBC kir. Wê rojê nûçe bi giranî li ser şerê li Bakur bûn. Piştî guhdarîkirina nûçeyan televizyon vekir. Her sê milîtanên jin jî xwe dabûn ser kursiyên li hemberî wî, çayên wan jî li ber wan bûn. Çavên Şervînê ji ser nediçûn. Pir mereq dikir ka li ser rewşa dawî çi dihizire. Rihanê pora xwe nû qut kiribû û rengê rewşenbîran dabû xwe. Çavên wê jî ji ser nediçûn. Car bi car xeyalên wê diçûn ser çiyayên azad. Destek cilûbergûn gerîla li ber bû, çeka wê li milê wê û rextê wê li pişta wê bû ji serê çiyayê Cûdî xwe berdida xwarê. Ev xeyal pir li xweşê wê diçû. Ji ber wê carna çavên xwe digirtin. Çavgirtina wê bala wî

kişandibû:

-Hevala Rihan, piştî lêhûrbûneke baş tu dikarî çi bikî?

Pirsa wî ji nava wê xeyala wê ya xweş derxistibû:

-Serokê min, partî çi guncaw bibîne, ezê wê bikim.

Apo serê xwe jêr û jor ve bir anî:

-Ji bo xebata nava gel tu amade yî? Bi salan jin ji her tiştî qut kirine. Ji bo pêşengiya civakê em dixwazin herî zêde derfetê bidin jinê. Divê hûn bizanin ka şaristaniyên dinyayê û şoreşan çawa dest pê kirine. Bi taybetî divê hûn dîroka xwe, dîroka jinê bişopînin. Tu çi dibêjî?

Rihanê ne dikarî bêje na, ne jî di dilê wê de çûna nava xebata gel hebû:

-Serokê min, ez ji xebata gel hatime, eger qadên leşkerî bin wê baştir be.

Hinekî rûyê xwe tirş kir:

-Heval, tu ji zehemetiyê direvî. Ji ber wê tu dixwazî biçî xebata leşkerî. Xebata nava gel zor e, berî her tiştî divê tu gel binasî û kesayeta xwe ava bikî. Divê tu civaka Kurdistanê jî binasî, ev pêwîst in. Ez jî dixwazim biçim welat, lê hûn dibînin va li vir kar dikim. Te bixwe jî got li gorî pêwîstiyên rêxistinê. Herî zêde niha pêwîstiya me bi rêxistin û tevlîkirinê heye. Divê ji bo her xebatê tu xwe amade bikî. Vir cihê wê ye, derfet di destê we de ne.

Xeyalên wê tev serûbin bûbûn. Xwest bêje, ez dixwazim kesayeta xwe li welat ava bikim, lê negot. Li ser gotinên wî hizirî.

Berê xwe vegerand ser Dîcle:

-Hevala Dîcle, tu çi dixwazî? Xwestekên te ji me çi ne?

Ji destpêkirina axaftina wî bi Rihanê re jixwe ketibû nava kelecanê. Ku dor hat serê kelecana wê dehqt bû. Çawa ku lingên wê ji erdê qut bûbin û nikaribe bifire jî wisa lê hatibû. Di nava wê rewşê de enceq karibû hevokekê amade bike:

-Hedefa min naskirina partiyê û kûrbûna di fikir û ramanên Serokatiyê de ye.

-Va hûn min dibînin ka ez çawa dijîm, çawa kar dikim. Divê tu pir bixwînî û jixwebawer bî.

Pir bêdeng û bê liv û tevger bû. Wisa xuya dikir ku hê nehatiye ser hişê xwe. Bawer nedikir ku li pêşberî Apo ye. Vê rewşa wê bala wî kişandibû. Hinekî li cilûbergên wê û li pergala rûniştina wê nirî. Xwe di milekî de xwar kiribû, mirov digot wê niha bikeve erdê. Weke keseke şermoke xuya dikir; dengê wê lerzonek, gotinên wê jî pir lewaz bûn. Çend kêliyan wisa lê nêrî, di dilê xwe de got, ev rewşa wê lewazbûna biryardariya wê jî nîşan dide. Xwest hinekî bihejîne da xwe komî ser hev bike:

-Pergala te weke ya keçikên malê ye. Tu perîşan xuya dikî! Xwe ji van kevneşopiyên paşverû rizgar bike. Wê heval ji te re bibin alîkar, lê alîkarê herî mezin insan bixwe ye. Li vir tê bibînî, ez bi serê xwe dimeşim û her kesî dikim tevgerê.

Şervînê ku ferq kir Dîcle ketiye zorê ket navberê:

-Serokê min, nîqaşên me çêdibin, lê heval ji xwe ne bawer e.

Careke din li pergala wê temaşe kir:

-Heval, tu rengê jinên Kurd didî. Divê hûn ruh bigirin, ne weke miriyên li ser piyan bin. Li vir ruhê bê girtin diyar e, ruhê jiyanê ye, dengê wê ye.

Ji nişka ve berê xwe da Rihanê. Pora wê ya kurt bala wî kişandibû. Hinekî ber ve çû. Çend kêliyan li pora wê nêrî. Çawa di venêrîna doktorê çavan de be, ji kelecanê reşikên çavên wê geh bi milê rastê ve diçûn, geh bi milê çapê ve. Çawa ku bi salan berberî kiribe wî jî wisa li pora wê dinêrî:

-Heval, kê pora te wiha kin kiriye?

-Hevalan serokê min.

Pir şaş bûbû. Ne li bendê bû ku derbarê pora wê de pirsan jê bike.

Berken bû. Didanên wî yên spî xuya kirin. Dema berken dibû bedewiyeke pir şîrîn diket ser rûyî wî:

-Temam baş e, lê xweş qut nekirine. Pir kin kirine, bûye weke ya lawikan. Tiştên li we bên û bi dilê we bin, bikin. Hûn bixwe bizanin ka çi reng û çawa li we tê û wisa bikin. Li gorî xwesteka ti kesî şekil û şemal nedin xwe. Ji jiyanê heta, cilûbergan, ji axaftinê heta hizirîn û helwestê, bila hemû bi daxwazî û fikrên we bin.

Careke din li pora wê nêrî û hê berkeniya wî ji ser neçûbû:

-Bawer dikim çavê wan bare negirtiye, ji ber wê bedewiya pora te birine.

Wê jî wêneyê pora xwe dianî ber çavên xwe. Dikir nedikir nikariya di hişê xwe de ji pora xwe re dîmenekî biafirîne. Di wê navê re dengê derî hat. Dîcle bilez çû derî vekir.

Bi dengê bilind gazî kir:

-Kî ye heval:

-Serokê min, hevalê Siwar û hevalekî din e.

-Temam bila bên.

Siwar û yê pê re derbasî metbexê bûn.

Piştî axaftina ji bo perwerdeyê û bernameya malê, gazî wan kir. Ji bo rûnştinê cih nîşanî wan da. Her du li hemberî wî rûniştin. Kesê bi Siwar re hatî bedlekî şînê asîmanî û gumlekekî spî lê bûn. Ji rûyê wî rêzdarî û giranî diyar dibû. Pora xwe bi şûn ve şeh kiribû. Pêşiya eniya wî sivik bûbû. Çavên wî li ser Apo rawestiyabûn.

-Serokê min hûn çawa ne?

-Spas heval em baş in, hûn çawa ne? Herî dawî li akademiyê me hev dîtibû.

-Rast e serokê min.

Gelek mijar hebûn ku pê re nîqaş bike, lê tişta li bendê û ji her tiştî girîngtir agahiyên li cem Siwar bûn:

-Siwar we çi kir?

Siwar bi destê xwe yê li tenişta xwe nîşan da:

-Hevalê Selah jî bi min re bû, me çend cih dîtin.

-Cihin çawa ne, bi kêrî pewerdeyê tên? Divê mezin bin.

-Serokê min, hinekî biha ne, lê wê jê daxin.

-Ew ne pir girîng e, ya girîng peydakirina cih e.

Ji ber ku cih hatibûn dîtin dilê wî rehet bûbû. Xwest Selah derbarê xebata xwe de agahiyên berfirehtir bide:

-Li ser xebata Şamê em axivîbûn. Hûn wê demê çend kes bûn?

-Em pênc kes bûn serokê min.

-Rast e, bi koma Kurdên Şamê re hûn hatibûn. Ji bo me girîng bû. Min wê demê ji we re gotibû emê bi hev re pir karan bikin.

-Belê serokê min, min çend rapor jî şandibûn.

-Ew hevalên din çawa ne, baş in, kar dikin?

-Niha ji berê çalaktir in.

Selah tevî ku ji malbateke jixwerazî bû -ji wan re digotin yên navikên xwe dibirin- û bi berpirsên gelek partiyan re rûniştibû, her dema li cem rûdinişt hestên cuda pê re çêdibûn û eniya wî xwêdan dida. Dixwest wê kêliyê ferqa di navbera wî û serokên partiyên din de bibîne. Vê carê jî ketibû rewşeke wisa. Bi kefa destê xwe xwêdana li ser eniya xwe paqij kir. Bala Apo jî li ser bû. Xwest diyalogê bidomîne:

-Raporên te gihîştin min, we dest bi karekî baş kiriye. Ji bo xwebirêxistinkirin û pêşvebirina xebata dîplomasiyê firsendeke mezin ketiye destê Kurdên li Şamê. Ziman baş dizanin û rewşa wan ya aborî jî baş e. Dikarin têkoşîna me bi gelên din bidin nasîn û di navbera gelê Kurd û Ereb de bibin pir. Ev xebata herêmî ji wan tê xwestin. Emê bi hev re civînan jî li dar bixin û bi wan re berfireh biaxivin.

Rabû ser xwe ber bi quncika eywanê ve çû. Baz bilind kir çend kêliyan li çavên wî nêrî, dîsa vegeriya li cihê xwe rûnişt. Di wê navê

re qehwe ji wan re hat. Çend qurt lê dan dîsa berê xwe vegerand ser Selah:

-Niha em vegerin ser mijara erdan û cihên we dîtîn. Hûn jî dişopînin, li ser me gelek zor heye û istixbarata Lubnan û Sûriyê ji bo mayîna me ya wir (Akademiya li Bîqayê) guncaw nabînin. Ji ber me bi ser Sûriyê de jî pir tên. Ji bo girtina akademiyê pir zorê didin hukumeta Lubanê jî. Berpirsên Suriyê dixwazin em bi hev re rûnin. Em wan bibînin. Em bizanin ka daxwaziyên wan çi ne.

Barekî giran ketibû ser milê Selah; hem dixwest ji Apo baş fêm bike, hem helwesta Suriyê fêr bibe, hem erka ketî ser milê wî pêk bîne. Apo jî bi çavê wergêriyê li wan nedinêrî, dixwest wan di nava karekî wisa girîng de pêş bixe:

-Lê ne daxwaziyên wan tenê, emê jî daxwaziyên xwe bi ser wan de bisepînin. Ebdulhelîm Xedam dixwaze bi me re rûne. Berdevkê Hafiz Esed e. Wan civan daye, em jî amade ne. Lê divê em jî bi hazirî biçin.

Destê xwe da ber erzeniya xwe çend kêliyan li ser tiştên li ser mase nêrî. Awirên wî tûj û kûr bûn. Serê xwe bilind kir li Selah nêrî:

-Hevalê Selah, tuyê jî êdî bi me re bî. Li dijî daxwaziyên me dernakevin, lê wê pir jî mecalê nedin me. Wê bixwazin em ji çarçoveya derfetên bidin me dernekevin. Em jî wan naxin zorê, lê emê xebata xwe jî bimeşînin. Cihên we dîtîn zû bikirin, ji dest bernedin.

-Me soz ji xwediyê cih standiye serokê min, li benda me ne.

Selah ketibû nava bablîsokeke ji fikir û fikaran; dikir nedikir nikariya ji nava hev derîne ka armanc û daxwaziyên Apo çi ne û wê çawa di vê neqeba weke Pira Sîratê re derbas bibe. Dengê banga melê hat. Apo serê xwe bilind kir hinekî guhdarî kir. Di wê navê re jî hûrmûrên ketîn ser mase paqij kirin. Ji cihê xwe rabû ber bi pirtukxaneyê ve çû, Selah û Siwar jî li eywanê bêdeng rûniştin.

Kurmê di serê Selah de weke berê ne di tevgerê de bû, derbarê Apo de weke berê hişê wî ne belawela bû. Çend caran li ser hev serê xwe bi jêr û jor ve hejand: Ev serok li kû, yên min dîtîn li kû... Bi dengê telefonê re ji nava mitaleyên xwe derket. Siwar bilez çû telefon rakir:

-Belê, kerem bikin!

Axaftina Siwar ya bi erebî kelecan bi Selah re çêkir. Ji axaftina erebî û ji liv û tevgera Siwar têgihîşt ku civan hatiye dayîn. Telefon danî, yekser berê xwe da pirtûkxaneyê. ji ketina wî ya hundir têgihîşt ku tişteke girîng heye:

-Ha, Siwar çi heye?

-Serokê min, xwediyê cih ji bo hevdîtinê amade ye.

Ew jî li benda vê civanê bû:

-Xwe amade bikin em biçin!

Hê kelecana Siwar li ser bû, derket çû cem Selah. Selah devê xwe vekir da jê bipirse ka çi heye, lê hê gotina wî di devê wî de, Apo ji pirtûkxaneyê derket, ber bi wan ve hat. Gumlekekî xakî û pantolonekî gewr li ber bûn. Pêlavên di piyên wî de yên sporê û spî bûn. Selah bi wan çavên xwe yên gir lê temaşe kir. Di dilê xwe de got, pir bihyebet xuya dike, lê xwezî destek cilên bedil li xwe bikira. Bestûka gumlekê xwe rast kir, li pêşberî wan sekinî:

-Çekên min çawa ne Selah, baş in?

-Belê serokê min, xweşk in. Lê ku yên fermî bûna wê baştir bûya.

Li bejin û bala xwe nêrî. Ji rengê rûyê wî diyar dibû ku kêfa wî ji wan re hatiye:

-Wiha baştir e. Emê bi çanda xwe biçin cem wan.

Her sê bi hev re derketin derve. Çavên wî li derdorê bûn:

-Siwar, ezê hinekî bimeşim, hûn jî seyareyê bînin milê din!

Bi rê ket Selah jî xwe da teniştê. Bilez dimeşiya. Berê xwe da milê taxa Mezê. Kutekuta dilê Selah bû. Pir bifikar li derdora xwe dinêrî. Di dilê xwe de got, di vê rê de tiştek biqewime emê çi bikin.

Hê di nava wan xeyalan de bû, jineke bejinkin û gurover ji dikana li hember derket. Qotiyeke ava bacanan di destê wê de bû. Berê wê û Apo ket hev. Dengekî bilind bi ser ket:

-Bi Xwedê ez te nas dikim!

Û çawa ku ji bo firînê teyrek baskên xwe veke, ji bo himbêzkirinê her du çengên xwe vekirin. Bi vekirina çengan re qotiya di destê wê de ket erdê. Lê jixwe ne li xema wê bû ka çi ji destê wê ketiye. Apo ketibû navbera Xelîl û Celîl; ew jî çengên xwe veke li ser devê wê rê jinikê himbêz bike nabe, xwe lê neke xwedî ew jî nabe. Lê ji ber ku nedixwest li wir zêde bisekine, hewl da derbas bibe. Lê jinikê xwe ji pêşiyê neda aliyekî. Ji kelecana dîtina wî ewqas ji nêzîk ve, rûyê wê weke sêveke sor lê hatibû. Bi dil û can û bi çavên tijî hêvî, li rûyê wî dinêrî:

-Pa bi Xwedê tu serok Apo yî, tu serokê me yî.

Û bi gotina xwe re destên xwe li stûyê wî weranîn. Wî çengên xwe venekiribûn, lê pêşiya himbêzkirina wê jî negirtibû. Ji ber mijara ewlekariyê Selah jê li dora xwe dinêrî:

-Serokê min, em dereng dimînin. Civanê me derbas dibe.

Apo pirsa rewşa wê kir û derbas bû çû. Ji wir dûr ketibû jî, lê jina Kurd, çawa ku her tişta xwe wenda kiribe û nizanibe ka çi bike, her du destên xwe xistibûn navkêla xwe li pêşiya xwe dinêrî. Li ser devê wê rê ne dilivî ne xwe dida aliyekî. Jineke cîrana wê ber ve dihat:

-Çi bûye Cîhan, tu wiha sekinî, tiştek bûye?

Di ber re jî milê wê dihejand. Destê xwe bi ser serê wê de bir. Cîhanê fêm kiribû ku Apo li cihekî nêzîkî wan dimîne:

-Diya Alan, min Serok Apo dît. Bi serê te min himbêz jî kir. Lê nesekinî çû.

-Hişş. Dengê xwe kêm bike. Ev tu dîn bûyî, karê Serok Apo li van deran çi ye?

-Keçê, ez dibêjim min himbêz kiriye, tu dibêjî tu dîn bûyî. Ma ji

ecêb re ezê serokê xwe nas nekim? Min got tu serok Apo yî, wî jî pirsa min kir.

-Ma ez çi zanim, min got belkû neyê van deran. Xwezî min jî bidîta. Hê gotinên wî yên di Newroza borî de weke niha li bîra min in. Ew cara yekê bû min serokeke Kurdan didît li ser tola şehîdan, xayîntiya nava Kurdan û serokatiya sexte diaxivî! Lê te ji min re got, ji ti kesî re nebêje.

***

Di odeyekê de Apo û Selah rûniştibûn. Bi singa dîwêr ve wêneyekî Hafiz Esed yê mezin daleqandî bû. Piştî qasekî çay ji wan re hat. Hê çaya wan li ber wan bû, zilamekî temenê wî li derdora şêstî û serê wî li jorê ket hundir. Yekî girê bilind û eniyeke fireh li ser bû. Pora xwe ya hinekî xelek di aliyekî de şeh kiribû. Rûyê wî yê fereh bi ser sor ve diçû. Rû û simbêlên xwe nû kur kiribûn. Çawa ku dinya tev di binê lingên wî de be wisa dimeşiya. Ji bo pêşwaziyê rabûn ser xwe. Çawa ku dostekî xwe yê kevin dîtibe, destê xwe bi germî dirêjî Apo kir û destê wî şidand:

-Hevalê Ebdulah, tu bi xêr hatî, tu çawa yî?

Apo jî bi rûyekî geş, çavên dostane û bi awayekî jixwebawer bersiva wî da:

-Tu jî bi xêr hatî, hûn çawa ne?

Piştî ku wisa li ser piyan kêfxweşî li hev dan, çû li ser kursiyê li pişt mase rûnişt. Berê xwe da Apo. Berî hingê jî gelek caran dîtibû, ji ber wê dizanî hema serê mijarê veke wê Apo dawiya wê fêm bike. Dema xwestekeke wan jê hebûya rasterast digotin, ne bi awayekî çors, ne jî pir nerm û neyê fêmkirin. Demeke dirêj bû nas dikir, lê dixwest bizane ka çi guherîn pê re çêbûne. Li rûyê wî baş nêrî:

Me xwest we bibînin. Çawa hûn jî dizanin, mayîna we ya li

Bîqayê êdî zehmet e. Ev demek e hûn jî vê dibînin. Divê em kampê bigirin. Hûn bi çapemeniya giştî jî hesiyan. Ji ber wê divê dîmen û wêneyan hevalên we li Bîqayê dernekevin. Wê gelek rojnamevan biçin wir. Divê bizanin ku ti kes ji we li wir nemaye. Em dixwazin dinya bizane ku Partiya Karkerên Kurdistanê ji wir derketiye!

Çavên wekîlê Hafiz Esed Ebdulhelîm Xedam, li ser Apo rawestiyabûn. Awirên çavên Apo, arambûna wî ya li hemberî pirsgirêkan, bêminetiya wî, giraniya wî, jixwebawerî û heybeta wî bala Xedam dikişandin. Vê rewşê wisa dikir ku li hemberî kesayeteke wisa rêzdar be. Bi awayekî aram û jixwebawer bersiva wî da:

-Rast e, pir bi ser Suriyê de tên. Ji ber wê heta ji me bê emê wê hesasiyeta di têkiliyan de û dostayiya xwe biparêzin.

Xedam bi bersiva wî pir kêfxweş bûbû û baştir fêm kiribû ku hem dixwaze Suriyê biparêze, hem kar bê meşandin. Lê ji bo karê xwe jî li hemberî ti kesî kemberbest nabe. Uslûbê axaftina wî û zelalbûna gotinên wî jî bala Xedam kişandibûn. Lê ji ber fermiyeta xwe nedixwest kêfxweşiya xwe bide diyarkirin. Êê, dewlet tişteke wisa ye; divê berpirsên wan hestên xwe yên mirovî nedin diyarkirin.

Apo jî hem ji axaftina wî, hem ji tevgerên wî ferq kiribû ku li hemberî wan komployeke mezin heye û Suriye jî neçar e li hemberî wê planê gavna biavêje. Ji ber wê nedixwest nîqaşê dirêj bike, yan jî bêencam ji wir derkeve. Di encamê de nêrîneke wiha hevbeş derket; wê rêxistin li Şamê hin malan bigire û ji bo birîndar û pêwîstiyên wan jî derfet bên dayîn. Bi kurtayî wê akademiya li Bîqayê bê girtin, piçûk jî be ji bo PKKê dergahek li Şamê bê vekirin. Piştî vê lihevkirinê, êdî mijareke li ser bê axaftin nemabû, dema xatirxwestinê bû. Tev de rabûn ser xwe. Ji geşbûna rûyê Apo diyar dibû ku tişta dixwest bi dest xistiye, Xedam jî bawer dikir ku mezinbûn û heybeta dewletê nîşan daye. Bi hev re ji hundir derketin.

Xedam destê xwe ber ve dirêj kir:

-Hevalê Ebdulah, em hem dost in, hem bira ne. Divê gelê Kurd jî wisa bizane.

Siwar deriyê paşî yê seyareyê vekiribû li benda wan bû. Siwar bûn û bilez ji wir dûr ketin.

***

Ketibû meha Îlonê. Çend roj bi ser hevdîtina bi Xedam re derbas bûbûn. Êrîşên li ser Suriyê roj bi roj pirtir û dijwartir dibûn. Van êrîşan yekser bandor li PKKê jî dikir. Jixwe di hedefa sereke ya Tirkan de PKK bû. Di nava waqas pirsgirêkan de Apo di nava haziriyên mezin de bû. Li eywanê  ew, Selah û Siwar rûniştibûn. Dîcle, Rihan û Şervîn jî li odeya xwe dixwendin. Li ser vê bablîsoka siyasî û pêvajoya nû kumê xwe danîbû ber xwe dihizirî. Hem derfeteke nû vebûbû, hem fikarên wî hebûn. Pêwîstî bi pêngaveke nû hebû. Di dilê xwe de got, divê kêştiya me bi selametî xwe ji vê tofanê rizgar bike. Tofana Nebî Nûh hat bîrê û hinekî berken bû: Wî jî kêştiya xwe û yên tê de bi selametî rizgar kiribûn. Wisa xuya dike ku wê zûbizû tofan ji vê herêmê xelas nebin. Lê wê her tim Nûh jî hebin.” Vê atmosfera giran di hundirê malê de jî xwe dida der. Hem Selah û Siwar, hem her sê jinên li odeya xwe di nava mitaleyên kûr de bûn. Çawa ku di hundir de oksîjen namabe û bi zorê bînê bistînin, xwe wisa hest dikirin. Lê dema çav bi Apo diketin çawa ku çiyayek li pişta wan be, ewqas baweriya wan bi wan dihat.

Bi dengê fîzefîza bayê re serê xwe bilind kir. Rabû ser xwe çû ber pencereyê. Bayekî dijwar li camên pencereyê dixist. Destê xwe xist berîka xwe zerfek jê derxist. Komek not tê de bûn. Rûnişt dest bi xwendina wan kir. Piştî xwendina çen notan, serê xwe bilind kir li Selah nêrî:

-Divê em hevalan ji akademiyê zû derxin. Piştî niha mayîna wan li wir ne baş e. Ji gotinên berpisên Suriyê diyar dibe ku êrîşên cuda jî hene. Dewleta Tirk dikare li herêmê tevlîheviyan jî derxe. Divê em hevalan nekin xeterê û Suriyê jî nekin zorê. Bila dostayiya me xirab nebe. Hema îro biçin. Berî ku aloziyek derkeve, bi riyên cuda hevalan ji wir derxin.

Selah, mirovekî jîr bû; hem nava Şamê pir baş nas dikir, hem derdora Bîqayê:

-Serokê min, em rê baş nas dikin û ji bo ewlekariya hevalan jî emê tedbîran bigirin.

-Destpêkê hevalan kom bi kom bînin vir. Pişt re li malên welatparêzan bi cih bikin.

Siwar û Selah ketibûn nava fikaran, wê bi sedan milîtanên bênasname ji Lubnanê bianiyan Şamê. Diviya hem ew hem alavên wan yên leşkerî neyên girtin.

-Lê zû vegerin. Divê em biçin cihên we dîtîn bigirin.

Bi hest û zanebûna ku barekî pir giran li ser milê wan e derketin.

***

Apo li eywanê diçû dihat. Şevê bêdengiya xwe li ser Şamê raxistibû. Carna perdeya li ber pencereyê radikir li nava bajêr dinêrî. Zengilê telefonê lê xist. Berî ku Şervîn xwe bigihîniyê wî rahiştiyê:

-Elo. Agir tu yî?

Bi gotina xwe re dest bi pirsan kir:

-Rewşa hevalan çawa ye?

-Hemû jî baş in, serokê min.

-Bêje; çi heye çi nîne?

-Serokê min, têkiliyên me yên bi Îranê re baş in. Ji bo birîndaran me du mal girtine û yên ji Balkanan hatîn me ew jî derbasî çiyê kirin.

Ji deverên din jî heval bê pirsgirêk derbasî vir dibin. Derveyî van tiştekî din qebûl nakin. Ji ber wê gelek caran derbarê xebata nava gel û derxistina şervanan de pirsgirêkên me bi dewletê re çêdibin. Bi taybetî naxwazin em li Kurdistanê karê rêxistinê bikin. Lê em nahêlin pirsgirêk mezin bibin.

-Ev tên fêmkirin, weke din tiştek heye?

-Weke din em dixwazin hevalên birînên wan giran bişînin Ewropa.

Bi tona dengê xwe xwest girîngiya mijarê bi aliyê din bide fêmkirin:

-Derfetên heyîn baş bi kar bînin. Bila têkiliyên me bi sîstemê re xirab nebin. Pêdiviya me bi wan têkiliyan heye. Lêbelê gelek hevalên li zindanên wir xwestekên wan hene û dest bi berxwedanê kirine. Cara yekê ye ku hevalên me li wir dest bi rojiya mirinê dikin. Divê haya we ji wan hebe. Divê sîstem jî vê tevgerê baş nas bike. Bexwedana wan silav dikim û silavên min bigihînin wan.

Li gorî girîngiya mijarê, dengê wî dihat guhertin. Û ev rewş di awirên çavên wî de jî diyar dibû.

-Li wir xebateke baş hatiye destpêkirin, lê hesas nêzîk bibin! Di aliyê îdeolojî de me bi gel baş bidin nasîn û firsendê nedin ku hin me şaş bidin nasîn!

-Serokê min, jixwe em jî wisa dikin. Lê ji bo xebatê û têkiliyan pêdiviya me bi kadroyan heye.

Çawa ku bi hevoka dawiyê hêrs bûbe, dengê xwe hinekî bilind kir:

-Kadro hemû li cem we ne. Lê divê hûn wan baş bi cih bikin. Divê hûn ne li gorî nerînên xwe yên şexsî, li gorî pêdiviyan bi cih bikin. Ev ji we tê xwestin. Hûn dizanin ez ji vir kadroyan tevan rêdikim aliyê we. Hûn rewşa vir jî dişopînin, hin rewşên em bi hev re dirêj niqaş bikin hene. Sibê bi bêsîmê jî dibe…

***

Ew demek bû dinya tarî bûbû. Selah û Siwar li akademiyê, di odeya rêveberiyê de rûniştibûn. Her kes li bendê bû ka çi agahî ji Şamê anîne. Fikaran û bêaramiyê li ser rûyê her kesî xuya dikirin. Siwar pakêteke piçûk ji berîka xwe derxist da destê Cesûr:

-Ev nota Serokatiyê ye. Ji bo alîkariyê em jî erkdar kirine.

Cesûr pir bilez û bikelecan pakêt vekir dest bi xwendina notê kir. Rûyê wî ji rengekî diket rengekî din. Carna awirên çavên wî dijwar dibûn, carna jê qermîçek diketin eniya wî. Çawa ku bîna xwe girtibe, wisa bi baldarî dixwend. Di nava çend kêliyan de xwend, dîsa xist cihê wê. Serê xwe rakir, hinekî li yên derdora xwe nêrî. Baş ne diyar bû lê mirov digot qey rondik ketine çavên wî. Lê diviya  bi yên li derdora xwe nede hestkirin û moral bide wan. Li Selah û Siwar nêrî:

-Jixwe hûn îşev li vir in. Bila heval cihê razanê nîşanî we bikin. Sibê emê li hev bicivin.

Siwar kefiya xwe avêt ser namilên xwe:

-Pêwîst nake, em cih nas dikin.

Ew û Selah bilez derketin, berê xwe dan qawîşên xortan. Selah destê xwe avêt çengê Siwar. Hingî di ervaz de bilez meşiyabûn hilehil bi ser dilê wan ketibû:

-Hevalê Siwar ew hevalê Cesûr bû, ne?

-Rast e, te berî niha nas dikir?

-Erê, şevekê li mala me mabû.

-Hevalê Siwar, hevalên ji welat tên dayîka min pir behsa wan dike. Ji me pirtir ji hevalan hes dike. Her tim ji me re dibêje, lawo, bêhna cihê bav û kalan ji wan tê, bêhna azadiyê ji wan tê! Ma ew jî nû ji welat hatiye?

-Bawer bike ez jî weke te nizanim.

Selah, li milekî kêfxweş bûbû ku ku ji aliyê Apo ve hatiye erkdarkirin, li milekî jî dihizirî ka wê çawa bi serfirazî erka xwe pêk bîne:

-Hevalê Siwar, ku dema me hebe ezê hinekî pê re suhbet bikim. Hingî behsa wî dikin dîtina wî ji min re bûye hesret.

Siwar, bideng keniya:

-Eger tu heta sibê sebir bikî emê wan bibînin.

Selah hinekî sekinî, rojên, borî û nîqaşên li ser PKK'ê kiribûn hatin bîrê:

-Hevalê Siwar, hevalên min yên di nav tekoşîna Filîstînê de li van deran hebûn. Wan di gotin, me jî di serî de dihizirî ku şoreşgerên PKK'ê weke yên me ne. Şoreşgeriyekî bi peran dikin. Wiha me serokê wan jî weke yên xwe nas nedikir. Lê piştire me fêm kir ku ji nenaskirina me ya ji partiyê re bû. Ew li dinyakî bûn, em li yekî din bûn.

Siwar baş lê guhdar dikir, hem bêhna xwe vedabûn, hem jî Siwar li benda qedandina gotina wî bû:

-Ê paşê cudabûn çawa dîtine?

Selah hinekî keniya, bi gavên hûrik meşiyan:

-Paşê dema dîtin şev û roj heval bê miqabil dixebitin, fêm kirin ku ne weke wan in. Bi taybet mijara kelha Şiqêfê, gelek baweriya wan bi PKK'ê hatibû. Wê demê, Îsraîl şerek dijwar kiribû. Bi xwe digot, yên li ber xwe dayîn hevalên PKK'ê bûn. Heta niha jî şehîdên me tînin bîra xwe, li ser wê berxwedanê lêkolîn dikin.

Nêzîkî qawîşê bûbû, Siwar dixwest gotinê bi dawî bike:

-Li wir Îsraîlê zanîbû şoreşgerê, PKK'ê li ber xwe dabûn.

Sehal lingê wî li kevir ket, hinekî êşiya, lê gotina xwe berdewam kir:

-Wê rojê em bi hev re bi serok re çûn cem alîkarê Esad Xedam. Ew kesên duyemîn di Sûriyê de ye. Gelek tişt di destê wî de ne. Min

li ser lêkolîn jî kir, ji Banyasê ye, Suniye. Di serî de bi Bi Esad re li nav tevgera Teshîhê de bû. Di şeran de jî bi hev re bûn. Bi siyaseta xwe tê nasîn. Baasiyeke hişk e, melefê me yê siyasî ew dişopîne. Ew hevdîtin hê li ber çavên min e. Serok tiştê dixwestin bi awayekî hêsan digot, li ser Tanso axivîn. Di gotinên wî de diyar dibû ku dizanî Tirkiyê nikare li hemberî serokatiyê bi ser bikeve. Baweriya min heye ji cem me rabû, çû cem Esad. Perspektîfan ji Esed distîne. Ewlekariya wî baş tê girtin. Ya min dîtî, pir cidî nêzîkî serokatiyê dibû.  Ma bala te nekişand, têkiliya serokatiyê dixwest pêşbixîne ji ya wan cudatir bû. Serokatî bi pêşerojê re mijûl dibû, lê wî tiştên rojane û li gorî berjewendiyên xwe didan pêş. Ji tevgerê serokê me pir şaş mabû. Serok weke xwe nêz dibû, ti tiştekî xwe nake bin venêrîna wan de. Heta cilên serokê me li gorî wî ne, ne li gorî ew dixwazin.

Bi gotina nobedar ya “Hûn kî ne” re, axaftina xwe qut kirin. Xwe dan naskirin, ketin hundir.          Di hundirê qawîşê de ranze hatibûn danîn. Her kes razabû bixepixa wan bû. Hina dikir xurexur, hina didanên xwe disîqirandin û yek jê diaxî. Yê li tenişta yê dikir xurexur diniquçandê, lê haya wî ji bayê felekê tinebû. Nobedar li pêşiya wan bû. Cihê razanê nîşanî wan kir:

-Me ev ranze ji bo we vala hiştine. Weke din ti pêwîstiyên we hene?

Spasiya wî kirin. Selah li betaniyan dinêrî, Siwar jî hem cihê xwe rast dikir, hem bi dengekî nizim pê re diaxivî:

-Hevalê Selah, divê tu wiha hinekî leşkerî razî.

Selah betanî nexwest, roja pazdê Tebaxê anî bîra xwe:

-Bi Xwedê ez dicemidim, lêbelê berê jî ez hatime vir, li derve di sermayê de razame. Betaniyek jî bi destê me nediket. Erê meha Tebaxê bû, lê bi şev pir sar bû. Îşev wiha bi destê min ketiye, êdî ezê çi bixwazim. Bes e û gelek e jî.

-Wê demê ji bo me her duyan jî şevbaş.

Roja din serê sibê Siwar û Selah bi dengê nobedaran re şiyar bûn. Betaniyên xwe pêçan, xwe bi ser hev ve dan û berê xwe dan qada akademiyê. Selah careke din çavên xwe li derdora akademiyê gerandin. Li her tiştî bi baldarî temaşe dikir. Yên dereng rabûyîn ew bûn, ji bilî wan her kes di nava tevgerê de bû. Ji milê Berliyasê ve seyareyek derbasî akademiyê bû. Siwar dimeşiya, çavên Selah li ser seyareyê bû. Di cihê xwe de sekinî, çavên xwe kuskusandin. Tiştek fêm nekir. Pişt re çavên xwe hinekî ferikandin, careke din li aliyê seyareyê ve nêrî:

-Hevalê Siwar, ew ne serok e ji seyareyê peya bû?

Siwar jî vesekinî, li aliyê seyareyê nêrî:

-Belê bi Xwedê ew bixwe ye.

Hem ketibû kelecanê, hem fikar pê re çêbûn. Xwêdanê di eniya wî de avêt:

-Ji me re negot ezê werim, gelo dibe ku tiştek qewimîbe?

Selah jê aramtir bû:

-Gelek caran bê agahî diçe deran. Dema dihat mala me jî carna agahî nedida.

Her duyan bilez xwe berda qadê, li ser devê rê gihîştin hev. Apo zaniya nû ji xew rabûne:

-Hûn hê necivîyane? Wê îro mêvan bên, divê em wan pêşwazî bikin. Emê paşê karê xwe yê din bikin.

Yên di rêveberiyê de tev hatibûn pêşwaziyê. Ew jî ne li benda hatina wî bûn. Ji ber wê hin ji wan cilûbergên wan bêserûber bûn. Silav da her kesî, pişt re ber bi Sara ve çû:

-Wê îro hin rojnemevan werin. Divê em bi wan re mijûl bibin. Hûn jî dikarin weke berê bernameya akademiyê bimeşînin.

Her kesî taştiya xwe xwaribû ber bi dibistanê ve diçû. Hindik mabû

ders dest pê bike. Apo jî destên xwe bi şûn ve danîbûn ser hev li qadê dimeşiya. Geh li erdê dinêrî dihizirî, geh çavên xwe yên kûr kûrtir dikirin li baniyên li derdora akademiyê dinêrî. Piştî qasekî berê xwe da odeya bêsîmê. Li ser maseyê bêsîmê qedeha çayê ket ber çavê wî. Hê nîvê wê mabû. Gazî nobedaran kir:

-Ev çi qedeh e li ser mase? Divê her kes bi berpirsiyarî û giraniya kar were vir, ne ji bo derbaskirina dem û suhbetê.

Çawa ku wî wisa kiribe li nîvê çavê nobedar nêrî. Girêkek ket qirika wî. Awirên çavên wî jî ketin erdê. Ji rewşa wî têgihîşt. Destê xwe danî ser milê wî:

-Kî li vir bû? Kê ev qedeh li vir hiştiye?

-Hevalên rêveberiyê li vir bûn, bi deryayan re diaxivîn.

-Çay jî di ber axaftinê re vedixwarin, ne? Dema ez bi qadên şer re diaxivin, çawa ku li wir bim bi wê giranî û cidiyetê diaxivim.

Rahişt qedehê da destê wî:

-Vê qedehê bibe û careke din nehêlin ti kes cihên karên cidî bike cihê suhbetê. Lênûs û pênûsekê ji min re bîne!

Nobedar bilez çû. Xwe nêzîkî kursiyê li pişt mase kir. Rûnişt destpêkê pê li toşa bêsîmê kir. Ji bo venêrîna deng hinekî lê xebitî. Paşê hêdîka destê xwe avêt mîkrofonê nêzîkî devê xwe kir. Çawa ku destê xwe biavêje tetika sîleh wisa bi baldarî mîkrofon vekir. Li aliyekî xwe ji bo axaftinê amade dikir, li aliyekî di hişê wî de gelek xeyal kom dibûn. Bedena wî li wir bû, lê hişê wî çûbû qadên şer. Çiyayên Kurdistanê yên bilind anîn ber çavên xwe. Lêvên wî dilepitîn: Evqas em li ser parastinê perspektîfan didin wan, gelo encamekê jê derdixin?” Dev ji xeyalan berda, hişê xwe li ser perspektîfên rojê kom kirin:

-Hemû derya hemû derya! Deryayên guhdarî me dikin, Roj bi we re ye!

Qasekî li benda bersivê ma. Pişt re ji çend kanalan bi hev re

dengê, “Em guhdar in, em guhdar in” hat.

-Derya Zer, rojbaş. Em hinekî li we guhdarî bikin.

-Serokê min, doh balafirên dijmin, li van deran xistin. Encam negirtin, lê li ser rê li çend havalan xistin. Hevalek birîndar bûye. Balafirên keşfê jî bêrawestan digerin. Cihên tên zanîn lê dixin. Perwerdeya me jî bi dawî bûye...

Pişt re ji deryayên din jî yek bi yek agahî girtin. Agahiyên hatîn tev yên qadên Bakur û Başûr bûn. Piştî girtina agahiyan cîhaz girt, pala xwe da kursiyê xwe. Agahiyên girtîn yek bi yek li ser wan hizirî. Ji bo wî her agahî dihat wateyekê û ji wê agahiyê têdigihîşt ka perspektîf pêk tên yan na. Piştî çend kêliyan careke din rahişt mîkrofonê:

-Em bi hevalan re axivîn. Hevalên li Misircê hêzên xwe diparêzin. Ji ber girtina riyan hê derbasî vir nebûne. Me xwest bi Êlihê re jî biaxivin, lê derneket. Dahûrînên îsal gihîştin we?

-Na serokê min, negihîştine me.

-Diviya bigihîştan we. Divê hûn bixwazin. Tişta em dixwazin berfirehkirina, tevgera gel e. Divê em têkoşîna li Bakur ber bi Başûr ve jî bibin. Wê dijmin hewl bide xeta Silopya bigire û xwe li wir bi cih bike. Ji bo me xeta Silopya û Zaxo pir girîng e. Ji bo wê divê li wê xetê keşfeke baş bê kirin û hêz bên bicihkirin. Herî zêde divê em li ser artêşbûnê rawestin...

Piştî axaftinê bêsîm girt derket derve.

***

Digel ku biryara valakirina akademiyê hatibû dayîn jî, lê bernameya perwerde û jiyanê hê weke berê dewam dikir. Jixwe ji bilî rêveberiya kampê haya ti kesî ji vê biryarê tinebû. Apo jî li kampê li benda hatina mêvanan bû. Rojnamevan Mehmet Alî Birand

kameraya wî di stûyê wî de bû, bi rojnamevanekî din re ber bi deriyê akademiyê ve dimeşiyan. Gavên xwe hêdîka diavêtin. Hem dimeşiyan, hem bi baldarî li derdora xwe temaşe dikirin. Her tişta ditîtin di çavên xwe de tomar dikirin. Ji ber ku berê jî carekê hatibû wir, dixwest bizane ka guhertinek çêbûye, yan na. Di tevgerên xwe de, xwe aram dida xuyakirin, lê dîsa fikarên wî ji vî cihê Tirkiye serbin kirî hebûn. Lewre hatibû cihekî wisa ku bûbû rojeva her kesî. Her gava diavêt, di wê zanebûnê de bû ku ew der cihê perwerde û amadekariya şerê çekdarî ye!

Li qadê merasimeke biheybet hatibû amadekirin. Apo li nêzî merasimê sekinîbû. Di sekna wî de bawerî û hêviyê xuya dikirin. Wê rojê destek cilên gewr li xwe kiribû. Bi wan cilan ve biheybettir xuya dikir. Pir jî li bejna wî hatibûn. Tîrêjên rojê li xelekên pora wî yên weke pêlan dixistin. Teysandineke weke xûzê ji dûr ve li ser xuya dikir. Bi wan çavên reş -mirov digot qey bi kilê subhanî hatine kildan- û birhên weke gurzikên kunciyan, heybeta wî pirtir dibû. Mêvan di binê awirên çavên xwe re derbas kirin. Rûyê wî pir geş bû û di binê simbêlên wî yên weke qîrê de didanên wî weke libên birincê spî dikirin. Di kenê li ser lêvên wî de rehetî û zelaliya hizrên wî xuya dikirin.

Bi silaveke germ mêvanên xwe pêşwazî kirin. Her du alî jî bikelecan bûn. Bala Bîrand li ser tevgerên wî bû. Piştî silavê ket tenişta wî çûn pêşberî merasimê. Ji serekî heta serê din meşiyan. Ji cilan heta çekên wan, Bîrand li her tevgera şervanên di merasimê de temaşe dikir. Apo di meşê de geh bi destê xwe hin dever nîşan didan, geh hin tişt jê re digotin.

Piştî merasimê derbasî odeya mêvanan bûn. Berî hingê çay hatibû amadekirin. Te digot qey hatiye agir, Bîrand ewqas bilezûbez bû; çaya xwe vexwar venexwar dest bi pirsên xwe kir. Gelek caran jî bi pirsên xwe re dikenî. Pênûs û lênûsa wî kêliyekê jî ji destê wî

nediketin. Mirov digot qey ew û Apo bi salan bi hev re mane, ewqas aram û degel bû. Apo jî pir aram û ji her pirsê re amade bû.

-Birêz Ocalan, vir cihê perwerdeya leşkerî ye?

-Perwerde ne taktîk û fêrbûna şer tenê ye, ya herî girîng avakirina kesayetê û îdeolojî ye. Vir bû çepera piştgirî û mezinkirina şoreşê û ji bo me pir binirx e.

-Ez bawer dikim hûn li vir tenê perwerdeyê nabînin.

-Her cihê em lê, perwerde ji bo me şert e. Gelek kes hatin vir û em şopandin.

Tevî ku ew der di hedefa dewleta Tirk de bû, bi awayekî aram bersivên wî didan. Piştî qasekî Apo li saeta xwe nêrî. Nêzî saetekê derbas bûbû:

-Dixwazî em navberekê bidinê. We jî xwestibû li van derdoran bigerin. Em bi hev re li tevgereke hevalan ya leşkerî û perwerdeya wan binêrin.

-Belê wê gelek baş be.

Berî ku rabin du fincan qehwe û du qedeh av anîn. Lê di ber qehweyê re jî ne bi fermî be jî pirs û bersivan dewam kir.

Piştî qehweyê rabûn ber bi qadê ve çûn. Çavên Birand li ser nobedarên derdora akademiyê bûn. Hem diaxivîn, hem ber bi jor ve diçûn. Li serê girê herî bilind rûniştin, li tetbîqata milîtanan ya leşkkerî temaşe kirin. Dengê çepik û tilîliyan bi ser cihê tetbîqatê ket. Tiliyên milîtanan jî di nava wê tozê de bilind dibûn. Li aliyekî jî her sê al hatibûn bilindkirin. Di tetbîqatê de qereqoleke dewleta Tirk diket destê şervanên Kurd. Vê bala Birand kişandibû. B ken li Apo nêrî:

-Hûn dikarin wiha bi hêsanî qereqolan bigirin?

Apo jî keniya:

-Salên 1980'î ev cihê Filistîniyan bû. Me bi tekoşîna xwe bi dest xist...

Bi awayekî dûvdirêj behsa dîroka akademiyê jê re kir. Ji ber ku pêwîst bû wê rojê biçe Şamê, ji Bîrand xwest beşa roportajê ya mayî li wir temam bikin.

Roja din li taxa Zahîra ya li rexekî Şamê, li qata sisiyan, amadekaiya roportajê hat kirin. Her çiqas li malê milîtan jî diman, lê jê re digotin "Mala Serokatiyê." Apo û Bîrand li eywanê rûniştibûn. Ji axaftina bi kesên li wir re, heta rabûn rûniştina wî, Birand her tevgera Apo bi baldarî dişopand. Ji bo çend kêliyan destûr ji mêvanê xwe xwest derbasî pirtûkxaneyê bû. Birand jî rabû ser xwe çû ber pencereyê. Li taxa Zahîra temaşe kir. Hin tişt bi serê wî nediketin. Wî koşeyê ku ti kesî texmîn nedikir tevgereke weke PKK'ê lê bimîne, serê wî tevlîhev kiribû. Carna lêvên xwe xwar dikirin, carna bi şûn xwe ve li pergala eywanê dinêrî: "Ev serokê evqas Tirkiye lê digere li vir dijî?" Di nava wê mereqê de careke din çû li cihê xwe rûnişt. Pênûsa xwe di nava tiliyên xwe de şidandibû. Serê xwe hinekî bi jêr û jor ve hejand, berê pênûsê da ser rûpeleke spî: "Hem li Suriyê, hem li Lubnanê PKK bi hêsanî tevdigere, lê dewleta Suriyê tevgera wan dişopîne. Û Apo jî di wê ferqê de ye." Nivîsa xwe qedand, li derdora xwe nêrî. Awirên çavên wî ketin ser telefona li ser mase.

Piştî qasekî Apo ji pirtûkxaneyê derket. Bedlekî risasî li ber bû û qumçeya çakêtê xwe jî girtibû. Di binê çakêt de jî kenzeyeke bi heman rengî li xwe kiribû. Li ber destşûya li tenişta eywanê avek li ser çavên xwe kir, derbasî eywanê bû. Ew çend roj bûn bi zekemê ketibû. Bi rûniştinê re Birand dest bi pirsên xwe yên mayîn kir:

-Birêz Ocelan, li hemberî we artêşeke mezin heye, civakek heye; hûn nafikirin ku hûnê nikaribin li hemberî vê dewletê bi ser bikevin?

Apo pala xwe da kursiyê xwe û bi rûkenî bersiva wî da:

-Eger we taybetiyên tekoşîna me ya çekdarî baş fêm bikirana,

weyê bidîta ku me qezencên pir mezin bi dest xistine.

Gotina qezencê pir bala Birand kişandibû.

-Çi ne ew qezenc?

-Têkoşîna çekdarî ne teqîna çekan tenê ye. Li gorî min kûrbûna îdeolojîk û fêmkirina polîtîkayê ye. Ez li gorî xwe behsa têkoşîna çekdarî dikim, ne li gorî têgîhiştina we, yan ya kesên din. Ji ber ku ji Kurdan re ji bilî têkoşîna çekdarî riyeke din nehiştine, serî lê didin, çima hûn fêm nakin?

Birand berê xwe da aliyê derve:

-Niha di vê balkona vekirî de guleyek were emê her du jî bimirin. Baş e tu natirsî?

Çend kêliyan sekinî û serê xwe jî bi rast û çep hinekî bir anî.

-Her ku diçe ez ji hestên mirinê dûr dikevim.

Serê xwe hêdîka bi jêr û jor ve bir û anî:

-Wisa. Xerîb e lê rastiyek e. Û bi qasî ku karên pir mezin ve mijûl dibim, ka çawa ji hestên mirinê dûr dikevim, ji xetera mirinê jî dûr dikevim. Dîsa xerîb e!

Çavên Birand fereh bûbûn, ne li benda bersiveke wisa bû:

-Kesekî di rewşeke wisa de, lazim e pir xedar be û ji hestên xwe dûr be. Lewre dem bi dem hûn hevalên xwe jî dikujin. Ev we nerehet nake?

Li hemberî vê pirsê di rengê rûyê Apo de ti guhertin çênebûn. Pir bixwebawer bersiva wî da: -Eger giyayek jî bêwate bê perçiqandin, min pir hêrs dike. Di halê hazir de rewşa min wisa ye. Eger pêwîst be pê lê neke û pê lê bike, demildest dibêjim pê lê neke. Ewqas hesasiyet heye!

-Lê eger bike?

-Ezê bêjim neke. Ezê hêrs bibim.

Ji ber zekemê û nexweşiya sînozîtê, di ropotajê de pir zehmetî dikişand. Geh bi her du destên xwe çavên xwe diferikandin, geh

pozê xwe paqij dikir. Çavên wî jî sor bûbûn. Birand jî bêrawestan pirs dikirin:

-Eger dîsa pê lê bike?

-Ezê helwestê daynim û bêjim neke.

-Tuyê ceza bikî?

-Na. Ezê helwestê daynim.

Roportajê bi pirs û bersivên cuda dewam kir...

Piştî şîvê jî hê çavên Birand li tevgerên Apo bû. Her ku bi milîtanan re diaxivî, rêbazê wî yê meşandina kar bala wî gelek dikişand.

***

Reş ketibû erdê, lê hê jî li Berliyasê, bayekî germ li derdorê dixist. Li deşta wê, çawa ku bi roj agir bi axê hatibe vêxistin, hê tîna rojê li ser bû. Carna bayekî honik ji aliyê çiyayan ve dihat, lê heta ku digihîşt deştê bandora wê kêm dibû. Bîna fêkî ji bostanan belav dibû. Xaniyê ji bo têkiliyan û hatina mêvanan yê li Berliyasê, wê rojê ji Selman û Ciwan tenê re mabû. Komkek lîsteyên alîkariyê û komek pere li ber Selman bûn dijmartin û ji hev cuda dikirin. Hingî serê wî tevlîhev bûbû, carna yên ji hev cuda kirîn, dîsa dixistin nava hev. Ciwan jî pal dabû, pirtûka Pirsgirêka Kesayetê dixwend. Lê ji ber nirçenirça Selman her carê serê xwe ji ser pirtûkê radikir. Lê Selman serê xwe kiribû nava lîsteyan, haya wî ji ti tiştî tinebû. Hingî serê xwe ji ser pirtûkê radikir, nizaniya ka li kû sekiniye. Hevokên xwendîn dîsa dixwendin. Di dilê xwe de digot, ev pirtûk ji bo me Kurdan derman e, çiqas dubare bibe ewqas baş e. Lê êdî tama xwendinê nemabû:

-Ew çi nirçenirça te ye hevalê Selaman, tu nahêlê ez pirtûka xwe bixwînim. Pirsgirêkek hebe bêje em bi hev re çareser bikin.

Lê vê carê kufekuf bi Selman ketibû, hesabê wî tevhevtir bûbû:

-Hevalê Ciwan, ez vê lîsteya alîkariyê dubara çêdikim, lê pere kêm derdikevin!

Ciwan derê pirtûkê girt rabû ser xwe:

-Baş bîne bîra xwe ka me li kû çi kiriye. Ka ez jî carekê bijmêrim.

Selman destê xwe li eniya xwe xist, çavên xwe girtin:

-Haa, wê rojê me solek ji hevalekî birîndar re kirîbû, min ew qeyd nekiriye.

Ciwan li raserî lîsteyan rawestiyabû:

-Hevalê Selman, te ez tirsandim.

Selman keniya, keyyfa wî gelek hat. Berî ku bersivê bide ew jî qeyd kir:

-Hevalê min, ev malê partiyê ye, ma hindik e? Yên didin me ji nanê zarokên xwe kêm dikin didin. Ji ber wê divê em lê miqate bin.

Lîsteyên xwe dan hev, li pirtûka di destê Ciwan de temaşe kir:

-Ew pirtûka Pirsgirêka Kesayetê ye tu dixwînî? Xwezî min jî careke din bixwenda.

-Ez gihatime beşa taybetiyên milîtanê PKK'ê. Madem te xwendiye em dikarin beş bi beş nîqaş bikin.

-Wê gelek baş be.

Di wê navê re dengê derî hat. Ciwan berî Selman çû vekir. Polîsê li ber derî silav da.

-Berpirsê vir kî ye?

Hestên Ciwan di navbera tirs û fikaran de diçûn dihatin. Lê li xwe neanî der. Hinekî jî dereng bersiva wî da:

-Berpirs di hundir de ye.

Di wê navê re Selman jî hatibû ber derî:

-Berpirs ez im kerem bike!

-Xazî Kenan dixwaze we bibîne.

Derî girtin tev de li seyareya polîs siwar bûn.

Cihê çûyînê cihekî dewletê bû. Polîs Selman û Ciwan li odeyekê dan rûniştandin derket çû. Ode cihê xebata polîsan bû. Weke moristanê diçûn dihatin. Piştî deh deqîqeyî deriyê odeyê vebû. Bi vekirina derî re, zilamekî girî bilind û biqerewat bi rûyekî sar ket hundir. Destek cilên reş lê bû. Digel ku her kesî dizaniya berpirsekî dewletê ye, lê dîsa dixwest bi helwest û tevgera xwe jî vî erka xwe nîşanî derdora xwe bide. Çawa ku çavê dinyayê tevê li ser be, dixwest xwe biheybet û jixwebawer bide xuyakirin. Ji helwesta yên li hundir jî diyar dibû ku pir jê ditirsin. Ti kesî newêriya li çavên wî binêre, çavên wan li jorê bûn. Bi ketina wî ya hundir re. Tev rabûn ser xwe, bi awayekî leşkerî pêşwazî kirin. Piştî pêşwaziyê çû ber maseyê polîsekî bi dengekî bilind pê re nîqaş kir.

Selman niquçand Ciwan:

-Xazî Kenan ev e. Ji karên partiyên li vir tevan berpirs e.

Derbasî odeya li teniştê bû. Piştî çend kêliyan polîsek ji odeyê derket gazî wan kir. Polîs derî ji wan re vekir, ew derket. Piştî merhebayê cihê rûniştinê nîşan da:

-Me gazî we kir da hûn ji rêveberiya xwe re bêjin. Divê kampa li Bîqayê vala bikin. Dewleta Tirk zorê dide me.

Selman li bendê bû ku wê tiştekî wisa bêje:

-Baş e, emê ji rêveberiya xwe re bêjin.

Erka her du aliyan jî agahdarkirin tenê bû, ne wî tiştek got ne jî wan. Xatirê xwe xwestin bilez derketin berê xwe dan akademiyê. Apo li odeya rêveberiyê rûniştibû li ser rewşa akademiyê yadiaxivî. Nobedar destê xwe li derî da ket hundir:

-Serokê min, Selman û Ciwan hatine.

-Bila werin.

Ketin hundir, wisa li ser piyan xwestin agahiyên li cem xwe bidin:

-Serokê min, Xazî Kenan gazî me kir.

-Haa, ji bo mijara akademiyê, çi got?

-Got ji rêveberiya xwe re bêjin, dewleta Tirk zorê dide me, divê kamp bê valakirin.

Apo destpêkê di pencereyê re li derve nêrî hinekî hizirî, pişt re berê xwe da rêveberiyê. Rûyê tevan jî ne xweş bû.

-Mesele girtina akademiyê ye, li Sûriyê jî heman tişt ji me re gotin. Divê moralê me xirab nebe.

Hinekî bi ser xwe ve hat. Erzeniya xwe jî xistibû nava destê xwe. Çawa ku kamerayek pir bi baldarî û ji nêz ve dîmenekî bikişîne, çavên wî jî wisa yek bi yek li ser kesên di hundir de digeriyan. Hin nîşanên hizirînê li ser rûyê wî xuya dikirin, lê ji bêhêvîtiyê eser tinebû:

-Em sala heftê û nehan ji welatê xwe derketin, heştiyan dîsa em vegeriyan welat. Em li vir mêvan bûn. Emê biçin mala xwe ya bingehî. Emê cihê xwe li wir çêkin û li wir şoreşa xwe bikin. Jixwe demeke dirêj e me dest bi vegera welat kiriye. Hedefa me ya bingehî jî ev e.

Piştî çend gerên bilez çerxa awirên çavên wî li ser Cesûr rawestiyan:

-We her kes ji bo derxistinê amade kiriye?

-Serokê min, karê mayî emê sibê hemûyî bi dawî bikin. Em tiştekî li van derdoran nahêlin. Perwerde jî hema hema bi dawî bûye.

-Panîkê nekin nava hevalan, lê karê xwe jî bilez bikin. Divê heval jî bizanin ku ev der ne cihê me ye, kengê be emê derkevin.

-Rast e serokê min, me bi hevalan re nîqaş kiriye. Haya tevan jî ji rewşê û êrîşên dijmin heye.

Ji bîra wî ya kûr careke din tîr ber bi salên borî ve ketibûn tevgerê û henaseyeke kûr kişand hinavên xwe:

-Hûn nizanin bi çi kêferatê em gihîştin van rojan. Me li vir partî bihêz kir. Me gelek hevalên xwe yên şehîd bûyîn ji vir rêkirin welat. Ev der ji bo me gelek girîng bû. Li Rojhilata Navî ji bo me bûyîn û

hebûneke nû bû. Hevalê Kemal ji vir bi rê ket. Egîd ji vir derket. Ev der cihê şehîdan e. Cihê hilhatina PKK'ê li Rojhilata Navî ye. Lê divê em pêvajoyê bi hevalan jî bidin fêmkirin.

Rabû ser xwe, yên din jî dan pey berê xwe dan dibistanê. Hingeding ji dibistanê dihat. Ji ber pirbûna milîtanan hin li ser piyan mabûn. Deng ji ti kesî dernakeve, her kes li benda Apo bû ka wê çi bêje. Di qadê de bilez dimeşiya. Sara jî li tenişta wî ya milê Rastê dimeşiya, lê bi qasî gavekê bi şûn ve bû. Cesûr jî bi heman rengî li tenişta din bû. Zekî dixwest xwe bide tenişteke wî lê cih nemabû, ji neçarî li pey wan dimeşiya. Nobedaran deriyê dibistanê vekir, ew jî ketin hundir. Derbasî pişta mase bû. Ji bo her siyên din li rêza pêşî sê kursî vala hatibûn hiştin. Ew jî li cihê xwe rûniştin.

Bi pirskirina rewşa wan dest bi axaftinê kir. Pişt re awirên çavên xwe li nava dibistanê gerandin:

-Me li vir karekî dîrokî kir. Em ji welat derketibûn, lê em zû vegeriyan. Vegera welat ji bo me hedefeke mezin bû û me pêk anî.

Hinekî sekinî. Xwest bizane ka nêrînên milîtanan çi ne:

-Ji bo derketinê hûn çi dibêjin?

Hinekî berken bû:

-We bertek nîşan daye. We gotiye em dernakevin, eger pêwîst be emê şer jî bikin. Ev deh sal in em li vir in. Divê hûn bizanin ku em li vir mêvan bûn û bi exalqê PKK'ê em tevgeriyan. Ji ber wê ne gundên derdorê, ne Lubnan, li vir ti kes ji me aciz nebûye. Hedefa me yek jê ew bû ku li Rojhilata Navî em li ser piyên xwe bisekinin. Em di nava dilê wê de man û heta dawiyê jî me îradeya PKK'ê bi her kesî da naskirin. Ya girîng ji bo me ev bû. Me biratiya xwe ya bi gelên bindest re û girêdana bi axê ve nîşan da. Ev serkeftineke mezin bû. Hedefeke me ya din, gihandin û perwerdekirina milîtanên pêşeng bû. Hûnê biçin şer, hûnê rêveberiya şer bikin. We li vir rêbaza Serokatiyê ya şer dît. Divê hûn bi berpirsiyarî herin. We kêmayiyên

berê zanîn û divê hûn zû şehîd nekevin. Gelek heval ji vir çûn, lê li ser jiyana gerîla pênaseyeke baş ji min re rênekirin. Ev jî erkekî we ye. Me bi hezaran şervan li vir perwerde kirin. Ev der nebû qismetê her kesî. Divê em ji vir germtir derkevin. Em dikarin gelek ciyan vekin. Hûn jî dikarin li wir ciyekî ji min re çêkin.

Li ser rûyê her kesî kelecaneke mezin diyar dibû. Du saetan li ser hev axivî. Her çiqas hin fikar mabin jî lê di dilê her kesî de aramiyek çêbûbû. Li saeta xwe nêrî:

-Hevalan plan çêkiriye, hûnê li gorî wê tevbigerin.

Piştî axaftina xwe derket derve. Di destekî de tizbiyên wî bûn, bi destê din carna pora xwe rast dikir. Çawa ku bêje wê ev dîtina me ya dawiyê be, çend caran çavên xwe li qadê û girên derdorê gerandin. Selman û Ciwan li ber deriyê rêveberiyê li ser piyan bûn. Gazî wan kir:

-Selman, tu û Ciwan werin!

Bi meşeke leşkerî ber ve beziyan. Awirên çavên wî pir bilez digeriyan:

-Divê hûn biçin cem berpirsiyarê leşkerî yê Bîqayê. Silavên me li wan bikin û spasiya me ji wan re bêjin. Ji roja hatîn vir heta niha bi dostayî nêzîkî me bûne. Emê jî vê dostayiya wan ji bîr nekin.

Selman û Ciwan bilez li seyareyê siwar bûn, berê xwe dan geliyê Bîqayê. Wî jî berê xwe da odeya xwe. Li ser kursiyê li pişt mase rûnişt, di pencereyê re hinekî li derve temaşe kir. Çend notên ji nava gel hatîn li ser mase bûn, vekirin dest bi xwendina wan kir.

***

Zekî û Rizgar li qadê bi hev re dimeşiyan. Lê Rizgar xwe nedida teniştê, gavekê-du gavan bi şûn ve dima. Her du destên xwe bi şûn ve danîbûn ser hev, destiyek tizbî jî di destê wî de bû. Pir hewl dida ku di her axaftin û tevgera xwe de weke Apo bike. Bi

her gava xwe re, kesayeta xwe û hêza ku di xwe de didît dianî bîra xwe. Ji bo mezinbûn û gihandina armancên xwe di nava hizran de bû. Di dilê xwe de got, eger vê carê ez biçim welat, ezê bibim fermandarê herî pêş. Wê navê min li ser zimanan bigere. Carna li dora xwe dinêrî, plana êrîşê çidikir.

Dinya bi dinyayê ketibû, rewşa akademiyê ketibû rojeva her kesî. Derveyî berdana akademiyê çareyên din nehatibûn dîtin. Lê ew aram bû, çawa ku tiştek nebûbe, gazî Rizgar kiribû. Di dilê xwe de digot, ya girîng li welat, di şer de ez bibim qehreman. Lê bi rêbazê ku ez dixwazim ezê bibim. Ka li akademiyê kê çi gotiye, di nava xwe de çi axivîne û çi pêşniyar kirine, Rizgar gotin bi gotin jê re digotin. Dixwest bi vê melaqiya xwe nîşanî wî bide ku pê ve girêdayî ye. Di ber re jî di binê simbêlên xwe de dikeniya.

Zekî di rewşeke tevlîhev de bû. Di milekî de li xwe difikirî û di milê din de jî karê her kesî dişopand. Bê ku berê xwe bidiyê û bi dengekî hişk pê re diaxivî:

-Pêşniyara te çi ye? Tu ji bo çi hazir î?

Rizgar ji hişkbûna dengê wî tirsiyabû, hinekî xwe komî ser hev jî kiribû:

-Heval, hema tu biçî kû, ezê bi te re bim.

-Ez jî wisa dihizirim. Emê derbasî welat bibin. Pêvajoyeke pir giran û pir dijwar li pêşiya me ye. Jixwe ev der jî tê girtin. Dema ez biçim, ezê te jî bi xwe re bibim. Baweriya min nîne ku cihekî weke vir peyda bibe.

Ji nêrîna xwe gelekî bawer bû, ku wê qadên şer tenê bimînin. Di hundirê xwe de ev zelal kiribû:

-Cihê min qadên şer in. Ez dixwazim taktîkên şer pêş bixim. Hatina min ya vir navberek bû. Karê Serokatiyê perwerde û pêşxistina têkiliyan e. Karê me jî meşandina şer e. Emê niha derbasî welat bibin. Piştî demekê emê dîsa vegerin.

Bi vê axaftina xwe dixwest bide diyarkirin ku fermandarekî pir mezin e û cihê biçiyê wê feteh bike. Rizgar jî bi çavê kesayeteke mezin lê dinêrî, xweziya xwe dianî ku rojeke ji

rojan ew jî wisa bihêz bibe. Di ber re jî pişt stûyê xwe dixwerand. Di dilê xwe de got, dema ez jî bibim weke wî wê her kes li hemberî min wiha rawest e.

***

Selman û Ciwan li avayiyeke fermî di odeya berpirsiyarê leşkerî de rûniştibûn. Yê berprsiyar piştî ku çay ji wan re xwest hinekî li wan temaşe kir:

-Hûn mirovin pir birêz bûn û ti kesî ji we zerer nedît. Me nedixwest hûn ji cem me biçin, lê ji me re dibêjin divê derkevin. Dijminê we Tirk in, ew dixwazin hûn ji vir derkevin. Berî we gelek partiyên din jî li vir mane, lê ne weke we bûn. Ji ber wê em ji we gelek memûn in. Partiyên din gundiyên me gelek diêşandin, lê hûn cuda bûn. Çûna we ji bo me wendabûnek e.

Selman bi helwesta wî kêfxweş bûbû:

-Em jî ji bo peyamekê hatine. Serokatiya me bi taybetî em şandin. Silavên wî ji we re hene û spasiya we dike. Lê xwestekeke me ji we heye; em dixwazin ji kampên derdora xwe xatir bixwazin.

Yê berpirs hinekî nava serê xwe xwerand:

-Dibe, emê bi hev re biçin.

Piştî xatirxwestina ji kampan Selman û Ciwan li seyareya xwe siwar bûn berê xwe dan Berliyasê. Selman dengê stirana “Va ye PKK rabû” bilind kir. Wî jî pê re dubare dikir: “Va ye PKK rabû, li deşt û çiyan belav bû. Kulîlkên welat sor bûn, bilbil bi gulan şa bû...” Ji bo karê pê ve diçûn hin fikarên wî hebûn:

-Hevalê Ciwan, hevalan sê bêsîmên din xwestine. Divê em biçin bistînin lê gelek çav li ser me ne. Em seyareya Feysel Dawid bixwazin ne baştir e? -Feysel Durziyekî dosê PKKê bû.-

Yekser berê xwe dan gundê Helwa, mala wî. Di navbera akademiyê û Helwa de pênc deqe hebûn. Çiyayekî biçûk di neqeba wan de bû. Gund hema li pişt çiyê bû. Nêzî gund bûn. Çavên wan li keriyên pez yên li wan derdoran diçêriyan, di nav

wê erda fireh û çiya kendal de diçêriyan. Ji devî û maziyan her der kesk dikir. Mala feysel Dawid ji dûr ve, diyar dibû ku mala begê berê ye. Gund nêzî bîst û pênc mala bûn. Gihan nêzîkî malê. Çavên Ciwan bi Feysel Dawid, yê li ser xwe, ketin, berê xwe da Selman:

-Ez gelek caran hatime vir, lê min nedîtiye xwediyê malê zêde diaxive. Tevî ku civata wî timî geriyaye.

-Dengê xwe kêm bike. Ew pir ji axavtinê hez nake. Pir têkiliya wî bi agahiyan ve nîne. Tu dizanî carekî gote me, ji min re pirtûkekî serok bînin da ku ez bixwînim û jê fêr bibim. Ew bi xwe serokê partiya demokratîk ya Durziya ye.

Nêzîk bûn, Ciwan lê dinêrî, heybeteke ku berê gotibûnê li ser heye, li ber çavên wî neket. Lê çawa şêxekî bibine, rengekî welê dida. Ji mala wî xwiya dikir ku maldar e. Her du nêz bûn û silav û keyfxweşî li hev kirin. û derbasî odeya rûniştinê bûn.

Feysel weke axayekî li nîvê odeyê rûniştibû pala xwe dabû balîv. Şalwalekî reş û gumlekekî spî lê bûn. Serê simbêlên xwe badabûn, berê xwe da herduyan. Ew endamê mecilîsa gelê Lubnanê bû. Xwediyê erda ku Akademî lê bû. Ji xwe gelekî bawer diaxivî:

-Beriya vê min xeber şandibû ji bo serokatiyê bibînim. Serokatî bi xwe hate vir. Me gelek şêxên xwe jî kom kirin û bi wan re jî rûnişt.

Bi gotina xwe re rabû ser xwe çû ber pencerê:

-Em di nav vî bexçî de rûniştin. Serok ji min re got, tu xwediyê erdê yî. Em mêvanê we bûn, em pê kêfxweşbûn ku însaneke weke te ev erda he daye me. Ev cihê azadya gelê me yê destpêkê ye. Me gelek sûd jê girt, bihezaran qehreman jê derixstin.

Vegeriya, li cihê xwe rûnişt:

-Min ji serokatiyê re got, ev ne tişteke ji bo gelê kurd. Bûye cihê şehîdan. Em diyarî gelê kurd dikim û ez bawer dikim wê rojeke bê ku bibe ziyareta kurdan. Hûn ji vir biçin jî, dê weke xwe bimîne. Ez vî cihî diyarî we û gelê kurd dikim.

Selman û Ciwan gotinên Apo mereq dikirin:

-Serokê me çi bersiv da:

-Serokê Apo got min, xelata te ji bo gelê kurd tiştekî ne hindike û pir mezin e. Em jî soz didin gelê kurd û Lubnanê heta taliyê ji bo azadî û demokrasiyê, li ber xwe bidin.Yên rûniştî yek ji wan rabû got, me digot qey li şûna erdê tê peran bidî Feysel, lê ev soza te dayî tu weke nebî Îsayî yî. Ji bo tekoşîna gelê kurd, însaniyetê û gelê Lubnanê, hê serokeke Ereban ji bo gelê xwe ev soz nedane. Lê tu, ji bo gelê xwe û Rojhilata Navîn vê soza mezin didî.

Piştî ku civîna ku çêbûyî ji wan re got, Selman xwest zû rabin:

-Daxwaziyeke me hebû, em ji bo wê hatine.

-Kerem bikin. Min berê jî ji we re gotiye; çi pêwîstiya we hebe carê bêjin. Min ji Serok Ocalan re jî gotiye. Em li ser soza xwe ne. Wek Durziyekî çiyayî, ji bo her xizmetê amade me. Silavê min li Serokatiya xwe bikin û bêjinê gelek dostê Durzî dixwazin wî bibînin!

-Emê vê xwesteka we ji serokatiyê re bêjin. Ew jî dixwaze we bibîne.

-Xwesteka we çi bû?

-Me dixwest bi seyareya we heta deverekê biçin. Hin tişt ji me re...

Feysel bê ku li benda qedandina axaftina wî bimîne bersiv da:

-Eger me sozek dabe, emê heta dawiyê pê ve girêdayî bin. Bila Besam bi we re bê û çi pêwîst be bila bike!

Li ber derî xatirê xwe xwestin bi Besam re ketin ser riya Berliyasê.

Piştî ku bêsîm hatin kirîn, Besam cîhaz xistin seyareya xwe ket ser rê, ew jî bi seyareya xwe ketin pey.

Piştî saetekê her du seyare ketin qada akademiyê. Yekser berê xwe dan odeya Apo. Destê xwe li derî xistin ketin hundir. Serê xwe ji ser rûpela di destê xwe de rakir:

-Ciwan hûn çima dereng man?

-Serokê min, bêsîmê me hatin dîtin, ji ber wê em sekinandin.

Rûyê wî hinekî nexweş bûbû:

-Çima hatin dîtin, ma we tedbîrên xwe negirtibûn?

-Serokê min, me bi seyareya dostekî şandin. Lê ji ber ku ew sekinandin, em jî li benda wî man.

Dengê xwe hinekî bilind kir:

-Hûn jî dibînin li me û behaneyekê digerin. Çi bibînin wê bigirin. Divê hûn pir şiyar bin. Berî vê jî min ji we re gotibû. Bi her awayî em di binê çavdêriyê de ne. Divê em li gorî wê tevbigerin.

***

Selman li Şamê hatibû girtin. Li girtîgeha Fire-Filistîn, di odeya lêpirsînê de li ser kursiyekî nîvşkestî rûniştibû. Bi dengekî ku jan ji guhê mirov biçe deriyê hesin yê zingargirtî vebû. Bi vebûna derî re berpirsekî mûxaberatê bi rûyekî weke yê zebaniyên dojehê ket odeyê. Bê ku li rûyê wî binêre dest bi pirsan kir:

-Her kesê tu bi wan re kar dikî, navên wan bêje!

Dengê wî jî ji dengê zebaniyan ne kêmtir bû.

Selman têgihîştibû ku rewş xirab e, lê çi dibe bila bibe diviya tiştekî nebêje. Berxwedana li zindana Amedê anî bîra xwe:

-Min bi ti kesî re kar nekiriye û navê ti kesî jî nizanim.

Xwest xwe bikenîne, lê devê wî qîç bûbû û ken jî lê nedihat. Çawa ku gurekî devbixwîn li nêçîra xwe binêre, rûyê wî jî wisa xuya dikir:

-Tu wiha bikî tuyê hê pir li cem me bimînî. Em dizanin tu tenê kar nakî. Ku tu bêjî wê ji bo te baştir be!

Selman serê xwe rast û çep hejand:

-Tiştekî ez bêjim nîne û min ti karên dervayî qanûnan nekirine.

-Wê demê emê pêşwaziyeke baş ji te re bikin.

Di ber re jî kulmek li nîvê pozê wî xist. Veşewişî lê neket erdê. Xwînê dabû ser pozê wî ve. Piştî ku çend çov jî lê xistin da rûniştandin. Dengê xwe jî hinekî nerm kir:

-Tuyê çayê vexwî?

Lêxistinê kîna wî ya li hemberî dagîrkeran xurttir kiribû:

-Ez venaxwim.

Dengê wî bi bêminetî derketibû.

Berpirs çavên xwe xistin nava çavên wî:

-Tu kadroyê PKKê yî?

-Ez Kurd im. Berî niha jî min got, ez derneketime derveyî qanûnan.

-Wê demê her tişta te kirî û navên kesên bi te re xebtîn binivîse. Ku tu wisa bikî emê di her warî de alîkariya te bikin.

Fêm kir ku doza sîxuriyê lê dike:

-Ne tiştekî ez bêjim ne binivîsim heye!

Berpirs serê xwe hejand:

-Himm, tu pêşwaziyeke baştir dixwazî.

Û gazî çend zebaniyên din kir. Jixwe ew jî amade bûn. Bi çov, kulm û pehînan lê xistin heta westiyan. Rewşa wî pir xirab bûbû. Êdî nikariya li ser piyan raweste. Kefûkinc bi ser devê wî ketibû û rûyê wî di nava xwînê de mabû.

Piştî ku zebaniyê destpêkê zanî wê bikare biaxive, milê wî girt hejand:

-Li vir ti pirsgirêkên Kurdan nînin, hûn doza kurdî ya çi dikin? Eger pirsgirêkeke Kurdan hebe bi Tirkan re ye, ne bi me re!

Xwîna li ser lêvên xwe paqij kir. Êdî ferq kiribû çiqas xwe ji siyasetê bişû jî hatiye naskirin. Ji ber wê pêwîst dît ku parastina doza xwe bike:

-Ji bilî wekhevî û biratiyê daxwaziyeke me nîne.

Zebanî dîsa xwest wî bikişîne nava siyasetê.

-Dixwazim pirseke din bikim; eger hûn ji biratî û wekheviyê pêve tiştekî naxwazin, têkiliyên we yên bi partiyên çepgir re tê çi wateyê? Dewleta me jî çepgir e.

-Ew çepgir in, em jî çepgir in, ji ber wê. Têkiliya me bi we re jî heye.

Zebanî rûyê xwe tirştir kir:

-Binêre Selman, ji bo şerê we yê li hemberî Tirkiyê em tiştekî nabêjin. Lê em qebûl nakin hûn li welatê me rêxistinê bikin. Vê jî baş bizanin!

Pişt re berê xwe da du zebaniyên li wir rawestiyayîn. Piştî ku çavên wî girê dan, dido ji wan her yekî bi destekî wî girt û bi erdê re kişandin. Carna jê didan ber pehînan. Wisa birin heta xistin cihê girtiyên siyasî yê binerd. Di wir de çavên wî vekirin. Piştî çûna wan li derdora xwe nêrî. Cihekî ne pir mezin bû, lê ji mirovan tijî bû. Tev li dora wî kom bûn. Pirs li ser pirsan jê dikirin. Pişt re yekî girî bilind hat cem. Şeqeşeqa tizbiyên wî bû:

-Tu Kurdî? Tu ji bo çi girtine, ji bo Kurdistanê?

Çawa ku bersiva yên din nedabû, bersiva wî jî neda. Wisa bêdeng li cihê xwe rûnişt. Jixwe rewşa wî ne ya axaftininê bû. Lê yên din dev jê berneda:

-Tu rengê endamên PKK'ê didî. Demeke dirêj e ez li vir, min gelek hevalên te dîtine. PKK dixwaze welatekî serbixwe ava bike!

Ji nava girtiyan yek bilez rabû ser xwe:

-Mafê gelê Kurd heye. Ma hûn nabînin çawa Kemera Erebî li ser wan pêk tînin. Kurdan sala heştê û didoyan alîkariya Ereban kir. Li Kelha Şiqêf bi Ereben re şerê Israîl kirin.
Êdî zanî ku yên li wir siyasî ne û dixwazin PKKê baştir nas bikin. Serê xwe rakir li derdora xwe nêrî:

-Diyar e ku hûn doza kurdî baş dişopînin. Çawa ku hûn dixwazin me nas bikin, ez jî dixwazim we û doza we nas bikim.

Heta dema razanê di nava xwe de suhbetên siyasî kirin.

Her kes razabû. Hem ji ber êşa laşê xwe, hem ji ber ku nizaniya ka wê rewşa wî çawa be, dikir nedikir xewa wî nedihat. Li rojên borî yên xebata xwe dihizirî. Dîmenê Apo dianî ber çavên xwe. Gotinên wî, tevgerên wî yek bi yek di guhên wî de deng vedidan. Di nava wan xeyalan de bi xew ve çû.

***

Îlona 1992yan bû. Biryar hatibû dayîn, wê akademî bihata valakirin û vê rewşê bandor li her kesî dikir. Tingeting ji milîtanan dihat. Wê çawa bihata valakirin. Jixwe wê salê ji ber gefên dewleta Tirk li akademiyê bi giranî bi intişarê derbas bûbû. Her kesî digot, ji bilî şehîdgehê û dîwarê wêneyê Mahsum Korkmaz li serê, divê li vir tişteke tenê saxlem ji dijmin re nemîne.

Apo derbarê mijarê de destpêkê kom bi kom bi wan re axivî. Pişt re çû qadê li derdor temaşe kir. Xirabkirina akademiyê dest pê kirbû. Milîtanan bi balyozan dibistan xirab dikir. Wî jî wisa li wan temaşe dikir. Pişt re çû ber dîwarê nav û wêneyê Mahsum Korkmaz li serê. Pir hestiyar bû. Ew cara yekê bû ku wisa xemgîn dihat dîtin. Bê ku biaxive bi deqîqeyan li hember sekinî. Gazî milîtanên li derdorê kir. Tev li hemberî wî bi rêzdarî kom bûn. Destpêkê li girên derdorê nêrî:

-Hûn van giran dibînin, hevalê Kemal li wir sekinîbû.

Çawa mirov li filmekî temaşe bike, yek bi yek behsa bîranîna milîtanên çûyîn akademiyê û şehîd bûyîn kir. Ji destpêka vekirinê heta wê rojê, çawa tu ta bi derziyê ve bikî, her kêliya li wir derbas bûyî li ber çavên wan raxist. Li wê erdnîgariyê çi bûbû, çi nebûbû yek tenê jî ji bîr nekiribû. Yên guhdarî dikirin jî çawa ku ji destpêka vekirina akademiyê ve li wir bin, ketibûn nava xeyalên wisa. Ew jî pê re çûbûn dîrokê û pê re vegeriyabûn. Ew der bûbû weke navenda Kurdistanê, weke dilê Kurdistanê. Piştî axaftina xwe nava xwe kişand berê xwe da odeya rêveberiyê.

Sara û Cesûr li odeya rêveberiyê li cem Apo li ser plana valakirina kampê diaxivîn. Di wê navê re Selah û Siwar ketin hundir.

Serê xwe ji ser lîsteya li ser mase rakir:

-Ha, hûn hatin? Divê em lez bikin. Beşek ji hevalan li Şamê li

malan belav bikin.

Berê xwe ji wan vegerand ser Sara û Cesûr:

-Hevalên we ji bo çiyê jî amade kirîn, emê li Zahîra bi wan re biaxivin. Weke din em çi bikin?

Cesûr li lîsteya di destê xwe de nêrî:

-Her tişt amade ye serokê min. Hevalên bimînin bi qasî ku dest bi dewreyekê bikin hene.

Apo bi wateya baş e, serê xwe hejand:

-Îşev em li vir namînin. Heta ji we bê bilez tevbigerin û dema çapemeniya giştî bê vir, divê bizanin ku me ev der bi tevayî berdaye. Divê em dostên xwe pir nekin zorê. Wan deriyê xwe ji bo me vekir. Niha dibêjin pir bi ser me de tên.

Sara jî lîsteya di destê xwe de bilind kir:

-Serokê min, hevalên jin jî hemû amade ne. Eger li Şamê hûn civîneke taybet bi wan re çêkin wê baş be. Pêşniyarên hin hevalan ji bo qadên şer in. Hin jî dixwzin di perwerdeyê de bimînin.

-Emê bi wan re paşê nîqaş bikin.

Di wê navê re rabû ser xwe:

-Hûn dest bi karê xwe bikin, emê jî biçin bi bêsîmê pirsa rewşa welat bikin. Diyar e ku wê li Başûr êrîşî me bikin. Her çiqas ne li gorî berjewendiyên gelê Başûr be jî, hukumeta herêmê bi Tirkan re li hev kiriye. Divê em li hemberî êrîşan li her derê hazir bin!

Derket berê xwe da odeya bêsîmê. Piştî nîv saetekê derket.

Roja din serê sibê hê zû valakirina akademiyê dest pê kir. Lê valakirina wê ne hêsan bû, diviya 250 şervan bê ku bên girtin, bi selametî bigihin cihên xwe. Ew akademiya bi deng û reng û biheybet kerr bûbû. Fîzefîza bayê payîzê xemgînî li her bosta erdê wê belav kiribû. Deng ji ti kesî dernediket. Mirov digot qey yên diçin tên tev kerr in. Erê biryar hatibû girtin, lê dilên wan ranedigirtin ku ew cihê bi xwîn û xwêdana xwe ava kirîn bihêlin biçin. Dilên tevan şkestî û

çavên gelekan şil bûn. Ne hêsan bû; li aliyekî hevalên xwe yên şehîd li wir dihiştin, li aliyekî bîranînên xwe yên dîrokî. Lê kêm be jî bi du tiştan dilên xwe xweş dikirin. Ya yekê, baweriya wan bi serokê wan hebû ku wê ji bo perwerdeyê cihekî ji wan re peyda bike, ya din, wê gelek ji wan biçûna welat. Destpêkê wê milîtanên jin derketan. Berî ku derkevin tev bi hev re ji bo xatirxwestinê çûn şehîdgehê. Gora Hasan Bindal (Hemze) û yên dozdeh milîtanên PKKê yên di şerê Filistîn-Israîlê de şehîd bûyîn li wir bûn. Ji bo wan şehîdgeheke taybet hatibû çêkirin. Destpêkê li ber gorên wan bi nîzameke leşkerî deqîqeyekê rêz girtin, pişt re yek bi yek wêneyên li ser gorên wan maç kirin û xatirê xwe xwestin. Çavên tevan tijî rondik bûbûn. Çawa ku wan himbêz bikin hev himbêz dikirin. Tevan di dilên xwe de digot, me nedixwest we li vir bihêlin, lê li me biborin divê em biçin. Tev bi çavên şil û dilên şkestî ji şehîdgehê derketin. Yên din jî deh deh, bîst bîst bi seyareyan derdiketin. Li hemberî êrîşên dijmin hêrseke mezin bi wan re çêbûbû. Bi wê hêrsê wê derbasî qadên welat bibûna û cihên ji wê mezintir li ser erdê xwe ava bikiran. Her ku diçû di dilê wan de kîna li hemberî dijmin gurtir dibû.

Nîzîkî nîvro bû. Tiştek li akademiyê nemabû. Ew cihê ku ji çûnhatinan vala nedibû bêdeng bûbû. Xweza jî bêdeng bûbû. Teyrikekî jî danetanî ser wan keviran, çawa ku wan jî bi milîtanan re bar kiribe. Cih bûbû weke bermayiyeke dîrokê, lê heskirina xwe li wir hiştibûn. Hê her sê al yên li pêşiya akademiyê li ber bayê payîzê weke pêlên deryayê şeqeşeqa wan bû diçûn dihatin. Sara û Siwar li pêşiya wan sekinîbûn. Girêkek ket qirika Sara, dikir nedikir nikariya xweziya xwe daqurtîne. Bi kotekî dengê wê derket:

-Hevalê Siwar, dilê min ranagire alan daxim jêrê. Wan daxe, baş bipêçe.

Lê rewşa Siwar ji ya wê ne baştir bû. Rondikên wî heta ser erzeniya wî hatibûn. Ji bo ku bi dengê bilind negirî pir zor dida xwe. Tiliyên

xwe yên dilerizîn hêdîka ber bi benên alan ve birin. Lê dikir nedikir tiliyên wî nedigirtin. Sara pişta xwe dabûyê, nedixwest dîmenê daxistina alan bibîne. Ji ber rondikan Siwar nedidît ka çawa dipêçe. Pişt re her duyan her sê al yek bi yek maç kirin, Sara xistin çenteyê xwe. Li wir her du tenê mabûn. Tiştekî ku bikin nemabû. Piştî xatirxwestina ji şehîdgehê ew jî li seyareya xwe siwar bûn di derî re yê li ser kembera wê "Deriyê Serkeftinê" nivîsî derketin. Heta seyare ji wir dûr ket Sara di pencereyê re li paş xwe ve dinêrî. Rondik di ser hinarikên rûyê wê de dihatin xwarê. Rondikên xwe paqij kirin, pencere girt. Di dilê xwe de got, em dîrokekê bi şûn xwe ve dihêlin diçin, divê ev dîrok neyê jibîrkirin!

***

Siwar li ser kursiyê dîreksiyonê bû, Apo jî li kurisiyê paşiyê rûniştibû. Ji keviya Şamê ber bi navendê ve diçûn. Feyrozê stirana Qudsê digot. Apo bi baldarî guhdarî dikir:

-Siwar, gotinên vê stranê ji min re wergerîne!

-Serokê min, divê ez çend caran lê guhdarî bikim.

-Ev stirana wê gelek biwate ye. Dengê wê xwe berdide nava dilê mirov. Mirov melodî û newaya wê qet ji bîr nake. Ez jî hinekî fêm dikim.

Piştî qasekî nêzîkî Mezê bûn:

-Siwar, te ji bo min ji bijîjkê çavan civan girtibû?

-Rast e serokê min, bijîşk got kengê dixwaze bila bê.

Seyare ket kolana mal lê. Nexweşxane ket ber çavên wî.

-We li vê nexweşxaneyê civan girtiye?

-Belê serokê min. Timî vekiriye bijîjkên wê jî baş in. Em niha biçin?

Li saeta xwe nêrî, li bernameya xwe ya rojê fikirî:

-Dibe, em biçin.

Seyare li ber deriyê wê rawestand. Peya bûn ketin hewşa nexweşxaneyê. Xebatkarekî temenê wî li derdora sihî ber bi Apo ve çû, bi rêzdarî bixêrhatin dayê.

-Serokê min bijîşkê we yê sinozîtê jî li vir e. Dixwazî em wî jî bibînin.

-Emê destpêkê biçin cem yê çavan bila li çavên min binêre. Em paşê dikarin wî jî bibînin.

-Kerem bike serokê min.

Ketin kêlekê berê xwe dan nava nexweşxaneyê. Apo berê xwe da yê xebatkar:

-Navê te Qehar bû?

-Rast e serokê min, ez berî demekê jî hatim cem we malê.

-Hat bîra min. Rewşa te çawa ye? Tu baş li birîndaran dinêrî?

-Baş im serokê min. Ya ji dest me tê em dikin.

Hin bijîşik hevalên me baş emeliyat nakin. Di pişta hevalekî de gule hebû, lê dernexistibû. Xebera deweletê ji birîndarên me heye.

-Rast e serokê min, wî bijîjkî lêborîna xwe xwest. Lê me heval êdî nebirin cem.

Pênûsa bijîşk di destê wî de bû li ser rûpelekê tiştin dinîvîsîn. Bi vebûna derî re serê xwe rakir:

-Qehar te nexweşê xwe aniye?

-Belê. Mirovê min e, ji dûr hatiye divê tu baş lê binêrî.

Bijîşk kursiyê rûniştinê nîşanî Apo kir:

-Kerem bike rûne!

Rahişt cîhazê xwe li çavên wî nêrî.

-Bi xwendinê pirtir diêşin ne?

-Rast e. Dixwerin. Sor dibin. Rondik ji wan tên.

-Divê tu sinozîta xwe jî bidî kontrolkirin. Ezê ji bo xwendinê berçavkekê binivîsim. Dema tu derketî bila berçavka rojê jî her tim li

ber çavên te be. Bila xewa te jî nîzamî be. Pir bêxew nemîne û pir nexwîne!

Pirsa ku diviya destpêkê bike, nû hat bîra wî:

Tu çi karî dikî?

Apo berê xwe da Qehar:

-Qehar, jê re bêje, ez mûhasib im, ji bo wê li nivîsan pir dinêrim.

Bijîşk keniya. Çawa ku bawer neke:

-Haa, min fêm kir, lê ji mûhasiban wêdetir rengê te bi ser dîroknasan ve diçe. Ezê dermanekî ku timî çavên te şil bihêle û nehêle bixwere binivîsim. Ev jî karta min e.

Apo kart girt xist berîka xwe:

-Pir spas dikim. Ku baş nebe ezê werim. Emê biçin cem yê sînozîtê jî.

Ji bo xatirxwestinê Apo destê xwe dirêj kir. Bijîjk jî destê wî şidand:

-Maşelah tu pir dirêj î, yan ez pir kin im!

Bi hev re keniyan. Xatir xwestin berê xwe dan odeya bijîşkê sînozîtê. Bijîjk li ber derî sekinîbû. Ber bi wan ve çû bixêrhatin da Apo:

-Kerem bike! Ez pê dilşa dibim ku bijîşkiya serokê partiyekê dikim. Rewşa we çawa ye? Berî du mehan hûn hatibûn. Qehar jî dizane ez Çerkez im lê ji gelê Kurd pir hes dikim. Rewşa siyasî napirsim, dizanim karê we pir e.

Apo li ser kursiyê kontrolê rûnişt. Bijîşk piştî ku qasekî kontrol kir, serê xwe rakir bi rûyekî xweş lê nêrî:

-Birêz Ocalan, berî vê jî min gotibû we, sînozîta we gelek giran e. Divê hûn emeliyat bibin. Eger hûn nebin wê timî bêhna we teng be. Her tim wê pozê we bixetime û serê we biêşe.

Apo pişta xwe rast kir:

-Tu rast dibêjî, zorê dide min. Dema li cihên vekirî bim pir naêşe,

lê nava bajêr û dûyê seyareyan min pir nerehet dike. Bi taybetî bihar û zivîstanan. Ango teqez divê ez emeliyat bibim?

-Belê, emeliyat şert e. Ez ti dermanan nanivîsim. Ji bo emeliyatê hûn dikarin roja Duşemê werin. Yan jî rojeke ji bo we guncawa be. Emeliyat dema we pir nagire.

-Baş e emê te agahdar bikin. Careke din dema em hatin emê li ser dîroka Çerkezan nîqaş bikin. Rûyê bijîşk dikeniya:

-Dema ez we dibînim hêviya min gelek mezin dibe. Tu serokê herêmê yî. Em gelê Çerkez heliyan, lê bi hebûna we hêviya me jî xurt dibe.

Xatir xwest, derketin.

Seyare li ber deriyê malê sekinî peya bûn. Li ber deriyê avayiyê zilamekî milkisekî destîdirêj di destê wî de bû, wisa ziq li Apo temaşe dikir. Rewşa wî ya biguman bala Apo kişandibû. Berî hingê jî çend caran di heman rewşê de dîtibû. Lê vê carê rûyê wî baş dit:

-Siwar, li derdora me gelek kes me dişopînin.

-Serokê min, heta ji me tê em bi şiyarî tevdigerin.

Li asansorê siwar bûn, gihîştin ber deriyê qata dehan:

Şervînê bilez derî vekir. Dîcle û Rihan jî li teniştê sekinîbûn. Piştî merhebayê yekser berê xwe da eywanê, li ser kursiyekî rûnişt. Rahişt rojnameya li ser mase, pelên wê qulibandin. Tv. jî li ser nûçaneyan bû. Piştî nûçeyan berê xwe da metbexê. Şervînê şîv çêdikir. Ji pişt ve dengê wî hatiyê:

-Ezê nan û mast tenê bixwim, pêwîst nake hûn tiştekî çêkin. Sibê jî savarek weke ya diya min çêkin. Bila dew jî li ber hebe. Lê hûn nizanin weke wê xweş çêkin.

Rahişt qedehek avê ji henîfiyê dagirt berê xwe da pirtûkxaneyê. Piştî qasekî derket çû ber destşoyê. Li ber neynikê hinekî li çavên xwe temaşe kir, pişt re dest bi tiraşkirina rûyê xwe kir. Birhên xwe yên stûr û gur jî paş de dan. Pêşgîra li ser milê xwe bîn kir, -bijîşk jê

re gotibû, divê tişta biparfûm li rûyê te nekeve- pişt re pê rûyê xwe ziwa kir.

Ew demek bû li pirtûkxaneyê dixebitî. Rabû ser xwe li pêşiya mase hinekî çû hat. Li ser mase tişteke pir hûrik li ber çavên wî ket. Tiliya xwe bi ser ve bir. Destpêkê baş nehat zanîn ka toz e, yan ji ber tîrêjên rojê wisa xuya dike. Lê hin toz bi serê tiliya wî ve mabû. Bi dengekî bilind gazî Şervînê kir:

-Şervîn, ka were!

Şervîn bikelecan ber bi pirtûkxaneyê ve çû, derî vekir ket hundir:

-Belê serokê min!

Mase nîşan da:

-Tu vê tozê dibînî? Ev mala we ye; divê hûn pir paqij bin û weke çavên xwe li derdora xwe binêrin!

-Temam serokê min!

-Ji bo paqijkirinê tiştekî bîne!

Şervîn bilez derket çû metbexê paçek anî. Destê xwe dirêjî paç kir. Şervîn mabû şaş. Weke xunavekê xwêdan li ser eniya wê kom bûbû:

-Serokê min, ezê paqij bikim.

Nedixwest paç ji destê xwe berde, hişk girtibû. Lê ji destê wê derxist, dest bi paqijkirina mase kir.

-Min ev ji bo we got da hûn di her warî de diqet bikin, ne ji bo paqijkirina mase!

Çû ber henîfiyê, hê jî av nehatibû. Wê saetê av qut bûbû. Piştî hatina avê, rahişt cilên xwe yên paqij berê xwe da hemamê. Hem amadekariya şûştinê dikir, hem bi dengekî nizim stirana Aram Tigran, “Ey welato ez heliyam” digot. Gotinên wê tev ji ber kiribûn. “Derdê welat peyda dike jano kulek. Navo dil ciger êşiyan gelek gelek. Ey welato em heliyan, ceger li erdê riziya, xwîn herikî û meşiya... ”

Dîcle gazî hevalên xwe yên din kir:

-Hevalno, ka werin Serokatî distirîne. Ez nû dibihîzim. Dengê wî jî pir xweş e.

Siwar û her duyên din jî ber bi milê hemamê ve çûn. Kêfa tevan jî pir hatibû û bi baldarî guhdarî dikirin. Dîcle bi pistepistê diaxivî:

-Heta niha min nizaniya dengê Serokatiyê evqas xweş e. Hem pir xweş e, hem weke xuşîna avekê ku xwe ji nava belekiyên berfê berde wisa aramiyê bi mirov re çêdike.

Dengê wî carna bilind dibû, carna nizim. Di hemamê de rojên li ber çemê Firatê derbas kirîn hatin bîrê.  Ketina çemê Firatê, şînbûn û zelaliya wê dianîn ber çavên xwe. Çawa ku mirov xwe ber bi xeweke şîrîn ve berde, çavên xwe di bin dilopên ava germ de girtin, di çemê Firatê de çend caran xwe noq kir. Piştî ku xwe şûşt, cilên xwe li xwe kirin derket. Her çar li serê korîdorê li pêşberî xwe dîtin:

-Hûn li vir çi dikin?

Şervîn berken bû:

-Serokê min, dengê we xweş bû, me guhdarî dikir.

W jî xwe kenand:

-Hûn nahêlin mirov bi kêfa xwe stranekê jî bêje.

Derbasî odeya xwe bû di berkêşkên dolabû de li goreyên xwe geriya. Gore nedîti, berê xwe da odeya xwe. Odeyeke ne pir piçûk, ne pir mezin bû. Li aliyekî dîwar textê razanê, li tenişta wî dolaba cilan, li aliyê din dolabeke biberkêşik û neynik, di refên wê de tiştên entîke û diyariyên gel jê re şandîn hebûn. Li tenişta text pencereyek hebû. Kulîlkên li ser perdeya wê bi tayên zerê zêrîn hatibûn honandin. Dema rojê lê dida çawa ku kulîlikan ji tîrêjên rojê xwe berdabin ser wisa xuya dikirin û weke zincîran bi hev ve girêdayî bûn. Her çar taqên dîwar hatibûn kaxizkirin. Ku mirov pir ji nêz ve lê nenêriya, nîgar û wêneyên wan teyrikên bedew nedidîtin. Tiştên di hundir de pir bi nîzamî û biserûber hatibûn bicihkirin. Bi hesasiyeta

zêrînkerî û hestên hunermendekî her tişt bi pîvan li cihê wê hatibû danîn. Çarşefên li ser text spî û pir paqij bûn. Erê odeyeke mûtewazî bû û tiştên ne pêwîst tê de tinebûn, lê dema mirov diket hundir çawa ku bikeve mala mîrekî ewqas paqij û biaheng bû. Weke cihê zahidekî aramî, weke qesreke buhiştê bextiyarî û weke kelhekê bixwebawerî dida mirov. Bêhna jiyana azad jê dihat. Kesê biketa hundir êdî nedixwest jê derkeve.

Di wê navê re ji bo agahiya telefona ji derve hatî, Şervîn li derî xist ket hundir. Hê goreyên xwe nedîtibûn:

-Heval, nizanim her carê hûn çi ji goreyên min dikin?

-Serokê min, yên kevin qetiyabûn, me yên nû anîn.

-Ez li yûn xwe yûn şînê kevin digerim. Min çend caran ji we re gotiye heta bên wergirtin neavêjin. Çima we avêtiye, bihêlin ezê bidirûm. Her car hûn ewqas pere didin cilan. Çima hûn wisa dikin? Ev nirxên gel in. Bihêlin ezê cilûbergên xwe bixwe bidirûm û li xwe bikim. Hinek ji wan qetiyane jî lê ez li malê werdigirim. Pêwîst nake hûn her carê yên nû bikirin. Ez goreyên xwe yên kevin dixwazim! Xwîşka min jî carekê xeber şandibû, gotibû bila Evdila ji min re xaniyekî peyda bike, ezê werim cem bimînim. Min got ev xwîşka min bêaqil e, ma nizane ev gumlekê li min jî gel ji min re şandiye. Biçe wan goreyên min bîne ezê bidirûm.
Şervîn, nezaniya ka çi bike.

-Temam serokê min!

Piştî çend kêliyan gore anîn. Ji destê wê girtin, destê xwe danî ser cihê qetiyayî, li Şervînê nêrî:

-Lê binêre heval, pir neqetiyane. Ta û derziyê bîne ezê bidirûm û bikim piyên xwe.

Piştî ku ta û derzî anîn dest bi dirûtina goreyê kir. Şervîn hejiyabû û hişê wê belawela bûbû. Ne li benda tiştekê wisa bû. Dikir nedikir aqilê wê nedibirî çawa serokê gelekî goreya xwe bidirû. Di hundirê

xwe de got, di nava van derfetan de Serokatî li pey cotek goreyên qetiyayî ketiye. Wê demê ji niha û pêve divê em her tiştî baş biparêzin û qîmetê wê bizanin.

***

Selah li ber deriyê malê seyareya xwe rawestand, bi asansorê derket qata dehan.  Şervînê derî jê re vekir. Silav da û bilez ket eywanê. Kufekuf pê ketibû, di dilê xwe de digot, ezê çawa ji serok re bêjim. Bi bihîstina dengê derî re ew jî ji odeya xwe derket hat ewyanê:

-Tu bi xêr hatî Selah, we heval hemû derxistin?

Serê Selah li ber bû, çawa ku sûcek kiribe nedixwest li çavên wî binêre:

-Serokê min, me heval hemû derxistin lê koma dawiyê hatiye girtin.

Bi bersiva Selah re rengê wî hat guhertin. Hêrsa li ser rûyê wî ji dûr ve xuya dikir. Her du ceynikên xwe ferikandin:

-Li kû hatine girtin?

-Li Suriyê.

-Çend heval bûn?

-Li derdora bîst û pêncan bûn.

Apo her du destên xwe xistin teniştên xwe çend caran çû hat:

-Dengê lingê şerê li Başûr tê, dixwazin hêzên Başûrî bi ser me de bişînin. Wisa xuya dike girtina akademiyê û şerê ku dixwazin bi hêzên Başûrî bidin kirin parçeyên heman senaryoyê ne. Ji ber wê dibe ku niha wan bernedin. Eger di şerê li Başûr de em bi ser bikevin, wê wan berdin, eger em bi ser nekevin, bernadin. Wê ji Tirkan re bêjin, hûn dibînin em wan digirin û dibe ku teslîmî wan jî bikin.

Piştî vê axaftina xwe çû li ber destşoyê rûyê xwe şûşt dîsa

vegeriya:

-We heval çawa bi cih kirin?

-Serokê min, me hin şandin Şeba, yên din jî me li vir li malên welatparêzan bi cih kirin.

-Şeba li kû ye?

-Li Xota ye serokê min.

-Ha ha, min nas kir.

-Serokê min, me li Sêdnaya jî cihek dîtiye, hinge ya li Şeba ne mezin e, lê baş e.

-Divê em lez bikin, da bandorê li perwerdeyê neke. Kîjan herêm baş be li wir bigirin.

-Serokê min, herêma Şeba ya me cih lê girtî ji bo ewlekariyê baş e. Derveyî bajêr e lê ne pir dûr e. Ya Sehnaya jî weke wê ye.

-Dewlet dizane em ji Lubnanê derketin û ev xwesteka wan jî bû. Me ji rayedarên dewletê re got, em neçar in hevalên xwe yên birîndar bînin vir. Ji bo wan em cih dixwazin. Lê ew jî ne amade ye gelek tiştan bidin me. Dixwazin em li gorî xwestekên wan tevbigerin.

Çend caran di nava eywanê de çû hat:

-Tu cihan bibîne lê bila fireh bin. Bila dûrî bajêr bin û bala ti kesî nekişînin.

-Ji bo dîtina wir me hin welatparêz jî bi xwe re birin, hûn wan nas dikin. Li wê herêmê em pir geriyan û me gelek cihên din jî dîtin. Herî dawî me ya li Şeba eciband. Hemû dar in. Avayiyek jî tê de ye. Mezreeyeke piçûk e. Nêzîkî riya giştî ye û dûrî cihên dewletê ye.

-Ji destê xwe bernedin! Emê hevalan li wir bi cih bikin. Divê hûn cihê perwerdeyê jî bilez çêkin, lê divê derdora wê baş bê girtin. Divê berî gavekê em hevalan li dibistanan bi cih bikin. Çi dibe bila bibe divê em dest bi perwerdeyê bikin. Weke min gotî divê bala ti kesî nekişîne û zû tevbigerin!

-Serokê min, tu bibînî em pişt re bistînin wê baştir be.

-Wê demê em di demeke guncaw de biçin. Niha tu dikarî biçî ser karê xwe.

Piştî derketina Selah, Şervîn ji metbexê ber bi eywanê ve hat. Li ser tepsiya di destê wê de sêv, hinar, hêjîr û tirî hebûn. Tepsî danî ser mase, li pêşberî wî sekinî.

Hê rûyê wî ne xweş bû:

-Serokê min, me raporên xwe amade kirine. Hevala Rihan li ser rêxistinê lêhûrbûna xwe dike. Hevala Dîcle jî dahûrînên Serokatiyê dixwîne.

-Hevala Dîcle çiqas me nas dike?

-Dibêje, min nizaniya Serokatî evqas bi her karî û her kesî re elaqedar dibe.

-Niha me çawa dibîne?

-Dibêje, naskirina Serokatiyê ji dûr ve ne weke naskirina wî ji nêzîk ve ye. Pêşniyara wê jî çûna qadên şer e.

-Hê zû ye, bila hinekî din jî lêhûrbûnê bike. Bila pirtûkên giştî bixwîne. Dinyayê nas bikin. Bila guhdarî Tv. Bike. Tu jî xwe ji bo pêşengiyê amade bike! Divê tu bibî fermandareke xurt. Wê Sara jî were vir. Weke din çi heye?

-Serokê min, li hemberî siyaseta hêzên Başûrî hevalên li Ewropa amadekariya mitîngan dikin. Li benda perspektîfên we ne. Weke din dibêjin gelek rojnemevan û nivîskar dixwazin Serokatiyê bibînin. Hevalên Rojhilat jî ji bo şandina Ewropa navên hin hevalên birîndar dan. Hevalên Cîzîr, Efrîn û Kobanê jî raporên xebatê bi dayîkan re şandine. Dayîk jî li benda we ne.

-Temam heval, rapor li kû ne?

-Serokê min, li pirtûkxaneyê ne.

-Piştî şivê ezê bixwînin.

***

Serê sibê zû bû. Apo û Selah di seyareyê de, li ser riya balafirgehê ber bi Milîhe ve diçûn. Cihê tê re derbas dibûn bala Apo kişandibû, cihekî aram û tenha bû. Destê xwe li milê Selah da:

-Selah, vir gelek xweş e û riya wê jî baş e. Hem nêzîkî hevalan e, hem di aliyê ewlekariyê de baş e.

-Serokê min, li vir jî me xaniyek dîtiye, lê xwediyê wê hinekî biha dibêje. We gotibû ji bo istirahet û lêhûrbûnê cihek pêwîst e.

Çavên Apo hê li ser cih bûn. Kêfa wî ji xwezaya wê re hatibû. Bîna daran dihatiyê. Carna çavên xwe digirtin û nefeseke kûr dikişnad hundirê xwe:

-Em dikarin niha lê binêrin.

Peya bûn ber bi cih ve çûn. Xweşikbûna darên çam û merxan bala wî gelek kişandibû. Çavên xwe ji ser xwezaya cih ranedikirin. Selah jî êdî fêm kiribû ka li cihekî çawa digere:

-Serokê min, ev ji yên heta niha me dîtîn hemûyan baştir û xweştir e. Tu xwezaya wê jî dibînî çiqas bedew e. Her rengê darên fêkiyan tê de hene. Ji vir re dibêjin Milîhe. Nêzîkî dibistanên me ne jî.

Piştî qasekî gihîştin ber derî. Deriyekî duqat û mezin bû. Kulîlkên yasemînê yên spî û zer weke ristikan di ser re daheliyabûn. Çavên wî her li wan kulîlkan bû. Çend heb jê weşiyan ketin ser cilên wî. Kêfa wî ji bîna wan re pir dihat. Di hundir de, tişta destpêkê bala wî kişandî pirbûna daran bû. Darên sêhr, yên bêhr, ji her rengê daran hebûn. Daran û meyweyên wan xemleke wisa didan mezreeyê mirov digot qey Baxçeyê Babîl e. Ji ber daran siyeke tarî ketibû erdê. Hawîrdorê wê jî tev hatibû dîwarkirin. Li ber dîwar jî ji her rengê gulan hebûn. Di nava wê de jî hewzeke pir xweş hatibû çêkirin. Ava wê ya şîn û zelal aramî dida mirov. Li ber wî hawzê bedew rawestiya

lê temaşe kir. Jixwe bi xwazayê pir kêfxweş dibû, nemaze ku bedewiyeke wisa didît, kêfxweşiya wî dehqat dibû. Rengê hewz yê asîmanî ji ber tîrêjên rojê weke eynikekê diçirisî. Ji bihna li raserî hewz henaseyeke kûr kişand nava xwe. Bi dengê çivîkên li ser daran arambûna wî pirtir bûbû. Li ser xwe re nêrî. Tîrêjên rojê xwe di nava pelên daran de berdidan erdê. Çavên xwe girtin, di dilê xwe de got, emê li vir gavên nû biavêjin. Dibe ku ne bi dilê ti kesî be, lê wê bi dilê gelê me be. Kêfxweşiyeke weke berfa biharê ketibû ser lêvên wî. Li ser hinarikên rûyê wî jî gulpikên kêfxweşiyê belav bûbûn. Ew li dinyayekê bû, Selah li dinyayeke din bû. Ya ji bo wî girîng ewlekarî, xweza û bikaranîna cih bû, derdê Selah jî metreyên erdê bûn. Çawa ku endezyarek be, bi çavên xwe erdê wê dipîva. Bi dengê Apo ji nava xeyalên xwe derket:

-Selah, emê vê bikirin. Zûbizû ti kes vir jî nabîne. Dar û daristana wê boş in. Cihê lîstika topê jî heye.

Di ber axaftina xwe re hêdî hêdî ber bi cihê lîstikê ve çû. Di dilê xwe de got ji bo futbol û voleybolê her duyan jî dibe. Çûn hundirê xênî, li qata xwarê nêrîn. Odeyên wê têra xwe fireh bûn. Eywana wê jî hem fireh bû, hem berê pencereyan li baxçe bû. Wata jorê jî weke ya jêrê sê ode û eywane bûn. Hawîrdorê wê jî tev balkon bû. Baxçe tev jê xuya dikir. Li her cihî temaşe kir. Selah jî li mezinbûna xênî dinêrî. Piştî ku li her derê temaşe kirin, derketin. Apo careke din bi şûn xwe ve lê nêrî:

-Cih baş e, lê bihayê wê çiqas e?

-Serokê min, dibêje sih û şeş milyon, lê wê jê daxe. Li vir bazar wisa ye. Destpêkê biha dibêjin.

-Hûn bi wî bixwe re axivîn?

-Belê serokê min, me jê re got em vir ji bo bazirganekî dewlemend dixwazin.

-We baş gotiye, lê hûn dizanin pereyên min nînin. Em her tiştî ji

bo pêkanîna karê xwe digirin. Lê divê welatparêzekî bibawer li ser navê xwe çêke! Divê cihên din jî li ser navê welatpêrêzên saxlem bin.

-Serokê min, me bi hevalan re jî ev mijar nîqaş kir, me got emê li ser navê du welatparêzan çêkin. Her du jî dostên me ne û li Şamê dimînin.

-Tavilê biçin bikirin! Tişta we nîqaş kirî guncaw e, ez tevlî dibim. Emê vir ji bo karên xwe yên taybet bi kar bînin. Piştî we stand, bila welatparêzek were li vir bimîne.

-Serokê min, me ji Şêxo re gotiye, wê li vir bimîne.

-Haa, ez wî nas dikim, cara yekê min li Zahîra dîtibû. Piştî wê êdî gelek caran dihat, heval dibirin dianîn. Mirovekî kedkar e, li cem me be baş e. Emê çend hevalan bînin bila lênûrbûna xwe lê bikin

Piştî ku derketin çûn, êvarê Selah û du welatpêrêz vegeriyan. Xwediyê xanî jî hatibû. Destpkê Selah hevalên xwe pê dan naskirin, pişt re dest bi bazarê kirin. Li ber hev didan. Xwediyê xanî li kesên bi Selah re hatîn dinêriya. Bi serê wî nediket ku bikarin bikirin. Lewre hem Kurd bûn, hem xizan bûn. Ev ji axaftin û serûberên wan dihat fêmkirin. Vê bêdengiya wî bala Selah kişandibû:

-Çawa ku ne bi dilê te be tu bifiroşî.

-Na birayê min, ez dixwazim, lê gotinek heye dibêjin, teyrê nêçîrê serê nikulê wî xwar e, ev hevalên te ne ti teyr in.

Lê Selah jî ne kêmê wî bû:

-Birayê min, tu wisa li cilûbergên wan nenêre, wisa dikin da ti kes wan nas neke. Tu xwediyê pereyên xwe yî. Ma çi karê te bi cilên wan heye?

Xwediyê xanî hinekî pişta stûyê xwe xwerand. Çawa ku pir ne bi dilê wî be. Destê xwe avêt berîka xwe pênûsa xwe derxist:

-Êh, madem wisa ye, li ser xêrê be.

***

Apo li eywana qata dehan destên xwe kiribûn teniştên xwe, diçû dihat. Akedemiya li Bîqayê hatibû girtin, diviya berî gavekê perwerde dest pê bike. Gelek pirsgirêkên din jî hebûn. Tev li benda çareseriyê bûn. Ji ber wê dixwest bilez bimeşe, lê nava eywanê ew derfet nedida. Ji bo wî ew der teng bû. Bi dengê bilind gazî Siwar kir:

-Karê dibistanan çawa bû, hevalan dest pê kiriye?

-Belê serokê min, dest pê kirine. Weke we gotî me ji Memed re got, divê berî gavekê dîwarê derdora wê bê girtin. Li ber xelaskirinê ye. Ew bi xwe jî gelek karan dizane.

-Ma hoste di nav hevalan de jî hene?

-Serokê min her heval ji karekî fêm dike.

-Wê demê em îro biçin hosteyiya wan bibînin. Piştî saetekê amade be emê bi rê bikevin!

-Temam serokê min!

Komek ji sih kesî ji bo serastkirina dibistanê li mezrea Şeba dixebitîn. Her çend kes bi karekî ve mijûl bûn; hina binê daran paqij dikir, hina deverên xirabûyî çêdikir, hina nava xanî paqij dikir, hina jê dîwarê derdor bilind dikir. Pir kêfxweş bûn. Li kû bûya, cihekî çawa bûya ji bo wan ne girîng bû, ya girîn ew bû ku ji bo perwerdeyê cihek ji wan re peyda bibe, li cem serokê xwe bin û jiyana wan ya hevbeş xirab nebe. Ji ber wê bi coşeke pir mezin dixebitîn. Şev roj li cem wan tinebû.

Siwar seyare li nava kolanên Şamê hêdî hêdî diajot. Li ser riya Şeba li ber derê dikanekê seyare sekinand:

-Serokê min, ezê avekê bînim, tişteke din pêwîst e.

-Na, av bes e.

Piştî ku av anî lez da seyareya xwe.

Apo di pencereya seyareyê re li derdor dinêriya. Riyeke pir xweş bû. Weke di çîroka Hezar û Şevekê de tê gotin, her du aliyên wê bi darên pir bilind bûn û siyeke pir xweş didan ser rê. Bi giranî darên spîndar bûn û bilindayiya her yekê bi qasî bîst metreyî hebû. Bîna şiliya erdê li wan navan belav bûbû. Di pencereyê re ew bihna xweş dikişand hundirê xwe.

Ji xweşî û bedewiya rê, nizanîn ka çawa gihîştine mezreeyê. Yekî esmerê zeîf û bi kefî, derî ji wan re vekir. Li ber derî peya bûn û bilez ketin hundir. Destpêkê berê xwe da dîwarê derdorê yê tê bilindkirin. Weke kunmoriyê her kes bilezûbez û bieşq dixebitî. Bi bihîstina hatina wî re tev li hev kom bûn û ji bo pêşwaziyê ketin rêzê. Ew jî bi rûyekî pir geş û biken li pêşberî wan sekinî:

-Merhaba, hûn çawa ne? Rewşa we çawa ye?

Qederekî sekinî li bilindbûna dîwar nêrî. Berê xwe da yê jê re derî vekirî:

-Memed, ev cihê me ye, lê emê çawa biparêzin? Eger cîranên me baş bin, wê bibin leşkerên me û me biparêzin, lê eger li dijî me bin wê bibin dijminên me û wê dijmin bînin bikin nava me.

Ji ber xelasbûna dîwar kêfa wî pir hatibû, Li derdor dinêrî:

-We karekî baş kiriye, lê ez jî ji çêkirina avayiyan fêm dikim. Dibe ku ez ji we baştir jî çêkim.

Hinekî pêş ve çû, bêr ji destê Memed girt, dest bi çêkirina xercê kir. Di nava demeke kurt de xerc amade kir. Kêfa Memed pir hatibû, di dilê xwe de got, Serokatî jî weke me ye. Apo bêra xwe di nava xercê de çikand, çavê xwe li Selah gerand. Selah li wir jî dest bi endezyariya xwe kiribû, bi gavên bilind ji milekî diçû milê din.

-Selah, ez çawa kar dikim?

-Serokê min tu pir baş kar dikî.

Bi dengê bilind keniya:

-Heval çawa kar dikin, nanê xwe helal dikin?

-Serokê min, ji karkerên şirketa Cebel Qasyon xweştir kar dikin.

Berê xwe da aliyê dîwar yê derve:

-Li derdor çi heye?

-Serokê min, cîranên derdor digotin ev kî ne, çi ne, bi şev û roj kar dikin.

-Te çi bersiv da wan?

-Min ji wan re got em ji yekî zengîn re dixebitin.

-Te baş gotiye.

Li milê pêşî nêrî:

-Derî amade ye? Divê deriyekî mezin be.

-Rast e serokê min, me derî aniye.

Êdî wê ji dibistanê biçûya. Tev lê kom bûbûn li bendê bûn ka wê ji wan re çi bêje. Yek bi yek li rûyê wan nêrî:

-Hevalno, karê me hema hema temam e. Hawîrdorê wê hat girtin, êdî hûn dikarin dest bi cihê dersan û cihê razanê bikin. Kengê derfetê bibînim ezê werim. Divê zû amade bibe.

Berî ku derkeve, li cem Memed sekinî:

-Tuyê li vir bî, piranî wê hevalên bi zimanê erebî nizanin li vir bin. Ji derve çi pêwîst be tuyê pêk bînî. Ev karê te ye, çûna bijîşk be, anîna erzaq, vekirina derî, tê lê binêrî. Li derdor miqate be.

Destê xwe danî ser milê wî:

-Tu xwediyê şoreşê yî, yên vî karî dikin, xwediyê kedê xwediyê vê şoreşê ne.

Xatir jê xwest û derketin.

***

Di nava çend rojan de dibistan qediyabû. Ji bo destpêkirina perwerdeyê her tişt amade bû. Xaniyekî duqat di nîvê wê de bû. Li qata jêrê cihê milîtanên jin hatibû amadekirin. Li teniştê jî çadirek ji

wan re hatibû vedan. Qata jorê ji bo Apo hatibû amadekirin. Du cih ji bo razana milîtanên xort, ciyek jî ji bo perwerdeya zivastanê bû. Ji bo perwerdeya havînê jî li binê daran cihekî gurover hatibû çêkirin. Nîvê wê ji bo kesê dersê bide hatibû çêkirin, hawîrdorê wê jî ji bo kursiyan bû. Li hewşê cihekî kevokan jî hatibû çêkirin. Aramî li ser rûyê her kesî xuya dikir. Qada topê jî hatibû çêkirin. Hem cihê sporê, hem yê meşê û nîqaşan bû. Cihê çapemeniyê û odeya rêveberiyê jî amade bûbûn.

Di nava çend rojan de ji her çar parçeyên Kurdistanê û dervayî Kurdistanê nêzîkî heftê milîtanî kom bûbûn. Ji nîqaş û tevgera milîtanan diyar dibû ku lêhûrbûnê dest pê kiriye. Li ser banê xanî her tim du milîtanan nobet digirt. Ruhekî nû ketibû ser wî parçeyê erdê.

Roja din sibê zû bernameya rojê bi sporê dest pê kir. Du kesan jî çaydanên çayê yên mezin dibirin kêleka dibistanê û sifreyên taştê li erdê rêz dikirin. Taştiya wê rojê penîr, zeyt û zehter bû. Bi şîara noşîcan be, li ser sifreyê rûniştin.

Piştî taştê şahiya qedandina dibistanê dest pê kir. Di nîvê qadê de milîtanekî li bilûrê dixist. Hêdî hêdî yên din jî li dorê kom dibûn. Yekî saza xwe girtibû, ew jî li kêlekê rûnişt. Dengekî xweş bi ser wan deran ketibû.

Siwar û Memed, bi seyareyeke tijî arzaq ber bi dibistanê ve diçûn. Memed pir kêfxweş bû ku di karê partiyê de ye:

-Hevalê Siwar, berê ez pir feqîr bûm. Demanceyeke min hebû, me û Ereban carna şer dikir, ji ber wê min bi xwe re hiltanî. Dema hevalê Hemze hat alîkariyê, hema min dayê. Ji min re got ev pir e, min got eger em bi vê partiyê re bin divê her tişta me jê re be. Bavê min ji min re digot, yan tuyê bi min re bî, yan bi vê partiyê re, ev partî ne misliman e. Min jî jê re got bavo, tu li ser riya xwe ez li ser riya xwe. Pişt re ez û hevalê Hemze çûm cem, pir kêfa wî hat.

-Te berê ji partiyê re qet gotiye ezê tevlî bibim?

-Min pir dixwest tevlî bibim, lê hevalan got, zarokê te hene. Kar bike bes e. Dema min pirtûka Pirsgirêka Kesayetê dixwend min digot qey Serokatî li gundê me maye. Min ji Serokatiyê re jî got dixwazim tevlî bibim. Got çend zarokên te hene, min got pênc. Got wan mezin bike bike şoreşger bes e. Hingê emê te qebûl bikin.

Di wê navê re gihîştin ber derê dibistanê. Bi ketina hundir û dîtina wî dîmenî re, ji kêfa mirov digot wê niha bifirin.

Ji bo danîna erzaq çend milîtan bibez hatin. Wan jî pir dixwest tevlî şahiyê bibin, lê karekî din yê lezê li pêşiya wan bû.

***

Xaniyê li Milîhe hatibû kirîn. Apo, Selah û Şêxo li nava baxçe rûniştibûn, çay vedixwarin. Apo, Şêxo di ber çavên xwe re derbas kir. Temenê wî li derdora çilî bû, lê ji ber ku di avayiyan de karkerî dikir hem terk ketibûn nava destên wî, hem temenê wî li derdora pêncihî xuya dikir. Ji ber ked, westan, sira zivistan û germa havînê xet ketibûn eniya wî. Mirovekî pir rêzdar û nefspiçûk bû. Hem ji ber kelecanê, hem ji ber rêzdariyê şerm dikir li nava çavên Apo binêre. Lê ne li hemberî wî tenê, li hemberî her kesî rêzdar bû. Apo destê xwe danî ser milê wî:

-Berî tu werî Şamê te çi kar dikir?

-Serokê min, min rêncberî dikir. Lê êdî ji me re neqediya em hatin vir. Zarok hûr bûn û debar jî zehmet bû.

-Min jî karê rêncberiyê kiriye. Tuyê li vir li cem me bimînî. Ev xanî êdî emanetê te ye. Ji her tişta wê tu berpirsiyar î. Rojekê zarokan jî bîne vir em wan jî bibînin û ji bo malê çi pêwîst be ji hevalan re bêje!

Şêxo bînçikiyayî diaxivî. Hinekî jî xwêdan dabû:

-Serokê min, ez dixwazim bi temamî li cem we bimînim.

Apo keniya:

-Na na, tuyê hem li vir binêrî, hem li zarokên xwe. Çend zarokên te hebûn?

-Heft in serokê min. Me bi Hevalê Hesen Bîndal partî nas kir, em wisa bûn dost. Bavê min berê çepgir bû, paşê bû demokart. Hevalên Bakur dihatin cem me.

-Hûn xwediyê rêxistinê ne, ne dost. Hesen Bîndal hevalê min yê zaroketiyê bû û heta dawiyê jî em hevalên hev bûn! Ez bi qasî dikarim xizmetê dikim, hûnê jî bikin. Gotin tu ji çandiniyê baş fêm dikî, ez jî hinekî fêm dikim. Emê bi hev re bikolin, bi hev re daran daynin û bi hev re av bidin. Karê mala xwe jî ji bîr neke! Wê heval jî alîkariya te bikin. Vir tu dibînî hemû darên fêkiyan e û ji wan re xwedankirin pêwîst e.

Berê xwe vegerand ser Selah:

-Selah, tu û Siwar biçin karê xwe, ez û Şêxo jî emê bi hev re biçin.

Ji ber vê gotina wî ya dawiyê xwêdanê di eniya Şêxo de avêt, di dilê xwe de got, ez û Serok emê çawa bi serê xwe û bê seyare biçin.

Apo xwêdana li ser eniya wî û kelecana wî dîtibûn. Berken bû:

-Were Şêxo, ez xwe diparêzim ti kes min naparêze. Ez dikarim we jî biparêzim. Emê heta ser rê bimeşin, li wir bi texsiyekê biçin.

Şêxo hê li ser mijara parastinê dihizirî:

-Temam serokê min.

Selah û Siwar bi hev re derketin, ew jî rabûn berê xwe dan ser riya giştî. Digel ku ti çek bi Şêxo re tinebûn jî, lê çawa ku parêzvanekî Apo be wisa tevdigeriya. Erê mirovekî şermoke xuya dikir, lê çavên wî weke yên baz li derdor digeriyan. Li ser devê rê texsiyek sekinandin. Apo li paş, ew jî li cem ajokar rûnişt. Çavên ajokar di neynikê de ketin ser Apo. Ket kelecanê. Hinekî bi ser milê xwe re li paş nêrî:

-Çawa ku ez we nas bikim.

Apo pir bixwînsarî bersiva wî da:

-Ez bawer nakim. Pir kes dişibihin hev.

Lê ajokar dev jê bernedida:

-Na bi Xwedê min li cihekî hûn dîtine, lê dikim nakim nayê bîra min. Hûn ji cizîrê ne?

-Belê, em xelkê Cizîrê ne.

Ajokar bêdeng bû. Rûyê xwe qermiçand, bi destekî jî pişta stûyê xwe xwerand. Di serê xwe de digerand ka li kû dîtiye. Lê êdî pirs jî nekirin. Kelecana bi Şêxo re pirtir bûbû. Carna di binê awirên çavê xwe re li tenişta xwe dinêrî. Di dilê xwe de got, gelo dibe ku ev mirovekî xirab be. Di wê navê re texsî gihîşt dibistana Şeba. Piştî ku peya bûn çûn jî ajokar hê bi şûn ve li wan dinêriye. Ji xwe re got, wisa xuya dike ez pîr bûme, êdî ez tiştan ji bîr dikim.

Apo ferq kir ku Şêxo pere nedane ajokar:

-Şêxo, me pereyên wî nedanê. Me ji bîr kir, xuya dike wî jî ji bîr kiriye. Divê tu pereyên wî bidiyê. Dibe ku xizan be.

-Serokê min, bi Xwedê çû. Emê li vî bajarê mezin li kû bibînin?

-Na, divê em bibînin. Sibê were vir, dibe ku di vir re derbas bibe.

-Temam serokê min, ezê werim.

Hê çavên wî li ser rê bûn, digot belkû ajokar vegere.

***

Selah seyareya xwe li ber deriyê xaniyê li Milîhe sekinand, jê peya bû. Bi peyabûnê re zilamê xanî firotî wan ber ve hat. Pir bikelecan xuya dikir:

-Selamûeleykum, tu çawa yî cîran?

Selah jî bi rûyekî xweş silava wî veda û bi destê wî girt:

-Kerem bike, Ebû Elî!

Ev xaniyê li teniştayê we yê min e, min bi hev re û weke hev ava

çêkiribûn. Êdî em cîranên hev in.

-Min nizaniya. Wê demê emê bi hev re pir suhbet bikin.

Ebû Elî li nava çavên wî nêrî:

-Lê dema ji bo kirîna xanî tu bi min re axivî te tişteke din got. Hingê jî min ji te re got ev her du zilam neketin serê min.

Rûyê Selah qermiçî, di dilê xwe de got, gelo dibe ku poşman bûbe. Lê poşman bûbe jî imze kiriye çûye.

-Birayê Selah Xwedê ji te razî, te çima di serî de ji min re negot em ji serokê xwe Ebdullah Ocalan re dikirin. Ez cîranê kesekî wisa mezin im. Ev ji bo min rûmet e. Moriyek jî nêzîkî vir bibe emê ji we re bêjin.

Selah li derdora xwe nêrî:

-Ebû Elî bila ti kes dengê te neke, tu ji kû Ebdulah Ocalan nas dikî?

-Bavê min, dinya hemû nas dike. Tirkiye serûbin kiriye, dinya hemû qala wî dike. Min bi çavên xwe dît. Tê vir û sibehan zû sporê dike. Lê xeman nexwe, ez ji zarokên xwe re jî nabêjim. Ev jî sir e. Yê şerê Osmaniyan bike em jê hes dikin û kêfa me ji mêraniya wî re pir tê!

Selah keniya:

-Ebû Elî, ne Abdulah Ocalan e. Pir dişibihiyê, lê ne ew e, bazirnanekî mezin e.

Bi serê wî neketibû lê nexwest li pey bikeve.

-Baş e xem nake, dibe. Kerem bike were em bi hev re qehweyekê vexwin!

-Spas, bila bimîne careke din.

-Tu kengê werî ser çavan. Deriyê min tim ji bo we vekirî ye.

Serê Selah tevlîhev bûbû. Xatirê xwe xwest bilez ket hundir. Destek cilên sporê yên şînê tarî li Apo bû, li cihê sporê dimeşiya. Bi dîtina Selah re ber ve çû:

-Ha, Selah tu hatî? Were em bimeşin, divê tu wî zikê xwe hinekî daynî.

Selah jî bilez ber ve dimeşiya, rûyê wî jî hinekî ne xweş bû:

-Serokê min, divê Şêxo êdî qet ji vir neçe. Cîranê me hûn nas kirine. Min xwest pê bidim bawerkirin ku ne tu yî, lê bawer nakim bi serê wî ketibe.

Rûyî wî jî ne xweş bû:

-Selah, hûn min eşkere dikin.

-Serokê min, bi naskirina we nerehet nebûye. Dibêje ez gelek kêfxweş im ku cîranê wî me.

-Lê dîsa şiyar bin. Eger ti zerera wî negihe me, em jî bi cîrantiya wî kêfxweş in. We cihên din çawa kirin? Hûn welatparêzan bi cilûbergên wan ve dibin. Ji ber wê ti kes bawer nake ku bikarin wan cihan bikirin.

-Serokê min, me vê carê bi bedil û qerewat birin.

-We ew cî jî temak kir?

-Serokê min, me temam kir. Ji me re gotibû deh milyon, lê me bi heştan stand.

-We li ser navê kê çêkir?

-Li ser navê Bavê Qehreman û Bavê Welat.

-Bavê Qehreman pişt re dikare di nava karê me de jî cih bigire.

-Serokê min, we gotibû bila welatparêz werin. Em çawa bikin?

-Rast e min gotibû. Bila ji her herêmê çend kes werin.

-Temam serokê min.

Selah derket, wî jî dîsa dest bi meşa xwe kir.

***

Li xaniyê Milîhe Şêxo derdor bi ser hev ve didan. Bi dengê seyareyê re ber bi derî ve çû. Piştî ku Apo ji seyareyê peya bû, çavên wî bi

Şêxo ket. Beriya wê jî ew dîtibû. Dizanî hatiye. Şêxo bi lez ber bi wî ve meşiya. Bi dîtina Apo re ketibû kelecanê. Lingên wî erd nedigirtin. Çavên xwe bilindtir kirin, çawa ku di xewnekê de be, welê lê dinêrî. Kutekuta dilê wî bû, çawa ku pêleke deryayê ber bi wî ve were wiha lê dinêrî. Apo hinekî li Şêxo temaşe kir. Apo bi rûyeke geş nêz bû. Ew ji dema hatî ve xwe ji bo vê kêliyê amade dikir:

-Tu bi xêr hatî serokê min!

Apo destê wî girt şidand. Ji kêf û kelecana dîtina Apo lingên wî erd nedigirtin. Perên wî hebûna wê bifiriya:

-Me çend caran hev dîtiye, destpêkê bi hevalê Hesen Bîndal re tu hatî Zahîra me li wir hev dît. Tu ji Cizîrê bûyî. Karê tu dikî xizmeteke mezin e, êdî emê bi hev re bin.

Çavên Şêxo ji kêfa tijî bûbûn:

-Serokê min, qet min bawer nedikir ku evqas li nêzîkî we bim.

-Rewşa malê çawa ye, mayîna te wê bibe pirsgirêkê ji bo wan?

-Serokê min, cara din jî min gotibû, ji bo malê nabe pirsgirêk. Ji bo min şensekî mezin e ku ez li cem we me.

Apo berê jî nas dikir, lê careke din baş lê nêrî. Dixwest ji wê demê ta niha guhertina pê re çêbûyî bibîne:

-Berê te çi kar dikir?

-Serokê min, berê li welat ez bi cotkariyê re mijûl dibûm.

Di sekina wî de jixwe baş ew taybetmendiyên cotkareke kedkar diyar dibû. Keyfa Apo bi hatina wî hatibû:

-Ev cih bi keda şoreşê pêkhatiye. Divê dar, baxçê wê baş em biparêzin. Ya herî girîng jî ewlekariye, em hemû jî divê şiyar bin. Ez jî ji zîraetê fêm dikim, em bi hev re li bexçe binêrin.

Şêxo bala wî li ser dilnizmiya Apo bû, gelekî pê bandor bûbû. Di dilê xwe de got, serokê me ye, lê behsa cotkariyê û axê dike. Hê jî destê wî girtibû, çawa ku çiyayek li pişt wî be wiha baweriyek mezin girtibû:

-Serokê min, çi karê bikeve ser milê min ezê bikim. Ger destora we hebe ez dixwazim biçim tiştên xwe ji malê bînim.

-Bila Siwar te bibe û bîne! Ji vir heta Şamê, saetek rê ye.

-Temam serokê min.

Siwar û Şêxo ketin ser riya Ruknedîn, Ew û Selah jî ber bi nava baxçe ve meşiyan.

***

Serê sibê bû. Selah û Siwar li eywana qata dehan rûniştibûn. Selah pirtûka Apo ya Jin û Malbat dixwend, Siwar jî li rojnameyên li ser mase dinêriya. Rihanê jî guldanik diguhertin. Çend not di destê Apo de bûn, hêdî hêdî ber bi wan ve hat:

-Hûn hatin, we çi kir?

-Serokê min, hevalên we navên wan dayîn, me birin dibistanan.

Ji rojên berî hingê rehettir xuya dikir. Notên di destê xwe de xistin berîka xwe, li ser kursiyekî rûnişt:

-Emê êdî dibistanên xwe vekin. Destpêkê bi navê cihê birîndaran emê yekê vekin. Bi wî navî û bi navê pêwîstiyên wan emê hin hevalên din jî derbasî wir bikin. Hevalên birîndar jî ji malên walatparêzan derxin, derbasî wir bikin. Bila ya Şeba amade be. Divê em Sûriyê aciz nekin, lê karê xwe jî bidin meşandin.

-Serokê min, wê Şeba amade bibe. Me piraniya hevalan derbasî wir kirine. Lê ji bo ku balê nekişîne em dixwazin ya Sêdnaya hinekî din jî bimîne. Li Mezê Vêlat jî me qatek girt. Me hevalên jin derbasî wir kirine. Mala li Zahîra jî me ji bo mêvanan hiştiye. Niha hevalên xort li wir in. Xaniyê li Mezê Vêlat li ser navê Mamoste Osman hatiye çêkirin. Yê sala 1990'î ketî meclisa gel. Xaniyên me yên li Mezê nêzîkî hev in. Xaniyê li Zahîra gelek kes pê hesiyane, ji bo ewlekariyê hûn zêde neçin wir baştir e. Li gorî agahiya me girtî hin

Israîlî jî me dişopînin, dixwazin her tevgera me bizanin. Jixwe istixbarata Sûriyê her tim me dişopîne.

Apo pir bi baldarî guhdarî dikir. Car bi car serê xwe dihejand:

-Haya min ji van heye û li ber çavên wan ez van karan dikim.

Ji cihê xwe rabû ber bi pencereyê ve meşiya:

-Bila heval dest bi bernameya perwerdeyê bikin! Ya herî girîng em bizanin ka wê Sûriye çawa nêzîkî van cihên me bibe. Divê heval pir hesas nêzîk bibin û ewlekariyê diqet bikin.

-Serokê min, me heval şiyar kirine, li gorî wê tevdigerin.

-Divê nobeta xwe baş bigirin, wê hewl bidin me kontrol bikin.

-Rast e serokê min, me agahiyeke wisa girtiye.

Roja wî bi civîn, xwendina raporan û bersiva telefonan derbas bû. Piştî şîvê derbasî pirtûkxaneyê bû, dest bi nivîsa bernameya perwerdeyê kir. Pênûsa di destê wî de pir bilez diçû dihat. Destekî xwe jî di nava pora xwe de digerand. Nivîsa di destê wî de heta dozdehê şevê ajot. Mijarên di serê xwe de tev zelal kirîn yek bi yek li ser rûpelan bi cih kiribûn. Derê lênûsê girt, pênûs danî serê, hêdîka rabû ser xwe. Bi dilxweşiya qedandina bernameya rojên pêş hêdî hêdî dest bi meşê kir. Vê carê hizrê wî çû ser şerê ku wê li Başûr dest pê bike. Tiştên di nava odeyê de çavên wî yek bi yek diketin ser wan û bi awirên kûr li wan dinêriya. Gavên xwe jî li gorî mijara li ser dihizire, geh bilez dikirin, geh hêdîka. Libên tizibiyên kehrîbar bêrawestan diçûn dihatin. Şeqeşeqa wan aramî dida mirov. Êdî tişteke ku wê şevê bike nemabû. Derket derbasî odeya razanê bû. Serê xwe danî ser balîv, nivîn kişand ser xwe. Serê xwe çend caran quliband. Cihê serê wî xweş nedibû û xew nediket çavên wî. Nivîn da aliyekî rabû rûnişt. Dîrok û kesayeta Kurdan anî ber çavên xwe. Girêka kor ya xiyanetê ya dîrokî anî bîra xwe. Çawa ku xencerek ji şûn ve li rayê qolinca mirov bikeve, kirrên ji kezeba wî dihat. Li ser dema Medya hizirî. Hê wê demê xiyanet hatibû kirin. Heta hê

wirvetir dibir, digihand dema Gilgamêş. Benê dîrokê bi rojê ve baş dihona. Careke din serê xwe danî ser balîv. Lê heta çarê sibê xew neket çavên wî. Rabû ser xwe çû da kehrebeyê pê bixe, lê dev jê berda, ber bi pencereyê ve çû, li derve temaşe kir. Her der tarî bû. Li jêrê li hemberî avayiyê reşên çend mirovan ketin ber çavên wî. Li derdora xwe dinêriyan. Carna jê ber bi aliyê wî ve dinêriyan. Xwe ji ber pencereyê da aliyekî ber bi metbexê ve çû. Qedehek av vexwar, li eywanê dest bi meşê kir. Li ser taktîkên nû hizirî. Helwest û sekna gerîla dianî ber çavên xwe. Berê xwe da pirtûkxaneyê, li ser kursiyê li pişt mase rûnişt. Rahişt pênûsê, dest nivîsê kir. Saetek derbas bû, dengê telefonê ji eywanê hat. Rabû ser xwe lê berî ku derkeve Şervîn ket hundir:

-Serokê min heval ji welat digerin.

Derbasî eywanê bû rahişt destiyê telefonê. Piştî çend kêliyan dest bi axaftinê kir:

-Me hukumeta Botan-Behdînan kir rojevê. Hedefa me pêşxistina riya çareseriyê bû. Dijmin ev dît. Niha dixwazin em li Başûr pêş nekevin. Ev destwerdana NATO ye. Hêzên Başûr ketine pişt wan. Ji ber wê sînor tên girtin. Hevalên me yên birîndar li Îranê tên girtin. Wê haziriya me û koçberiyê jî bikin. Çawa ku di dîrokê de kirine, wê cihên koçberan ji bo me vekin.

Hinekî sekinî dîsa dewam kir:

-Suriyê, Îran û Îraq jî dixwazin bi ser me de bên. Ji ber wê akademiya me girtin. Bi ser Lubnan û Sûryê de hatin. Dizanîn ka çiqas rola wê akademiyê heye. Dixwazin îradeya PKKê bişkînin. Hê jî baş dîroka me ya detpêkê nas nekirine. Hûn dibêjin me xwe bi cih nekiriye, divê hûn xwe bi cih bikin. Wê ji nişka ve êrîş bikin. Ev plan pir dûvdirêj e…

***

Êvar bû. Rojê berê xwe dabû rojavayê Xakurkê. Çiyayên wê yên asê û geliyên wê yên kûr bi bedewî û heybeta xwe derketibûn ser dikê. Kaniyên wê yên esîl hêdî hêdî germ yên din jî dicemidîn. Çemê Lolan, weke fetlên maran xwe li derdora wan çiyayan dipêça û ber bi jêrê ve xwe berdida. Rengekî şîn li ser bejna xwe girê dabû. Çawa ku bi kenekî hevrîşimî mirovan pêşwazî bike, heyînên li ser axa wê geş û xweş bûn. Mirov nedixwest çirkeyekê jî çavên xwe ji ser wê bedewiya wê bide aliyekî. Aramiyeke bêsînor li derdor belav bûbû. Di navenda vê xwezaya şîrîn de, çiyayê Şekîf ku keleha sê parçeyên Kurdistanê bû, li pêşberî Evdal Kovî yê bejinzirav serê xwe bilind kiribû. Ji bo Geliyê Reş yê bi şîntayî û darên xwe mirov mest dikir, parêzvanî dikir. Şekîf jî ji Şemzîna ve, her yekê ji rexekî ve, bayekî ji bêhna emberê li gelî belav dikir. Geliyê Reş, bi kevirên xwe yên reş û geliyê xwe yê dirêj, rêwitiyek ji xakûrkê heta zagorsê pêşkêş dikir. Tama avên kaniyên wê ji ya cirnê Kewserê ne kêmtir bû. Şopên kevneşopiya Kurdan ji nêz ve lê xuya dikirin. Ji sala 1984'an ve gerîla di himbêza xwe de xwedî dikir û diparast. Warê fermandarê efsaneyî Egîd bû. Cih û warê vejîn û mezinbûna şoreşa Partiya Karkerên Kurdistanê bû.

Li ber robarekî yê ava wê weke rondikên çavan zelal, keçeke bedew û xwînşîrîn bi cilûbergên gerîla yên zerê xezêmî pala xwe dabû dara çinareke kevnar, bi herkîna avê re kûr çûbû. Ew û cilûbergên xwe pir li hev  hatibûn, weke parçeyeke ji bedewiya xwezayê bû. Lênûseke bi qasî destekî di destê wê de bû. Bi pênûsa xwe ya ji dara kevot, li ser rûpela spî gotinên xwe yên weke durran bi hunermendiya zêrînkerekî rêz dikirin. Her ku çend hevok dinivîsîn, bala wê diçû ser bedewiya xwezaya wê û bêhna ji nava giya û darên wê difûriya. Ji bayê wê yê nava mirov honik dikir nefes dikişand hinavên xwe. Her car serê xwe radikir hinekî li wê

xwşkayiyê dinêrî, dîsa lênûsa xwe dixist tevgerê. Lê vê carê çavên xwe yên belek kirin nava çavên kulîlkan. Pişt re devê xwe bir ber guhê kulîlkekê û bi dengekî nizim jê re got, ez dengê we dikim. Baskên min çêbûne, ezê niha fir bidim û ber bi navsera çiyayê Helgurd ve bifirim. Hûn jî werin tevlî rêwîtiya min ya li Xakurkê bibin. Ez bê rawestgeh difirim. Piştî ku gotina xwe qedand, pelûyên çavên xwe danîn ser hev. Bi dengê sîsirkan û qurequra beqan, bi sira bayê hesiya. Her ku tişteke xwezayê bala wê dikişand, ji bo ku ji bîr neke demildest dest bi nivîsa wê dikir. Dengek ji nava dilê wê hatiyê: “Ez di nava buhiştê de me.”

Rûpeleke nû vekir. Bilez hevoka di hişê xwe de nivîsî: “Îskenderê Mekdonî bi sefera xwe ya li Rojhilata Navî, di vir re derbas bûye û Xakurkê dîtiye. Dema bedewî û xweşiya wê dibîne, dibêjiyê Xakûrkê, (ango buhişt) avên te ruh û zindîbûnê didin." Rêzenivîsa xwe xelas kir, careke din pelika lênûsa xwe quliband. Ji kûrayiya dilê xwe dihizirî. Berê xwe da keskenûriya li ser erdê. Kulîlkên narîn û tenik, bêhn û bayê ferfûrî ji wan difûriya. Serê xwe tewand ew bêhna xweş kişand hundirê xwe. Berê xwe da çemê ku bi azadî diherike li kulîlkên her du keviyên wê temaşe kir. Çawa ku baweşînikê lê bike, bayekî nerm ji aliyê bakur ve li gelî dixist. Wê jî weke Îskender xwest bi dengê bilind bi xwezayê re biaxive: Xakurkê, tu bi qasî navê xwe heyî. Çi deng, reng, tebat, nebat û teamên mirov bixwaze, te li ser sifreya xwe kom kirine. Tu meskenê jinan î, ji pirûşeya jiyanê diteyisî. Newala Çil û Çaran, deng û pêşenga gerîla tu dibihîzî. Çiyayên bilind, weke her car we serhildêriya Kurdan ji xwe kêm nehiştiye. Her ku şopekê bi xwe re dibî yeke nipûnû bi xwe re tînî, li ser axa xwe ya bedew û têr radixî. Dergûşa hejîna şoreşan î.

Li derdora xwe temaşe kir. Ferq kir ku ji ber dengê ava çem, dengê wê nayê bihîstin. Li narînî û meşa wê ya nazenîn temaşe kir. Keça ciwan, hizreke din di serê wê de derbasa bû, xwest bedewiya

Xakurkê binivîse: “Xakurkê, gerîla di nava bilindiya çiyayên xwe de vedişêre. Nepeniyeke din jî li ser nepeniyên xwe yên dîrokê zêde dike. Deng ji gelî û newalên xwe xelas nake. Bi dengê jinan derdora xwe şên kiriye û careke din dawa xwe bi zayîneke nû zindî kiriye. Bi vê taybetiya xwe bal kişandiye ser sêkoşebûna xwe. Dengê keçên şoreşger ji newalên wê bilind dibe. Bi dengê bayê re newayeke xwerû dihone. Newala Çil û Çaran li derdora xwe çiyayên bilind rêz kirine. Li qûntarên van çiyayan dengê ken û jiyaneke nû ji zû ve li xwe kom kirine. Îro jî rojeke ji wan rojên wê ye û şênbûna wê xuya dike. Siya darên çinarê derdora çem tarî kiriye. Balinde ber bi baniyan ve difirin.”

Di hişê xwe de li çend peyvên bedew yên li gorî bedewiya çiyayan digeriya, lê dengekî pir xweş çavên wê ji ser lênûsê bir. Bikelecan rabû ser xwe çavên xwe li çivîka li ser çiqilê darê gerandin. Bi dîtina çivîkê re kêfxweşiya wê pirtir bû, lewre bi qasî dengê wê, ew bixwe jî ewqas xweşik bû. Çawa ku jê fêm bike pê re axivî: “Ji bo ku ez te jî binivîsim tu hatî vir?” Bi dengê wê re çivik firiya. Careke din li cihê xwe rûnişt. Biskên pora wê ya kin, ji hev belav bûbûn. Bi baweşîna ba re weke pêlên çem li ser lamên wê dihejiyan. Çavên wê yên belek li ser lênûsê bilez diçûn dihatin. Her ku hevok temam dikir, şîrîniyek li ser lêvên wê diyar dibû. Sarbûna qurmê dara çinarê li pişta wê dixist. Destê xwe yê çepê hêdîka ber bi kulîlka li kêleka xwe ve bir û bi dilovaniya dayîkekê mis da.

Roj ber bi avabûnê ve diçû, tirêjên wê yên sor li gelî dixistin. Serê xwe ji ser lênûsê rakir, li sorayiya rojê nêrî. Êdî dereng bû diviya nivîsa di serê xwe de amade kirî wê êvarê biqedîne. Li hevokên xwe yên nivîsîn temaşe kir: “Ev dil hatiye honandin. Digel keziyên çilgulî yên koçeran. Destên min Binefş in. Weke Egîd diçizirim. Weke Delîl dikevim nava pêkdadanê û Mezlumê sê darikên kibrîtê me. Ez çend giyanên nûhatî ji hinavê xwe dizêm. Di her pêkdadanê de ez ya li pêş

im. Ez ji nû ve têm dinê. Bi tilîliyan re weke Ferhat, Mehmûd, Necmi û Eşref bedena min dişewite.” Bi gotina bedena min dişewite re kesereke kûr kişande hinavên xwe. Destê xwe avêt pirtûka li ser qurmê darê. Li sernivîsa wê “Israra di Sosyalîzmê de israra di insaniyetê de ye” nêrî. Bala wê pir kişandibû. Careke din xwend. Dengek ji nêz ve hatiyê:

-Hevala Bêrîtan were ber êgir!

Bi bihîstina deng re, rabû ser xwe. Lênûs û pênûsa xwe bilez kirin berîka xwe, ber bi wan ve meşiya. Şeş jin li dora agir kom bûbûn. Ji bo ku dû neke, êzing dikirin çarkoşe.

-Agir xweş bikin, ez têm. Emê saet çendan biçin?

Li kêleka êgir, jineke porkin rûniştibû, berê xwe ber ve vegerand:

-Bawer dikim emê nîvê şevê bi rê bikevin.

Jineke din jî li tenişta ya porkin darikekî dirêj di destê wê de bû pringên agir tev didan. Bêrîtan çû li tenişta wê rûnişt, destê xwe di ser stûyê wê re weranî:

-Hevala Rûken, ez mereq dikim ka Serokatî vê kêliyê çi dike û li ser çi dihizire. Lê ne ev kêlî tenê, ez mereqa jiyana wî tevê dikim.

Çawa ku yekî tiştek jê re gotibe, nava xwe kişand û her du çavên xwe berdan nava pêta agirê bireng. Ji ber agir hinarikên rûyê wê sortir û şîrîntir bûbûn:

-Eger dema min çêbe, karê herî destpêkê bikim wê nivîsa romana Serokatiyê be. Mirov dikare ji her hevokeke dahûrînên Serokatiyê romanekê binivîse. Ev ji bo min hesret e!

Rûkenê berê xwe vegerand li rûyê wê yê sorbûyî nêrî:

-Hevala Bêrîtan, ev hizir gelek binirx e û baweriya min heye tu bikarî bikî. Teqez Serokatî niha li ser pêngavên gelek mezin dihizire. Ez xweziya xwe bi hevalên Serokatî dîtîn û pê re mayîn tînim.

Heta çend kêliyan her duyan jî wisa bêdeng li agir nêrî. Bêrîtanê darikê di destê xwe de avêt nava agir, di ser milê xwe re li Rûken

temaşe kir:

-Hevala Rûken, Serokatî ji me pirtir li ser me û azadiya me dihizire.

Kela dilê wê her ku diçû germtir dibû. Ji gotinên wê dihat fêmkirin ku hesreteke mezin di dilê wê de ye. Lê xwest ewrên wan gotinên xwe belav bike. Di ser xwe re li asîman nêrî, pişt re li derdora xwe:

-Tu dengê vê bêdengiya şevê ya li van gelî û dehlan belav bûyî dibihîzî? Bawer bike di cîhanê de ji vê xweştir işteke din nîne.

Axaftin dirêj bûbû. Jinên din, hina guhdarî wan dikir, hin jê bi tiştin din ve mijûl bûn. Lê dema Bêrîtan diaxivî ti kes bi tişteke din ve mijûl nedibû. Hestên wê jî pir germ bûbûn:

-Li asîman binêrin, çawa di nava meksiyeke ji stêrkan de, bedewiya riya kadizan xuya dike. Hûn stêrka şivanan û zuhrerengiya wê dibînin? Çawa li seranserê gelî ronahiyeke narîn pê xistiye. Ev dîmen bi qasî xewn û xeyalan xweşik in!

Kêfa Rûken ji axaftina wê re pir hatibû:

-Hevala Bêrîtan, dema tu diaxivî, tu heqê bedewiya Xakurkê didiyê.

-Ez qala dilopekê jê dikim. Xwezî min çiyayên Kurdistanê tev bidîtan!

-Mereq neke, emê pir bigerin û cihên cuda bibînin.

-Ez dixwazim biçim çiyayên Dêrsimê. Bigihîjim çemê Munzur, bibînim û ji ava wê vexwim!

-Tu gelek bi xwestek î û li ser xwestekên xwe jî israr dikî.

Di wê navê re didoyan ji wan darekî dirêj di destiyê çaydanê re derbas kir û her yekê li aliyekî agir pê girt.

Ji ber ku Bêrîtan xwe pir nêzîkî agir kiribû û darên qaç jî li ser agir hebûn, gelek çirîskên agir ketibûn ser rûyê wê û her du lamên wê jî bûbûn tenî. Çavên wê jî ji dû tijî bûbûn. Bê ku bersiva Rûkenê

bide, rabû ser xwe. Dinya sar bûbû. Pişta xwe da agir. Bi her du destên xwe teniya li ser lamên xwe paqij kir. Her duyên çeydan di destê wan de li rûyê wê temaşe dikirin. Yek ji wan keniya:

-Hevala Bêrîtan te nexşeya Kurdistanê li ser rûyê xwe çêkiriy. Tev bi hev re keniyan...

Êdî dema razanê bû, çarbera xwe jî amade kiribûn. Yekê nobet girt, yên din xwe dirêj kirin serê xwe danîn ser çenteyên xwe. Ji ber ku nava rojê westiyabûn, zû bi xew ve çûn. Lê Bêrîtan hê şiyar bû. Xwe dirêj jî nekiribû. Her du destên xwe xistibûn bin çengên xwe, pala xwe dabû berê li tenişta agir, li şewqa heyvê dinêrî. Guhê xwe dabû ser pêjna nepeniya şevê. Sehwa dengîniyeke kûr dihatiyê. Rabû ser xwe guhê xwe da aliyê deng. Qasekî li elena heyvê ya li ser neynika avê diteyisî temaşe kir. Nedixwest dev ji wî dîmenî berde, lê dema rabûnê bû. Berê xwe da hevalên xwe yên di xewa şîrîn de. Bi dengekî xweş bangî wan kir. Her kes rabû ser xwe. Her kesî hê êvarê amadekariya xwe kiribû, çenteyên xwe dan pişa xwe û ketin ser rê. Piştî ku kom tev li cihekî gihîştin hev, meşa dirêj dest pê kir. Ber bi Robarok ve dimeşiyan. Riyên Geliyê Reş geh dibûn evraz, geh dibûn nişûv. Her du jî ji hev nexweştir bûn. Piştî şeş saetan ji bo bêhnvedanê li ber avê rûniştin. Destpêkê nobedar derxistin. Pişt re dest bi çêkirina nan û amadekariya xwarinê kirin. Hina pêwîstiyên xwe pêk dianîn, hina goreyên xwe dişûştin, hina çekên xwe paqij dikirin, hina jê di nava xwe de suhbet dikir. Lê kelecana çalakiyê bi her kesî re hebû. Ji bo gerîla kêliyên navbera meşê weke destpêkirina jiyaneke nû bûn û pir tijî derbas dibûn. Xewa wan kêliyan jî ji hingiv şîrîntir bû.

***

Komên gerîla ji bo meşê xwe amade kiribûn. Ji bêsebriya derketina

rojê, şevê carna xwe li wan dilezand, carna jî dirêj dibû. Çawa ku wê roj neyê der û reşayiya şevê bikeve bîr û hafîzeya wan ya kûr. Gerîlayên biçin Robarok roja xwe li cihê bêhnvedanê derbas kirin. Bûbû şev êdî amadekariya razanê dikirin. Çawa ku moriya xewê kitibe guhên wan, bi xwedirêjkirinê re xeweke hingivî ket çavên wan. Bêrîtan li binê dara tûyê ketibû nava xeyalan. Ji wan kêliyên reşayiyê hes nedikir. Dixwest roj zû derkeve da her tiştî baştir bibîne. Xefikên çavên xwe li ber xweşikbûna stêrkan vedabûn. Bayê Şemzîna li derdor dixist. Rojên derbasbûyî dianîn ber çavên xwe. Kesereke kûr danî ser dîwarê emrê xwe: “Xwezî ronahî bûya da min ev hestên vê kêliyê binivîsiyan!” Di xeyalên wê de Dêrsim hê diçû dihat: "Dêrsim, bajarê min yê berxwedan û serhildanê. Ez şaneyeke pir hûr ji deng û hestên wan im. Dengê karker, cotkar û gundiyan im..." Stûna tevna jiyana xwe bilindtir kiribû: "Ez di van kêliyên payîzê de, li ser lênûsa dilê xwe, biharên li çiyayên Kurdistanê tînim ber çavên xwe..." Çavên xwe kirin nava çavên heyvê û pelûyên wan ketin ser hev. Li ber xeyala tîrêjên roja Tîrmehê dilê xwe germ dikir: "Gelo wê kengê ew roj bê û ez Serokatiyê bibînim?" Bi dengê balafiran ji nava xeyalên xwe derket: “Hevalno, dengê balafiran tê!” Her kesî çekê xwe rakir û her didoyan bi milekî ve çûn. Dengê lêxistinê ji dûr ve dihat. Çend balafir jî bi ser wan re firiyan. Piştî ku dengê balafiran kêm bû careke din her kes çû cihê xwe. Pêwîstiya wan bi xewê hebû. Piştî qasekî Bêrîtanê deng li Rûkenê kir.

-Hevala Rûken dema meşê ye?

Rûkenê çavên xwe ferikandin. Bêrîtan li tenişta xwe rûniştî dît:

-Hevala Bêrîtan, tu çima şiyar î?

-Ez naxwazim vê dema xweşik û biqîmet wenda bikim.

-Hevala Bêrîtan tu bêxew bimînî tuyê di meşê de zorê bikişînî. Riyeke dirêj li pêşiya me ye. Divê em li dawiyê nemînin.

-Mereq neke. Ji min bawer bike emê bi qasî israra xwe di karê

xwe de jî serkeftî bin.

Germayiya Bêrîtanê dilê Rûkenê jî germ kiribû.

-Tu berê jî wiha serhildêr bûyî, yan di nava tekoşînê de tu wiha bûyî?

-Berê jî min pîvanên ji bo jinê di nava civakê de hatîn danîn qebûl nedikirin. Baweriya min bi îradeya jinê hebû. Dema diçûm dibistanê jî pîvanên bi ser jinê de disepandin nediketin serê min. Ji ber wê min mûjankên xwe xemrî dikirin.

Di ber axaftina xwe re jî dikenî:

-Min rengê qeytanên pêlavên xwe jî şîn û kesk dikirin. Dema min partî nas kir, têgihîştim ku ji bo civakeke nû têdikoşe.

-Haya min ji israra te heye. Ev du sal in tu tevlî bûyî, bi israra xwe daxwaziyên xwe pêk tînî.

Bêrîtan rabû ser xwe, rextê xwe da pişta xwe. Li Rûkenê vegeriya:

-Li vir şev, roj, berf, baran, meş û zehmetî zû derbas dibin. Ez ji têkoşînê pir hes dikim. Ez di wê baweriyê de me ku ji bo têkoşînê hatime dinyayê! Lêkolînên min berê jî hebûn. Lê dema min ramanên Serok Apo xwendin, min dît ku ji her kesî cudatir e. Ji bo paşroja jinê cîhaneke xweşik amade dike. Min raporeke berfireh ji Serokatiyê re rêkiriye. Tu dibêjî wê bersivê bide?

Dengek ji aliyê din yê gelî hat:

-Hevala Bêrîtan, amade bin emê bi rê bikevin.

Bi bihîstina deng re, her pênc jinên din jî şiyar bûn. Xwe şidandin û bi aliyê çem ve meşiyan. Li dora fermandar kom bûn. Bêsîmek di destê wî de bû bi deverna re diaxivî. Rûken hêdîka ket pêşiya Bêrîtanê:

-Heval ka vê qedehê bi çente ve baş girê bide!

Dengê wê bikelecan derketibû:

-Hevala Bêrîtan, ev cara yekê ye emê tevlî çalakiyeke wiha mezin

bibin!

-Rast e, wê nav û dengê wê jî bimîne!

Di wê navê re dengê fermandar bilind bû. Jê re digotin Eliyê Dirêj. Por û simbêlin reş, naveke qendîl û ciwaniyeke bedew li ser bûn.

-Hevalno, di meşê de bi dengê bilind axaftin nabe. Bila her kes di rêza xwe de bimeşe. Dibe ku derdora rê mayînkirî be. Parola "Jiyan Berxwedan e." Emê bênavber bimeşin. Divê ti heval li dawiyê nemînin. Berê me li çalakiyeke zor e û qadeke asê ye. Di heman demê de girîng e û dîrokî ye. Çalakiya me li ser biryargeha Robarok e. Emê bi jimareke mezin bi ser dijmin de herin. Cihê guleya yekê ye! Ji çalakiyekê wêdetir, di şerê me yê gerîla de pêngaveke nû ye! Heval tiştekî dibêjin?! Eger nebêjin, emê dest bi meşa xwe bikin.

Meşê bi bêdengî dest pê kir. Fermandarê giştî, bi bejna xwe ya bilind ya weke şitleke rihanê, geh li tenişta rê, geh di rêza pêş de dimeşiya. Carna jê xwe dida cihekî bilind. Çavên xwe yên xezalî li ser dûrbînê hişk digirtin, li derdor dinêriya.

Piştî ku fermandar dît her kes westiyaye, ferman da ku navbereke kurt bidinê. Bêrîtan û Rûken li tenişta hev rûniştin. Rûkenê weke her car dest bi pirsan kir:

-Hevalê Elî digot pêncsed heval tevlî vê çalakiyê dibin. Tu ferqa wê dibînî, di çalakiya destpêkê ya Şemzîna de çend heval hebûne, niha em pêcsed kes tevlî dibin.

-Hevala Rûken ev şerê tolhildana gelê me ya hezarê salan e.

Dîsa dengê ji bo rabûnê bilind bû. Her kes bilez rabû ser xwe, ketin ser riya xwe ya dirêj.

Şevê careke din kirasê xwe yê reşê tarî li xwe kiribû. Dengê çekan bi ser wan geliyan ketibû. Li geliyê Robarok qiyamet rabûbû. Çawa ku ji bo roja qiyametê dibêjin "Dê weledê xwe diavêje" li wî gelî jî

rewşeke wisa hebû. Ronahiya çek û bombeyan xwe li Çiyayê Govendê dixist. Ji ber dûyê bi ser wan çiyayan ketî stêrkan xuya nedikir. Dengê tilîliyan, dengê çekan, dengê balafir û hawarhawara leşkerên dijmin tevlîhev bûbûn...

Bi dereketina rojê re, dengê çekan kêm bû, lê yê top û balafiran zinarên herêmê dihejandin. Gerîla vekişiyabûn, ber bi Xakurkê ve diçûn. Yên li pêşiyê birîndar rakiribûn. Di wê şeva reş de reng, deng û dêmên her kesî hatibûn guhertin. Lê hêvî û kîna li hemberî dijmin qet kêm nebûbûn. Rûken di rêza pêşiyê de bû. Çavên xwe li Bêrîtanê digerandin. Çawa ku çav pê ket bibez xwe gihandiyê:

-Hevala Bêrîtan, ji şevê din ve ez çavên xwe li te digerînim.

-Hevala Rûken şeveke pir dirêj bû, em dimeşin nameşin xelas nabe!

Çavên Rûkenê fireh bûn û kutekut bi ser dilê wê ket:

-Tu birîndar bûyî?

Mendîla xwe derxist da xwîna li ser rûyê wê paqij bike. Bêrîtanê mendîl ji destê wê girt:

-Hevala Rûken, tiştek bi min nehatiye, birîneke piçûk e.

-Hevala Bêrîtan, çi piçûk, çi mezin, birîn birîn e, te çima negot ez birîndar bûme?

Bêrîtan li ser çalakiyê û encama wê dihizirî. Çawa ku ji xewnekê şiyar bûbe, her tişt jê re weke xeyalan dihat. Dengê durişmên serkeftinê yên hevalên xwe yên di çeperên dijmin de avêtîn dianî bîra xwe. Berxwedana biheybet ya gerîla ya wê şevê bandoreke mezin lê kiribû. Di dilê xwe de got, ev çalakiya min ya destpêkê bû, lê ez bûm şahida qehremaniyeke dîrokî. Ji bo wê jî bûbû destpêka bûyîneke nû. Bêrîtanek çûbû Bêrîteneke nû hatibû.

Dengê fermandar careke din hat bihîstin:

-Hevalno, emê navberekê bidinê. Bila heval kom bi kom dûrî hev rûnin. Me çalakiyeke mezin kiriye. Em zû rabin dibe ku dijmin êrîş

bike.

Çawa ku rûniştin Rûkenê dest bi paqijkirina birîna di rûyê wê de kir:

-Hevala Bêrîtan, dîmenên hevalên me yên şehîd ji ber çavên min naçin!

-Em di şerekî giran de ne, helbet dilê me li ser hevalên me diêşe, lê emê şehîd jî bikevin.

Bêrîtanê serê xwe danî ser çenteyê xwe. Di nava çend kêliyan de çavên wê ketin ser hev. Te digot qey xewn li benda xewa wê ye; li ber bayê biharê û tîrêjên rojê xwe ji serê çiyayekî bilind berdida, ber bi deştê ve difiriya. Li nava mêrgeke tijî kulîlik danî. Hem bêhna wan dikişand nava xwe, hem bi wan didanên xwe yên spî û wan dev û lêvên şîrîn dikeniya. Li pêşberî xwe Apo dît. Wî jî serê xwe tewandibû, kulîlik bêhn dikirin. Di ber re jî distirand. Çawa ku kulîlik li ber dengê wî govendê girê bidin wisa ji navkêlê vedixeliyan. Weke tîra ji devê kevan bifilite Bêrîtan ber ve bezî. Ew jî ber ve çû. Lê berî ku bigihîjin hev ji xew şiyar bû. Digel ku şiyar bûbû jî hê ew kenê şîrîn li ser lêvên wê bû. Sirê li birîna wê dabû. Rabû ser xwe rûnişt, pişta xwe da çenteyê xwe.

***

Peşgîreke spî û şûşeya avê di destê Şêxo de bûn, li benda Apo bû ku spora xwe bi dawî bike. Siwar jî taştê amade dikir. Şûşeya avê û pêşgîr ji destê wî girtin, derbasî eywanê bû. Ji bo guhdarîkirina nûçeyan radyo vekir. Radyoyeke sonî ya piçûk bû. Rojnameya Huriyet, Milliyet, Zaman û hwd. li ser mase bûn. Li kêleka wan jî Serxwebûn û Berxwedan hatibûn danîn. Bi bilindkirina dengê radyoyê re xetên rûyê wî hatin guhertin. "Çar milîtanên PKKê li Wanê hatin kuştin". Bi dengê bilind gazî Siwar kir:

-Siwar, navên van hevalan bixwaze!

-Temam serokê min.

Pir aciz bûbû, li eywanê dest bi çûnhatinê kir û geşbûna li ser rûyê wî jî çûbû. Li ser rewşa heyî hizirî. Piştî qasekî Siwar hat eywanê:

-Serokê min, hevalan navên wan dan; Zinet Karaaslan ji Gimgimê ye, Fevzî û Bawer ji Wanê ne, Leyla Kuran ji Sêrtê ye. Her çar jî li bajarên xwe hatine veşartin. Cenazeyên wan ji aliyê gel ve bi serhildan û durişman hatine pêşwazîkirin. Di merasima cenazeyê hevala Zinet de sed kes hatine binçavkirin. Di merasimeke din de jî dijmin xwestiye çar welatparêzan bigire, lê gel ji destê wan derxistine.

Pir hêrs bûbû, mirov newêriya li çavên wî binêre:

-Divê tola şehîdan li erdê nemîne. Ev soza me ye. Wê gerîla lê bixe û Kurdistanê rizgar bike. Ev deynê stûyê me ye. Heta ji me bê emê vê têkoşînê xurt bikin. Emê wisa xurt bikin ku dijmin poşman bibe.

Çawa ku berpirsên gerîla tev li pêşberî wî bin wisa diaxivî. Carna dimeşiya, carna jê disekinî li ber xwe dinêrî:

-Divê hevalên me zûbizû şehîd nekevin. Riya şoreşa me dirêj e.

Di wê navê re yên li malê tev li eywanê kom bûbûn. Agahiya şehîdbûna gerîla xemgîniyeke mezin li eywanê belav kiribû.

-Hevalno, li pêşberî me erkên giran hene û divê di herî milî de em xwe amade bikin. Tola şehîdan ne bi xemgîniyê, emê bi têkoşînê hilînin!

Piştî vê axaftinê derbasî odeya xwe bû. Dest bi hin raporên nehatîn xwendin kir.

Dema xwarinê bû. Li ser mase peteteyên qelandî, pîvaz û dew hatibûn danîn. Piştî xwarinê çay anîn. Gazî Siwar kir:

-Mezlum gihîşt cihê xwe?

-Rast e serokê min, doh em pê re axivîn, got ez gihîştime cihê

xwe.

-Wê hevalê Cesûr saet çendan were?

-Wê saet heft û nîvê were, niha li Zahîra ye.

-Karê me pir heye, xwe li gorî wê amade bikin!

-Temam serokê min.

Ew tenê li eywanê mabû, yên din her yek bi karekî ve mijûl bû. Her ku şehîdbûna her çar gerîlayên dawiyê dihat bîrê, hêrsa wî pirtir dibû. Çavên xwe danîn ser hev, çend kêliyan wisa ma. Çavên xwe vekirin li pêşiya xwe nêrî: "Divê tevger ji vê mezintir bibe. Enceq em bikarin tola wan bi wî rengî rakin. Divê tevgera jinê di kesayeta keçên me yên şehîd de, tola salan hilîne. Da dijmin bizane wê jina Kurd bibe pêşeng û şehîdbûna wan bibe tevgereke civakî. Ev jî soza min e!" Rabû ser xwe ber bi odeya xwe ve çû.

Piştî deh deqîqeyekê deng ji derî hat. Siwar bilez çû vekir. Bi bihîstina dengê Cesûr re Apo jî ji odeya xwe derket. Tev de li eywanê rûniştin. Bi hatina Cesûr pir kêfxwş bûbû. Li ser pêvajoya dawî û şerê li Başûr diaxivîn. Çalakiyên gerîla yên li Bakur jî yek ji mijarên nîqaşên wan bûn. Cesûr di rûyê wî de hêrseke mezin didît. Ev, ji dengê wî, rengê wî, qermîçekên diketin ser eniya wî û awirên wî yên tûj pir xweş diyar dibû. Erzeniya xwe xist nava destê xwe û çawa ku bêje, em hêviyeke mezin ji te dikin, li nava çavên Cesûr nêrî:

-Va tu dibînî, dijmin bi awayekî dirinde bi ser hevalan û gelê me de tê. Divê em ji her tiştî re amade bin. Tu jî ji bo Heftenînê xwe amade bike. Wê dijmin destpêkê êrîşî wir bike. Divê ev herêm nekeve destê wan!

-Rast e serokê min, ez jî amade me. Ez jî li ser pûçkirina taktîkên wan dihizirim. Haziriyên me jî wê li gorî wê bin. Emê berxwedaneke layîqî demê û dîrokê bikin.

Bi hejandina serê xwe gotina wî erê kir:

-Gelê me jî bi qasî me bibiryar e. Emê şerê man û nemanê bikin. Tevî ku Turkiye ji Emerîka û hevkarên xwe yên Kurd hêzê digire jî, bi gotin dibêje Kurd hene, lê hedefa wê ya sereke imha û tinekirina Kurdan e. Tevî her şêwazê şer, wê hukumeta Demiral di vê planê de bi ser nekeve. Gelê me dest bi meşa xwe ya azadiyê kiriye.

-Serokê min, wê hewl bidin bi hêza hewayî gelê me çavtirsandî bikin. Lê tevî her tiştî em ji bo pêngava meşa azadiyê amade ne.

Di wê navê re çay ji wan re hat. Qurtek li çaya xwe da:

-Qedera dîrokê di destê me de ye. Hêviya min bi te mezin e. Tu serleşkerekî me yî û hêvî ji te tê kirin. Heta astekê te xwe di warê taktîkê de bihêz kiriye, van rojan emê bi hev re bin! Emê hê pir nîqaş bikin, lê divê tu zû derbas bibî!

Şerê Başûr dest pê kiribû. Xencera reş ya xiyanetê dîsa ji kalan derketibû û li ser serê Kurdan diçû dihat. Çerxa felekê ji bo Kurdan careke din çep digeriya. Apo di pirtûkxaneyê de rûniştibû li ser pêvajoya dawî dihizirî. Saet bi saet bi cîhaz agahî ji Başûr û Bakur digirtin. Ji bo fermandarên gerîla perspektîfên şer didan û geşedanên dibûn bi wan re dinirxandin. Li aliyê din derbarê rewşê û geşedanan de çapemenî dişopand û saet bi saet guhdarî nûçeyan dikir. Herî zêde li ser rewşa gerîla dihizirî. Ji xwarina wan, heta çekên wan, ji parastina wan heta herêmên lê dimînin di ber çavên xwe re derbas dikirin. Lewre dijmin bi tevayiya hêza xwe ketibû êrîşê û li Başûr jî hevkarên xwe yên Kurd bi kar dianîn. Dixwest gerîla dorpêç bike û bi wî awayî tine bike. Gelo wê gerîla bi kîjan taktîkan ew çembera dijmin bişkanda. Ev bûbû rojeva wî ya bingehî.

***

Şervîn û Sara li metbexê rûniştibûn çay vedixwarin. Sara li saeta xwe meyze kir:

-Em nizanin ka wê kengê Serokatî were. Dema civîna me jî hatiye.

Şervînê qedehên çayê dîsa dagirtin:

-Deh deqîqe mane.

Hem çaya xwe vediwarin, hem suhbet dikirin. Şervînê pir dixwest Sara behsa girtîgehê jê re bike. Sara jî pirsa xebata nava gel jê dikir. Êdî dema civînê hatibû. Qedehên xwe şûştin, ber bi eywanê ve çûn. Yên din jî tev hatibûn. Piştî rêzgirtina ji bo şehîdan Sara dest bi axaftinê kir:

-Berî me sê heval li vir bûn, niha em heft kes in. Hevalên nû hatîn bila xwe bidin naskirin. Me bername diyar kiribû. Rewşa siyasî pir giran e. Şerê li Başûr jî dijwar bûye. Wê Serokatî li ser  raporên hin hevalan ji bo me civînekê çêke. Em hê nizanin ka mijar çi ye, lêbelê Serokatiyê got divê hûn wan raporan bixwînin. Li vir ya herî girîng pêşxistina kesayetê û rizgariya ji kesayeta kevin e. Pêdiviya me jinan herî zêde bi vê heye. Hevala Rozerîn em ji we de dest pê bikin.

Rozerîn pir bikelecan bû. Bi wan çavên xwe yên xumarî li Sara nêrî:

-Ez ji Amadê hatime. Hesreta min dîtina Serokatiyê bû. Min bawer nedikir ev xwesteka min wiha zû pêk were. Di aliyê rêxistinî de gelek pirsgirêk hene. Nêrînên şaş yên li hemberî jinan hene. Bi çavê hêzeke leşkerî li jinan nayê meyzekirin. Bi navê eniya paş gelek hevalên jin, ji eniya pêş hatine derxistin. Lê tevî wê jî hevalên jin li ber xwe didin. Ez dixwazim li vir herî zêde dahurînên rêbertiyê bixwînim. Li gorî min, pirsgirêka herî bingehî nasnekirina Serokatiyê ye. Ji ber wê li hemberî jinê nêzîkbûnên erzan tên kirin.

Di nava axaftina xwe de carna pora xwe ya zer paş de diavêt. Mijara behsa wê kirî pir girîng didît û dixwest rêxistin jî bizane. Heta axaftina wê qediya her kesî bêdeng guhdarî kir. Piştî axaftina wê Sara xwest ya li tenişta wê biaxive:

-Kerem bike hevala Zozan!

Zozan jineke gelek jixwebawer bû. Bejneke zirav, çavin reşê tarî, rûyekî spî û poreke dirêj li ser bûn. Pora xwe kiribû kezî, bi şûn de berdabûn. Bi tevgerên xwe dixwest nîşanî derdora xwe jî bide ku jineke bedew û xurt e:

-Ez ji Amadê me. Ne demeke dirêj e tevlî bûyîm. Hatina min ya vir li ser xwesteka min bû. Herî zêde dixwazim li ser xwe lêhûrbûnê bikim. Min rapora xwe ji Serokatiyê re nivîsiye. Dewreyeke perwerdeyê jî min li akademiyê dîtiye. Baweriya min pir bi min heye.

Dora ya li tenişta wê hatibû:

-Ez ji Efrînê me. Demeke dirêj e ez tevlî bûme. Min li vir kar kiriye. Herî zêde dixwazim kesayeta xwe xurt bikim.

Ya li tenişta wê yeka zirav, porkin û esmer bû. Yeka pir giran bû. Pirtûka dahûrînê ya di destê xwe de danî ser mase:

-Navê min Perwîn e. Demek e li mala Serokatiyê me. Niha dahûrînên Serokatiyê derbasî nivîsê dikim. Hedefa min naskirina Serokatiyê û xeta partiyê ye.

Piştî Perwînê Dîcle dest bi axaftinê kir:

-Demek e li vir im. Berî ku bêm vir min Serokatî nas nedikir. Min pêdivî nedidît werim vir jî. Dîtin û bihîstina Serokatiyê ne weke hev in. Dîtina wî bi serê xwe cîhanek e. Pêşniyara min çûna qadên şer e.

Dora Rihanê hatibû. Weke her car rûyê wê dikeniya:

-Min jî dixwest li vir di aliyê rêxistinî de xwe kûr bikim. Ez dixwzim tecrûbeya min li vir girtî di xebata xwe de pêk bînim.

Herî dawî Şervîn mabû:

-Demeke dirêj e di nava xebatê de me. Hem li akademiyê mame, hem li cem Serokatiyê. Pêdiviya me jinan bi çi heye, divê em çi bikin, yan jî pirsgirêkên me yên bingehî çi ne? Min xwest van ji nava hev derînim. Dixwazim her tiştî bi hevalên nû hatîn re parve bikim.

Li vir jiyana Serokatiyê tev perwerde ye.

Nîşanên giraniya berpirsiyariyê li ser rûyê Sara xuya dikirin. Bi dil û can guhdarî her kesî kiribû. Dixwest yên li cem xwe nas bike û bizane ka pêdiviya kê bi çi heye. Xalên pêwîst dîtîn tev di lênûsa xwe de nivîsîbûn. Piştî ku her kes axivî çend kêliyan yên li pêşberî xwe di ber çavên xwe re derbas kirin û dest bi axaftinê kir:

-Ez jî dixwazim behsa berxwedana li zindanê û tecrûbeya wê bikim.

Jixwe yên li wir jî tev li benda wê bûn. Ji berxwdana biheybet, heta işkenceya hatî kirin, rojên dijwar, siyaseta dijmin ya li ser zindanê, çawa ku tu ta bi derziyê ve bikî yek bi yek gotin. Carna hestiyar dibû rondik diketin çavên wê, carna hêrs dibû, carna dengê wê nizim dibû, carna bilind. Her kesî bi mereqeke mezin gudarî dikir.

Bûbû êvar, bêdengiyê xwe li derdora qata dehan gerandibû. Zozan û Rozerîn, di odeya razanê de li cilan dinêriyan. Rûyê Zozanê tirş bûbû:

-Ev cil ne xweşik in, hin ji wan jî pir kevin bûne.

Rozerîn jî destek cil di destê wê de bû, li xwe digirt.

-Ez bawer dikim tu baş li wan nanêrî. Ka li min binêre, va yên min temam in.

-Hevala Rozerîn tu kin î her cil li te tê, lê li min nayên.

Di wê navê re Şervîn ket hundir:

-Hevalno, Serokatî hat:

Apo li korîdorê silav da wan. Li ber Zozanê sekinî, lê baş temaşe kir:

-Lêhûrbûna te çawa ye?

-Serokê min baş derbas dibe.

-Ya girîng ew e ka tu me nas dikî yan na. Tu pirtûkên me dixwînî, jê fêm dikî?

-Rast e serokê min, ez dixwînim, hewl didim fêm bikim.

-Xuya ye te hê ji me fêm nekiriye.

Berê xwe da aliyê Perwînê:

-Min raporên te xwendin, tu ji xebata Şamê hatî. Xwendina te jî heye, tu li vir dikarî pir bixwînî.

Piştî wê destê Rozerînê girt:

-Keça jêhatî Rozerîn, divê her kes weke te baş notan bigire û xwe pêş bixe. Cihê tu lê bixebitî jî divê pêş bixî. Ev xwestekên te di cihê xwe de ne. Lê vê carê tu biçî xebata gel wê baş be.

-Serokatî çi guncaw bibîne ezê wê bikim, lê dixwazim li cihê min zor dîtî, bibim bersiv.

-Heval, divê tu li ser girêdana xwe ya bi qada çiyayan û hevalên xwe ve pirtûkekê binivîsî, li vir derfet hene û ev jî erka te ye. Her kêliya tu tê de jiyayî binivîse.

-Tişta Serokatiyê gotî ezê li ser rawestim.

Piştî wê destê Şervînê girt:

-Hevala Şervîn te çi kir? Notên hatîn te hemû xwendin? Xwestek û pêşniyarên hevalan yek bi yek bêje.

-Serokê min, hemû amade ne.

-Wê demê em hinekî bi hevala Dîcle û Rihan re nîqaş bikin.

Piştî ku yek bi yek destê wan girt û pirsa wan kir, li peşberî wan sekinî:

-Hûn hevala Sara dibînin. Hevala min ya destpêkê ye. Dikare ji bo we berxwedan û helwesta jinê ya li hemberî dijmin diyar bike.

Berê xwe vegerand ser Sara:

-Te xwe gihandiye astekê û dikarî ezmûn û lêhûrbûnên xwe ji hevalan re jî bêjî.

Dîsa berê xwe da tevan:

-Li qadên şer jî berxwedaneke jinan ya bêhampa heye. Emê li ser vê mijarê bi kûrayî rawestin. Gerîla li ber xwe didin. Heta ji me bê emê jî li vir xebata xwe bihêz bikin.

Serê xwe hejand. Hinekî hêrs bûbû.

-Berî çend rojan li Heftenîn şer pir giran bûbû. Hevalê me Cesûr ketibû çembera dijmin. Hûn dizanin ne ji zû ve çûye. Em bi Qamişlo re axivîn, me got Ehmed Repo û Xebat li Cûdî ne, ji bo şkandina çemberê bila xwe bigihînin wir. Çembera dijmin bi wî awayî hat şkandin.

Hinekî çû hat:

-Hûn dibînin, em ji vir dest diavêjin çiyê jî.

Piştî axaftinê ket pirtûkxaneyê li ber refa pirtûkan sekinî. Çend pirtûk derxistin li wan nêrî.        Dîsa danîn cihên wan li ser kursiyê xwe rûnişt. Wê rojê pir westiyabû. Hişê wî tev li ser şerê li Başûr bû. Çavên xwe danîn ser hev. Di xeyalên xwe de çiyayên Kurdistanê û li liv û tevgera gerîla temaşe kir. Xwest xwe bigihîne wan bilindiyan û wê berxwedanê. Çavên xwe vekirin dest avêt danezana ji bo çalakiyan hatî amadekirin...

***

Bîst û didoyê Cotmeha 1992yan bû. Bayekî hişk li geliyên Xakurkê dixist. Ji bo dagîrkirina vê herêmê artêşa Tirk bi hêzeke pir mezin dest bi tevgerê kiribû. Hêzên Başûrî jî bi Tirkan re tevlî tevgerê bûbûn. Hêzên Gerîla jî li seranserê Xakurkê di nava tevgerê de bûn. Erkdarkirin û bicihkirina gerîla li gorî şer dihat çêkirin. Gerîla kom bi kom di nava amadekariya şer de bûn. Civîn hatibûn çêkirin û li ser rewşa heyî biryara helwesta pêwîst hatibû dayîn. Komên eniya pêş li hemberî êrîşan bi rê diketin.

Bêrîtan pir bikelecan bû, wê jî bilez xwe amade dikir. Çenteyê xwe li hev dida, çeka xwe kontrol dikir û li derdora xwe vedinêriya ka tiştek maye yan na. Bi kurtayî di nava kêferatê de bû, lê kêferateke bikêf bû:

-Hevala Rûken, divê ez biçim cem hevalan da bizanim ka emê kîjan çiyayî bigirin!

Rûken ji xwesteka wê ya çûna şer mabû şaş:

-Hevala Bêrîtan, hê birîna rûyê te baş nebûye, tuyê çawa biçî?

Lê Bêrîtanê ji zû ve biryara xwe dabû:

-Hevala Rûken, dijmin li hemberî me dest bi pêngava tinekirinê kiriye. Emê berxwedaneke mezin bikin. Emê nehêlin pêş ve werin.

Di wê navê re dengê balafiran hat. Bêrîtanê bi ser xwe re nêrî:

-Bila heval belav bibin, ezê biçim cem hevalê Harûn.

Her kes bilez çû cihê berê jê re hatî diyarkirin, Bêrîtanê jî berê xwe da cem cihê Harûn. Hem dimeşiya hem li ser xiyanetê dihizirî. Ma wê çawa nehiziriya, keça Dêrsimê bû, haya wê ji xiyaneta nava Kurdan ya dîrokî hebû. Hê xiyaneta Rayber li Elîşêr û hemsera wî Zerîfe kirî ji bîr nekiribû. Ji bo ku nekevin destê leşkerên Tirkan, jinên Dêrsimî xwe di zinaran de avêtibûn. Bi dehê caran ev çîroka biêş jê re hatibû gotin. Ew dîmen tev dianîn ber çavên xwe. Ji ber wê li hemberî xiyanetê pir bikîn bû û her tim ji xwe re digot, divê em tovê xiyanetê li Kurdistanê biqelînin. Keserek hatiyê: “Xiyanet her tim weke xencereke bicehir li pişta gelê me ketiye, divê helwesta me ya herî dijwar û bihêz li hemberî xiyanet û nokeriyê be!

Lîsteya plansaziyê di destê Harûn de bû lê vedinêriya. Bêrîtan li cem sekinîbû, li bendê bû ku karê xwe biqedîne:

-Hevalê Harûn, em dixwazin zû biçin?

-Hevala Bêrîtan, niha bisekinin. Em binêrin ka wê bi çi awayî êrîş bikin, da li gorî wê em tevbigerin. Jixwe Serokatiyê talîmat rêkiriye, dibêje divê hûn bi şêwazê şerê gerîla tevbigerin.

-Hevalê Harûn min jî talîmat xwendiye. Ez dibêjim em niha biçin bilindayiyan bigirin. Divê em firsendê nedin ku dijmin pêş ve were.

Harûn nava riha xwe xwerand. Pêşniyara wê jê re maqûl hatibû û baweriya wî bi Bêrîtanê dihat:

-Wê demê hûn çiyayê Lêlkan bigirin. Jixwe civîna heye, di civînê de emê bikin  biryar. Lê bi me re di nava têkiliyê de bin! Dema êrîş dijwar bû emê hevalan ji we re bişînin.

Dîsa bilez hat cem Rûkenê. Pir bikelecan bû. Lê hê du gotin ji hev re negotîn dengê erkdarê rojê bilind bû: "Bila her kes çante û çeka xwe rake, civîn heye."

Bêrîtan pir bilezûbez bû:

-Hevala Rûken, ka çenteyê min!

Rûkenê pir ji Bêrîtanê hes dikir, bi çavê hevaleke pir ezîz lê nêrî:

-Heval nebêje ezê biçim eniya pêş! Helbet em hemû jî dixwazin biçin pêş, lê ji bo birîndariya te dibêjim!

-Hevala Rûken di vî şerî de divê em di eniya pêş de bin û nîşanî her kesî bikin ku jina Kurd li hemberî xiyanetê xwedî helwesteke dijwar ya hêjayî dîrokê ye. Jixwe biryar jî wisa hatiye dayîn.

Li saeta xwe nêrî:

-Hevala Rûken, saeta plansaziyê hatiye, em zû biçin xwe bigihîninê.

Bi gotina xwe re jî meşiya. Rûken jî neçar ma li pey bilez bimeşe. Piştî nîv saetê her du bi hev re ji civînê derketin.

Qîmet û heskirina Bêrîtanê di dilê Rûkenê de pirtir bûbû. Di wê civînê de aliyekî din yê wê nas kiribû:

-Te di pêşniyara xwe de israr kir û da qebûlkirin ku em eniya Lêlkanê bigirin. Lê diviya tu hinekî li biryargehê bisekinî.

-Hevala Rûken, li dijî xiyanetê teqez divê tevlî bibim. Ez qet qebûl nakim hevalên min li eniya pêş bin û ez li paş bimînim. Divê em pêşiyê bigirin.

Di wê navê re çend gerîlayên jin yên din jî hatibûn cem wan. Bêrîtanê birîna di rûyê xwe de nîşanî wan kir:

-Hevalno, li min binêrin, ev birîna li ser rûyê min çiqas li min hatiye û ez pir bedew kirime.

Gurmegurma topan li ser asîmanê Xakurkê ketibû. Gerîlayên din çûn, dîsa her du man li cem hev.

-Hevala Rûken, divê em xwe zû amade bikin, nîv saeta din emê bi rê bikevin.

Hinekî li xwezayê nêrî, pişt re li nava çavê Rûkenê:

-Tu dizanî, di vê kêliyê de rengên xwezayê yên xweşik û ew çûka dozdehrengî tên ber çavên min!

-Hevala Bêrîtan, di nava vê hingamê de tu çawa dikarî li ser van fikrên xweşik û zindî bihizirî?!

Pişt amadekariyê koma Bêrîtan berpirsiyara wan û komeke din çenteyên xwe dan pişta xwe, bi coş û kelecan bi rê ketin. Bêrîtan li pêşiyê dimeşiya, henaseyên kûr dikişandin hundirê xwe. Li ser eniya wê weke xunaveke hûr libikên xwêdanê kom bûbûn. Gavên xwe bileztir kirin. Dengê serhildanên borî yên 1991ê ketin guhên wê. Dengek ji şûn ve hat:

-Hevala Bêrîtan, em navbereke piçûk nedinê!

-Temam heval, lê hema hinekî. Divê berî ku reş bikeve erdê em xwe bigihînin Lêlkanê.

Her kes di rêza xwe de rûnişt, pişta xwe de çenteyê xwe. Dengê topan bênavber dihat. Bêrîtanê çend carekî bi ser xwe re nêrî. Destê xwe avêt berîka xwe, deftera xwe ya piçûk derxist. Pênûsa xwe bilez danî ser rûpela spî. Bilez hevokek nivîsî, lê hevok sernivîsa mijareke dirêj bû. Dema wê têra wê hevokê tenê dikir. Lênûs kir berîka xwe:

-Hevalno, rabin em bimeşin!

Her tevgera wê bala Rûkenê dikişand:

-Hevala Bêrîtan, te avek venexwar.

-Hevala Rûken dema avê vedixwim êdî nikarim bimeşim.

Rabûn ser xwe, ketin ser riya xwe. Di rêçikên wan çiyayan de, Bêrîtan careke din ketibû nava fikir û hizrên cuda. Gotina "Ez soz didim, wê pîvana hesikirina min mezibûn be" anî bîra xwe. Piştî

meşeke dirêj û zehmet gihîştin cihê xwe. Bi kêfxweşiya gihîştina ciyê xwe henaseyeke kûr kişandin. Lê ji westanê berî ku tiştekî bikin, rûniştin pişta xwe dan çenteyên xwe. Bêrîtanê li bilindayiya çiyayên derdor dinêriya. Çavên wê ketin ser rojê. Êdî dema xatirxwestina wê hatibû, wê biçûya ava. Çawa ku ew jî destê xwe jê re bihejîne, wisa çavên wê man li serê. Piştî ku ew qursa sor wenda bû, li derdora xwe nêrî:

-Hevalno, ji bo van kêliyên wiha em bi hev re, naxwazim bimirim. Lê ji mirinê jî qet natirsim.

Hinekî li çavên hevalên xwe nêrî:

-Hûn dizanin çima evqas bicoş im? Serokatî her tim banga tevlîbûna jinê dike. Ez dixwazim em jin tev bi tevlîbûna xwe bersiva bangewaziya wî bidin.

Piştî ku dît her kes dixwaze guhdarî bike, axaftina xwe domand:

-Hevalno, ya ji bo me jinan pêwîst helwest e. Ti kes nikare hêza me sînordar bike. Lê divê em di zanabûna tevlîbûna xwe de bin û tevlîbûna me rast be. Eger wisa nebe wê tevger bikeve xeterê. Divê em gotina Serok ku dibêje; “Ya şer dike azad dibe, ya azad dibe xweşik dibe, ya xweşik dibe tê heskirin” ji bîr nekin.

Bi destê xwe çiyayên li pêşber nîşan dan:

-Emê li van qadan jî deng û rengên xwe bihêlin. Emê kevneperestiya li ser jinê disepînin û hişmendiya ku dibêjin jin nikare şer bike, pûç bikin.

Bi gotina xwe re li xwezayê nêrî:

-Hevalno, rabin lez bikin! Berî ku reş bikeve erdê divê em cihê xwe bigirin!

Bi gotina wê re her kes rabû ser xwe, li çeperan belav bûn.

Êdî dinya tarî bûbû, dengê topan her ku diçû nêzîktir dibû. Bêrîtan li ser çeperan digeriya. Di çepera Rûken tê de rûnişt pala xwe da dîwarê wê. Li aliyê dengê topan dinêriya:

-Hevala Rûken, tu dibînî, her ku diçe dijmin nêzîktir dibe. Êrîş jî pir dijwar bûye. Ezê hinekî din pêş ve biçim, da bizanim ka bi kîjan alî re tên.

-Hevala Bêrîtan tu pir tevdigerî hay ji xwe hebe, top li nêzî me dikevin!

Lê diviya biçe, erka wê bû. Rabû ser xwe ber bi çeperên din ve çû. Demek derbas bû. Lê her ku diçû top nêzîktir diketin. Careke din vegeriya çepera xwe li kêleka Rûkenê rûnişt:

-Hevala Rûken, em çeperên xwe bernadin. Wê ev şer jî bi serkeftî bi dawî bibe. Bi ya min be tuyê rabî li ber bedewiya vê heyvê stiranekê ji me re bêjî.

Rûken tişteke di nava kaxizekê de ji berîka xwe derxist:

-Hevala Bêrîtan, ev helawa te ye, hevalan ji bo te veqetandibû.

-Hevala Rûken, her ku ez stiranekê ji te dixwazim tu xwe bi awayekî ji min xelas dikî!

Helaw ji destê wê girt, destê xwe danî ser milê wê:

-Ez pir ji helawê hes dikim. Westiyeteke min li te heye; dema ez şehîd bûm, di roja şehîdbûna min de ji vê helawê çêkin.

Rûkenê jî destê xwe avêt ser stûyê wê:

-Ax hevala Bêrîtan, vê şevê û van gotinan, ev çi gotin in!

-Hevala Rûken, stiranê bêje, xwe giran neke!

Êdî Rûkenê nikariya Bêrîtanê bişkîne. Her çar jinên di çeperê de rûniştin. Wê şeva tarî, Rûkenê bi wî dengê xwe yê xweş hevalên xwe di nava xeyalên kûr de birin anîn. Bêrîtanê li aliyekî guhdarî dikir, li aliyekî jî xwe ji cengê re amade kiribû. Ew xwezaya xweşik û bedew dîsa kiribû mêvana xeyalên xwe. Ew firîna ji serê zinaran ber bi deşt û newalan ve anî ber çavên xwe. Dengê kenê hevalên wê di guhên wê de deng vedida. Bi stiranê re kêliyên xweş dianîn bîra xwe. Van xeyalan aramî û kêfxweşî didanê.

Dengê topan ji berê bilidtir û nêzîktir bûbû. Gotinên Osman, liv û

tevgera wî anîn ber çavên xwe... Ji ber dengê topan êdî dengê Rûkenê baş nedihat bihîstin, stirana xwe di nîvî de hişt. Bêrîtanê axînek kişand:

-Tiştên bi dilê me temam nabin, lê nîvê din jî piştî vî şerî em guhdarî bikin!

Careke din destê xwe li stûyê wê weranî:

-Tu dizanî çi dihat bîra min! Dema pêşmerge dihatin cem hevalê Osman ji bo wan em tev diketin tevgerê. Dema min ji bo eniya şer pêşniyar dikir, fermandar Osman ji min re digot, dem dema siyasetê ye, tu dibêjî ezê biçim eniya şer. Digel ku ewqas hevdîtin çêbûn, em niha di çeperan de ne û pêşmerge jî bi dewleta tirk re êrîşî me dikin. Ew jî weke dewleta Tirk naxwazin em li yek parçeyê Kurdistanê jî hebin.

-Ango tu dibêjî rêbaza hevalê Ozman şaş e?

-Bi rastî, di serî de dema ez hatim vê qadê, ew ji bo min mînak bû. Lê piştî ku min ji nêzîk ve nas kir, niha rêbazên wî yên pêşengiyê paşdemayî û klasîk dibînim. Her ku dahûrînên Rêbertiyê jî dixwînim baştir fêm dikim.

Hinekî bêdeng bû, pişt re rabû ser xwe. Xwe xwar kir, bibez ber bi çeperan ve çû. Her çepera diçûyayê moralê wê bilind dibû. Leşkerên artêşa Tirk jî her ku diçû nêzîktir dibûn. Lê tiliyên gerîlayan jî li ser tetikan bûn. Ji bo wan du gotin tenê biwate bûn: “Berxwedan û Serkeftin.” Piştî venêrîna çeperên din dîsa hat cihê xwe:

-Hevalno, ji bîr nekin, PKK ev kêlî ye. PKK ev şervanên di van çeperan de ne. Ev ruhê me yê berxwedanê ye!

Li tenişta Rûkenê rûnişt guhên xwe dan ser aliyê dijmin. Bala wê li ser deng bû, lê dixwest gotina di dilê xwe de jî ji Rûkenê re bêje:

-Hevala Rûken, min heskirina xwe li van bilindiyan veşartiye. Ez soz didim ku ezê bibim layîqî gelê xwe.

Dengê topekê li nêzî wan hat. Bi dengekî bilind û tijî kelecan gazî kir:

-Hevalno, dijmin zû pêş ve tê. Bila her kes dest bi lêdanê bike! Li rûreşiya xiyanetê bidin!

Ji aliyê Rûkenê ve jî deng hat:

-Hevala Bêrîtan, dijmin nêzîkî me bûye! Bila hin heval û çekên giran bişînin!

-Temam heval. Haya hevalan jî jê heye wê bişînin!

Bibez ber bi çepera pêş ve çû. Carna jê ji ber topan xwe diavêt erdê. Bi wî awayî xwe gihand çeperê. Çavên wê bi gerîlayeke di nava xwînê de ket. Serê wê rakir danî ser zendê xwe. Lê mixabin şehîd bûbû. Da pişta xwe, ji çeperê derxist. Li erdê dirêj kir, bi kefiya wê rûyê wê yê weke yê firîşteyan nixumand. Çend rondik ji çavên wê hatin xwarê.

***

Li ser bedewiya Xakurkê, dengê xiyanetê weke ewrekî tarî belav bûbû. Çiyayê Lêlkan hatibû dorpêçkirin. Leşkerên Tirk û pêşmerge pêş ve dihatin. Rengê axa çiyayê Lêlkanê ya sor, şîn û spî ji reşên wan reş bûbû. Leşkerên Tirkan pêşmerge dabûn pêş, ew jî li benda bidestxistina çêyê bûn. Ji bo ku hevalên wê nekevin çembera dijmin, Bêrîtanê dixwest dijmin ber bi aliyê xwe ve bikişîne. Li serê zinara herî bilind sekinîbû. Êdî dengê guleyan ji jorê nedihat. Ew kêliya bêdengiyê di dilê wê de serkeftina ruhê wan bû. Heta dawiyê berxwedan hatibû kirin. Erka xwe bi serbilindî temam kiribûn. Berê pêşmerge û leşkeran li jorê bû, Bêrîtan dîtibûn. Wê jî ji jor ve baş riya xwe ya zadiyê dîtibû. Li ser zinara biheybet bin xwe re li wan dinêrî. Weke bîreke bêbinî reş û tarî xuya dikir, riyeke zor bû. Di dilê xwe de got, ev riya yekîtî, zelalî û hevaltiyê ye. Ya dîrok û

mezinbûnê ye. Li hawîrdorê wê weke taviya baranê gule dibariyan. Careke din xweavêtina jinên Dêrsimî di zinaran de hat bîrê. Çawa ku ew kêlî be û dengê wan jinan bikeve guhên wê, xwest bi durişma “Berxwedan Jiyan e, Bimire Xiyanet, Bijî Serok Apo, Bijî Azadî Bijî kurdistan...” dengê xwe tevlî dengê di guhên xwe de bike. Ev deng di nava dengê top û balafiran de çawa ku di guhên dijmin de bê gotin, bi zelalî diçû wan. Wî dengî dijmin dîn û har dikirin. Tişta ku pê diêşiya xiyanet bû û li ser helwesta xwe kilît bûbû. Diviya heta kêliya dawiyê wê helwestê bi zelalî nîşan bide. Serê xwe bilind kir, li derdora xwe nêrî. Pêşmergeyek li pêşberî wê sekinîbû. Bi qasî du çengan nêzîk bûbû. Destê xwe jê re dirêj kir:

-Destê xwe bide destê min, em tiştekî bi te nakin.

Bêrîtanê li destê ber ve hatî dirêjkirin nêrî û li destê xwe nêrî: “Ev çi dest e, destê kê ye? Deng, beden, şan, nîşan, dirof û cilûberg kurdî ne, lê hişmendî, axaftin, tevger ji bo dijmin in.” Xiyaneta li Kurdistanê çêbûyî tev hatin bîrê. Di dilê xwe de got, mirov evqas rezîl û riswa dibe? Bêguman bersivek jê dihat xwestin, wê jî xwe ji bo wê amade kiribû. Ew çemekî zelal û pak bû, xwediyê destê hatî dirêjkirin, çemek ji gemar û xiyanetê bû. Ew kêlî bû xwe di ruhê wê de dubare dikir. Li ser wê axê wê kurtedîrokeke nû bihata destpêkirin:

-Ez qet teslîm nabim!

Ji ber heybeta helwesta wê, destê pêşmerge dilerizî:

-Ezê te xelas bikim, destê xwe bide min.

Keça Dêrsimî careke din bin xwe re nêrî. Dengê tilîyên jinan yên serhildêriyê di guhên wê de olan didan. Wî dengî îrade û hêza wê xurttir dikirin. Rengê rûyê wê jî pir biheybet xuya dikir. Xwediyê destê rezîl êdî newêriya li awirên çavên wê binêre. Kesên li derdorê, tev sekinîbûn li wî dîmenî dinêrîn. Dîmenê du Kurdan. Yek ji bo gelê xwe, yek ji bo dijmin. Yekî nûnertiya tariyê dikir, yekê nûnertiya

ronahiyê. Yek sembola tirs û bêxîretiyê bû, yek sembola berxwedan û rûmetê. Xwediyê dest careke din doza teslîmbûnê lê kir, lê wê ji zû ve biryara xwedîderketina li rûmetê dabû. Careke din li derdora xwe nêrî, pişt re jî çend kêliyan li xwediyê dest nêrî. Di çavên wê de pir piçûk û belangaz xuya dikir. Çeka xwe ya vala hêdîka ji milê xwe danî, bi her du destan pê girt. Li lata li pêşiya xwe da heta parçe parçe bû. Ji bo ku tişteke wê nekeve destê xayînan her tişt tine kir. Pişt re her du çengên xwe vekirin û xwe di wê zinara bêbinî de berda jêrê.

***

Apo bi cîhazê mezin ji qadên şer agahiyên dawiyê girtibûn û perspektîfên pêwîst dabûn. Derbasî  pirtûkxaneyê bûbû bilez diçû dihat. Ji hêrsa çavên wî sor bûbûn. Hêrsa wî ya vê carê ne weke carên berê bû. Çend caran rapora di destê xwe de xwendibû. Careke din vekir li xetên wê yên xweşik temaşe kir. Sernivîsa wê careke din xwend: “Rapora min ya şexsî ji bo Rêber Apo: Çavên xwe girtin û xwe berda nava deryaya hizran. Ku çavên xwe vekirin wêneyên şahîdan yên bi dîwar ve ketin ber çavên wî. Derket hêdîka ber bi eywanê ve meşiya. Bi bihîstina dengê deriyê pirtûkxaneyê re Sara û yên din rabûn ser xwe. Ew cara yekê bû ku rûyê wî wisa didîtin. Ew geşbûna berê xuya nedikir. Rapora di destê xwe de nîşanî wan da:

-Hûn vê raporê dibînin? Berê jî min xwendibû. Agahiya min girtî, ev heval di şerê li Başûr de şehîd bûye. Di serê rapora xwe de dibêje, ez bi eslê xwe ji Dêrsimê me, lê 1971ê li Solxana Çewlikê hatime dinyayê. Bihara 1991'ê tevlî refên gerîla bûm. Zanîngeha aborî xwendiye. Taybetiyên herêma xwe baş nas kirine û dibêje, taybetiyên herêmê bi min re hene. Ew jî baş tesbît kiriye. Taybetiyeke wê herêmê rabûna li hemberî zorê ye. Pirtûkên li ser

zanista civakî û Sosyazlîmê xwendine. Ev jî kevneşopiyeke wê herêmê ye.

Hem dimeşiya, hem kesayeta xwediya raporê dinirxand. Ji rûyê wî diyar bû ku pir li ber ketiye:

-Sala 1990'î tevlî xebata rêxistinî bûye. Ji ber ku pir bilez tevgeriyaye hatiye girtin. Piştî zindanê tavilê berê xwe daye çiyayên azad.

Serê xwe rakir li rûyên xemgîn yên hemberî xwe nêrî:

-Hevalno, di rapora wê de, hevokên ku bi rastî mirov li ser bihizire û binirxîne nivîsîne. Gotinên gelek hêja ne. Xuya ye ev heval gihîştiye asteke baş û di fêmkirina xeta Serokatiyê de xwe kûr kiriye. Divê hûn raporê baş bixwînin û nîqaş bikin. Ev ji bo min bûyereke mezin e ku hevaleke jin bêje ez dikarim ji her hevokeke te romanekê binivîsim. Heta niha ez li ser piratîka wir dihizirîm, min dixwest navekî lê bikim.

Qasekî sekinî. Hinekî li ber xwe nêrî dîsa serê xwe rakir:

-Pîvan Bêrîtan e. Berî ku şehîd bikeve ev rapor nivîsiye. Ji bo ku teslîm nebe xwe di zinaran de diavêje. Nahêle tiştekî wê bikeve destê dijmin. Çeka xwe û her tişta bi xwe re dişkîne. Ev helwest ji bo min ferman e. Ev helwesta kadroyê PKK'ê ye. Kadroyê xeta berxwedanê û hevaltiya bi Serokatiyê re nas kirî. Di heman demê de hevaleke entelektûel e. Xiyanet bin ketiye, Bêrîtan bi ser ketiye.

Hinekî din meşiya, dîsa rapor vekir lê nêrî:

-Bêrîtan ji bo me perspektîf e. Bi Serokatiyê û rewşa şer baş hesiyaye. Li hemberî koladariyê serî hildaye. Bê dudilî bi ser xiyanetê de çûye. Keçeke wêrek e. Di şer de bûye fermandar. Ji mirinê netirsiyaye. Ji jiyanê hes kiriye. Dibêjin ji hevalan re gotiye, ez dixwazim li ber tava meha Hezîranê bimirim. Xwestiye jiyana min binivîse. Xwestiye çiyayên bi per û bask ji xwe re bike mekan. Navê êla xwe li xwe kiriye. Têkoşîna jinê li Kurdistanê daye

maşandin. Şeveqa azadiya jinê baş dîtiye. Bûye şopdara Besê û Zerîfe.

Piştî vê axavtinê rapor dirêj kir:

-Hevala Şervîn, ha, bigire û bixwînin! Li ser baş niqaş bikin, ev pîvana me ya şer û jiyanê ye.

Careke din berê xwe da pirtûkxaneyê. Di hundirê xwe de li bersva rast digeriya. Hê jî pênaseya ji Bêrîtanê re bike kêm didît. Di hundirê xwe de got, ev kurtayiya dîroka me ye, xeta berxwedanê li hemberî xiyanetê ye. Êdî didît ku di kesayeta wê de xeta berxwedanê bi ser ketiye, iyaneta hundir û derve bin ketiye. Vê dilê wî hinekî rehet kiribû, bersiva ji wî şerî re di kesayeta wê de didît. Her ku diçû li ber çavên wî Bêrîtan mezintir dibû.

## BEŞA SÊYEMÎN

14'ê meha yekê bû. Bayekî sar li Şamê dixist, lê ne sermayeke wisa bû ku mirov ji ber biêşe. Çawa ku mirov aveke sar berde ser ya kelandî û têhnûşîro bike, bayê sar yê ji çiyayê Qasyon dihat û yê nermê ji Deryayaspî dihat tevlîveh dibûn ew jî sarûgermo dibû. Dema mirov diket Ruknedîn, -çenda xanî tev dişibihiyan hev û bedew bûn jî- bedewiya xaniyekî pirtir bala mirovan dikişand ser xwe. Xaniyekî mezin û bi şêwazê Şamê hatibû çêkirin. Şaxên dara yasemînê xwe di ser her du aliyên derî de berdabûn. Di hewşa wê de ji her rengî kulîlk hatibûn çandin. Hewşa wî bi darên leymûn, pirteqal û zeytûnan hatibû xemilandin. Dilopên xunavê yên li ser pelên wan bedewiyeke din li ser bedewiya wan zêde dikirin. Di nîvê wê de jî hewzekî bedew hebû. Avê xwe ji nafora wê berdida nava hewzê gurover. Şaxên dara leymûn, pirteqal û zeytûnan weke şaxên şengebiyê xwe bi ser ava wê ya zelal de tewandibûn. Dema mirov diket hewşê, berî ku mirov derbasî hundirê malê bibe, odeya mêvanan li ser destê çepê xuya dikir. Heta ber deriyê odeyê jî guldanik hatibûn rêzkirin. Xwediyê malê li ber derî sekinîbû, mêvan pêşwazî dikirin. Zilalmekî Bibejindirêj û dagirtî bû. Simbêlên xwe bi ser lêvên xwe de berdabûn. Ji aliyê pêş ve pora wî sivik bûbû. Bi rûyekî xweş mêvan derbasî odeya mezin dikirin. Di nava odeyê de ji serekî heta serê din qenepe û kursî hatibûn danîn. Mirov digot qey koçka wezîran e. Bi dîwêrên wê ve wêneyên kevnar hatibûn daleqandin. Şûrekî di kalanê xwe de yê ji sifir jî li koşeyekî hatibû daleqandin. Cezweya qehweyê li ser mase li benda mêvanan bû. Li ser tepsiya binê wê nîgarên kevnar û wêneyên xezal û kulîlkan hatibûn çêkirin. Di odeyê de ji mirovan cih nemabû. Ji zarokên piçûk heta yên heftê salî hatibûn. Kursiyek tenê vala mabû. Ti kes li ser wî rûnediniişt. Li benda xwediyê xwe bû. Li pişta kursî ala ERNEK'ê

hatibû daleqandin. Siwar û Rihan jî ji bo bicîkirina mêvanan alîkariya xwediyê malê dikirin. Kelecana zarokan ji ya mezinan pirtir bû. Ew jî li erdê li ser xalîçeyên gulgulî rûniştibûn. Êdî kesekî were nemabû, her kesî cihê xwe girtibû. Herkes ketibû kelecanê û çavê her kesî li derî bû ka wê xwediyê kursî kengê were. Xwediyê malê hê li ber deriyê hewşê sekinîbû. Seyareyek bilez ber bi malê ve dihat. Li ber derî sekinî. Yên tê de bilez peya bûn, ketin hewşê. Xwediyê malê ber bi mêvanê xwe ve çû û ji bo himbêzkirnê çengên xwe virkirin. Apo bi rûyekî geş silav dayê.

-Merhaba, Bavê Riyad, tu çawa yî?

Rûyê wî jî weke gulekê vebûbû:

-Tu bi xêr û selamet hatî serokê min!

-Bû demek me hev nedîtî, rewşa we çawa ye?

-Em baş in serokê min, şert hûn in!

Berê xwe da Siwar:

-Her kes amade ye?

-Belê serokê min.

Bi wê rûgeşî û kelecana xwe derbasî hundir bû:

-Hûn bi xêr hatine, rewşa we çawa ye?

Çavên xwe bi baldarî li ser kesên di hundir de gerandin. Li ber kursiyê jê re hatî veqetandin sekinî:

-Kerem bikin em rûnin!

Li ser lêvên wî kenekî ji kêfê diyar dibû û di rûyê wî de aramiyê xwe nîşan dida. Li ser kursiyê xwe rûnişt. Li ser maseyê li pêşiya wî gula zembeqa sîpî weke rûyê wî geş bû. Gula rezan ya pembe û spî jî çawa ku pê re bikenin pelên xwe vekiribûn. Di nava gulan de mabû. Ji singê bi jor ve tenê xuya dikir. Berê xwe da yên li pêşberî xwe:

-Firsend nîne em mal bi mal biçin serdana gel, ji ber wê me civîn çêkir. Koçberiya we û hatina we ya vir ji ber zora dijmin e. Koçberiya min jî ketiye sala 14an. Divê em li ser doza welat

biaxivin. Mayîna me ya li vir bi rastî jî zor e. Li vir bi alîkariya dostan me karekî mezin kir. Ji berxwedanê pêve titştek li vir nayê bîra min. Ez her roj dixwazim tişteke nû îcad bikim. Çima ewqas serihldanên Kurdan şkestin? Ji ber ku dijmin dil û mejiyên Kurdan hemû parçe kirine û kî hatiye ji yê berê xirabtir kiriye. Berzanî bi alîkariya Îranê xurt bûbû, lê di rojekê de herî kêm sed hezar pêşmerge bêçek kirin. Nikarî rojekê li ber xwe bide. Bi hezaran pêşmergeyên wî hebûn hemû reviyan. Em li serhildana Şêx Seîd binêrin, di nava du mehan de hatiye girtin û bi dawî bûye. Em li ya Dêrsim û Agiriyê binêrin, ew jî şeş mehan nemane. Encama wê wendabûn, darvekirin û teslîmbûn e. Partiyên din navên wan tenê hene, heta niha dilopek xwîna dijmin nerijandine. Me xwest li hemberî vê dîroka reş bisekinin. Bîst sal in em têdikoşin. Pir tişt çêbûn, ji niha pêve Kurd tine nabin.

Her du destên xwe kirin berîka xwe, qasekî li wan nêrî:

-Ez jî weke we insanek im. Divê mirov li ser rastiya xwe bisekine. Sala borî xayînên Kurdan ketin pêşiya dijmin êrîşî me kirin. Hevalên me pir qehremanî kirin, ev ne hindik e. Cîhan li ser nasekine, lewre destê hemûyan tê de hebû. Nûneran çêkin, xwe bigihînin perlemanan. Destê xwe bidin hev, xayînan ji nava xwe derxin. Di vî zemanî de bi şer tenê her tişt hel nabe. Pêwîstiya me bi fikir, siyaset û taktîkan heye. Berê me şûrê xwe digirt, em dadketin meydanê, lê êdî nabe. Gelek bê siyaset û xebat nabe.

Ji zarokan heta kalan her kesî bi dil û can û bê ku xwe bilivînin guhdarî dikir. Lê dixwest ew jî biaxivin:

-Pirsên we hebin bikin. Eger şaştiyeke min hebe ji min re bêjin. Ez bi navê gel dibêjim ez demokrat im, gel nebêje ez nabêjim. Şam ji Kurdistanê gelek dûr e. Di xebata me de cihekî pîroz e û dostên me yên vir gelek pîroz in. Dema ez hatim vir tişteke me tinebû, niha gelek tişt çêbûne.

Çavên wî ketin ser zarokan, hinekî keniya.

-Çend zarok hene, bila ew jî çend pirsan bikin!

Lê berî zarokan ji nava civatê kalekî destê xwe bilind kir û rabû ser xwe:

-Ez li pey te me, tu çi bêjî wisa ye.

Ji rûyê wî dihat fêmkirin ku naxwaze axaftinên bi wî awayî bên kirin:

-Tu li pey xwe yî, bi xwe re yî. Ya rast serkeftina xebatê ye.

Lê kalo nedisekinî, mirovekî jixwebawer bû:

-Mirov serkftinê bi çavan dibîne.

-Baweriya we bi temamî bi serkeftinê heye?

-Înşaela înşaela, emê bi ser bikevin.

Apo jî bi serê xwe gotina wî erê kir:

-Jixwe ji ber ku baweriya we bi serkeftinê heye hûn hatine vir. Rexneyên we ji bo min hebin bêjin!

Bi vê gotinê civat kêfxweş bûbû. Ji nava civatê dayîkek rabû ser xwe:

-Serokê min, tu pêxemberê me yî.

-Na na, ne wisa, lê riya min jî riya pêxemberan e. Riya min bi rastî ya wan e. Ya wan li Erebistanê kirî em li Kurdistanê dikin. Mirov pir cuda lê nenêre. Geleke kes dibêjin em Misilman in û bi wî navî bi ser me de tên. Misilmanên welatê me inkar dikin û me ji holê radikin. Lê di bingehê Islamê de ev zilm nîne. Wî zemanî ku zilm li yekî bihata kirin, ne pêxember qebûl dikir, ne eshabeyan. Lê Misilmanên niha zilmê qebûl dikin. Bi navê Hizbullah 400 kes kuştin. Bi navê Islamê, bi navê pêxmberan bi me lîstin. Lê ev borî, êdî em firsendê nadin wan.

Kêfa dayîkê pir ji bersivê re hatibû. Dîsa berê xwe da zarokan. Rabû ser xwe biken ber bi wan ve çû, himbêz kirin. Rûnişt, zarok jî li dora wî kom bûn:

-Hûn çawa ne? Hûn bi kurdî dizanin yan na?

Çend ji wan ne tê de, yên din tevan bi hev re bi gotina em dizanin bersiva wî da. Dengê Siwar ji dawî ve hat:

-Serokê min, Kurdên Şamê bi kurdî nizanin, lê yên din dizanin.

-Wê paşê xwe fêr bikin. We heta niha Serok dîtibû, we ez nas kirim.

Zarok li benda hev neman, hemûyan bi hev re bi gotina "Erê em te nas dikin," bersiv da.

-Kî dizane karê Serokatiyê çi ye?

Zarokekî heşt salî yê li milê wî yê rastê rabû ser xwe:

-Riya rast nîşanî me dike! Karê serxwebûn û azadiyê dike.

Heqî jî li kêleka wî rûniştibû lê hinekî mezin bûbû. Dikeniya û bi awirên xwe nîşan dida ku wî nas dike. Bi awayekî jixwebawer rabû ser xwe:

-Kurdistanê rizgar dike. Gel zane dike. Li dijî xanyînan disekine.

Apo destê xwe danî ser milê wî:

-Aferim ji te re, tu fêrî gelek tiştan bûyî. Wa tu mezin jî bûyî. Weke din ez dikarim çi bikim û hêza min çiqas e? Ez dikarim dijmin yan na? Hêza min têrê dike yan na, ez dikarim xayînan?

-Zarokan bi hev re bersiva wî da:

-Dijmin nikare te, tu dikarî dijmin. Xayîn bi Serok nikarin!

-Hûn şekir dixwazin yan tiştekê din?

-Em dixwazin zana bibin. Em dixwazin biçin çiyê.

-Rast e berî her tiştî welatek pêwîst e. Ev welat ne yê me ye. Ma hûnê li vir çi bikin? Zimanê we li vir pêş nakeve. Ji bo we ziman, welat, serxwebûn, azadî û wekhevî lazim e. Ev serok li ser van mijaran disekine. Mezinên we, dêbavên we heta niha li ser van tiştan nesekinîne. Ev kar hemû li ser ser milê min ma. Dema ez bi qasî we min dest bi karê azadiyê kiribû. Dayîk û bavê min jî hebûn, lê min

dest bi kar kiribû. Lê pêşiya azadiya min girtibûn, li min dixistin, ez digirtim, ez dikirim hundir. Min çiya dixwest. Ez zarokekî serlildêr bûm. Rojekê dayîka min jî gotibû, ma min xwestiye li hemberî dewletê rabe, min dixwest li ber destê min be. Di deh saliya xwe de min dest bi şerê azadiyê kir. Min ji heft saliya xwe dest bi çêkirina xwe kir! Berê digotin divê kur mezin bibe ji dayîkê re qumaş bîne, lê min wisa nekir, min xwe da ser riya gel. Berê nedihiştin ti kes bê derdora min. Min nikariya zarokekî ji xwe re bikim heval, zarok ji min direvandin. Ditirsiyan, digotin wê Ebdulah zarokê we bi çolan bixe.

Gotina pêşiyane: "Qîzê ji te re dibêjim, bûkê tu bibihîze". Erê bi zarokan re diaxivî û hêviya wî ew bûn, -çawa ku Ehmedê Xanî dibêje, ûmîda me ji tîfalan ku me emel betalan- lê bi qasî wan, mezinan jî bi baldarî guhên xwe didayê. Çawa ku bi mirovê mezin re biaxive bi wê girîngiyê axaftina xwe bi zarokan re domand:

-Em bi welat ve mijûl in, ji ciwanan heta kalan her roj şehîd dikevin. Em dixwazin aştiyê bikin, lê dijmin qebûl nake. Derdê me mezin e. Ez çawa xwe jê derxim?

Heqî bersiv da:

-Bavê min timî dibêje serê Kurdan hişk e, tiştek bi wan nabe.

-Hûn dibînin, mezin pirsgirêkan derdixin. Hûn soz didin min ku hevalên min bin? Lê divê hûn soza xwe ji bîr nekin û bi min re bin. Ez soz didim we ku ezê di meşa xwe de li pêşiyê bim. Hûn jî di xwendinê de yekemîn bin. Ev kar hemû ji bo we ye, emê ji we re welatekî çêkin...

Bi pirs û bersivan civînê heta demeke dirêj dewam kir. Civînê ka çawa bi kelecan dest pê kiribû, bi wê kelecanê jî bi dawî bû. Piştî civînê zarokan, mezinan, jinan, mêran yek bi yek, kom bi kom bi pê re wêneyên xwe kişandin. Wênekişandina pê re kelecaneke cuda bi wan re çêkiribû. Pişt re jî rûniştin tev de fêkî xwarin. Lê di wir de jî

suhbet pir germ bû.

Heta gihîştin qata dehan saet bû dozdeh. Yekser berê xwe da pirtûkxaneyê. Piştî ku çend kêliyan bêhna xwe vekir, dest bi xwendina notan kir. Dîcle tevlî civînê nebûbû, pir mereq dikir, ka behsa çi kiriye:

-Hevala Rihan, Serokatî herî zêde li ser çi axivî, pirsên gel çi bûn?

Kelecana Rihanê hê kêm nebûbû:

-Îro zarok pir hatibûn civînê, we bidîta çiqas kêfa wan ji Serokatiyê re dihat! Serok ji wan re got, mezinan tiştek ji me re nekiriye, lê min soz daye xwe ku ji bo zarokan tiştên mezin bikim. Got ti kesî weke min soza dayî zarokan pêk neaniye. Zarokek rabû got serokê min, ev extiyar in nikarin tiştekî bikin!

Dîcle keniya. Ji bo ku dengê wê neçe pirtûkxaneyê destê xwe danî ser devê xwe:

-Jinan çi dipirsî?

-Li ser xiyanet û şerê diqewime pir dipirsîn. Serok digot, em bi sozên wan pir ne bawer in, lewre ketine xizmeta dijmin. Li ser pirsa têkildarî Yekîtiya Sovyetan jî got, Sovyet xistin vî halî, bila zererê nedin, em ti alîkariyê ji wan naxwazin. Nikarin tiştekî bikin û em bawer nakin hevaltiyeke rast bikin. Ji bo Emerîka jî pirsa gelo, dibe ku Emerîka hêza xwe li dijî me jî bi kar bîne, kirin. Serok bi awayekî eşkere bersiva wan da, got, Berzanî, Tirkiye, Sedam hemû Emerîka ye. Eger xwe ji pişta wan bide aliyekî nikarin rojekê li ser piyan bisekinin. Serok serê xwe dihejand, digot, ax Emerîka, Ax emerîka!!!! Niha xwe dostê Kurdan nîşan dide, lê di bin re gora me dikole.

***

Sira zivistanê ya sar li qata dehan dixist. Pê re jî baraneke xweş lê dikir. Milîtanên jin li eywanê hina pirtûk dixwendin, hin jê bi karin din ve mijûl bûn. Apo li ber pencereya pirtûkxaneyê li barana ku her tiştî pak dikir dinêrî. Her ku baranê lê dikir, sira hişk hinekî nerm dibû. Carna jê dengê şîqeşîqa birûskan dihat. Li saeta li ser destê xwe nêrî. 19ê Çile dinivîsî. Li ber pirtûkan sekinî hinekî li wan temaşe kir. Pişt re çû li ser kursiyê li pişt mase rûnişt. Çawa ku wê dest bi nexşeyekê bike, bi awayekî nazik rahişt pênûsê. Lênûs vekir, pênûsa xwe li ser rawestand. Dixwest ji bo mijara herî zêde li ser dihizirî pênaseya herî xweşik peyda bike. Mijar jî kongreya jinê bû. Bi xetên stûr "Ji bo Kongreya Jinê ya Neteweyî" nivîsî. Di wê navê re dengê derî hat. Serê xwe ji ser lênûsê rakir:

-Kerem bike were!

Rozerîn bi tepsiyeke piçûk ket hundir. Di tepsiyê de pirteqal û sêveke qeşartî hebûn. Tepsî danî ser mase. Çavên wî li tevgerên wê bûn. Kêfa wî ji jêhatîbûna wê re dihat. Dixwest guhertina ji wir girtî her roj di kesayeta wê de bibîne:

-Heval, fêkî bibe eywanê, ezê bêm wir.

-Temam serokê min.

Rahişt tepsiyê derket. Wî jî lênûs û pênûsa girtin derket çû eywanê. Li ser kursî rûnişt. Tepsiya fêkî hê di destê Rozerînê de bû, nizaniya ka wê dayne kû. Apo lê temaşe kir. Çetelê li ser tepsiyê ket erdê. Rozerînê li çetelê ketî temaşe kir. Li ber piyê wî ketibû. Ji kelecanê dudilî bûbû; yan wê çetel rakira, yan wê tepsî daniya, biçûya çetelekî din bianiya.

Apo keniya. Xwe tewand çetel ji erdê rakir:

-Fêkî dayne ser mase, çetel jî bibe bişû. Duduyan bîne.

-Temam serokê min.

Lênûsa xwe vekir, ji cihê mayê nivîsa xwe domand:

-Yek ji karên me yên herî biwate yên meşa azadiyê yên destpêkê, têkoşîna azadiya jinê ye. Geşedanên demên dawiyê em xistin nava hewldanekê ku vê pirsgirêkê berfirehtir binirxînin. Hûn endamên partiyê, bi taybetî hevriyên keç, hevriyên jin! Li pêşiya we jiyaneke nû û afirandina kesayeteke nû heye. Mijara herî girîng ya niha em li ser rawestin ev e: Taybetiyên jinê yên li Kurdistanê bibin bingeh û çavkanî çi ne? Di nava jiyanê de wê jin çawa cihê xwe bigire û çawa xwe bigihîniyê? Me xwest em vê ragihînin: Wê çawa bi çarçoveya bingehî ya siyasî, welatparêzî, azadî û rastiya gel û rêbertiyê ve girêdayî, vê mijarê binirxîne. Jina vê ji bo xwe neke bingeh û çavkanî nayê qebûlkirin.

Piştî van hevokan li pêşberî xwe nêrî. Rozerîn sekinîbû û du çetel di destê wê de bûn. Dengê derî hat. Sara di derî de xuya kir. Bilez û bikelecan derbasî eywanê bû:

-Merheba serokê min!

Apo bi rûyekî geş ew himbêz kir û li kêleka xwe da rûniştandin. Û bi baldarî li rûyê wê dinêrî:

-Tu bi xêr hatî, rewşa Efrînê çawa bû?

-Serokê min, gelê Efrînê bi Rêbertiyê ve girêdayî ye. Bi dil û can ji me hes dikin. Ji bilî me partiyên wisa bihêz jî li wir nînin.

-Kêfa te ji wir re hat?

-Serokê min, weke buhiştê ye. Her cihê em lê digeriyan, tu diketî bîra me, me digot xwezî Serok jî niha li vir bûya. Ez çûm hafa çiyayê Gewr jî.

Apo berçavka xwe ya di nava tiliyên xwe de danîn. Dîmenê wan deran di xeyalê xwe de gelek caran hem çêkiribû, hem jî pir bihîstibû. Berê xwe da Rozerînê hê li ser piyan bû:

-Rozerîn were rûne!

Dîsa berê xwe da Sara:

-Berî tu bêyî min peyama kongreyê dinivîsî.

Dema behsa jinan û kongreyê kir, hestên wê bilind bûn. Çawa ku ji kêfa çavên wê tijî bibin, wisa xuya dikir. Weke keseke rûhê wê bikele lê hatibû. Pir mereq dikir ka çi nivîsiye û çawa dest pê kiriye. Apo berê xwe da herduyan. Kelecana wan dît, di kesayeta wan de kelecana bi hezaran jinan jî xeyal dikir:

-Me ji bo jinê çend pîvanên wiha danîn:

Dildara neteweparêziyê ye.

Dildara azadiyê ye.

Dildara partiyê ye.

Dildara Rêbertiyê ye.

Kêfa Sara û Rozerînê pir hatibû. Ev ne cara yekê bû ku Sara li ser mijara jinê guhdarî fikirên wî dikir, lê asta bilindkirina tekoşînê bala wê pir dikişand:

-Serokê min wê jina Kurd bi van pîvanan kesayeteke mezin ava bike.

-Azadî di vir de tê zetimkirin. Di vê çarçoveyê de em dikarin bikevin dinyaya heskirinê. Em vê xalê jî bê westan û biisrar dibêjin: Dijmin di nava me de heskirin tine kiriye. Bedewiya ruhî û bedenî tine kiriye. Jin tine kiriye, jinbûn tine kiriye...

-Serokê min, ji bo xwegihandina vê, jina rêxistinkirî û ya têkoşer pêwîst e.

-Min berê jî ji we re gotiye; riya diçe heskirinê jî di milîtaniya şer re derbas dibe. Şer jî di van re derbas dibe; partîbûn û girêdana bi gel û welet ve. Û me ev jî got; berî her tiştî çi jina Kurd, çi mêrê Kurd be, divê çar-pênc zewacên nû bikin.

Rabû ser xwe hinekî çû hat. Carna jê li çavên wan dinêriya:

Zewaca bi welat re.

Zewaca bi gel re.

Zewaca bi partiyê re.

Zewaca bi şer re. Enceq piştî van, dora zewaca hûn difikirin tê.

Ev zewac ji zewaciyê hatine xistin. Zewaca em behs dikin, wê ji zewacên kevneşopiya berê derkevin û bibin têkiliyên azad. Çareserî ev e û emê di vir re xwe bigihînin heskirinê. Tu çi dibêjî?

-Serokê min, Heta ev zewacên bingehî pêk neyên, bila ti kes li bexteweriya şexsî, zewacên kevin, yan jî li riyeke din negere. Û bila xwe nexapîne! Rêbaza rast ev e. Ev rêbaz ji jihevheskirin û rêzgirtina kesan tiştekî kêm nake. Tersê wê, heskirênê mezin dike, biwate dike.

Bi hejandina serê xwe gotinên wê erê kirin:

-Derdekî min ku jin û mêran bi xwe ve girê bidim nîne. Jixwe bi milyonan bi min ve girêdayî ne. Ne ji bo ku bibin kole û bende, tersê wê, ji bo azad bibin, em erk didin wan. Ji bo ku bi awayekî erzan mirov bi min ve bên girêdan, ez nirxên partiyê, otorîteya partiyê bi kar naynim.

Çend carekî çû ber pencereyê û hat:

-Dayîka min jî be, ez bi xwe ve girê nadim. Ez wan bi welat, gel, partî û Rêbertiyê ve girê didim. Girêdana bi Rêbertiyê ve ne girêdana bi şexsê min ve ye. Rêbertî saziyek e, ezê sibê bimirim, lê wê ev sazî bimîne û saziyeke pîroz e. Divê nirxên gelê Kurd tev bi Rêbertiyê ve bên girêdan. Eger wisa bibe, wê yekîtiya wan û têkoşîna azadiyê pêş bikevin.

Gotina Rêbertî saziyek e bala wan gelek kişnadibû. Dîsa rûniştin nivîsa xwe domand, wan jî berê xwe da odeya xwe ya lêhûrbûnê.

***

Ji meha yekê heta 26ê Sibatê, hem ji bo yên ji welat, hem yên ji derveyî welat dihatin civîn li ser civînê çêbûbûn. Êdî amadekariya dema pêş dihat kirin. Bihara Kurdan nêz bûbû, tevgera wan li her derê dest pê kiribû. Yek ji wan ciyan jî herêma Ruknedîn ya Şamê

bû. Herêm li pesarê çiyê ye. Ji berê ve Kurdan xwe li girtiye. Berê digotin Çiyayên Kurdan, lê piştî Yekîtiya Misir û Sûriyê  ya sala 1958'an, navê wê dibe Ruknedîn. Lê navên taxan hê jî navên êlên Kurdan in. Ku yek ji wan jî taxa Kîkî ye. Kesayetên Kurd yên navdar yên koçber bûyîn li wir diman, wir bûbû cihê dîwan û şêwra wan. Li wir wê Newroz bihata pîrozkirin. Dengê Kurdan wê ji vê quncika Şamê bilind bibûya. Ji bo pîrozbayiyê berê Kurdistaniyan ji Rojava û deverên din jî li wir bû. Li mala Selah amadekariya civînê hatibû kirin. Eywan dagirtî bû. Li ser sehpayê axaftinê her sê al hatibû danîn. Li tenişta destê rastê jî gulên spî yên weke tîrêjên rojê hatibûn danîn. Li pişta kursî jî her sê al daleqandî bûn. Li ser sehpa mîkrofonek jî hatibû bicihkirin.

Apo di nîvê civatê de rûniştibû. Pantolonekî reş û kenzeyekî leşkerî yê biberîk li ber bûn. Sermil û enîşkên wî keskê vekirî bûn. Di bin kenze de jî gumlekekî keskê tarî li xwe kiribû. Pora xwe ya li gorî sala borî sivik bûyî bi şûn ve dabû. Ji ber wê xelekên wê pirtir xuya dikirin. Simbêlên wî jî hê pir gur bûn, lê ji xedra zeman çend mûyên spî ketibûnê. Awirên çavên wî jî hê pir dijwar bûn. Lê ji rûyê wî diyar dibû ku pêvajoyeke giran heye. Hinekî jî bihêrs xuya dikir. Çavên xwe li nava salonê gerandin û bi hevoka “Di riya serxwebûn û azadiyê de sala we ya nû pîroz dikim” dest bi axaftina xwe kir. Çavên xwe girtibûn, wisa diaxivî:

-Di doza me û dîroka insan de ka gel çi ye, şerê gel çi ye, ketin çi ye, dijmin çi ye, xiyanet çi ye, ji her salê pirtir me sala borî dîtin. Ji her demê pirtir me ketin û serkeftin dîtin. Di binê Serokatiya PKKê de divê biryara partiyê jî meşa li ser riya jiyanê be. Dijmin dixwest em teslîm bibin. Lê di encamê de em ketin sala 1993'yan. Emê hê pirtir di riya serxwebûn û azadiyê de bimeşin û êş û zilma li ser gelê Kurd rakin.

Careke din çavên xwe vekirin, li eywana ji rengên Kurdan hatî

xemilandin temaşe kir:

-Sala borî diyar bû ku dijmin nikare li hemberî me bisekine. Ev sal sala gel e û sala serkeftinê ye. Her tiştê me ji bo serkeftinê ye. Gelê Kurd bê welat bû, me bi welat kir. Em dixwazin di Newroza nû de vê bidin diyarkirin û têkoşînê bihêztir bikin. Emê îsal jimara gerîla zêde bikin. Ev sala serhildan û şerê gel e. Herî zêde wê îsal biryar û dengê we bilind bibe. Komcivîn û perlemento çêdibin. Heta niha gelê Kurd bi navê xwe, di parlementoya xwe de biryarên mezin negirtine. Dijmin di prlemantoya xwe de biryara mirina Kurdan digirt û em dibêjin bes e. Derveyî biryara mirinê ji perlementoya dijmin tiştek derneketiye. Di vê salê de wê biryarên dijmin ji ser me rabin û yên me li ser me bimeşin.

Çend kêliyan sekinî. Hinekî jî bihêrs bû:

-Ne ji vî şerê me bûya li Başûr ne meclis ne jî konfederalbûn çêdibûn. Şerê sala borî pir giran bû. Nêzîkî sed, sed û pêncî şehîdên me jî çêbûn. Me di vî şerî de pir bi qehremanî li ber xwe da. Li her çar parçeyên Kurdistanê me li ber xwe daye. Divê Kurd ji dijmin dûr bikevin. Tişta ku em ji dostên xwe jî dixwazin; eger alîkariya me nakin, bila alîkariya dijmin jî nekin. Ev sala yekîtiya Başûr û Bakur e.

Ji rûyê kesên li ser piyan û rûniştî diyar dibû ku bi gotina yekîtiya Başûr û Bakur pir kêfxweş bûne. Axaftina xwe bênavber didomand:

-Sala 1993'yan li ser siyaseteke rast emê biratiyê û yekîtiyê çêkin. Em zererê nedin hev û nekin xizmeta dijmin. Em di meclisa Kurdistanî de xwe bikin yek. Welatparêzên Başûr yekîtiyeke mezin dixwazin. Gel ji me yektîyê dixwaze. Berê ji me re digotin, dev ji şerê çekdarî berdin. Lê Kurdistan bê şerê çekdarî nabe.

Te digot qey mirov li eywanê nînin, deng ji ti kesî dernediket:

-Bila sala1993'yan eniya Kurdistanê fireh bibe. Nebêjin PKK rê

nade, em dibêjin werin. Ne li welat, ne li derveyî welat em naxwazin ti kes ji me dûr be. Dostên dixwazin kar bikin em heta dawiyê bi wan re ne. Serxwebûna me ya gelê Kurd û Rojhilata Navî ye. Xebata PKKê berî her tiştî xebata insaniyetê ye, xebata welatparêzî, demokrasî û Sosyalîzmê ye. Gelê Kurd êdî fêm dike ku vê şoreşê bi wan dest pê kiriye, lê taliya wê ya her kesî ye.

Sînozîta wî dîsa serdestî jê standibû, mendîleke kaxiz ji ser sehpa rakir, pê pozê xwe paqij kir:

-Me di PKKê de insanên mezin û bicesaret çêkirin. Yên bi insaniyetê re, yên ji sedî sed bi gelê xwe re. Yên bi azadî û qehremaniyê re. Berî vê, tiştek nedikirin, niha ref bi ref û kom bi kom diçin xwîna xwe didin. Êrîşî dijmin dikin. PKK şerefa insanê Kurd e. Di dîroka Kurdistanê de roja hilatî ye û jiyan e. Partî dixwaze vê salê jî bike sala Kurdistanê. Ji çiya heta zindan û bajaran dikare şerê gel yê şoreşgerî bide meşandin.

Civîn ber bi dawiyê ve diçû, lê diwest dîroka PKKê bîne bîra wan:

-Sala 1972'yan min dest pê kir. Di nava kêferateke pir mezin de min têkoşîna xwe domand. Em bi wê biryara xwe re ne. Di van bîst salan de gelek xebat hat kirin. Bila ti kes nebêje ez nikarim tiştekî bikim. Hûn dibînin insan çiqas tenê be jî ku durist be dikare karê xwe bike. Eger mirov xiyanetê neke û durist bimeşe sed qatî min dikare kar bike. Eger hûn bi xwe, Serokatiya xwe û siyasetê nelîzin û durist kar bikin, dinya jî li hemberî we be, hûnê bi ser bikevin.

Ji axaftinên wî diyar dibû ku wê sal dijwar derbas bibe.

-Em dijminê xwe piçûk nabînin. Em dijminê xwe dinasin, xwest sala borî bike sala mirina me. 12ê Îlonê jî Evren-Ozal xwestin Kurdan ji holê rakin. Karê mezin di vê rê de ye, mirin di vê rê de dibe nemirin, nexweşî dibe saxî, her tiştê wendabûyî tê dîtin. Emê wisa bi ser vê salê de biçin û wê sala me bibe sala serxwebûn û

azadiyê. Ji bo serkeftinê çi pêwîst be emê bikin. Careke din li ser bîranîna şehîdan emê wisa bimeşin û ji bo we hemûyan serkeftinê dixwazim.

Tevî ku ew saetek bû li ser hev diaxivî, weke destpêkê rûniştî, hê wisa bû. Qet hereket nekir. Saetekê her du destên wî ji ser çokên wî ranebûn. Bi hevoka dawî re yên di salonê de tev rabûn ser xwe, li çepikan xistin. Ew jî tevlî çepikan bû. Piştî civînê re berê xwe da cihên perwerdeyê.

***

Sibata ku bi bayê xwe dihat nasîn, wê rojê jî ji her milî ve bayê li derdoran dixist. Sala nû dijwar dest pê kiribû. Apo di rê de bû, ber bi qata dehan ve diçûn. Li saeta xwe nêrî:

-Siwar tu dizanî ku li malê civanê me bi mêvanan re heye.

-Rast e serokê min, me ji hevalan pirsî, gotin hê mêvan nehatiye.

-Temam, baş e.

Piştî qasekî gihîştin malê. Silav da yên li eywanê û ber bi odeya xwe ve çû. Derê dolabê vekir, gumlekekî şînê asîmanî derxist li xwe kir. Bi ser de jî kenzeyekî rîsê biharî yê bi rengê şînê petrolê li xwe kir. Li ser pêşiya wî jî sê rengên sêkoşe hebûn. Yek risasî, yek reş, yek jî keskê tarî bû. Çû ber neynikê, li xwe temaşe kir. Kêfa wî ji wan rengan re dihat. Pantolonê wî jî rîsasiyê tarî bû. Cilên xwe pir li hev anîbûn. Hemû baş rast kirin. Rahişt goreya xwe ya şînê tarî jî kir piyê xwe. Pora xwe, simbêlên xwe û birhên xwe baş rast kirin, derket derve. Li eywanê hinekî li tv. temaşe kir. Di wê navê re dengê derî hat. Siwar bilez çû derî vekir. Yekî kin di derî de xuya kir. Parkeyekî biharî lê bû. Di bin de jî gumlekekî spî li xwe kiribû. Pantolonê wî jî risasî bû. Şalgerdeneke sor jî li stûyê xwe pêçabû. Serê wî keçel bû, lê çend mûyên mayîn bi aliyekî ve şeh kiribûn.

Erzeniya wî tenê birih bû. Bi ketina hundir re merheba da. Apo ber ve çû û bi silav û rûgeşî hev hêmbêz kirin. Mêvanê xwe da pêşiya xwe derbasî eywanê bûn. Her çiqas yên li wir bi piranî mêvan nas dikirin jî, lê hina nas nedikir. Bi destê xwe mêvanê xwe nîşan da:

-Mêvanê me, mamosteyê me birêz Yalçin Kûçûk e, ji Tirkiyê hatiye.

Rûniştin û heta qasekî pirsa rewşa hev kirin. Mêvanê wî pir biste û rehet xuya dikir. Berê xwe da Apo:

-Min hûn pir baş û xweşik dîtin. Digel evqas şer û qelebalixê wisa xuya dike ku nava we rehet e.

-Sax bin. Ji bo hatina we ya vir, pir bextiyar im. Pir spas dikim. Xweşikbûna tu behsê dikî, ne ya şexsî ye. Rewşa rastiya gelê me ye. Gelê me ji her demê pirtir van salan, dest bi xweşikbûn û başbûnê kir.

Li odeya teniştа eywanê xwarin dihat hazirkirin. Ji bo kişandina wêneyan Apo destê wî girt rabûn ser xwe. Milîtanên li wir tev li wan kom bûbûn, bikelecaneke mezin temaşe dikirin. Piştî kişandina çend wêneyan, di wêneyê talî de destên hev girtin û di ber e jî diaxivîn. Kûçûk jî bi baldariyeke mezin li derdora xwe temaşe dikir. Piştî ku parkeyê xwe danî, çend wêneyên din jî hatin kişandin. Berçavka xwe rast kir, li tevgera di hundir de nêrî. Piştî çend kêliyan berê xwe vegerand ser Apo:

-Min par ev tişt got: “Di binê Herranê de kanal vedibin, wê serê wê şîn bibe. Apo di serê insanê Kurd de, baxçeyê gulan dide çandin.” We ev gotina min bihîst?

-Erê ew hevoka we pir biwate bû. Weke din we gotibû, birayê min Apo weke boldozerekê dikeve mejiyê insanê Kurdistanê û li wir baxçeyê gulan datîne, gul vedibin.

Heta qasekî suhbet kirin. Xwarin hatibû hazirkirin. Tev de derbasî ser sifreyê bûn. Apo li pêşberî wî rûnişt, dest bi xwarinê

kirin. Kûçûk di hişê xwe de pirsên xwe amade kiribûn. Bala wî li ser liv û tevgera Apo bû. Piştî xwarinê bi mîlîtanên li malê re rûnişt, çend wêne bi wan re jî kişandin.

Çay û suhbetê jî qasekî dewam kir. Êdî dema destpêkirina roportajê bû. Li eywanê ew û Apo li pêşberî hev rûniştin. Kûçûk dest bi pirsan kir:

-Ez dibînim karê we baş dimeşe.

-Çawa em dixwazin ne wisa be jî, hêvî ji her demê pirtir ber bi pêkanînê ve diçe.

-Digel ku riya we dirêj e, hûn his dikin ku ber bi kaşekî ve hilkişiyan e û gihîştine serî?

-Erê, hem bi qasî Çiyayê Agirî em bi kaş ve kilkişiyane.

-Hûn hilkişiyan, wisa?

-Erê, bêguman em hilkişiyan. Ez polîtkayeke cuda dikim û ez bi pîvanên polîtîkayê ve pir girêdayî me. Lê min bi tecrûbeya xwe dît ku polîtîka hunerê hestê bînkirin û girtina serê ben e.

-Hûn vê çawa his dikin?

-Polîtîka ji bo min, hunerê zetimkirina bedewiyan e. Ez ji bo bedewiyê, ji bo bedewkirina mirovan polîtîkayê dikim.

Kûçûk serê xwe hejand, li rojên wan yên destpêkê hizirî:

-Tiştên tu îro dikî, hina texmîn dikir?

-Erê nîşanên wê pêşdîtinê hene. Hê ez piçûk ji min re digotin, benê xwe qetandiye. Ev tê wateya qutbûna ji sîstemê.

-Wê demê tu çend salî bûyî?

-Heft salî. Ez li dû hevalên xwe dibezîm, malbatan ji min direvandin. Ji min re digotin, tu şewitî, tu bi tiştên beredayî ve mijûl dibî, zarokên me jî neşewitîne.

-Ango hê wê demê lîdertiyê dest pê kir?

-Ev ji bo min bûbû hirs, komkirina zarokan ji bo min bûbû weke dildariyê. Min çûk digirtin, li zarokan belav dikirin.

-Rewşa bavê te çawa bû:

-Heta dawiyê xwe kişandibû qalikê xwe. Çawa ku mirovekî wê dinyayê be. Hêviya wî ya mezinbûnê tinebû. Digel wê, ji bo min digot, li ser eniya Ebdullah nîşana fethê heye. Her ciyê biçiyê wê fetih bike.

-Ev hêza we kom kirî berteka li hemberî bêhêziya wî ye?

Serê xwe hejand, bêhêziya bavê xwe anî ber çavên xwe, hinekî sekinî:

-Erê, ez bawer dikim têkiliya wan bi hev re heye. Dema neheqî lê dihat kirin, dijûn dikirin. Ji min re jî digot dijûnan bike. Lê min serî li rêbaza dijûnan neda.

Çawa ku wê dema wan careke din tinebe dipirsî. Lê êdî dema razanê bû. Cihê xewê hatibû amadekirin. Kûçûk çû ser cihê xwe. Apo jî çû odeya xwe. Li ser bernameya xwe ya roja bê hizirî. Pirsên jê hatîn kirin careke din ber bi zaroktiya wî ve biribûn. Dîmenên bavê wî hatin ber çavên wî. Di nava odeyê de çend caran çû hat. Derbasî ciyê destşoyê bû; didanên xwe firçe kirin, piyên xwe şûştin derbasî odeya xwe bû. Serê xwe danî nivîn kişand ser xwe. Baxçeyê gulan yê mêvanê wî behsê kirî ket xeyalê wî. Di hişê xwe de dîmen û neşşeya jiyana li Kurdistanê çêkir. Rûyê wî bi wan xeyalan re geş dibû. Di dilê xwe de got, ew roj niha gelek nêzîk bûye. Wisa bi xew ve çû..

Kûçûk bi dengê banga ji mizgefta nêzîk ji xew şiyar bû. Serê xwe danî dîsa raza. Piştî qasekî Apo ji xew rabû, li eywanê spor kir. Milîtanên li malê jî tev rabûbûn. Hina taştê hazir dikir, hin jê bi karê rojê ve mijûl bûn. Kûçûk jî rabûbû li ber pencereyê li derdor temaşe dikir. Taştê hazir bûbû, dengê Apo ji eywanê dihatiyê. Berê xwe da eywanê çû. Li teniştа Apo rûnişt, biken lê nêrî:

-Hûn li derdora xwe her tim mirovên bedew dixwazin?

-Ez vê bi şer diafirînim. Ez şervanekî bedewiyê me. Yên

bixwazin li derdora min bimînin, di vê çarçoveyê de dikarin bimînin.

Piştî taştê roportajê ji cihê mayê dest pê kir:

-Dayîka we ji bavê we bihêztir bû?

-Wisa bû. Bihêz û serdest bû. Stûyê xwe ji zilam re xwar nedikir û heta dawiyê bi ser bavê min de diçû. Dixist binê kontrola xwe.

Kûçûk serê xwe hejand. Ew kêliya dayîka wî dîtî anî bîra xwe:

-Di kongreya HEPê de ez û wê li cem hev rûniştin. Pir gihîştî bû, xwe biyanî nedidît. Parlementeran destê wê maç dikir. Çawa ku bi sedê salan destê wê hatibe maçkirin wisa bû. Pir rehet bû. Lê dixwazim vê bipirsim, dayîka we ji gelê xwe hes dikir?

Hinekî sekinî, nêzîkbûna dayîka xwe ji yên derdora wan re anîn ber çavên xwe:

-Ne pir.

-Aliyê wê yê têkoşeriyê hebû?

-Pir têkoşer bû, lê cirnexweş bû. Yekî kiş bikira mirîşka wê, dikir sedema şer. Her roj bi bavê min re şer dikir.

-Ev pir xweş e, lewre ev kesayeta we çêdike. Hemsera min digot, ka Mustafa Kemal ji bo Tirkan çi ye, Apo jî ji bo Kurdan ew e. Tu çi dibêjî?

Vê pirsê bala wî kişand, xwest bi awayekî kurtebir cudatiya xwe nîşan bide:

-Mustafa Kemal her tişt bi dewletê dikir. Ez her tiştî bi gel dikim.

-Hûn bi rehetî radizin?

-Razan jî, jiyan jî her yek ji bo min erkek e.

-Hûn ji jiyanê hes dikin, ne wisa?

-Ez niha çil û çar salî me, lê bi kelecana zarokekî heft-heşt salî dijîm.

-Ango hûn xwe weke zarokekî hest dikin. Ev hesteke xweş e.

-Hûn çawa binirxînin, binirxînin, ez mezinbûna bi awayekî din

qebûl nakim. Ez kalbûnê qebûl nakim. Li aliyê din gelekî di rewşa zarokan de heye. Min mezinbûna xwe bi mezinbûna vî gelî ve girê daye.

-Tu ji zarokan hes dikî?

-Heskirin li aliyekî, ez bixwe zarok im. Dinyaya zarokan dinyayeke bedew e. Li wir azadî heye, hevaltî heye, neheqiya mezin nîne.

-Baş e, hevalên te yên şer vê his dikin?

-Min dinyaya xwe ya zaroktiyê û hevaltiyê ji wan re gotiye. Digel ku malbatên me dijberên hev bûn, min rêxistina xwe ya bi dizî ya destpêkê bi Hasan Bîndal re kir.

-Te bi hevalên xwe re henek dikirin?

-Ez hem pir nêzîk im, hem pir dûr im. Bi min re henek dikirin, lê ne her kesî. Ez her tim giran bûm û li dû nîzamê bûm. Hema hema di her civakê de cihekî min yê pêşengiyê hebû. Lê ez pir mûtewazî, pir nefspiçûk, adil û bi kedê ve girêdayî bûm.

-Ev aliyê we pir nayê zanîn. Dibêjin dikare di cih de sed zilamî bikuje.

-Ev ne nêrîneke rast e. Dema min moriyek didît, ji bo ku pê lê nekim, min piyê xwe bilind dikir û niha jî wisa me. Di dinyayê de ji her kesî pirtir ez xwe ji mirin û kuştinê vediçinim.

Kûçûk ne diwestiya, ne jî ji pirsan têr dibû. Kêfa Apo jî ji mijarên dipirsiyan re dihat. Bi taybetî mijarên kesayeta xwe li ser wan ava kirî. Roportajê heta êvarê dewam kir. Êdî dema xwarinê bû...

Roja din serê sibê Kûçûk bedlek li xwe kiribû. Şalgerdena sor û gumlekê spî jî ji bîr nekiribûn. Piştî taştê çûn dibistanê. Li hewşê milîtan tev di merasimê de amade bûn. Apo li pêşiyê bû wî jî yek bi yek destê wan girt. Piştî silavdayînê derbasî cihê rûniştinê bûn.

Milîtan jî li pêşberî wan li ser kursiyan rûniştin. Rûniştin rûneniştin Kûçûk dest bi pirsan kir:

-Hevaltiya te û Kemal Pîr çawa dest pê kir?

-Nîv saetê guhdarî min kir, min çend tiştên giştî gotin. Careke din ji me veneqetiya. Di aliyekî de sîlehşorê me yê destpêkê bû, fermandarê me yê destpêkê bû.

-Hûn heskirinê û jiyanê çawa pênase dikin?

-Jiyana min cewherê vejîna Kurdan e.

-Niha Kurd stirana "Serok Apo" dibêjin.

-Ev nîşana heskirina jiyanê ye, dixwazin ji xwe hes bikin. Dema ji min hes dikin, dest bi heskirina xwe dikin.

-Tu tevlî govedên Kurdan dibî?

-Na. Ji bo min govend siyast e. Lîstika herî bedew siyaset e.

Kûçûk bi bersiva pirsên xwe re, di serê xwe de mijarên dixwestin bipirse zelal dikirin:

-Dema tu hatî vir te Kesîre xanim agahdar kir?

-Na, min biryara derketinê jê re negot.

-Lê pişt re ew jî hat cem we vir.

-Hebet wê were. Di çarçoveya têkiliyên rêxistinê de hat. Ji ber pîvanên rêxistinê min ji ti kesî re negotibû.

-Taybetiyên lîdertiyê pê re hebûn?

-Erê, pir xurt û pir jîr bû. Eger bixwesta dikariya ji her kesî pirtir alîkariya me bike. Lê taybetiyên xwe di aliyê erênî de bi kar neanîn. Têkiliyên me weke jehrê bûn. Ez ji ber wê ji malê reviyam.

-Wê demê di serî de bihevnekirin heye.

-Hem pir mezin bû.

-Digel wî qasî têkiliya we deh salan dewam kir.

-Piştî hingê fikarên polîtîk dest pê kirin. Lê ne ev tenê, min dixwest hevriyekê qezenc bikim.

-Ango hûn zûbizû qut nabin?

-Ez zûbizû ji ti têkiliyan qut nabim û sedema ti qutbûnan ne ez im.

-Baş e, hûn dikarin ji jina we afirandî hes bikin?

-Zehmet e. Emê niha derbasî qanûna civakê bibin. Me xwest biceribînin. Ez li dijî urf û adetin heyî me, lê ez dîsa wan hinekî li ber çavan digirim. Lê tiştên min ji xwe re veşartîn jî hene.

Roj zû derbas bû, wê roportajê piştî şîvê li qata dehan dewam bikira.

Li qata dehan dîsa amadekariya roportajê hatibû kirin. Li pişt Kûçûk her sê al hatibûn danîn. Wî jî lingên xwe avêtibûn ser hev. Apo li pêşber rûniştibû. Mijar li cihekî germ mabû:

-Baş e têkiliya we û Kesîre çawa qediya?

-Li gorî qanûnên têkoşînê qediya. Ji bilî riya siyasî ez têkiliya xwe ji ti kesî nabirim.

-Eger berê hûn prensekî Kurd bûna, wê ji eşîreke din prensesek ji were peyda bibûya.

-Na! Gelek derfetên min hene ku ez xwestekên xwe yên şexsî pêk bînim, lê ez qet qebûl nakim û li xwe nagirim. Hin hişmendî û pîvanên min yên estetîk hene. Ez bi wan ve girêdayî me. Heskirin huner e.

Milîtanên li malê yên jin û mêr bi baldariyeke mezin guhdarî dikirin.

-Baş e wê pîvanên jiyana jin û mêr ya bi hev re çawa bin? Wê jihevcudabûn çawa be?

-Em bêjin nîzama malê, em nebêjin nîzama zewacê. Lê bila şaş fêm nekin, ez li hemberî zewacên niha rêzdar im. Ez ji gelek hevalên me re dibêjim, hin ji we zewicîne, ferq nekirine, hina ji we hev berdaye ferq nekirine. Di rastiyê de di PKKê de rengekî zewacê hatiye afirandin, lê hê ferq nekirine. Mînak, ez ne bi jinekê re, bi

azadiya jinê re zewicîme.

-Baş e hûn bi vî awayî jinê hema hema derdixin asîman.

-Mezinkirina jina hatî xistin karekî bedew e.

Yelçin Kûçûk roportajeke dirêj bi Apo re kiribû û bersiva her pirsê girtibû. Ji ber wê pir kêfxweş bû. Lê got, ezê careke din jî werim. Di nava atmosfereke germ de xatirê xwe xwest.

***

Wê salê bihar zû hatibû Lubnanê. Li çiyayên Berliyasê yên bilind hê sar bû lê biharê konê xwe li deştê û nava bajêr vedabû. Bêhneke xweş ji axê dihat. Mezlum ji Ewropa vegeriyabû. Di pencereya seyareyê re li Şamê temaşe dikir. Rojên borî dianîn bîra xwe. Bayê biharê li eniya wî dixist. Car bi car berçavka xwe radikir paqij dikir. Çend mûyên spî ketibûn pora wî. Diyar bû ku li Ewropa zehmetî kişandiye û bîriya Şamê kiriye. Berî çûna Ewropa pora xwe di milekî de şeh dikir, lê niha bi ser eniya xwe de bardabû. Kêliya dîtina Apo dianî ber çavên xwe:

-Hevalê Siwar, çawa ku cara yekê biçim cem Serokatiyê wisa di kelecanê de me.

-Hevalê Mezlum, bi Xwedê digel ku em li cem jî dimînin, em jî di heman hestan de ne.

-Hevalê Siwar, cara destpêkê dema min dîtî, min li liv û tevgera wî tenê temaşe dikir.

Siwar bê ku bersivê bidiyê bêdeng guhdarî dikir. Mezlum çavên xwe li riya Zahire digerandin, dixwest guherînên çêbûyîn bibîne:

-Vir qet nehatiye guhertin. Rê weke xwe ne. Va em gihîştin malê ev e ne?

-Rast e heval, te qet ji bîr nekiriye.

Mezlum peya bû nebû, bilez berê xwe da qata didoyan. Siwar bi zorê xwe digihandiyê. Bi lêxistina derî re ji wan re hat vekirin. Bi ketina eywanê re dengek hat guhê wî. Çawa ji nû ve zindî bibe deng bandoreke wisa lê kiribû. Dengê Apo bû. Li eywanê sekinîbû, her du destên wî bi şûn ve li ser hev bûn. Rûyê wî jî dikeniya:

-Tu bi xêr hatî Mezlum, tu çawa yî!?

Bi gotina xwe re himbêz kir.

Çawa ku Kurdistan himbêz kiribe, Mezlum wisa kêfxweş bûbû:

-Serokê min, hûn çawa ne?

-Başiya min bi kar dibe. Xebata Ewropa çawa ye, heval çawa ne?

-Hemû jî baş in serokê min, gelek silavên wan hene. Silavên gel jî hene. Pir mereqa we dikin.

Destê xwe danî ser milê wî her du li hemberî hev li eywanê rûniştin. Milîtanên li wir tevan li wan temaşe dikir. Apo hinekî lê nêrî, guherînên pê re çêbûyîn di ber çavên xwe re derbas kirin:

-Gel silavan ji bo riya azadiyê dişînin! Ji bo gelê me îsal sala şer û serhildanê bû. Ji zivistaneke sar û êrîşên dijmin, em gihîştin van rojan.

-Serokê min, gel şerê Başûr dişopîne, dixwazin PDKê nas bikin.

Bi vê gotina wî re rabû ser xwe. Ji qermîçekên li ser eniya wî û awirên wî yên kûr, diyar dibû ku hêrs bûye:

-PDK bi Tirkan re hat ser me, bi awayekî eşkere dijmintiyê dikin. Ev çil sal in şer dikin û bi kurdî diaxivîn, lê di bingehê wan de mirina Kurdan heye. Ji bo çêkirina van Kurdên sexte, dijmin her tiştî dide wan. Ev hemû li ser xwîna şehîdan e û ji ber hebûna me ye. Gelek kes ji min dipirsin, dibêjin, fayde dîtin, yan zerer. Mesele ji wê mezintir e. Divê mirov dijminê di dawa xwe de jî nas bike. Dibêjin, me îro jî têr xwar bes e. Demekê Kurdên Îranê jî kuştin û xwarin li ser xwîna wan girtin. Dijmintiyê di hezar derê de dikin. Ew ne ji bo

Kurdistanê ne. Rast e bi kurdî diaxivin û navê kurdî li xwe dikin, lê ne ji bo Kurdan e. Niha wiha ne, lê paşê hûnê bibînin ka wê çawa wan bişewitinîn. Meselê ne piçûk e, meselekeyeke tarîxî, civakî û namûsa Kurdan e. Lê gelê me dizane ku PKK xeta şer û berxwerdanê ye. Eger PKK di hundirê xwe de bi xwe nelîze ne mumkin e bikeve.

Berê xwe dîsa vegerand serê:

-Gel ji hevalan razî ye?

-Serokê min, gel ji hevalên durist, yên di xeta partiyê de hes dike.

Bi dengekî bilind bangî yên li metbexê û odeyên din kir:

-Heval, tev werin vir, heval ji derve hatiye, baş guh bidinê. Bizanin ka xwestekên gel ji me çi ne!

Yên li malê tev bilez li eywanê kom bûn.

-Sala 1984'an em komeke piçûk bûn. Lê dîsa me bi sebir û xebatê dest bi pêngava pazdehê Tebaxê kir. Taktîk çi ye ne çi ye haya me jê tinebû. 83, 84an em li vê qadê bûn. Salên 80yî jî wisa bû. Pişt re gavên mezin hatin avêtin. Tê bîra min, Adara '85'an em komeke piçûk bûn. Belki jimara me bi qasî we tinebû. Çil-pêncî yan hebû, yan tinebû. Me wisa dest pê kiribû. Wê salê pêngava pazdehê Tebaxê di xeterê de bû. Ka wê bimeşe, nemeşe, ne xuya bû. 81, 82yan me dest bi vegera welat kiribû. Divê hûn bizanin ku dersa we ya bingehî dîroka partiyê û şerê wê ye. Sala 86 an, me amadekariya kongreya 3. kiribû. 85an me hin derb xwaribûn. Me dixwast sebebên wê bizanin. Bi kûrayî em li ser jiyana partiyê sekinîn. Şexsiyeta zarerê dide, ya di xwe de kar kîlît dike, difetisîne, me tev derxistin meydanê. Li vir me gaveke xurt avêt. Bihara 87an jî gaveke mezin bû, lê rêveberiya leşkerî hebû. Lê ew bixwe jî pelişî, li cihê wê sîstema şerê taybet anîn. 87an me jî dest bi pêngavekê kiribû. Ew sal ji bo me jî, ji bo dijmin jî destpêkek bû. Min di nirxandinên Adar û nîsana '88'an de

pir tişt bi awayekî vekirî anîn ziman. Yên di hundirê partiyê de bi jiyana partiyê dilîstin gelek derketibûn. Sala '89'an jî wisa bû. Li ser kesayeta hevalan em sekinîn. Yên seresere nêzîk dibûn erzan wenda kirin. Newroza '90'î dest pê kir. Serhildanên destpêkê çêbûn. Di dîroka Kurdistanê de rûpeleke din vebû. '91'-'92yan jixwe em tev hê di germayiya wê  de ne. Hedefa dijmin ya '92yan tinekirina me bû, hedefa me jî mezinkirina şer bû. Ji bo newroza îsal amadekariyên mezin dibin.

Li saeta xwe nêrî:

-Dema firavînê ye, emê pişt re dîsa biaxivin

Di wê navê re dengê lêxistina derî hat. Sê kes ketin hundir. Yek ji wan xebatkarê nava gel bû. Her duyên din li gorî nota hatî şandin ji bo tevlîbûnê hatibûn. Her du jî bizendûbend û bibejin bûn. Her yekî dikarî du zilaman dayne ser milên xwe bibe. Temenê wan li derdora bîst û pêncan bû. Apo li bejin û bala wan nêrî, derbasî hundir bûn, li hemberî wî sekinîn:

-Hûn ji bo tevlîbûnê hatine. Kîjan komîtê hûn şandine?

Yê li milê rastê dest bi axaftinê kir:

-Ji aliyê komîteya partiyê ya Tarsûsê ve ez hatime.

Yê din jî ji heman cihî hatibû. Ka çawa derbas bûne û bi çi rengî hatine tev gotin. Pir bidiqet li wan temaşe dikir. Hem gelek pirs ji wan kirin, hem li sekin û tevgerên wan pir dinêrî. Ew bixwe jî ne pir rehet bûn. Çavên wan dilîstin. Piştî xwarina nîvro, ji bo hin karên nava bajêr hem Mezlum, hem yên din tev derketin. Li malê Apo, Siwar û her duyên nû hatîn mabûn. Apo li odeya xwe bû. Li eywanê jî Siwar û her duyên din bûn. Her carê yek ji wan radibû, da biçe tiwaletê û bi wê egerê li nava malê digeriyan. Yê bîst û pênc salî çûbû odeya tenişta eywanê. Çavê wî li ser çend klaşînkofan ketibû. Xwe tewand da rahêje yekê, lê zû dev jê berda. Çû eywanê rûnişt. Siwar ji cem rabû, çû ber pencereyê. Carek din vegeriya pirtûka xwe

xwend. Vê carê yê din ber bi aliyê destşoyê ve çû. Yê din jî heta qasekî çavên wî man li ser çekan. Yê din jî pişt wî re hat û her duyan bi hev re li çekan dinêrî. Nedixwestin ji wir derkevin. Her duyan jî, bi çavin biguman hem li hev dinêrî, hem li Siwar.        Siwar rabû ser xwe, di dilê xwe de got, nû hatine, sebra wan rûniştî nayê! Çû cem wan, xwest cihên din jî nîşanî wan bike. Ji wê odeyê derketin. Heta ku derketin jî, çavên wan li ser çekan bûn. Siwar di dilê xwe de got, wisa xuya dike ku ev ji çekan pir hes dikin. Piştî ku nava malê tev nasa kirin, li eywanê rûniştin. Siwar rahişt pirtûka xwe dîsa dest bi xwendinê kir, yên din jî li ser du kursiyên hemberî hev rûniştibûn. Tu bêjî saniyeyekê jî çavên wan li ser ciyekî nedisekinîn; geh li odeya Apo dinêrîn, geh li odeya çek tê de, geh li hev, geh li Siwar. Jixwe haya Siwar ji bayê felekê tinebû. Digel ku berî çend kêliyan çûbûn tiwaletê, yekî ji wan dîsa berê xwe da wir. Siwar di dilê xwe de got, van çi xwariye hinde diçin tiwaletê. Tiwalet û odeya çek tê de li tenişta hev bûn û derî jî vekirî bû. Çawa ku bikeve tiwaletê wisa kir, lê berê xwe da deriyê din. Di wê navê re yê din jî rabû bi wî alî ve çû. Piştî ku ew çû yê din vegeriya. Dîsa rûniştin cihên xwe. Piştî çend kêliyan, vê carê yê din ber bi odeyê ve çû. Yê rûniştî serê xwe xwar kiribû lê dinêrî. Wî jî ferq kir, bê ku bikeve hundir vegeriya cihê xwe. Lê di bin çavan re pir li hev dinêrî. Di wê navê re Siwar çû tiwaletê. Bi çûna wî re yek ji wan ji nişka ve rabû ser xwe. Bi rabûna wî re yê din jî rabû. Li pêşberî hev sekinîn. Li nava çavên hev dinêrîn. Yekî xwest bi çavên xwe peyamekê bide yê din. Her du jî di nava kelecaneke pir mezin de bûn. Her du jî çavekî wan li ser odeya çekan bû, çavê din li ser yê li hemberî xwe bû. Vê carê yê din xwest bi hin îşaretan peyamekê bide yê din. Kelecana her duyan jî qat bi qat zêde bûbû. Ji hev fêm kirin. Her duyan bi hev re li milê odeya çekan nêrî. Di wê navê re hem Siwar ji tiwaletê derket, hem deriyê malê vebû, Mezlum û yên pê re tev ketin hundir. Seyareya wan bibe

hatibû, Siwar li wan nêrî:

-Lez bikin, heval hatin we bibin, hûnê biçin perwerdeyê.

Çawa ku satilek ava cemidî bi ser wan de bûbe, di cihê xwe de hişk bûbûn. Lê neçar bûn çenteyên xwe bigirin ji wir derkevin. Wê pişt re diyar bibûya ku her du kontrayan destpêkê hev nas nekiriye.

***

Li eywana mala li Zahîra Mezlum û Siwar, li cem mêvanên nû hatîn rûniştibûn. Ji bo tevlîbûnê, ji her temenî mirovan berê xwe dida Şamê. Her ku şer dijwar dibû, tevlîbûn jî pirtir dibû. Di nava wan de zarokekî çar salî jî hebû, li eywanê diçû dihat. Çawa ku li mala xwe be wisa rehet tevdigeriya. Dê û bavê wî ji Mezlum û Siwar re behsa hatina xwe ya destpêkê, nedîtina wan ya hevalan, çawa li Şamê mane dikirin. Dayîk bîst û du salî, bav bîst û pênc salî bû. Ji bo tevlîbûnê, hatina xwe ya ji Bakur û rewşa wir bikelecan digotin. Dengê Apo ji hundirê din dihat wan. Dengê wî bihêrs derdiket. Ji ber girtina milîtanan hêrs bûbû. Piştî çend kêliyan êdî dengê wî nehat. Her kes li benda kêliya dîtina wî bû. Di wê navê re derbasî cem wan bû û yek bi yek bixêrhatin da wan. Çavên wî çûn ser malbatê. Gazî zarokê kir û himbêz kir.

-Hûn ji Bakur hatine. Raporên we digihîştin me. Navê te Amed bû. Yê we jî Xelat e. Demek dirêj e hûn dixwazin tevlî bibin.

Berê xwe da zarokê, pê re keniya:

-Tu jî heta vir hatî, wê demê em rê vekin, wê Kurd tev werin!

Hêrsa li ser çûbû, çawa ku Apoyek çûbe yekî din hatibe. Lê şiyarî û hêrsa wî li hemberî

-Wê demê destpêkê hûnê biçin perwerdeyê. Zarok jî wê li cem me be. Emê weke emanetekî biparêzin û bidin xwendin. Çend zarokên din jî yên hevalên me li vir in. Wê nêzîkî min bin, ezê li wan

binêrim û hûnê jî xebatê bikin.

Bi gotina xwe re berken bû:

-Ji bo tevlîbûnê we pir israr kiriye û hûn heta vir hatine. Em nikarin we ji biryara we vegerînin. Lê divê hûn parwredeyeke baş bibînin. Emê paşê li ser cihê xebatê biaxivin.

Xwendin rewşa malbatê hemû ji wan pirsî. Çavên wî bi wan ketibû, mezinbûna şoreşê û belavbûna

Careke in li wan nêrî:

-Tevlîbûna PKK'ê tevlîbûna rastiya jiyanê ye. Hûn ji bo tevlîbûna jiyanê hatine. Daxwaziya we rizgariya ji jiyana kevin e û tevlîbûna jiyaneke nû ye. Emê bi hev re bin. Di nava şoreşê de kar pir e. Mirov durist nêz bibe besî me ye. Bi qasî hêza xwe kar bikin, ne ji wê kêmtir ne jî zêdetir. We li Siûdî jî xebat kiriye, şêwazê xebata me ya wir çawa ye?

Amed xwe bi ser hev ve da:

-Serokê min, xebat li gorî derfetên heyî baş e. Welatparêz pir in. Li wir kar dikin. Lê hê jî şêwazekî bşa yê perwerdeyê rûneniştiye. Lê di aliyê alîkariyê de baş e. Gel şoreşê dişopîne, nêzîkî rêxistinê ne. Pirî wan ji qadên welat cihên şer û tekoşînê hatine.

-Ji bo perwerdeyê emê te rêkin Qabûn. Perwerdeyê dest pê kiriye. Perwredeya leşkerî jî û teorî jî bibîne. Tu bi erebî jî dizanî, tu dikarî ji bo pêdiviyên derve bi hevalan re alîkar bî.

Berê xwe da Xelatê:

Tuyê jî werî cem me. Malên me hemû ji bo perwerdeyê ne. Li cem keçên me bimîne. Hûnê bi giranî dahûrînên rêxistinê bixwînin. Niha heval dikarin we bibin.

Piştî çûna wan bi komên din yên ji nava xebatê hatîn re dest bi suhbetê kir. Heta êvarê dem bi civîn û suhbetan derbas bû. Piştî tevan gazî Mezlum kir. Pirsa Kurdên li Ewropa jê kir. Mezlum pir bikelecan bû:

-Serokê min, gel pir mereqa îsal dike. Hêviya wan ew e ku îsal vegerin welat.

Rabû ser xwe. Qasekî li erdê nêrî, pişt serê xwe bilind kir, çend kêliyan çavên wî li ser xalekê rawestiyan:

-Eger we xwe bigihanda kesayeteke şoreşgerî, niha me welatê xwe azad kiribû. Taybetiya gundîtî û burjuwaziya piçûk ehmeqî ye. Ji bo rehetiya xwe ya rojekê, temenekî feda dikin. Gelek kes li ber bayê xwe dikevin û xwe wenda dikin. Çima wisa dibe Mezlum?

-Serokê min, em pir dereng bi pêvajoyê dihesin.

-Ez pesnê xwe nadim, lê ev tam bîst sal tijî dibin, me nefesa xwe deqeyekê bêwate nedaye. Ev rêbaza serkeftinê ye.

Berê xwe vegerand ser yên ciwan:

-Va hûn ciwan in, lê weke extiyaran xuya dikin. Bila fikir, zikir û kirinên we hev bigirin. Ku wisa bibe hûnê bigihin armanca jiyana bişeref.

Xwe hinekî ji cem ciwanan dûr xist berê xwe da tevan. Serê xwe jî hinekî hejand:

-Ciwantî di heskirina jiyanê de diyar dibe, ez pir caran li we dinêrim, pergala we dinêrim ti têkiliya wê bi jiyanê re nabînim. Divê hûn li ser têkiliya xwe ya bi jiyan û tekoşînê re kûr bikin. Li hev werin. Di serî de bi ruhê xwe re li hev werin, paşê ya girîng jî bi jiyanê re li hev werin…

Piştî ku çû odeya xwe bi deh deqîqeyan, Siwar destê xwe li derî xist ket hundir. Nameyek di destê wî de bû. Piştî saetekê ji odeya xwe derket, gazî Siwar kir. Name hê di destê wî de bû:

-Ev name li ti cihan derng nemaye ne?

-Na serokê min, gotin pir girîng e. Li gorî wê me anî.

-Biçe hevalên me yên din jî hemûyan bîne vir.

-Temam serokê min.

Dîsa ket odeya xwe, derê nameyê vekir, dubare xwend. Her ku

hevokek dixwend, serê xwe bilind dikir. Li dora xwe dinêrî. Awirên wî diçûn ser her tiştê li odeyê, lê fikrê wî çûbû dirêjiya dîrokaTirkiyê. Li ser serhildanên Kurdistanê tevan fikirî.

Roja din serê sibê, zû şiyar bûbû. Di balkona malê de li riya giştî dinêrî. Hinekî çû hat. Roja xwe plan kir. Êdî gihîştibû encamê. Derbarê mijara li ser dihizirî de fikrê xwe zelal kiribû. Berî ku bikeve tevgerê wê mijar bi kesên li cem xwe re para ve bikira. Berê xwe da yên li eywanê.  Yên li wir jî dizanîn ku nameyeke girîng hatiye, lê ka li ser çi ye ti kesî nizaniya. Li pêşberî wan sekinî:

-Turgut Ozal dixwaze li gorî Mîsaqê-Millî, Mûsil û Kerkûkê bi awayekî federatîf bi Komara Tirkiyê ve girê bide. Di vê çarçoveyê de têkiliyên xwe bi Celal Telebanî re xurt kirine. Bi vê armancê dixwaze bi min re diyalogê dayne. Bi rastî ev gavavêtineke dîrokî ye. Bi riya Celal Telebanî xeber ji me re şandiye. Dibêje, em dixwazin agirbestekê bikin. Nêrîna we li ser vê çi ye?

Deng ji ti kesî derneket. Jixwe ti kes ne li benda pirseke wisa bû. Peyva agirbestê jî ji bo wan peyveke nû bû. Hinekî meşiya, careke din berê xwe da wan:

-Gelo ev çi ye? Ji bo çi ye? Armanca dewletê ji vê çi ye? Em bikin yan nekin? Fikrê xwe bêjin, hûn çi dibêjin? Ha, Mezlum tu bêje!

Diyar bû ku ji bersiva pirseke wisa girîng re ne amade ye:

-Serokatî baştir dizane!

Lê belaya xwe ji wan venedikir, ji yên din jî yek bi yek pirsî. Tevan jî hema hema nêzîkî ya Mezlum bersiv dan. Du gavan xwe da paş:

-Divê em bersivê bidin! Niha ezê xwe hazir bikim. Wê serokên hin partiyên kurdî werin. Emê di civîneke çapemeniyê de agirbestê îlan bikin!

Eywan bêdeng bûbû. Her kes mabû şaş; dikirin nedikirin ji navê

dernediketin. Carna li hev dinêrîn, carna li wî. Piştî gotina dawî berê xwe da odeya xwe. Mezlum berê xwe da Siwar:

-Gelek geşedan hene, bi rastî em ne li benda tişteke wiha bûn.

Piştî çend kêliyan dîsa hat eywanê. Li Siwar nêrî:

-Bêsîm amade ye? Divê em xeberê bidin hevalên eyaletan. Em dest bi pêngavekê dikin, divê di şer de ti şaşîtiyan nekin!

Çend gav avêtin dîsa vegeriya:

-Hevalno, şaş fêm nekin, ev tecrûbeyek e. Emê binêrin ka wê çawa be.

Piştî gotina xwe ket odeya bêsîmê. Ew demek bû Mezlum ji Rojhilata Navî çûbû. Her tiş ji bo wî nû bû. Dixwest her tiştî ji nêzîk ve bişopîne. Jixwe mijara agirbestê ji bo wî weke xewnekê bû. Piştî ku hinekî hizirî, rabû ser xwe, hêdîka nêzîkî odeya bêsîmê bû. Xîtaba Apo ya vê carê jê re pir biheybet dihat. Di dilê xwe de got, gelo Serok dixwaze çi bike? Piştî qasekî vegeriya eywanê. Yên li wir tev ketibûn nava kelecaneke pir mezin, xwe nêzîkî Mezlum kirin. Siwar pirs jê kirin:

-Serok ji bo deryayên welat çi digot? Wê şer bê sekinandin? Ango êdî em bi dewleta Tirkan re şer nakin!?

Mezlum bi dengekî nizim bersiv da:

-Serokatiyê ji hevalan re got tedbîra xwe bigirin. Xwe sist nekin û dev ji xwe bernedin! Emê binêrin ka wê çawa be. Çalakiyan nekin.

Li eywanê hem yên ji zindanan hatîn hebûn, hem ji qadên şer, hem ji deverên cuda. Her kes di aliyê xwe de li ser vê geşedana nû bi kûrayê dihizirî. Çawa ku rûpela jiyanê hatibe qulibandin, yekî nû hatibe vekirin, wisa bûbû. Carna jê li ser mijarê nîqaş dikirin, lê bi giranî baweriya wan bi dewleta Tirk nedihat. Diviya bifikar û tedbîr nêzîk bibin. Yên agahiya wan ji şoreşên cîhanê heyî ji yên din re digotin. Bi kurtayî her kes ketibû nava melevaniya fikir.

Roja Apo bi şêwir û axaftina bi eyaletan re derbas bû. Reşayiya

şevê êdî xwe li bajarê Şamê pêçabû. Li ber pencereya eywanê sekinîbû li asîman dinêrî. Wê pêvajoyeke nû dest pê bikira. Pir kûr dihizirî. Dîroka borî, serhildanên Kurdistanê, şkestina wan, lîstikên Osmaniyan û bêbextiya dewleta Tirk, yek bi yek dianîn bîra xwe. Carna jê hişê wî diçû ser qadên şer û rewşa gerîla. Di nava wan hizran de, ber bi destşoyê ve çû; didanên xwe firçe kirin ket odeya xwe. Êdî dema razanê bû. Lê xewa wî nedihat, di dilê xwe de got, sibe ji bo me rojeke dîrokî ye, divê ez xwe baş amade bikim.

Roja din serê sibê taştê weke her car di dema wê de hatibû xwarin. Apo berê xwe da yên li eywanê:

-Ev cara yekê ye emê civîneke çapemaniyê ya wiha girîng bikin. Nêrîna we çi ye?

Şervîn û Rihan jî li eywanê bûn. Ji bersivê wêdetir, Rihan di hişê xwe de dîmenê civînê diafirand. Lê ne ew tenê, her kes bêdeng bû. Tev li bendê bûn ka wê çi bêje. Careke din vegeriya odeya xwe. Çend deqîqe derbas nebûn dîsa hat eywanê. Vê carê çavên her kesî li ser cilûbergên wî bûn. Taximekî reşê xweşik li xwe kiribû. Di bin çakêt de jî gumlekekî spî bû. Çend qerewatên rengên wan ji hev cuda jî di destê wî de bûn. Li pêşberî wan sekinî. Hinekî jî li cilûbergên xwe nêrî:

-Hûn çi dibêjin, kîjan ji van qerewatan li vî bedlî tê? Kîjan xweşik e?!

Her yekî behsa yekê kir. Herî dawiyê Siwar nêrîna xwe got:

-Serokê min, ya şîn û reş xweşik e.

Hemû danîn ser mase, rahişt yekê:

-Ev çawa ye, xweşik e?

Ya wî ecibandî, ji aliyê her kesî ve hat erêkirin. Ji ber ku roja çapeniyê hatibû diyarkirin, hem li Tirkiyê, hem li Kurdistanê, hem li seranserê dinyayê mijar ketibû rojevê. Di Tv. yan de bername li ser bernameyan dihatin çêkirin û nêrîn dihatin girtin. Wî jî hem rojeva

dinyayê hem ya herêmê dişopand. Lê gava mezin, jê dihat xwestin. Kêfa wî jî dihat, lewre mûxateb hatibûn dîtin.   Derbasî odeya xwe bû, ji bo daxuyaniya ku wê bide xwe amade kir.

***

Cejna azadiyê Newroza Kurdan nêz bûbû. Dema mizgînî û jiyaneke nû bû. Li Kurdistanê, bihar bi serhildanan dihat pîrozkirin. Apo roj bi roj her aliyê welat dişopand. Riyên çiya vebûbûn, dema çalakî û pêşvebirina doza azadiyê bû. Rojên wî hemû bi hevdîtin û peyaman derbas dibûn. Komên milîtanan dihatin rêkirin û xebata her qadê dihat plankirin. Barekî giran ketibû ser milê wî, ew jî barê agirbestê û birina dozê ber bi deriyê aştiyê ve bû. Pirsgirêka bûyî girêka kor, gelo wê bi awayekî aştiyane bihata çareserkirin. Ev bûbû hesreta Kurdan. Li çiyayên derdora Bîqayê, kulîlkên Adarê yên weke gangilokên sor, spî û xemrî her der xemilandibûn. Pizîlaqan jî xwe li baniyan dabûn milê hev.

17ê Adarê bû. Li geliyê Bîqayê, kelecana vê carê pir cuda bû. Gelî û çiyayên wê wê bibûna şahidên pêngaveke din ya tevgera PKK'ê. Wî erdî berî hingê jî şahidiya pêngava vegera welat, şerê çekdarî, dîroka Kurdan, koçberiya ber bi erdekî din ve kiribû. Bi hezaran dildar û dijminên tevgerê çavên wan li wê rojê bûn. Li ser riya Berliyasê û di nava geliyê wê de, wê rêwitiyeke din dest pê bikira. Wê qedera Kurdan bihata nîqaşkirin. Dibe ku wê pêngavê di rewşa Rojhilata Navî de jî guhertin çêkira.

Li vî bajarî wê serokê PKKê bi civîneke çapemeniyê agirbest ragihanda. Ji ber wê kelecaneke mezin dest pê kiribû. Ji Tirkiyê û welatên din sih rojnamevan li salona çapemeniyê kom bûbên. Kamerayên xwe tev li ser maseyê li pêşiya Apo rêz kiribûn. Li ser mase ala ERNKê hatibû danîn, li pişt mase jî ala PKKê ya bi das û

çakûç hatibû daleqandin. Sembola Newroza Kurdan û gelên Rojhilata Navî kulîlka kesk, sor û zer jî nehatibû jibîrkirin. Li aliyekî din yê mase desteguleke spî hatibû danîn. Ew jî li pişt kamerayên xwe çawa ku bêhna xwe girtibin, li ser piyan rawestiyabûn. Her gotina Apo ji bo wan pir girîng bû. Li pişt mase pênc kes rûniştibûn; di nêva wan de bi cilûbergên xwe yên fermî, -ku bala her kesî dikişand- simbêlên gurr yên li ser lêvên wî, birhên reşê tarî û bi heybeta xwe Apo rûniştibû. Rûyê wî ji her demê geştir û bedewtir bû.

Li milekî wî serokê HEPê Ahmet Turk û Sekreterê Partiya Sosyalîst ya Kurdistanê Kemal Burkay, li milê din Serokê Yekîtiya Niştimanî Kurdistan (YNK) Celal Telebanî û Serokê Partiya Demokratîk ya Kurdistanê-Hevgirtin Hemreş Reşo bûn. Li pişt wan jî, çend milîtanên PKKê li ser piyan rawestiyabûn. Apo bi hêviyeke mezin û jixwebawer dest bi axaftinê kir.

-Endamên ragihandinê yên hêja, berî her tiştî hûn bi xêr hatine. Em di pêvajoyeke pir girîng de ne. Li ser tewsiyeyên Mam Celal yên hêja, me pêwîst dît ku civîneke wiha li dar bixin. Di roja me ya îro de, ji pirsgirêkên herî giran, yek jê pirsgirêka gelê Kurd e. Ravekirina vê pirsgirêkê deynê stûyê me ye.

Ji milekî ve jî şeqeşeqa makîneyên wêneyan bû:

-Em dixwazin berî gavekê vî şerî bisekinînin û ji vê dozê re çareseriyekê peyda bikin. Kengê be wê ev pirsgirêk bi hevdîtinê çareser bibe. Heta ku leşkerên Tirk êrîş nekin, ji 20ê Adarê heta 15ê Nîsanê bi awayekî yekalî em agirbestê îlan dikin.

Apo bixwe jî hem bikelecan bû, hem gelek bi hêvî diaxivî:

-Ez li mûxatebekî digerim. Êdî em dawiyê li vî şerî bînin. Ev şer ji bo min işkence ye. Eger dewleta Tirk bi erênî bersiva vê niyeta me ya baş bide, wê min jî ji vê işkenceyê rizgar bike. Yê li vê dinyayê herî zêde xwe ji şer vedigire ez im. Pirsgirêkeke me ya qutbûn û

cudabûna ji Tirkiyê nîne. Em dixwazin di nava têkiliyên biratiyê de, di warê leşkerî û siyasî de bi awayekî wekhev tev de bijîn. Eger ev bi destûra bingehî bê misogerkirin, em dikarin têkoşîne xwe derbasî platforma siyasî bikin.

Piştî axaftina wî ya bicewher, rojnamvanan dest bi pirsan kir. Çend pirs û bersiv wiha bûn:

-Li gorî rewşê, dibe ku hûn agirbestê dirêj bikin?

-Niyeteke me ya wisa heye.

-Ma lazim e ileh PKK muxateb be?

Çavên xwe li ser rojnamevanan gerandin. Ew cara yekê bû ku ewqas rojnemevan, li dorê kom dibûn:

-Ji bo Mam Celal û HEP'ê jî nîqaş dibin; dibêjin, wekîl in yan na? Aliyekî vê pirsgirêkê em in.

-Baş e hakimiyeta we li ser gerîla tevan heye?

-Rojane têkiliya min bi wan re heye, teqez wê pêwîstiya talîmatan pêk bînin.

-Di vê biryara agirbestê de roleke Suriyê çêbûye?

-Qet rola wê çênebûye. Heta niha ne erênî ne neyînî Suriyê ji me re tiştek negotiye. Li Suriyê ti riyên vekirî nînin.

-Di ropotajên we yên berî niha de, we Kurdistaneke serbixwe dixwest? Lê niha hûn behsa Kurdistaneke di nava yekîtiya Tirkiyê de dikin, ev ne nakokî ye?

-Li gorî min di navbera wan de nakokî nîne. Serxwebûn, ji gotina peyvekê heta ku gelek di asta aborî, civakî, siyasî û neteweyî de xwe bi awayekî azad bîne ziman, pêvajoyeke wisa di nava xwe de dihewîne. Kurdistaneke bigihe federasyonê dikare ji serxwebûnê re pir bibe bersiv. Bihevrebûna Kurd û Tirkan ne li dijî serxwebûnê ye. Ji ber wê, divê gera me ya ku em di nava heman sînoran de, bi gelê Tirkiyê re li ser bingehê azadî û wekheviya gelê Kurd bijîn, li dijî serxwebûnê neyê şîrovekirin.

Mam Celal, hem li Apo dinêrî, hem li kesên dipirsîn. Apo jî bi awayekî rehet bersiva her pirsê dida. Di her bersivê de rêgezên xwe û daxwaziyên çareseriya dozê di serê xwe de baş dabûn rûniştandin. Kêfa wî pir xweş bû, lê ewqas jî di ferqa nazikbûn û hesasiyeta wê pêngava dîrokî de bû.

***

Piştî agirbestê çalakiyên gerîla rawestiyabûn. Li her deverê amadekariya pîrozbayiya Newrozê dihat kirin. Weke li her çar beşên Kurdistanê li derve jî Newroz dihat pîrozkirin. Li Şamê jî Kurdan Newroz bi kelecaneke mezin pîroz dikir. Êvara Newrozê bû. Apo li Zahîra di odeya xwe de rûniştibû. Dixwest li ser Newrozê peyamekê bide. Lê diviya peyama wî li gorî dîrokîbûna wê be. Lewre Newroz cejna rabûna li hemberî zordestiyê û tevgera azadiyê bû. Kurd bi deng û rengên xwe yên herî bedew wê rojê derdiketin qadan. Rengê kesk, sor û zer li ber çavên wî diçûn dihatin. Hejandina alan û agirê Kawayê Hesinkar yê li deşt û baniyan bilind dibe anîn ber çavên xwe. Li aliyekî jî li ser pêvajoya hatî destpêkirin dihizirî. Bangewaziya di civîna çapemeniyêde kirî kêlî bi kêlî dianî bîra xwe. Destê xwe di nava pora xwe re bir, rabû ser xwe. Hinekî çû hat. Di dilê xwe de got, em ji teqîna fîşeka yekê gihîştin van rojan. Li ber wêneyê Mezlum yê bi dîwar ve daleqandî sekinî. Li çavên wî nêrî û Newroza azadiyê lê pîroz kir: "Hûn in biryar û soza me dayî. Heta niha em li ser soza xwe ne. Em di bin fermandariya we de ne. Pişt re çû ber wêneyê Ferhad Kurtay, Eşref Anyik, Mahmut Zengin, Necmi Oner û Zekiye Alkan. Destê xwe da çarçoveya wêneyan,  bejna xwe li ber wan tewand. Çû ber wêneyê Hakî Karer û Xelîl Çavgun, got, me kar mezin kir û me gavên mezin avêtin. Ji bo bîranîna we me PKK ava kir. Pişt re çû li ber wêneyê Kemal Pir sekinî. Di wê navê

re dengê derî hat, Mezlum ket hundir, qedeha çayê di destê wî de bû, danî ser mase:

-Serokê min, wê gel ji bo Newrozê bê vir.

Hê çavên Apo li ser wêneyê Kemal bûn. Ji ber ku nedixwest axaftina bi Kemal û şehîdên din re qut bike bi serê xwe erê kir. Hê Mezlum jî sekinîbû. Vê carê bi deng axivî:

-Şehîdên me yên zindanê teslîm nebûn. Me jî soz da wan, ku em xwe bigihînin Kurdistanê û bi 15'ê Tebaxê me li Kurdistanê dest bi pêvajoyeke nû kir. Ev jî ji bo şehîdên zindanê bû.

Hinekî meşiya berê xwe da wêneyê Egîd:

-15'ê Tebaxê me li ser bîranîna wî got, ne li cihekî, li her devera welat emê şerê gerîla xurt bikin. Ev soza me ji şehîdên 15'ê Tebaxê re bû. Di salekê de me li her cihî dest bi şer kir û em ketin welat. Şehîdên Botanê bûn şehîdên tolhildanê.

Berê xwe vegerand ser Mezlum:

-Hevalên me yên sala 1988-1989'an li Mêrdînê şehîd bûyîn, şehîdên serhildanan bûn û serhildanan dest pê kir. Sala 1990'an serhildana Cizîr û Nisêbînê dest pê kirin. Serhildan niha li her cihî ye. Karê PKK'ê bi tamamî li ser xwîna şehîdan e. Her ku hevalek şehîd dibe, barê me girantir dibe. Jiyana me bû jiyana şehîdan û Newrozê.

Hinekî meşiya, destê xwe danî ser dilê xwe:

-Şehîd di dilê min de ne û jiyana wan di mejiyê min de ye. Gihîştina min ya vê astê li ser xwîna şehîdan e. Me ji bo mala mezin Kurdistanê gelek şahîd dan. Di rojên wiha mezin de divê mirov bi şehîdan re be. Şehîd şehîdên dîroka Kurd û insaniyeta mezin in. Li her bajarî, li ber her berî şehîdên me hene.

Mezlum hê di cihê xwe de wisa sekinîbû. Berê Apo jî hê li wêneyên şehîdan bû û diaxivî. Piştî qasekî berê xwe da aliyê mase, rahişt qedeha çayê, lê sar bûbû:

-Mezlum vê çayê bibe, lê nerijîne germ bike bîne.

Mezlum yekser berê xwe da metbexê. Birebira çaydanê bû. Ji bo Newrozê jî çend qotiyên şîraniyê ji li ser maseyê metbexê hatibûn danîn. Hêlmeke pir xweş bi ser çaydanê ketibû. Li qedeha di destê xwe de nêrî: “Serok ji min re got, çaya min nerijîne. Ma ezê çawa çaya sar bûyî germ bikim û ji Serokatiyê re bibim? Êê, divê ez nerijînim jî." Hinekî hizirî, li qedeha çayê nerî û kir qurtek bi ser xwe de kir. “Wiha baştir e, min nerijandiye. Evqas çaya germ heye ezê çawa ya sar germ bikim".

***

Roj bi serdan, pîrozbayiya Newrozê û peyaman derbas bû. Êdî dema şîvê bû. Apo ber bi metbexê ve çû. Siwar li ber firaxşoyê sekinîbû. Haya wî ji jê tinebû ku li pişt sekiniye:

-Hevalê Siwar emê çi bixwin?

Hinekî sekinî, nizanî ka wê bersiveke çawa bide:

-Serokê min, xwarina me ya nîvro sogilme maye.

-Temam baş e û bes e jî. Tişteke din çênekin!

Ji wir berê xwe da eywanê. Siwar ku qepaxa beroşê rakir dît ku têra kesekî tenê xwarin maye. Bilez germ kir, bir danî ser maseyê li eywanê. Apo fêm kir xwarin ji bo wî tenê hatiye. Rûnişt dest bi xwarina xwe kir. Siwar û çend kesên din ji bo xwe meqerne çêkirin. Apo sêniya xwe ya vala bir metbexê:

-Haa, hûn xwarina kevin didin min, ji bo xwe jî ya nû çêdikin.

-Serokê min, xwarin kêm bû.

Apo keniya û bilez derket. Yekser berê xwe da odeya xwe. Hem Newroz bû, hem agirbestê dest pê kiribû. Ji ber wê her kesî mereq dikir ka wê peyameke çawa bide. Li ser kursiyê xwe rûnişt, derê lênûsa xwe vekir: “Ji bo Gelê Başûrê Kurdistanê! Newroz, li we

tevan pîroz be! Gelê me ye welatparêz, di Newroz'a '93'yan de ji bo yekîtî û welatparêziyê me hin gavên xurt avêtin. Cara yekê ye ku xebata Bakur û Başûr dibe yek û bi ser dikeve.

Bi Serokiya Eniya Kurdistanîre me gelek civîn çêkirin. Ev civîn ji bo partiyên Başûrê Kurdistanê tevan bûn û encama wan baş e. Ji bo yekîtiyê bi partiyên Bakur re jî me hin civîn çêkirin. Encama wan jî baş bû.

Hûn dizanin; dijmin sala '92'yan dixwest Kurd bi hev bikevin û bikevin xizmeta wan. Me got mana me ya li Başûr ji bo we ye. Şoreşa li Kurdistana mezin xwe gihandiye we. Ev riya serkeftinê vedike. Ev meclis û hukûmeta federal yên we çêkirîn, encama karê sed salî ye. Lê ev serkeftina we di encama serkeftina têkoşîna li Bakur de pêk hat. Heta dijmin xwe neçar dît ku alîkariyê jî bide we.

Serê xwe hinekî ji ser lênûsê rakir, li ser sala borî hizirî. Hinekî sekinî careke din nivîsa xwe domand:

Hedefa dijmin ji şerê Başur û operasyonên di hundurê welêt de tesfiyekirina PKKê û şerê gel bû. Lê xeta PKKê, xeta şer û heta dawiyê berxwedan e...

Hem ev mijar, hem mijarên din bi berfirehî nivîsîn û bi dilxweşî pala xwe da kursiyê xwe.

***

4ê Nîsanê bû. Apo li odeya xwe rûniştibû qenalên tv. diguhertin. Di qenalekê de cejna Xiristiyanan ya bi hatina biharê di destpêka Nîsanê de dihat pîrozkirin. Cejna kîjan gelî bûya teqez pîroz dikir. Pir dixwest bixwe biçe bi wan re pîroz bike, lê rewşa wî derfet nedida. Îsa û dozdeh hewariyên wî hatin bîrê. Di dilê xwe de got, tevgera me jî dişibihe tevgera wî û hewariyên wî. Ew jî li hemberî zilmeke mezin rabûn, li ser me jî faşîzmeke mezin hebû. Doza

dewlet û desthilatdariyê nedikir, em jî wisa ne. Ji bajarê min Rihayê dawet kiribûn lê pêk nehatibû. Divê em vê cejna wan pîroz bikin. Gazî Mezlum û Rûkenê kir:
Her du bilez ketin hundir:

-Mezlum, tu ji Mêrdînê yî, tu Xiristiyanan baş nas dikî. Îro cejna wan e. Tu, Rûken û Nehro li ser navê min biçin cejna wan pîroz bikin. Jixwe Nehro ji Xiristiyanên Midyadê ye û li dêrê jî xwendiye. Bi kurdî, tirkî û Suryanî jî dizane. Di nava me de heta astekê xwe pêş jî xistiye. Desteguleke xweşik jî bi xwe re bibin. Li ser jî bi latînî û erebî li ser navê Partiya Karkerên Kurdistanê cejna wan pîroz bikin.

Ji bo amadekariyê her sê bilez derketin. Li seyareyê siwar bûn, ji bo peydakirina gulan berê xwe dan nava bajêr.

Li dikana gulfiroşan, li gulan temaşe kirin. Rûken li ber qerenfîlêlê sekinîbû, gazî wan kir:

-Hevalê Nehro, ez dibêjim eva spî baş e.

Nehro li gulên din dinêriya:

-Ma çima em ji çend rengan nabin?

Mezlum jî ket navberê:

-Ez dibêjim ya spî nabe, bila yeka sor be.

Rûkenê nêrî ku wê li ser rengan li hev nekin. Gazî gulfiroş kir:

-Ji me re desteguleke xweşik çêke, bila ji her rengî tê de hebin.

Gulên xwe girtin, berê xwe dan bab Şerqî yê diçe taxa Bab Toma ya li nêva Şamê. Gihan ber dêra herî kevin, ya Henaniya. Ji seyarê peyabûn û berê xwe danê û çend pêlekanan ve daketin binê erdê. Dêra ku bi keviran hatibû avakirin, bala wan gelekî dikişand. Kevinbûna wê zêdetirî duhezar salan hebû.
Ji bo pêşwaziya mêvanan, li ber devê deriyê hewşa dêrê çend xort bi awayekî kemberbest rawestiyabûn. Bi rûyekî geş û bi rêzdarî heyeta li ser navê PKKê çûyî pêşwazî kirin. Pişt re yek ji wan ket pêşiya heyetê li nava dêrê gerandin. Li ber wêneyê Meryema El Ezra

(Meryem El Ezra bi zimanê ibrî tê wateya “Abid û xizmetkara Reb”, bi zimanê aramî jî tê wateya pak û paqij) ya di çarçoveyeke mezin de hatî danîn sekinîn. Nehro destpêkê destê xwe li milê xwe yê çepê, pişt re li yê rastê pişt re li eniya xwe da. Meryemê, Îsayê pitik dabû ber singa xwe û bi dilovaniya dayîktiyê serê xwe tewandibû ser rûyê wî yê nûranî. Meryem bi wê bedewiya xwe, bi wê xeml û xalên xwe, bi wê nûra di rûyê xwe de weke kevokeke aştiyê xuya dikir. Ji rengê wê xuya dikir ku li ser erdê hebûnek ne êşandiye. Dayîktî ji her kesî pirtir li wê dihat û dilê wê yê paqij û hestiyariya wê di çavên wê yên şîrîn de diyar dibûn. Dema mirov çav bi wî wêneyî diket, mirov digot, gelo Xwedê çend mirovên din wiha pak, paqij, dilovan û dilevîn çêkirine? Mirov digot wê niha baskên xwe li hev bide, di nava ewran de bifire. Aramiya di wêneyê wê de aramî di dilê mirov de jî çêdikir. Şîrîniya li ser rûyê Îsayê pitik û bedewiya rûyê wê wisa li hev dihatin, mirov nedixwest çavên xwe ji ser wan rake.

Yên din digeriyan lê hê çavên Rûkenê li ser vê jina ji her tiştî berî, rawestiyabûn. Di dilê xwe de got, gelo dibe ku ji ber xirabiya ketî dinyayê çavên te şil bûbin. Mezlum bi şûn xwe ve nêrî. Hêdîka bi şûn ve çû destê xwe da milê wê. Bi hev re xwe gihandin yên din. Piştî qasekî petrîk bi cilûbergên reş ve heyet pêşwazî kir û bi kêfxweşiyeke mezin bixêrhatin da wan. Bi taybetî ku dît yekî Suryanî di nava heyetê de ye, kêfa wî dehqat bû. Nehro xwe hinekî da pêş:

-Petrîkê min, Serok Apo em şandin. Cejna we pîroz dike û pir silavên wî ji we re hebûn. Serokê me dibêje, em di riya Îsa Mesîh de ne. Aliyekî jiyana me yê dişibihe çîroka hewariyên Îsa heye. Hewariyên Îsa xwestin ji zilma Nemrûdan rizgar bibin, ji bo me jî her kêlî tehlûkeya çarmîxkirinê hebû. Dibêje, gotina Îsa ya “Dema yekî zeleyek li rûyê te da milê din jî bide ber,” tê wateya gera mezin ya li aştî û biratiyê.

Petrîk pir ji dil û bi rêzdarî guhdarî peyama Apo dikir. Ji rengê rûyê wî jî diyar dibû ku pir kêfxweş bûye. Li her siyan nêrî:

-Berî her tiştî ji bo peyama serokê we û hatina we ya vir, em spasiya xwe pêşkêş dikin. Silavên min jî lê bikin. Bi rastî xebata serokê we ya perwedekirina kadroyan, dişibihe xebata Îsa. Haya me ji Kurdan û dîroka wan heye. Ez jî diwazim serokê we bibînim û di bernameya min de heye…

Piştî ku vegeriyan, tiştên petrîk gotînû daxwaziya hevdîtinê hemû bi hûrgilî ji Apo re gotin. Ji bo hevdîtinê jî civanek hat amadekirin...

***

Rojên agirbestê pir bilez derbas dibûn. Hem li Kurdistanê, hem li derve nîqaşên li ser pêngavê gelek dihatin kirin. Ji milekî ve Kurdan fikarên xwe yên li hemberî pêvajoyê digotin, ji milê din ve jî kêfxweşiya xwe nîşan didan. Ji her derî nivîskar û siysetmedar dihatin cem Apo û riyeke bê talî ji nîqaş û doza Kurdî re vebûbû. 11ê Nîsanê bû, li pirtûkxaneya qata dehan rûniştibû, rapor dixwendin. Dengê qelebalixê ji eywanê bilind bû. Zanî ku tişteke ne di cih de heye. Rapor danîn, bilez derket, çû wir. Yên li eywanê li tv. temaşek dikirin, rengê rûyê wan ne xweş bû. Bi balkêşê li wan nêrî:

-Çi qewimiye?

Lê berî ku bersiva pirsa wî bidin, wî jî berê xwe da tv. Spîker hê behsa wefata dayîka wî dikir. Yên li wir, her kes li bendê bû ka wê helwesteke çawa nîşan bide. Weke din nizaniyan ka wê çawa serxweşiya wî bikin. Li tv. temaşe kir heta nûçe qediya. Piştî nûçeyê milîtanên jin yek bi yek çûn himbêz kirin û serxweşî danê. Pişt re jî heta demekê neaxivî, di nava eywanê de çû hat. Pir xemgîn xuya dikir:

-Dayîka min gelek baş û gelek bihêz bû. Di ber min de pir zehmetî kişand û her tim ez didam pêş. Kêfa min ji heskirineke erzan re nehat. Bi çend diyariyên piçûk, bi çend gotinên heskirinê nêzîk nebûm. Jê re bûbû hesret, her tim digot, gelo tu dikarî çar metre çiftexas bistînî. Lê min ti carî diyariyeke wisa jê re nebir!

Ev gotin çend caran li ser hev dubare kir. Dema digot, xemgînî û girêdana wî ya bi diya wî ve gelekî baştir diyar dibû. Çawa ku ewrek ketibe ser rûyê wî, wisa xemgîn û tarî bûbû. Yên derdor bêdeng bûbûn, nirxandina wî ya girêdana bi dayîkê ve li gorî xwe şîrove dikirin. Di kesayeta wî de ew girêdana kûr didîtin.

-Lê bavê min Umer gelek feqîr bû, ji min re digot, tuyê xwe di van pirsgirêkan de biêşînî. Dayîka min, bêsînor xwe bihêz nîşan dida. Stûyê xwe ji desthilatdariya bavê min re neditewand. Di kesayeta bavê min de, li hemberî mêran nûnertiya dayîksalariyê ya dema neolîtîk dikir. Eger li hemberî hina min stûyê xwe xwar bikira, yan min bigota were min biparêze, digot biçe tola xwe hilîne. Ev ji bo min diyariya herî mezin bû.

Hinekî çavên xwe danîn ser hev, dîmenê dayîka xwe anî ber çavên xwe. Ka di avakirina kesayeta wî de çiqas rolê wê hebû, dianî ber çavên xwe:

-Mezinbûna mafê dayîkê bi çend gotinan nayê ravekirin. Bêguman rêzdariya li hemberî dayîkê û girêdana bi hiqûqê dayîkê ve, erka her ewladî ye. Wê ev erk ji bo me li pêşiya her tiştî be û emê hewl bidin, bi awayekî herî baş bibin layîq.

Rojên borî yek bi yek dianîn ber çavên xwe, li milîtanên li dora xwe nêrî. Di kesayeta diya xwe de li jinên tevlî refên şoreşê,bûyîn, hemûyan hizirî:

-Nêzîkatiya min ji dayîkê re balkêş, binakok û biwate ye. Eger zarokek bi dayîka xwe re di nava xirecirê de be, ne xerîb e. Lewre bi wê hatiye dinyayê, bi wê cesaret standiye, bi wê gavên destpêkê

avêtine, bi wê navê wî diyar bûye, bi wê fêr bûye, bi wê bexteweriya jiyanê, xemgîniya jiyanê û zewq û êşa nas kirine.

Deriyê balkonê vekir derbasî wir bû. Bayekî honik dihat. Piştî çend kêliyan dîsa vegeriya.

Di wê navê re Agir ket hundir:

-Agir tu hatî?

-Serokê min, me jî agahiya wefata dayîka we girt. Hevalan jî dixwest werin, lê me nehişt.

Bê ku tiştekî bêje, axaftina xwe ya li ser dayîkê domand:

-Serhildana min li hemberî dayîkê dest pê kir. Dema behsa hiqûqê dayîkê dikir, bersiva min jî hebû. Min digot tu hêviya paşrojê nadî min, te çi daye min, heta tu ji min dixwazî. Ji bo min jî digotin, Xwedê ewladekî wiha nede ti kesî. Ne ji ber ku ez bêkêr bûm, ji ber ku ez ne weke wan bûm.

Şêxo şûşeya avê anî danî ber. Wêneyê wê yê nîşana serkeftinê anî ber çavên xwe:

-Piştî pêngava 15ê Tebaxê, dijmin xwest bi zorê gotina, “Kurê min, ma mirov çawa leşkerekî bikuje, çawa li hemberî dewletê şer bike?” bide gotin. Dema roja wê hat, tevlî civînên welatparêzan bû. Heta nîşana serkeftinê da. Ez bawer dikim ev bi îradeya xwe kirin.

Li milîtanên jin nêrî, di dilê xwe de got, ezê vê tekoşînê diyarî dayîkan tevan bikim û heyfa dîroka koletiya jinê di şexsê dayîka xwe de hilînim.

***

Agirbesta 17ê Adarê li Kurdistan, Tirkiye û seranserê dinyayê deng vedabû. Yên erênî jî dinirxandin hebûn, yên neyînî jî. 17ê Nîsanê bû. Mehek di ser agirbestê re derbas bûbû. Her kes li bendê bû ka wê were dirêjkirin yan na. Apo li eywanê bilez diçû dihat. Hizir, fikir û

fikaran xwe lê kom kiribûn. Carna di cihê xwe de disekinî, gotinên ku wê bêje di hişê xwe de dibijartin. Xwe ji bo axaftineke bihêz amade dikir. Carna bi gavên hûrik meşiya. Çû ber destşoyê kulmek av avêt ser çavên xwe. Çavên xwe li peşgîrê gerandin. Li kêlekê şervanekî ciwan peşgîr danîbû ser çengê xwe

-Kerem bike serokê min.

Pêşgîr ji destê wî girt, rengê rûyê wî ne xweş bû:

-Bi vî rengî xizmeta ti kesî nekin, bila li cihê xwe be ez dibînim. Divê ji ti kesî re hûn koletiyê nekin.

Rûyê xwe ziwa kir, ber bi odeya xwe ve meşiya. Bedlê xwe yê reş û gumlekekî spî deranîn li xwe kirinn. Hinekî li wan temaşe kir: "Ji bo gelê xwe emê vê gavê jî biavêjin. Ji bo rawestandina vê xwînê çi pêwîst be emê bikin." Li qerewata berê di civîna yekê ya agirbestê de girê dayî temaşe kir. Ew danî çendên din dan ber bedlê xwe. Ji nava hemûyan yeka bi xetên kesk, sor û zer neqand. Qerewata xwe jî girê da derket eywanê. Berê her kesî lê bû. Mezlum xwe nêzî Siwar kir:

-Dihêje ku serokê me bibe serokê cîhanê, ma çiqas ev cil lê tên.

Li pêşberî wan rawestiya:

-Emê îro pêngava xwe temam bikin. Divê ez kêştiya şoreşê bigihînim cihê layîqî gelê me.

Siwar xwe nêzîk kir:

-Serokê min mêvan hemû amade ne, li benda we ne.

-Temam em derkevin, dema çûnê ye.

Apo, Siwar û mêvan derketin. Yên li eywanê di nava coşeke mezin de bûn, çawa ku kêştiya xelasiyê ji wir derketibe, ji çolê ber bi deryayê ve çûbe.

Seyare dîsa ketibû ser riya Berliyasê. Meha Nîsanê bûka salê geliyê Bîqayê kesk kiribû. Apo hêviya gel di dilê xwe de baş tomar kiribû. Malbatên dihatin serdana wî dianîn bîra xwe. Pencereya

seyareyê hinekî vekir. Bayê biharê li rûyê wî xist. Li gelî temaş kir: “Divê dawî li vê êşa Kurdan bê. Divê birîna wan ya dîrokî derman bibe.” Li ser pêvajoya agirbesta dest pê kirî hizirî. Ketibû wê ferqê ku vekirina deriyê çareseriyê jê re maye. Ji xwe bibawer bû. Newrozê hêvî dabûyê, dilê Kurdan li cem lê dixist. Dizanî ku çav, dil û hişê her kesî li cem e. Siwar Stirana Aslîka Qadir danî ser. “Welatê me Kurdistan e, cih û meskenê me Kurdan e. Welat ji me re ruh û can e, millet hemû bira ne. Cih û mesekenê me Kurdan e. Temam bax e û bostan e. Welat gul e gulistan e.” Apo jî pê re serê xwe dihejand. Siwar hinekî din dengê wê bilind kir. Gotina "Milet hemû bira ne.” Pir ketibû dilê Apo û li gorî sefera wî jî bû. Stiranê dewam dikir: “Welatê me pir şîrîn e, mêrg û çîmen û zevî ne. Qîz bûkên wê tev cindî ne. Eslê xwe de Horî ne. Kurdistana me zeynet e, cim'eta wê pir hurmet e. Temam qedr e û qîmet e. welatê me cennet e.”

Li Berliyasê li ciyê civînê her kes li benda Apo bû. Bi ketina wî ya hundir re, tevger û kelecanê dest pê kir. Hê negihatî pişta mase şeqeşeqa kamerayên rojanamevanan dest pê kir. Bilez berê xwe da pişta maseyê bi ala ERNK û PKKê hatî xemilandin. Piştî ku çend kêliyan li rojnamevanan nêrî, li cihê xwe rûnişt. Li teniştên wî dîsa serokê HEPê Ahmet Turk, Sekreterê Partiya Sosyalîst ya Kurdistanê Kemal Burkay, Serokê Yekîtiya Niştimanî Kurdistan (YNK) Celal Telebanî û Serokê Partiya Demokratîk ya Kurdistanê-Hevgirtin Hemreş Reşo rûniştin. Mêvanên ji bo hevdîtna wî çûyîn, ew jî tevlî civînê bûbûn.

Bi rûyekî pir geş û kelecaneke mezin dest bi axaftinê kir:

-Endamên çapemeniyê yên hêja, berî her tiştî bixêrhatina we dikim. Berî niha nêzîkî mehekê me agirbest ragihandibû. Berî her tiştî vê hewldana agirbestê rê ji encamên girîng yên dîrokî re vekiriye. Agirbesta me ragihandî, pêvajoyeke nû daye destpêkirin. Tişta ku ji me tê xwestin, hinekî din kûrkirina vê pêvajoyê ye.

Bêguman berpirsiyariya me giran e. Gelê Kurd di demeke herî zehmet ya dîrokê de derbas dibe. Di binê zordestiyeke pir giran de ye. Zordestiya tê kirin xwe gihandiye qirkirinê û hê dewam dike. Rewşeke me ku em ji ber xwe êrîş bikin tinebû. Tiştên me kirîn tev ji bo hebûna xwe ya neteweyî, vekirina riyên pêşxistinê bûn. Di vî warî de em derfetekê bi dest bixin. Ji ber ku ti riyên din ji me re nehatibûn hiştin, me dest bi têkoşîna çekdarî kir û me anî vê merheleyê.

Li aliyekî diaxivî, li aliyekî jî dîmenên hovîtiya hatî kirin, weke şerîta fîlmekî di ber çavên wî re derbas dibûn:

-Pirsgirêka Kurd, di rastiyê de, pirsgirêka Kurd û Tirkan e. Têkoşîna me hatiye rewşe ku raya giştî ya tirk û derdorên fermî yên Tirk nasnameya Kurdan qebûl bikin. Êdî hebûna Kurdan qebûl dikin û xwe mecbûr dibînin ku pirsgirêkê çareser bikin. Ji me jî dixwazin ku em rewşê aram bikin. Me niyeta xwe ya baş nîşan da û ev bi ser ket. Bi taybetî di vê pêvajoya Newrozê de yek gule tenê nehat avêtin û di nava mehekê de yek leşker tenê nehat kuştin. Lê hêzên Tirk yên şerê taybet bênavber operasayonên xwe domandin. Sih gerîla û ji gel jî yazdeh, bi giştî çil û yek kes kuştin. Digel vê me agirbest xirab nekir.

Li alên li pêşiya xwe temaşe kir. Kesên li derdor bi baldarî guhdarî dikirin:

-Em nêrîna xwe ya niha diyar dikin. Em alîgirên kûrkirina vê pêvajoyê ne. Em dikarin bi hin şertan heta daxuyaniyeke din agirbestê dirêj bikin. Berî her tiştî agirbest yekalî nabe. Ji bo wê, divê operasyonên ji bo tinekirinê rawestin. Divê dawî li zora li ser gel, girtin û kuştinên kiryar nediyar bê anîn. Ji bo agirbestê bi kurtayî van dibêjim.

Neqebeke teng ji siyaseta tinekirinê û riya çareseriyê, hatibû pêşberî wî. Dixwest bi nêrînên zelaltir vê mijarê bi cîhanê jî bide fêmkirin:

-Eger operasyon bêsînor dewam bikin, emê jî mafê xwe yê parastinê bi awayekî herî xurt pêk bînin. Ez dixwazim vê jî bêjim; ji bo daketina gerîla ji çiyayan, daxwaziya hukumetê heye. Hêzên li çiyayan, ji bo armancên siyasî dev ji her tiştî berdane li çiyayan dimînin. Ji bo hebûna neteweyî û çareseriya azad li wir in. Eger ev armanc pêk werin û bingehê wê bê amadekirin, wê pirsgirêka hêzên çekdar yên li çiyayan bi hêsanî çareser bibe.

Dema behsa hêza çiya dibû, bala rojnemevanan gelek dikişand. Çavên wî ketin ser destegula rengûregî ya li ser mase. Serê xwe rakir:

-Xaleke din, divê operasyonên li hemberî gel jî bên rawestandin. Ya sisiyan, divê lêborîneke giştî bê derxistin. Em xwe sûcdar nabînin, lê em berdana girtiyan dixwazin. Weke din em li bendê ne ku hin mafên çandî bên dayîn. Bi kurtayî divê zimanê kurdî azad be. Gundiyên ji gundên wan hatîn derxistin, divê li gundên xwe bi cih bibin. Divê rewşa awarte bê rakirin. Ji bo çareseriyê em jî ji bo cerdevanan lêborînê radigihînin. Ango eger çekên xwe daynin, em destê xwe nadin wan. Divê rêxistinên Kurdan bibin qanûnî. Piştî hingê gava ku bê avêtin naskirina nasnameya Kurdan bibe qanûnî. Ev tev tên wateya ku di riya federasyoneke demokratîk de gav tên avêtin.

Bi vê gotinê re her kes rabû ser xwe. Piştî daxuyaniyê gelek pirs hem ji wî, hem ji serokên partiyên din hatin kirin.

Li Tirkiyê agirekî ji nêrînan bilind bûbû. Lê diviya heta dawiyê ji bo dozê riya heyî bişopîne. Piştî civînê siwar bû, çûn xaniyê Berliyasê. Hê jî dilê wî nereht bû, fikarên wî ji wan êrîşan û nêrînên li Tirkiyê pêş diketin hebû. Li dora xwe nêrî, milîtan jê bi hêvî bûn. Pêngava agirbestê ji bo rawestandina şer ji bo her du gelan gelek li ser hizirîbû. Lê rewşa heyî jî baş dişopand. Avek vexwar. Çawa ku çaxek li pişt xwe hiştibe, ketibe çaxekî din. Li berliyasê hinekî nêrî,

rojên xwe yên destpêkê anîn bîra xwe. Ew roj û rojên tê de didan ber hev. Pêvajoyeke bilez hatibû destpêkirin. Wî bixwe jî di her milî de dixwest li ser serdest be û bike xizmeta aştiyê.

***

Du roj di ser civînê re derbas bûbûn. Weke li her derê, Kurdên li Şamê jî li benda daxuyaniyeke Apo bûn. Şêxo û Siwar li Ruknedin bûn. Her yek bi aliyekî ve çûbû, yên biçûna civînê kom dikirin. Selah jî ji aliyê din ve çend kes dianîn. Li mala Şêxo rûniştibûn. Yadê Nûfa jî di nava wan de bû. Her ku pêşketinek çêbûya berê xwe dida Şamê. Vê carê jî ji ber agirbestê û nîqaşên dibûn, berê xwe dabû wir. Dayîk li dorê kom bûbûn. Ew jî weke firîşteyekê, bi xavik û kofiya xwe yên spî di nîvê wan de rûniştibû. Çavên xwe bi kilê subhanî kil kiribûn. Şanikên li ser eniya wê û erzeniya wê hê baştir xuya dikirin. Di dilê xwe de got, Xwedê tu rojekê li rûyê gelê me jî binêrî, bidî xatirê şehîdên me û vê dozê çareser bikî. Yên li wir di nava xwe de nîqaş dikirin. Dengê yekî bilind bû:

-Êdî şer nema, lê wa Tirk qet ranewestiyane, me got aştî, lê wan gavek neavêt. Ma wisa dibe, heta em sax bin emê li hemberî zilma Tirkan şer bikin. Em ji şer re jî hene ji aştiyê re jî!

Li quncikê jî dengek bilind bû:

-Eger Tirk bersiva agirbestê nedin, em hemû berê xwe bidin Tirkiyê, biçin şer! Ya me fêm nekirî ferderesyon e. Ma emê gavan paş ve biavêjin?”

Dayê Nûfa, kurê xwe yê destpêkê şehîd bûyî anî ber çavên xwe:

-Min çar zarokên xwe di vê rê de dane. Kêliyekê jî bi min re dudilî çênebûye. Lawê min Semîr, sala 1985an li Akademiya Mahsum Korkumaz şehîd bû. Li wir min fêm kir ku şoreş bê bedel nabe. Mistefayê min, 1987an dema li Cûdî şehîd bû, min fêm kir ku

ev doza Kurdistanê ye, û ne tiştekê hêsan e. Wê di gelek seradan re derbas bibe. Dema, Usam, sala 1990î li Çelê şehîd bû, min zanî êdî emê gelek xwînê bidin. Niha jî Orhanê min, ev salek e gerîla ye. Em çiqas bixwazin aştî çêbe jî, ne bi qasî Serokê xwe emê bixwazin. Ew bi qasî serê derziyê rê bibîne wê vê dozê çareser bike. Çi jî gotibe ji bo dozê û xwîna şehîdên me gotiye. Her roj me dibîne, bi qasî me li ser şehîdan xemgîn dibe. Bila dilê we rehet be, kes ne bi siyasetê, ne bi şer, nikare Serokê me. Em û Serokê xwe tenê ne, Serok dixwaze şer raweste, lê dinyayê xwe kerr kiriye.

Şêxo gihatibû gotina wê ya taliyê, bikelecan çû destê wê maç kir:

-Dayê, tu rast dibêjî, Serokê me bi şev û roj dixebite, şer bibe, nebe jî wê ji bo azadiya Kurdistanê her tiştî bike. Ti kes pê nikare, ne fenê Tirkan, ne jî bêbextiya wan nikare Serokê me!

Piştî hatina Siwar êdî anîna gel qediyabû. Her kom bi seyareyekê hat şandin. Ew jî herî dawiyê derketin, berê xwe dan Zahîra.

Ji bo ragihandina naveroka civîna çapemeniyê, li mala Zahîra amadekarî hatibû kirin. Wê ji her devera Suriyê berpisên kar bihatan. Apo li ser kursiyekî rûniştibû, mîkrofon li ser mase hatibû danîn. Li pişta kursî jî ala ERNKê hatibû bicihkirin. Vê carê bi pantolonekî reşê kitanî û gumlekekî bidamik hatibû. Weke her carê, berî axaftinê li hundir temaşe kir:

-Gelê me yê welatparêz, dostên me yên birûmet! Di binê Serokatiya PKK'ê de, di şerê me yê neteweyî de, me dest bi pêngaveke nû kir. Ev pêngava agirbestê bû. Me bawerî pê anî û wê di nava gelê me û dinyayê de tiştên pir baş çêbin. Me ev gav li ser hêza xwe, xebat û şerê me dayî meşandin avêt. Berê dijmin digot, lewaz bûne, lê hûn hemû baş dizanin ku me destpêka 1993'yan şer mezin kir û serhildana gel jî di vê Newrozê de bi ser ket. Ev gav ne li ser lewaziyê, li ser bawerî, mezinbûn û serkeftinê ye. Yên li hemberî me digotin, em dixwazin gavekê biavêjin lê şerê PKK'ê nahêle.

Firsendê nadin me. Yên dinyayê jî digotin, ev terorîst in û ev propagandaya dijmin bû. Me xwest nîşan bidin ka yên firsenda siyasî nadin kî ne? Yên terorîst kî ne? Li ser vî bingehî me ev gav avêt.

Gotinên wî dilê kesên li hundir rehet kiribûn. Ji hevoka pêşiyê fêm kiribûn ku tişta ew fikaran jê dikin, wî hesabê hemûyê kiriye.

-Berê digotin PKK ji şer pêve tiştekî nizane, lê niha yên şer disekinînin, dixwazin siyasî kar bikin em in. Yê ji aştiyê dûr dijmin e. Yê ji bo kar û xebata siyasî firsendê nade dijmin e. Wê niha her kes bibîne ku dewleta Tirk li hundirê welat û dervayî welat ketiyê tengayiyê û nikare ji vê tengayiyê derkeve.

Berê her kesî lê bû, di çavên wan de hêvî didît. Di dilê xwe de got, çawa be emê vî dijminî bînin rê:

-Ev gava min avêtî, ji hemleya şer pirtir bandor li dijmin kir. Bixwe dibêje em ketin halekî pir teng, emê çawa jê derkevin. Ji bo wê piştî mehekê me li ser van şertan agirbest dirêj kir.

Ji bo ku baş bibînin, yên li dawiyê rabûn ser xwe.

1-Divê dev ji siyaseta tinekirinê û operasyonan berdin. Divê girtin û kuştin bi dawî bibin.

2-Divê hukumet girtiyên me tevan berde û rewşa awarte bê rakirin.

3-Divê zora li ser çand û zimanê kurdî rake.

Ev gotinên wî bi dilê her kesî bûn.

-Eger ev daxwaziyên me pêk werin emê karê xwe di nava aştiyê de bidomînin. Eger pêk neyên, emê ji berê xurttir şer bidomînin. Bi vê pêvajoyê mecalê karê siyasî û imkanên dîplomasiyê xurt bûn. Girseya gel duqat bû. Li cîhanê dostên me zêde bûn. Li Bakur, Başûr, Rojhilat û Rojava gelê Kurd di aliyê yekîtiyê de xurttir bû û partiyên Kurdan dixwazin di binê sêwanekê de bên gel hev. Em bawer dikin wê di demeke kin de ev jî pêk were. Lê hin tiştên ne di cih de tên gotin. Dibêjin, em bi ferderasyonê ji serxwebûnê dûr

dikevin. Ev ne rast e, em ji serxwebûnê dûr nakevin. Federesyon ne li dijî serxwebûnê ye, ne tam serxwebûn be jî, ji bo serxwebûnê gaveke mezin e. Di dema niha de li Kurdistanê û Rojhilata Navî rewş wiha ye.

Hişmendiya serxwebûn û federasyonê bala wan gelek kişandibû, çavên wan li ser rawestiyabûn. Hina di ber re not jî digirtin. Wî jî bi awayekî zelal gotinên xwe domandin:

-Dibêjin di agirbestê de wê gerîla ji çiyê dakeve. Na, ne wisa ye. Gerîla ji çiyê danakeve û çekên xwe danayne. Eger gerîla dakeve wê dijmin roja din li her derê dest bi şer bike. Wê yên xayîn jî şerê gerîla bikin. Wê dijmin çiyayan tevan bigire. Heta serxwebûn û azadî pêk neyê, gerîla ji çiyayan danakeve. Ji bo armancên mezin em derketin çiya û heta mirinê jî emê li çiyayan bin. Xurtkirina karê siyasî nayê wateya paşxistina karê leşkerî. Emê karê xwe yê leşkerî, siyasî û dîplomasiyê bi hev re bikin.

Çavên xwe li ser tevan gerandin. Dizanî ku bi hezaran kes li benda wê axaftina wî ne. Di şexsê wan de dixwest bi cîhanê bide fêmkirin:

-Dîsa dibêjim, di binê Serokatiya PKKê de Kurdistan ava dibe. Yekîtiya gelê Kurd û partiyên welatparêz dibin yek. Ji her aliyê Kurdistanê Kurd hev digirin. Netewebûn jî mezin dibe. Ev destkeftinên nû ne û bi xebat û têkoşîna çekdarî çêbûne. Ji niha pêve emê bi xwe û bi hev nelîzin. Dîsa ez bawer dikim em di riya serxwebûn û azadiyê de, girêdayî şehîdan, berxwedana zindanan û serê çiyan dimeşin. Ji niha pêve jî emê bimeşin. Emê bi ser bikevin. Li ser van gavên mezin em we pîroz dikin, silav dikin, di xebata we de serkeftinê dixwazin.

Bi van hevokên dawiyê re civat bi hev re rabû ser piyan û dengê çepikan bilind bû. Ew jî tevlî çepikan bû. Ji bo wî ev temamkirina daxwiyaniya hatî kirin bû. Di şexsê wan de wê ev deng bigihîşta her

derê. Xebatkar û yên din, bersivên dixwestin girtibûn. Piştî civînê bi hev re şîv xwarin. Lê suhbetê heta nîvê şevê dewam kir.

***

Dayê Nûfa li eywana qata dehan rûniştibû. Çend jinên din jî li kêleka wê bûn. Ebû Ehmed û Qadir li kêleka din li ser piyan bi hev re diaxivîn. Qadir bi zor û zehmetiyeke pir mezin komek şervan ji Amanosê derbasî Rojava kiribûn. Ebû Ehmed jî ji aliyê Cizîrê komek bi xwe re anîbû. Ji ber wê pir westiyabûn. Ebû Ehmed gazî Şervînê kir:

-Ez dikarim li metbexê çigareyekê bikişînim?

-Belê tu dikarî, lê pencereyê veke. Serokatî pir hesas e zû bêhêna çigareyê dike.

Ebû Ehmed çû metbexê. Hinekî hizirî, li pakêta cigareyê temaşe kir: "Hema lanet li te be, pa bi Xwedê madem ku Serokê min ji te hes nake, ez jî êdî te nakişînim." Pakêt avêt nava qotiya gelaş. Ji berîka xwe lênûsa xwe derxist, li pirsên gel yên di lênûsa xwe de nivîsîn temaşe kir. Pirs hemû li ser agirbestê bûn. Dayê Nûfa jî notên bi xwe re derxistin dan Şervînê:

-Keça min, ev yên bi min re ne. Yên din jî wê dayîk bi xwe re bînin.

Hê ew diaxivîn, Apo ket hundir:

-Merheba ji we re, hûn bi xêr hatine.

Dayîk hemû rabûn. Yek bi yek Apo himbêz kirin. Piştî ku kêfxweşî li hev dan, rûniştin. Apo li hemberî dayîkan hem rêzdar bû, hem rûyê wî biken bû:

-Va hûn dibînin ka kar çawa diçe. Cihên hûn jê hatîn gelê wir çi dibêje?

Dayê xwe berdevka dayîkên hatîn tevan didît û ji ber ku dayîka

sê şehîdan bû wan jî wisa didît û ji xwe re dikirin mînak:

-Serokê min, gel dibêje ti wateya agirbestê nemaye. Tiştên we di civînê de gotîn me ji gelek kesan re gotin. Baweriya wan bi we tê, lê siyaseta Tirkan dibînin, ji wan bawer nakin. Dibêjin, dirêjkirina agirbestê bi çend şertan ve hatibû girêdan, dewleta Tirk yek tenê jî pêk neaniye. Çima PKK agirbestê yekalî dike?

Serê xwe hejand, ji aliyekî ve jî kêfa wî ji şiyarî û pirsên gel re hatibû:

-Gel rast dibêje. Dijmin operasyonên xwe zêde kirine, komkujî, işkence, roxandin û şewitandina gundan dewam dike. Gundiyan bi darê zorê koçber dikin. Heta ji berê pirtir dikin. Qanûnên sepandina teslîmbûn, xurtkirina sîstema cerdevaniyê û xiyanetê derdixin. Bi kurtayî bersiva agirbestê bûye êş û rondikên çavan.

-Serokê min, haya min ji aliyê Bakur jî heye, dibêjin, tîmên taybet yên lêxistinê û komandoyên bi taybetî hatîn perwerdekirin bênavber dişînin Kurdistanê. Dibêjin ji gel û gerîla bi dehan kes hatine kuştin.

-Ew agahî jî rast in. Çiyayên Kurdistanê bênavber tên bombekirin. Herî dawî li Amedê 15 gerîla bi awayekî hovane hatin şehîdkirin.

Dayê ket navberê, gelek hêrs bûbû:

-Serokê min, vê hêrseke mezin bi me re çêkiriye, her roj zarokên me dikujin. Êdî sebra me nemaye.

-Mafê we heye. Pêvayoya ji aliyê PKKê ve hatî destpêkirin, ji aliyê dewleta Tirk ve hatiye bidawîkirin.

Piştî vê axaftinê berê xwe da Qadir:

-We karê xwe çawa kir, we heval tev bi saxlemî derbas kirin? Niha karê me heye, emê paşê biaxivin.

-Rast e serokê min, me birin. Ji wir ve jî qasidan komek anîbû me bi xwe re anîn vir.

-Emê di demeke nêz de hin daxuyanî bidin. Em vê zilma li ser

gelê xwe qebûl nakin…

***

Bi germa havînê re şerê li welat jî germ bûbû. Diviya êdî li hemberî hovîtiya dewleta tirk helwestek bê diyarkirin. Heştê Hezîranê bû. Apo ketibû ser riya Berliyasê. Dîsa civîna çepemeniyê hebû. Wê derbarê agirbestê de daxuyanî bida. Agirbesta 17ê Adarê hatî ragihandin, hatibû dirêjkirin. Lê ji ber ku operasyonên dewleta Tirk ranewestiyabûn, agirbest ketibû xeterê. Weke her du carên berê bedil li xwe nekiribû. Destek cilên xakî li ber bû û zendûbendên xwe pêçabûn. Bilez ket hundirê salona civînê, yekser berê xwe da pişta maseyê axaftinê. Li ser mase gelek mîkrofon û cîhazên denggirtinê hatibûn danîn. Li pişta mase jî ala ARGKê hatibû daleqandin. Vê carê ji serokên pratiyan ti kes tinebû. Di dilê xwe de got, wisa xuya dike ezê bi serê xwe vê kêştiyê bibim qefê. Her kes di mereqê de bû ka wê çi bêje.

Mîkrofon nêzîkî devê xwe kir:

-Me xwest agirbestê bikin bingehê geşedanên girîng yên siyasî. Lê hukumetê bi taktîka lêxistina derbê bersiv da û ji bo geşkirina şer biryarname derxistin. Ev bêşansiyek e. Li şûna ku bersiveke rast bidin daxwaziyên me, ji bo tesfiyekirina me serî li her rêbazê dan. Bûyera li Çewlikê jî di encama vê de çêbû. Halê hazir li 10-15 eniyan şer dewam dike. Rewşa li Kurdistanê ji ya Bosna-Hersek, Azerbeycan û Qeredaxê pir girantir e.

Li aliyekî dîmenên di wan şeran de dihatin parvekirin dianîn ber çavên xwe, li aliyekî jî heyfa xwe li wê firsenda dîrokî dianî:

-Hukumetê xwest nîşan bide ku me ji ber lewazbûna gerîla serî li agirbestê daye. Lê ne wisa ye. Me got gelo li şûna têkoşîna leşkerî emê nikaribin bi têkoşîna siyasî ji bo gelên xwe riyeke çareseriyê

vekin. Me agirbest bi wî awayî nirxand. Lê hukumetê bi têgînên "Poşmniya Bişeref", "Teslîmbûna Bişeref" bersiv da niyeta me ya baş. Li dinyayê teslîmbûneke bişeref nîne. Her teslîmbûn bêrûmetî ye. Hûn nikarin zarokan jî bi vê rêbazê bixapînin. Digel ku em qet naxwazin, lê em neçar in serî li têkoşîna çekdarî bidin. Piştî niha wê aliyê leşkerî pêş bikeve. Ji ber wê êdî ti wateya agirbestê nemaye. Ev ji bo me jî ji bo gelan jî pir zor e, lê pirsgirêka hukumetê ye ku pirsgirêkan çareser bike.

Hinekî sekinî, ji bangewaziyên Tirkiyê yên teslîmbûnê pir hêrs bûbû. Destê xwe avêt şûşeya avê hinek vexwar. Ji germa zendikên xwe jî hinekî hildan. Peyama Ozal hemû anî bîra xwe:

-Ez dixwazim vê jî bêjim; Birêz Ozal di dawiya temenê xwe de peyameke wiha şandibû; "Ez dixwazim pirsgirêka Kurd çareser bikim. Gelo wê PKK hinekî nerm nebe? Wê di vê mijarê de hin gavan neavêje? Wê firsendê nede?" Me jî xwest bi agirbestê bersiva peyama wî bidin. Lê diyar e ku Demirel û Inonu dixwazin pirsgirêkê bi rêbazên berê çareser bikin.

Peymana Lozanê hat bîra wî. Di dilê xwe de got, hê jî heman siyaseta tinekirinê li hemberî Kurdan didin meşandin:

-Mûxatebê agirbestê Ozal bû, lê hê di ser civîna me ya çapemeniyê re rojek derbas nebûyî ji nişka ve mir. Berî ku bimire gotibû, bixeter jî be ezê îro piştî nîvro çend gavan biavêjim. Lê firsenda nedît. Û vê mirina wî pêşiya pêvajoya me xwestî pêş bixin hinekî girt.

Çawa ku mirina Ozal ji bo wî cihê gumanan bû, ji bo rojnamevanan jî cihê pirsê bû. Xwest li ser kesayeta Ozal hinekî raweste:

-Ozal li dijî me bi awayekî pir dijwar şer kir. Lê dawiyê fêm kiribû ku pirsgirêk bi riyên leşkerî çareser nabe. Li gorî min wê gavên biwêrekî biavêtan. Mixabin bi mirina wî ev şans ji dest çû.

Pênûsa rojnemevanekî ji destê wî ket. Çavên wî li ser rojnemevan rawestiyan. Piştî ku pênûsa xwe rakir, wî jî axaftina xwe domand:

-Ji xirabûna agirbestê ne em berpirsiyar in. Sedema ku pêvajo bi vî rengî pêş dikeve rejima faşîst ya mêtînger e. Em bi awayekî pir mûtewazî mafên mirovan û mafên xwe yên neteweyî dixwazin. Lê li şûna wan bikin, teslîmbûneke encama wê ne diyar bi ser me de sepandin. Bêguman em ne miya li ber kêrê ne ku serê xwe dirêj bikin. Me ev qebûl nekir û ti carî jî emê qebûl nekin.

Ji bo ewlekariyê milîtanan derdor tev girtibûn. ewlekariya wî gelekî hesas bûbûn. Êdî pêngava agirbestê qediyabû, ya êrîşên dijwar dest pê kiribû.

-Min nedixwest tabloyeke wiha reş nîşanî we bidim, lê rastî wiha ye. Heta ji destê min bê ezê dîsa hewl bidim têkoşînê bikişînim, platformeke siyasî, aştiyane û demokratîk.

Civîna çapemeniyê bi pirs û bersivên berfireh dewam kir. Rojjnamevanên tevlî bûyîn, pirên wan tevlî yên berê jî bûbûn. Rol û mezinbûna wî baş dîtibûn. Lê daxuyaniya dawiyê bandor li her kesî kiribû.

Piştî daxuyaniyê Apo li seyareya xwe siwar bû berê xwe da Berliyasê. Ji wir jî wê biçûya Şamê. Rojnamevanan xwestibû roportajan pê re bikin, lê civanê hevdîtinê li Şamê dabû. Siwar seyare bilez diajot. Aî jî pişta xwe dabû kursiyê xwe li ser daxuyaniya wê rojê dayî dihizirî. Pirsa destpêka pêvajoyê ji Celal Telebabî kirî, ya “Bi dîtina te wê Tirkiye gavan biavêje, ya na?” hat bîrê. Celal jî gotibû, “Wê biavêje.” Lê êdî agirbest bêwate bûbû û wê şer girantir bibûya. Ji bo rewşa li Bakur fikarên wê ji her demê pirtir bûbûn. Ser hemdê xwe rûnişt, xwest mijara rojnamevanan ji Siwar fêr bibe:

-Siwar wê rojnemevan çawa werin?

-Serokê min, ji bo wan me seyare xwestine.

Piştî saetek û nîvê gihîştin mala li Zahîra. Yek ser berê xwe da odeya xwe. Hizrê wî tev li ser pêvajoya nû bû. Piştî demekê derbasî eywanê bû. Rojnemevan hemû li bendê bûn û pir bikelecan bûn. Piştî ku li li ser kursiyê xwe rûnişt roportajan dest pê kir.

***

Ew demek bû, pêvajoyê ji berê pirtir bala kesên derve dikişand. Pêvajoyê wisa kiribû ku hê pirtir mûxatebê gotin û pêşvebirinan li Şamê bê dîtin. Apo jî rojên xwe pir dagirtî derbas dikirin. Bala her kesî li ser bû. Êdî di dema xwe ya herî dijwar de bû. Lê rewş jî zelal bûbû.

Li mala Zahîra Rihan, Rûken, Mezlum û Siwar li eywanê rûniştibûn, li televizyonê temaşe dikirin. Apo di odeya xwe de agahiyên ji qadên şer, Ewropa û çapemeniyê girtîn, di serê xwe de dinirxandin. Operasyonên dewleta Tirk roj bi roj girantir dibûn û şer bi tevayiya dijwariya xwe dewam dikir. Her du aliyan jî şûrên xwe kişandibûn. Dewleta Tirk bibiryar bû Kurdistanê bike çol, PKK jî di berxwedanê de biisrar bû. Piştî ku guhdarî nêçeyên dawî jî kir, derbasî ewyanê bû. Gazî Siwar kir:

-Siwar wê mêvanê min kengê were?

-Serokê min, hê nehatiye, çi dema bê emê bînin vir.

Gotina “mêvanê min” bala yên li wir kişand.

-Divê hûn xwarineke baş jê re amade bikin!

Pir bikelecan bû. Bê ku tiştekî bêje li eywanê diçû dihat. Lê ji rengê rûyê wî diyar bû ku ketiye nava xeyalên kûr. Rojên li zanîngehê hatin bîrê. Ew, Agir û çend hevalên wan yên destpêkê li baxçeyeke Enqere rûniştibûn. Xortek û keçekê destên xwe dabûn hev digeriyan. Agir bi henekî gotibû, em jî wiha ji xwe re bigeriyan.

Apo di bin awirên çavên xwe de lê nêrîbû, gotibû, divê şoreşger weke firîşteyan bin. Hinekî berken bû, çavên wî jî her li ser derî bûn. Çû ber pencereyê li rê temaşe kir. Ti kes ber bi malê ve nedihat. Careke din vegeriya cihê xwe, lê guhên wî li ser derî bûn. Siwar, Mezlum, Rihan û Rûken li tevgerên wî temaşe dikirin. Ew jî pir bikelecan bûn. Di wê navê re dengê derî hat. Her çaran jî dixwest biçin derî vekin, lê Siwar berî wan vekir. Bi vekirina derî re yekî bejinbilind, zeîf, esmer û bisimbêl ket hundir. Pora xwe jî ber bi aliyekî ve şeh kiribû. Apo jî ber bi derî ve çû. Di nîvê rê de hev himbêz kirin. Ji kenê Apo yê bi wan didanên spî diyar dibû ku pir kêfxweş bûye. Destê Agir girt ber bi cihê rûniştinê ve bir:

-Tu hatî? Çend roj in em li benda te ne.

Agir jî pir bikêf xuya dikir, lê di rêzgirtina li hemeberî Apo de kêmayî nedikir. Apo dizaniya ku tenduristiya wî ne baş e, ji ber wê li serûberên wî temaşe dikir. Çend mûyên spî yên di serê Agir de bala wî kişandibûn. Hinekî keniya:

-Pora te spî bûye. Çi bûye, ji ber pirsgirêkan spî bûye?

Her du bi hev re keniyan. Lê Agir bersiva pirsê neda. Piştî çend kêliyan Apo dest bi nirxandina pêvajoyê kir. Agir pir bi mereq û xwestek guhdarî dikir. Hem dixwest pêvajoyê ji devê wî bixwe bibihîze, hem dixwest bizane ka di nêrînên wî yên giştî de guherînek çûbûye, yan na. Her nêrîna wî, her gotina wî û ka gotinên wî tên çi wateyê di hişê xwe de tomar dikirin. Hem ji heskirin, hem ji bîrîkirin, li çavên wî dinêrî. Êê, hevalên hev yên destpêka têkoşînê bûn. Di wan rojên zehmet de bi hev re serê wan gelek ketibû şeqûdeqê. Di nêrîna wî de çavên Apo kûrtir bûbûn. Ji ber wê xemgîn bûbû. Nedixwest li pora wî ya hinekî spî bûyî binêre. Lê nêrîna çavên wî ber bi ceynikên wî yên spî ve firiyan. Di dilê xwe de got, xwezî min bikariya emrê xwe bida te. Wisa bêdeng guhdarî dikir. Bi dengê wî yê bilind ji nava xeyalên xwe derket:

-Heval çayê bînin!

Biken berê xwe da Agir:

-Tu li ser çi dihizirî? Min got çend avdeyên pora te spî bûne, tu jî li ya min dinêrî?

Agir jî keniya:

-Serokê min, ev demek e min hûn nedîtîn. Min mereqa rewşa we dikir. Geşedanên bûyîn ne hindik bûn. Em par di pêvajoya şerekî giran de bûn. Pêvajoya îsal ya agirbestê û daxuyaniyên Serokatiyê yên ji bo derbasbûna ji şerê çekdarî ber bi têkoşîna siyasî ve, ti kes ne li bendê bû.

- Me ji dil û can xwest, ez bawer dikim dilê Ozal jî hebû, lê çeteyên di nava dewletê de, pêşî lê girtin. Di serî de min bawer nedikir jidil be, min got dibe ku taktîk be. Ma nizane ku kuştin û mirin di vê rê de heye, ma nizane ka karê dike çi ye? Lê diviya min pêvajoya hatî destpêkirin, pêş bixista. Diviya pêşiya provokasyonê bigirim.

Piştî axaftinê Agir xwest rewşa du hevlên wan yên di zindana Almanya de bipirse:

-Serokê min, rewşa Çirûsk û Bager çawa ye?

-Di dema pêş de wê bên berdan, wê werin vir. Divê derkevin û di nava vê germola kar û xebatê de cihê xwe bigirin.

Siwar qedehên çayê yên vala ji ser mase rakirin, birin metbexê. Rûken û Rihan jî li pey çûn. Rûken destê xwe li milê wî da:

-Hevalê Siwar, ev kîjan heval e, çiqas ew û Serokatî bi hev re rehet in!

Siwar li çavên wê nêrî:

-Ev hevalê Agir e, ma hûn nas nakin?

Rojnemeyên wêneyên Agir tê de, hatin bîrê. Destê xwe danî ser devê xwe:

-Haa, nû hat bîra min, dijmin dibêje zilamê didoyan! Lê ew jî pir

hatiye guhertin. Pora wî spî bûye!

Apo li ser pêvayoya dawî û bûyerên qewimîn diaxivî. Carna jê her du bi hev re dikeniyan. Apo çav bi Rûkenê ket ku li wan temaşe dike:

-Were vir! Ev demeke dirêj e me hev nedîtibû.

Di wê navê re çay ji wan re anîn. Apo ferq kir ku rehetbûna wan bala yên li wir kişandiye. Hinekî li rûyê wan temaşe kir, pişt re berê xwe da Agir:

-Piştî xwarinê ji wan re hinekî behsa gerîla bike! Ev ji Ewropa hatine, li gerîla nemane. Gelek heval li van nêzîkan hene, bila ew jî werin. Bi hemûyan re biaxive! Rastiya dijmin ji wan re bêje.

Ji bo amadekirina xwarinê Rûken, Rihan û Siwar çûn metbexê. Rûken dihizirî ka wê çi çêke:

-Hevalê Siwar, ez dizanim Serokatî ji savarê hes dike. Weke din em çi çêkin?

-Em dikarin mehîrê jî çêkin, lê kî ji we dizane?

Rihan û Rûkenê li hev nêrîn:

-Ma tu dibêjî qey li malê hema me mehîr çêdikir?

Rihan hînekî hizirî:

-Lê tê bîra min ka dayîka min çawa çêdikir. Tu û hevala Rûken goşt çêkin, ezê jî mehîrê çêkim.

Rihanê devzendikên xwe hildan, li dan temeşe kir. Ew dîmen bi serê Siwar neketibû:

-Heval, tu li ser dixwînî, tu çi dikî? Diyar bû ku tu nizanî. Ez dibêjim ne hewce ye, jixwe Serokatî ji xwarina zêde aciz dibe, dibêje nirx in çima hûn wiha dikin.

-Tu rast dibêjî. Rojekê dîsa em li metbexê bûn, Serokatî hat li sarincê meyze kir. Dixwest bizane ka xwarina zêde maye yan na. Dema me xwarin zêde dirijand, digot divê hûn xwarinê bi pîvan çêkin û mîda we jî bila bipîvan be. Divê em nebêjin partî ye û her

tiştê me heye. Paşê dît ku marolê me xirab bûye. Got divê hûn qîmetê her tiştî bizanin. Hûn nizanin ka dayîka we û bavê we çawa her tiştî tînin malê. Gelê me feqîr, mafê me nîne em ji gelê xwe zêdetir bixwin. Nabe ku hûn xwe ji gel cuda bibînin. Herî dawiyê got, aliyê xirab bûyî jê bikin, yê din bînin ezê bixwim.

-We çi kir?

-Em ketin odeya xwe, em fikirîn ku em qîmetê kedê nizanin. Timî digot, ev nirxên gel in. Di dema xwarinê de, bilez dixwar, ji xwarina me ya hêdîka hes nedikir. Her tişta zeman dibir, li dij derdiket. Digot divê gel bi we re pîvan û exlaqê nû bibîne. Ji bo rûniştina me jî digot, divê hûn serê xwe xwar nekin. Weke koleyan nesekinin, civakê ji we re timî gotiye, hûn kole ne, ev di sekna we ya xwar de xuya dike.

Kêfa her duyan jî ji vê suhbetê re hatibû. Vê carê jî Rihan ket navberê:

-Rojekê em jî li ser sifreyê bûn îsotên xwe li me par ve kirin. Ku dît em nikarin bixwin, biken got, divê insanê şoreşger îsotê bixwe. Divê hûn îradeya xwe xurt bikin. Eger hûn niha nekin li hemberî zehmetiyê hûnê sibê çi bikin? Tişta piçûk jî tiştekî mezin e. Ev wisa dike ku mirov bikeve nava lêpirsînê. Pirî caran meyzandina me û ya Serok ne weke hev in. Serokatî bi çavê akademiyan li van malan dinêre. Her tiştî dike wesîleya perwerdeyê û dixwaze kesayetên azad ava bike.

Piştî qasekî xwarin amade kirin, danîn ser mase. Hemû bi hev re li dorê rûnşitin. Çawa ku ji dîtina wî têr nebûbe, hê Apo li Agir dinêrî. Pişt re berê xwe vegerand ser yên din:

Di ser xwarinê de jî divê hûn li ser şoreşê bihizirin. Li ser Rojhilata Navî, siyasetê û her tiştî divê hûn bifikirin. Hûn pir rehet mezin bûne. Gerîlatî zor e, li qada şer gur hene û ez li we meyze dikim hûn weke berxikan in. Divê her yek ji we bibe weke gurekî.

Piştî xwarinê Ew û Agir ji bo çûna qata dehen ji hundir derketin.

***

Rojeke pir germ bû. Rojê li avayiya qata dehan xistibû. Ji ber bilindbûna wê ji her alî ve tîrêjên rojê xwe berdidan nava malê. Apo û Agir di odeya wî de rûniştibûn, meywe dixwarin. Milîtanên jin jî li odeya xwe bûn. Rozerîn dixwend, yên din wisa pirtûkên wan di destên wan de, ji germa bi xew ve çûbûn. Apo derket çû ber deriyê odeya wan. Tepsiya weyweyan jî di destê wî de bû. Ti deng ji hundir nedihat. Bi lêxistina derî re Rozerînê vekir. Lê nedixwest hevalên wê razayî bibîne. Lê çavê wî bi wan ketibû. Tev bi hev re rabûn ser xwe. Biken tepsî dirêj kir:

-Me para xwe xwariye, ev para we ye. Dinya îro pir germ e, mirov nikare bixwîne. Lê ka ez li pirtûkên we binêrim, hûn çi dixwînin.

Li pirtûkên wan tevan nêrî. Dahûrînên dawiyê, pirtûkên şoreşa Rusya, Şer û Aştî, Dostoyevskî û Jin û Malbat, çend ji wan bûn. Hem li wan dinêrî, hem serê xwe dihajand:

-Hûn rojê çend rûpelan dixwînin?

Rûkenê xwe xwendevaneke baş didît:

-Serokê min rojê şêst rûpelî dixwînim.

Serê xwe ji ser pirtûkan rakir, li wan nêrî:

-Hûn pir sist in, diviya rojê herî kêm hûn sed, sed û pêncî rûpelî bixwînin. Di aliyê hizir de hûn xwe pêş naxin û xwe nawestînin. Divê saetên we yên rojê hemû tijî bin. Dema xwe vala derbas nekin! Qîmetê van derfetan bizanin.

Li meyweyên di tepsiyê de meyze kir:

-Divê hûn van meyweyan jî xelas bikin.

Hinekî li wan nêrî, wan jî li pirtûkên di destê xwe de dinêrî:

-Emê êvarê li ser pêşketinên keçên me yên di şer û têkoşînê de biaxivin.

Piştî gotina xwe derket. Mezlum û Agir li eywanê li ser piyan bûn. Diviya Agir berî gavekê emeliyata dîskê bibe. Her tişt hatibû amadekirin û doktor civan jî dabû.

Apo li Mezlum nêrî. Ji tevgera wî ferq kir ku dixwaze tiştekî bêje:

-Tu dixwazî tiştekî bêjî?

Mezlum li Agir nêrî pişt re berê xwe da dayê:

-Serokê min, ragihandina Tirkan li ser hevalê Agir gelek dinivîse.

Apo li Agir nêrî, bi xwe jî haya wî ji wan nivîsan hebû:

-Ha, Agir, ji bo we çi dinivîsin?

Agir dixwest Mezlum mijarê veke pişt re bersivê bide. Apo dizanî dîsa berê xwe da Mezlum:

-Dibêjin çi?

-Serokê min, dibêjin, di nava PKKê de zilamê duyemîn ew e û bi jimareke mezin ji PKK'ê veqetiyaye. Ji ber ku hevalê Agir li gelek cihan maye her kes nas dike. Eger bi gel re biaxive, hem ji bo rabûna gumanan, hem ji bo moral wê baş be.

Bi baldarî guhdarî nêrîna Mezlum kir:

-Baş e, hema dest pê bikin.

Ji ber ku pêşniyara wî hatibû qebûlkirin, Mezlum gelek kêfxweş bûbû:

-Weke din nêrîneke te heye?

-Rast e serokê min, eger resmekî Serokatiyê û hevalê Agir di serxwebûnê de derkeve, wê pir baş be.

Bê ku dem derbas bibe, Siwar çû wênekêş anî, resmê wan bi hev re hat kişandin. Pişt re bi milîtanên jin re resim kişand. Piştî kişandina resman, Apo berê xwe da Siwar:

-Hevalan bibe nava bajêr bila ji xwe re hinekî Şamê jî bibînin!

Careke din berê xwe da Mezlum:

-Cihê tu jê hatî cihên dîrokî lê hebûn?

Mezlum çend cihên li Eewropa dîtîn jê re gotin. Ji ber ku berê jê re gotibû pir bixwîne, çanda dinyayê nas bike, dixwest bizane ka çiqas pêş ketiye. Di dilê xwe de got, divê pirtir bixwîne. Piştî Mezlum berê xwe vegerand ser milîtanên jin:

-Hemû bi hev re biçin Qasyonê bibînin! Baş temaşe bikin û encamê jê derxin!

Mezlum û yên din tev bi hev re derketin, berê xwe dan çiyayê Qasyon yê li pêşberî Rûkendin. Piştî saetekê gihîştin navsera çiyê. Çawa ku mirov li kefa destê xwe binêre, Şamê ji wir wisa xuya dikir. Êê, li wir bê resim jî nedibû. Mezlum hizirî ka çima Apo şandine wir. Di dilê xwe de got, bi qasî ku Serok qîmet dide me û dixwaze em pêş bikevin, eger me jî wisa xwe biêşanda wê rewşa me cuda bûya. Ji bo tomarkirina wê roja xweş rahişt lênûsa xwe ya piçûk, dest bi nivîsê kir.

***

Her ku diçû rojê tîrêjên xwe dijwartir dikirin. 15ê Temûzê bû. Mirov digot wê niha mejiyê mirov bikele, ewqas dinya germ bû. Li dibistana Şeba amadekariya dewreyê qediyabû, êdî wê perwerdeyê dest pê bikira. Nêzîkî sed milîtanên jin û mêr di merasimê de sekinîbûn, li benda hatina Apo bûn. Cilûbergên wan ne yên leşkerî bûn, lê hema hema tev jî dişibihiyan hev. Pêlavên wan jî di rengê cilên wan de bûn. Hin gewr, hin qehweyî, hin risasî bûn. Bi sekin û tevgerên xwe didan xuyakirin ku hêzeke leşkerî ne. Hemû jî pir bikelecan bûn, kelecana wan li her derê belav bûbû. Kêfxweşiyeke bi qasî rojê germ ketibû nava wan. Di nava wan de ji hişdeh salî, heta

şêst salî jî hebûn. Ji bo şiyariya hatina Apo milîtanek bi ewayekî leşkerî li pêşberî wan sekinîbû.

Apo, bi gumlekekî milqut yê spiyê rengê şekir yê xetxetî, pantolonekî risasî, ber bi cihê merasimê ve hat. Hem kembera di pontolonê wî de, hem solên wî reş bûn. Di berîka gumlekê wî de berçavkek û pênûsek xuya dikirin. Pora xwe bi şûn ve şeh kiribû. Her çiqas ceynikên wî hinekî spî bûbûn jî, lê por, çav, birh û simbêlên wî reş dikirin. Weke her car rûyekî pir geş li ser bû û didanên wî di bin simbêlên wî de spî dikirin. Bi wê heybeta xwe ve li hemberî merasimê sekinî merheba da wan. Agir jî li teniştê sekinîbû. Pişt re yek bi yek destê wan girt. Piştî silavdayînê bilez çû li pişt maseyê hatî danîn sekinî. Destpêkê hinekî di cihê xwe de çû hat û çavên wî jî tim di tevgerê de bûn. Kêliyekê li ser xalekê nedisekinîn. Lê pir aram û rehet bû. Berî axaftinê hinekî berê xwe da aliyê çepê, li erdê temaşe kir, careke din ber bi aliyê rastê ve kir. Carna jê dengê tizbiyên di destê wê de dihat. Serwerda wan sê pelçimên daran yên zîvîn bûn. Vê xemil û dengekî cuda dida wan. Ji ber kîloyên zêde hinekî zikê wî çêbûbû. Bi bilindkirina serê xwe re wêne hatin kişandin. Piştî ku hinekî yên li hemberî xwe di ber çavan re derbsa kirin dest bi axaftinê kir:

-Ji dewreya şehîdên tolhildanê re em serkeftinê dixwazin. Hevalên tevlî dewreyê bûyîn em wan silav dikin. Em dikevin sala 15an ya xebata me ya li vê qadê. Herwisa em ketine sala 11an ya berxwedana 14ê Temûzê. Piştî meheke din jî emê bikevin salvegera 15ê Tebaxê. Eger yekî biaqil li ser van salan û li ser kesayeta xwe bisekine, bizane ka jiyan, mirin, mayîn, xebat û partî çi ne û bi çi awayî şer dike, dikare her tiştî bibîne. Şoreşgeriya me di serî de bi navê jiyanê, li hemberî jiyana rezîl, derew û xwexapandinê dest pê kir. Dibe ku hûn partiyê nû nas bikin, lê hûn dikarin hundirê wê zû bibînin û bizanin ka çi bûye. Berê perwerdekirina hevalan pir zehmet

bû û demeke dirêj jî xwe dixapandin. Ez bawer dikim niha ne wisa ye. Rastiya partiyê û şer firsendê nade ku mirov xwe bixapîne. Insanê Kurd roj bi roj xwe nû dike û durist dibe. Dema şoreş bi ser dikeve, ne şer û partî tenê bi ser dikevin, gel tev bi ser dikeve. Di vir de hûn jî bi ser dikevin.

Hinekî pêş de çû, li yên di rêza pêş de rûniştîn heta taliyê temaş kir. Li derdora cihê hatî hazirkirin baş nêrî. Çavên xwe li ser pelên daran yên wê rojê nedilepitîn temaşe kir:

-Mirov dikare bêje, di dîroka gelê Kurd de, cara yekê ye şerê jiyanê dibe. Ev gavên we yên destêpêkê ne. Me ji tinebûnê, heta jê xirabtir dest pê kir. Dema em rabûn her kesî digot, nabe, hûn nikarin serê xwe rakin. Gelê me digot em mirine, em nikarin rabin. Hûn jî zarokên wan in. Lê me dest bi kar kir. Divê kesayet di reşayî û kêmayiyan de xwe çêke. Yê dibêje, ez nikarim tiştekî bikim, xirab e. Herî zêde divê mirov li ser serkeftinê bisekine.

Li ser kursiyê li pişt mase rûnişt. Ji german êdî bîna wî teng dibû:

-Li Başûr çend top avêtin, tev reviyan. Sala 1975-1988-1991ê jî wisa bû. Ji wan çend topan reviyan, nikarîn tiştekî bikin, rev û teslîmbûn hebûn. Dijmin di serî de got, heta niha 28 serhildan çêbûne, me tev tine kirin. Lê niha li Botan tenê binêrin, ewqas teknîk, ne gerîla direve ne jî ji çiyê derdikeve. Yên nahêlin dijmin bi ser bikeve, fedekarî, usulê şer û serokatiya rast e. Di wan serokên din de ev tişt nînin, ji ber wê direvin û dev ji her tiştî berdidin. Yên dibêjin, bê şer her tişt dibe nerast dibêjin. Ji ber wê ji niha pêve wê jiyana me û şer bi hev re bimeşin. Em bi şer çêbûn û her tişt bi tiştekî çêdibe.

Milîtanan êdî hay ji germê nemabû, tev ketibûn nava lêhûrbûnê. Çavên wan derveyî Apo tişteke din nedidîtin. Yên temenê wan li jorê salên behsa wan dihat kirin hemû dianîn ber çavên xwe. Rabû ser

xwe li dora xeleka gurover ya li pêşberî milîtanan hinekî meşiya:

-Mirov dikare ji bo berxwedana 14'ê Temûzê jî wiha bêje: Dema hevalê Xeyrî, Kemal û hevalên din biryara rojiya mirinê dan, dijmin xwest wan tine bike. Ji wan dixwest li hemberî jiyanê Partî û Serokatiyê inkar bikin. Wan jî got, ew jiyan ne jiyan e û wisa biryara 14ê Temûzû dan. Li ser wê biryarê me kongreya didoyan çêkir û biryara vegera welat da.

Ew çend saet bûn li ser salvegera rojiya mirinê diaxivî. Berxwedan û helwesta milîtanên PKK'ê ya wê demê yek bi yek dinirxand. Yên guhdarî dikirin, hem bandor dibûn, hem jî xeyalên wan çûbûn nava wê zor û zehmetiyê. Bi hevoka dawiyê re dengê çepikan bilind bû. Piştî axaftineke dûvdirêj, yek bi yek bi tevan re resim kişandin.

Ew û Agir heta qasekî li tenişta hev meşiyan. Çawa ku ji bo dema pêş ji bo pêşengiyê amade bike, wisa nêzîkî Agir dibû:

-Tecrûbeyên xwe bide hevalan û yên ji zindanê jî hatîn bila tecrûbeyên xwe bidin wan.

-Serokê min ku tecrûbeyên derve û zindanan bigihin hev, wê pêşketineke mezin çêbe.

-Binêrin, sala borî li welêt hin kêmayî çêbûn. Divê mirov xwe nas bike. Çima hûn rê ji mirovên xirab re vedikin? Di vir de kêmayî di mirov de ye. Ez jî berê wisa bûm, lê min sal bi sal xwe xurt kir. Ti kes nikare zûbizû min bixapîne. Ti kes nikare min ji bo xwe bi kar bîne. Lewre min ji tiştên dibûn ders girt.

Hinekî sekinî, lê rengê rûyê wî jî ne xweş bûbû, li Agir nêrî:

-Terzi Cemal hebû; li aliyekî wî xirab dikir, li aliyê din wê jinikê. Li welat hema hema li her herêmê cenawirek heye, xirabiyê dike. Bi awayekî pir bêwijdan tiştên ku Şener dixwest bike, pêk anîne. Ji bo tesfiyeyê planeke mezin amade kiribû, lê bi ser neket. Derbarê wî de tu çi dibêjî?

Agir li ser wan kiryaran dihizirî, dianîn bîra xwe ka wan çi kiriye:

-Serokê min, ev komek ji Rizgariya Gel (HK) bûn. Piştî ku dido ji wan hatin kuştin, li rêxistinên din belav bûn. Hin ji wan jî hatin cem me. Terzi Cemal jî berpisê wê koma hatî nava me bû. Yek ji wan di kuştina Hakî Karer de cihê xwe digire. Yekî li Ewropa dewleta Elman bi ser me de şand.

Apo serê xwe hejand:

-Digel ku polîs dizane Terzi Cemal berpirsê vê komê ye jî du-sê caran li Dîlok, Riha û Nizîpê digire, dîsa berdide.

Li rûyê milîtanan nêrî, di dilê xwe de got, divê milîtanê PKK'ê bikare berî her tiştî xwe baş biparêze. Wisa li hemberî xeta şaş derkeve. Çavên wî hê li ser wan rawestiya bûn:

-Weke din, kî dixwaze tiştekî bêje?

Seîd di rêza pêş de rûniştibû; hem haya wî ji wan kiryaran hebû, hem di nava wan de jiyabû. Rabû ser xwe:

-Serokê min, ev kes dema derbasî welat dibe, eger ez ne şaş bim, ji her heşt hevalên koma Hêzil berpirs e.

Apo, dema koma Hêzil amade bûyî heta derbas bûyî, hemû anîn bîra xwe:

-Terzî Cemal jî di nava wan de bû?

-Rast e serokê min, wî bixwe ji me re behs dikir. Li Dêrikê nexweş dikeve.

-Wisa haa!

-Serokê min, tam dema ji bo derbasbûnê bikevin tevgerê nexweş dikeve. Bala min kişandibû, dema min jê pirsî, digot ez vedireşiyam. Û sedema vereşana xwe jî xwarin nîşan dida. Halbiku hevalan tevan ji wê xwarinê xwaribû.

-Berê jî bi daxwaziya cezayê darvekirinê hatibû darizandin û tê zanîn şansek jê re hatibû dayîn. Bi egera ajantiyê hivdeh kesî bi

işkencê dikuje. Hin heval direvin, ji bo agahdarkirina me diwazin werin vê qadê. Lê ew jî di rê de dikevin kemînê şehîd dibin. Hevalek bi navê Devrim jî direve, wî xwe gihand me û derbarê wî de gelek agahî dan me. Hûn dizanin, PKK rêxistineke hesabdayîn û hesabxwestinê ye. Paşê li vê qadê hat darizandin û cezayê kiryarên xwe jî stand. Ji ber wê navên dewreyên me yên îsal bûn dewreyên tolhildanê.

Piştî dersê bû, ew û Agir bi hev re li qadê dimeşiyan. Ji ber rojê xwe dan binê siha darê:

-Agir tu dibînî, em bi serê derziyê derfetan dibînin û wê ji bo hevalan dikin xizmeta perwerdeyê. Wan hazir dikin û dişînin qadên şer, lê hê jî nikarin xwe biparêzin. Kesên tesfiyeker dizanin çi jî bikin, ezê dîsa xebatê bi ser bixim. Ji ber wê ev kes kadroyên min, kesayeta min dikin hedef û êrîşên hovane dikin.

-Serokê min, ji bo ku xeta PKKê nas bikin, di perwerdeyê de heta ji me tê em tecrûbeya xwe didin wan.

-Erê xeta PKK'ê ruhê Kemal, Xeyrî û Haki ye. Ew ruh weke vê roja li asîman ti çav nikarin ser xwe re nebînin.

Dîsa dema dersê hatibû, Agir çû dibistanê, ew jî ber bi odeya xwe ya xebatê ve çû.

***

27ê Mijdarê bû. Ji bo axaftina salvegera 15an ya avakirina PKKê, li qata dehan Apo xwe amade dikir. Wê sibê zû ji xew rabûbû. Dixwest wê rojê xwe bigihîne gelek cihan, lê di serî de wê bi milîtanên li malê re, pîroz bikira, paşê berê xwe bida qadên perwerdeyê û civînên gel. Ew roj ji bo wî cuda bû, ne weke her rojê bû. Rojê tîrêjên xwe li nava bajêr belav kiribûn. Ew jî li odeya xwe rûniştibû, rojên li pêşiya xwe plan dikirin. Milîtanên jin ketibûn kelecaneke mezin. Her yekê

karek dikir. Maseyê li eywanê bi her sê alan û kulîlkên kesk, sor û zer hatibû xemilandin. Bi coşeke mezin, ji odeya xwe derket, derbasî ewyanê bû. Piştî silavdayînê li ser kursiyê pişta mase rûnişt. Bi rûyekî geş li yên li wir nêrî:

-Ev sala borî beramberî çardeh salên derbasbûyî bû. Pir germ derbas bû. Sala li pêşiya me sala Kurdistanê û ya şerê gel û serkeftinê ye. Îsal gel xwe gihand zanebûn û yekîtiyeke mezin. Bi sedhezaran bi hev re meşiyan û şiyariyeke mezin tê de hebû. Em soz didin ku emê sala 16'an jî bikin sala gel. Em tev de li welat bin. Ruh, nav, heysiyet û şerefa me pir ketibûn, emê navê xwe wiha rakin. Ji bo wê jî ez dibêjim sala li pêşiya me wê sala cesaret, mezinbûna ruh û ronahiyê be. Wê yekîtî û şer pir mezin bibin. Ji bo wê careke din em soza xwe didin. Ji bo bîranîna xwîna şehîdan, ji bo hevalên zindanan û hevalên bi qehremanî şer dikin û tevayiya gelê me yê bi me bawer, em saleke serkeftinê dixwazin. Ji destê kê çi tê divê bike. Soz ev e û em bi vê sozê re ne. Sala çûyî li we hemûyan pîroz be û sala bê ji bo we hemûyan sala serkftinê be.

Heta nîvro zeman bi serdana yên ji derve dihatin û suhbetê derbas bû.

Li mala ku wê salveger lê bihata pîrozkirin, amadekarî qediyabû. Li eywanê maseyek hatibû danîn. Mase bi baqên gul û kulîlkan hatibû xemilandin. Her sê al jî li ser nîvê wî hatibûn danîn. Li derdora wî jî li aliyê rastê qerenfîlên sor, li aliyê din jî ji her rengê gulan hatibûn bicihkirin. Ji bo wî jî di nava wan gulan de kursiyekî spî hatibû danîn. Li ser şerîta li ser gulan, “15 SALİYA PKKê Lİ GELÊ KURDİSTANÊ PÎROZ BE” hatibû nivîsîn.

Berî ku bikeve hundir hinekî sekinî, çawa ku wê biçe pêşberî bi hezaran xwe amade kiribû. Careke din axaftina xwe ya destpêkê bêje, anîn bîra xwe. Li derdora wî jî tev milîtan bûn. Bi gavên bilez ket eywana malê. Li ser piyan bi çepikan hat pêşwazîkirin. Pir bikêf

xuya dikir. Çakêtekî reş, pantolonek û gumlekekî zeytî lê bûn. Cilûbergên wî yên wê rojê pir lê hatibûn. Bilez derbasî cihê xwe bû. Silav da û cîhazê deng vekir. Piştî ku bixêrhatin da wan dest bi axaftinê kir:

-Me xwe gihand vê salê, em ketin sala şazdehan. Dijmin hawara xwe digihîne dinyayê; dibêje ez bi PKKê nikarim. Bi gelê me pir hatibû lîstin û bixwe bi xwe dilîst. Dema min li jiyana wan temaşe dikir min digot ev çawa temhemûla vê jiyanê dikin. Em gelek fikirîn û me xwe rexne kir.

Axavtineke ku demên borî tev bên ber çavên wan kir. Ji bo sala nû jî plan û projeyên partiyê diyar kirin. Gel bi şiyariyeke pir mezin guhdarî dikir. Gelek malbatên milîtanan jî li wir bûn. Berê xwe da wan:

-Zarokên we tên cem me, her tiştî ji me dixwazin û pir nezan in. Azadiyê jî ji me dixwazin. Divê em ji bo wan welatekî ava bikin. Divê tu wan zane bikî, derbasî welat bikî. Me ne 1978'an dest pê kir, me bihara sala 1973'yan de dest pê kir. 1978'an vê mehê me got em navekî li xwe bikin. Niha Kurdistanê li cîhanê deng daye û emê bi ser bikevin. Mirov li hemberî dijminê xwe serî rake, wê demê qîmetê mirov heye.

Piştî axaftineke dirêj xwest pirsan ji gel bigire. Kalekî temenê wî heftê salî rabû ser xwe:

-Min ji we re silavên hevalên Amedê anîne.

-Tu ji Amedê hatî?

-Erê, ez ji Amedê hatime, ez bavê Şêxmûs im.

-Kîjan Şêxmûs? Haa, min nas kir yê şehîd bûyî?

-Belê li Licê şehîd bû.

Bi vê gotina wî ya dawiyê re çavên xwe danîn ser hev hizirî. Heta qasekî wisa bêdeng ma. Pşt re serê xwe rakir, ji milîtanê li cem xwe re titşek got:

-Temam, temam. Weke din pirsên kê hene?

Kalekî din rabû ser xwe:

-Serokê min, eger firsend hebe dixwazim bi we re tenê rûnim.

Apo serê xwe bilind kir, li gel temaşe kir:

-Temam, emê wê firsendê bidin we hemûyan. Ji bo mêvanê min yê ji Amedê hatî jî, min niha ji heval re got emê berfireh pê re biaxivin.

Çavên xwe li ser her kesî digerandin:

-Tiştên min gotîn rast in yan na? Hûn dikarin rexne jî bikin. Bila yên ji kar razî jî û yên ne razî jî rabin.

Bavê Şêxmûs careke din rabû ser xwe:

-Li Diyarbekir jî em serdest in.

-Gaveke mezin li wir hat avêtin. Hema hema li tevayiya sînorên Kurdistanê me dijmin li paş xist. Em ketin Erzingan, Sêwas, Mereş, Erzirom û Meletî jî. Ev tev di sala pazdan de çêbûn.

Çavên wî girtî bûn, destên wî jî di nava pora wî de bûn. Pora xwe paş de bir:

-Dostên birûmet, gelek kes bi mal û zarokên xwe ve bi me re ne. Hûn çi dibêjin?

Ciwanekî sih salî rabû ser xwe:

-Karê partiyê gihatiye çi astê?

-Partî xwe digihîne her derê û li her derê şîn dibe.

Kêfa wî ji rehetbûna gel û axaftina wan re dihat û pir bi baldarî guhdarî dikir.

Yekî din rabû ser xwe:

-Hûn xebata mala Berzanî çawa dibînin; demekê kar kirin, demekê li dijî me şer kirin?

-Rast e Berzanî jî xebat kir. Tiştên baş kirîn, em pê re ne, tiştên ne baş kiribin em li dij in. Li ser navê Berzanî ti kes nikare her xirabiya xwe baş bibîne. Niha dijminên me Tirk in û bi ser me de

tên, ew jî bi ser me de tên. Dibêjin çareya me nîne.

Yên rûniştî hem nêrîna wî ya li ser Başûr mereq dikirin, hem jî bi salan bû dixwestin fêm bikin. Wî jî dixwest wê girika kor ya xiyanetê bi wan bide fêmkirin:

-Eger çareya te tinebe ma tuyê biçî li ber dijmin bigerî? Yê li ber dijminê xwe bigere ketiye. Li şûna tu li ber dijminê xwe bigerî tu bimirî baştir e. Dibêjin em naxwazin Tirkiyê parçe bikin. Ev serokê evqas Tirkiyê diparêze, mirovê çi jê re bêje?

Di wê navê re yekî ji nava gel bi zimanê Tirkî pirsek kir. Gotinên wî ji gel re wergerandin:

-Ev heval ji cihekî dûr hatiye, dibêje, dijminê tewrî mezin Emerîka ye, leşkerên wan Tirk in û balafiran jî didin Tirkan. Rast e Emerîka û Almanya dijminên mezin in, lê êdî nikarin tiştekî bikin.

Zilamekî din bi awayekî jixwebawer rabû ser xwe:

-Dema dewletek bixwaze alîkariya me bike emê çi bikin, wê alîkariya stratejîk hebe?

-Eger em bixwe nebin alîkarê xwe ti kes nabe alîkarê me. Ne Sovyet ne Emerîka nabin hevalbendên me. Dema mirov qîmet bide xwe wê her kes qîmet bide mirov. Divê baweriya mirov bi hêza mirov bixwe hebe.

Êdî, kesên nêrînên wan hebûna bi xwe radibûn û pirsên xwe dikirin. Yekî din rabû ser xwe. Ala li raserî Apo daleqandî nîşan da:

-Te ji tinebûnê ev gel anî vê astê, ev jî tişteke birûmet e. Ew al te bi serê xwe rakir û gihand heta vir!

Wî jî karê xwe yê ji Enqere heta wir anî ber çavên xwe:

-Ez dizanim, hûn van tiştan hemûyan mezin dibînin. Min li vir û Enqere kar kir. Min xwe negihand çiya. Lê dijmin dixwaze min ber bi çiya ve bibe û tine bike. Bi şev û roj li dû min in, lê nikarin tiştekî bikin. Kesê serokatiya Kurdan bike divê hay ji xwe hebe, ne tişteke rehet e mirov bibe serok. Ez bi şev û roj kar dikim. Lê hin serokên

sexte hene dixwazin rojekê bibin her tişt.

Rola xwe bi zimanekî hêsan ku yên li wir tev jê fêm bike vedigot:

-Ez sala 1975'an li Diyarbekirê bûm. Min ji çend kesî re got, werin em li ser Kurdan çend tiştan bifikirin. Hûn dizanin kevirên Diyarbekir hemû reş in û germ in. Li min vegerandin gotin, tu nikarî bi qasî serê derziyê jî baweriyê çêkî, li vî kevirê reş binêre di germê de heliyaye, tu dikarî çi jê derxî? Tê bîra min em tî û birçî bûn, cih tinebû em lê razin. Niha Diyarbekir tev rabûye. Dayîk û bav heta vir tên, em qebûl bikin wê tev tevlî me bibin.

Di wê navê re dayîkek bikelecan rabû ser xwe:

-Serokê min, Diyarbekir tev rabûye, tev rabûye!

Li dayîkê nêrî û keniya:

-Dayê tu dizanî tev rabûne?

-Belê ez ji wir hatime. Ez heyran tev rabûye, şerê Licê jî hemû li Diyarbekir çêbû.

-Haa, tu ji Diyarbekir hatî?

-Belê, niha her tişt baş e lê divê em kar û xebata xwe sist nekin.

Destê xwe bilind kir. Tişteke piçûk di destê wê de bû. Çavên wî li ser bûn. Hinekî pêş ve çû, kevirekî reş, bi qasî serê tiliya beranekê bû:

-Serokê min, min ji te re ev kevirê Amedê aniye. Te Amed hemû rakir ser piyan, îro kevirên wê jî yên te ne!

Kevir ji destê wê girt. Çawa ku diyariya herî mezin girtibe. Pir kêfxweş bûbû, kevir bilind kir da ber reşika çavên xwe, lê nêrî. Hinekî kir nava kefa destê xwe. Bi çavê tişteke pir pîroz û mezin lê dinêrî:

-Ev xelateke gelek mezin û pir biwate ye. Ev ne kevirek e, hesreta me ya destpêkê û hêviya me li wir dest pê kirî û heta van rojan em hatîn di nava wî de ye. Çawa ku parçeyek ji Kurdistanê bi

min re be, ezê bi xwe re bigerînim. Jixwe ruhê me li Kurdistanê ye, li her çar parçên wê ye. Li ser her bostek axa wê ye.

Dayîk himbêz kir û çend wêne jî pê re girtin:

-Bila jin tev werin em bi hev re wêneyekî bigirin. Ez timî dibêjim; jin parçeyek ji axa kurdistanê ne, divê wisa bê dîtin. Ji bo ku bibim ewladekî layîqê dê û bavan min dest bi vê xebatê êkir.

Jin hemû li dorê kom bûn. Bi dehan wêne hatin kişandin. Paşê gazî her kesî kir, bi hev re wêne kişandin. Pişt re bi yên dixwestin tenê biaxivin re axivî. Ji bo wî ew roj gelek biwate bû. Li wan dinêrî, di dilê xwe de digot, ev cejna bûyîna Kurdan e. Di nava wan de sekinîbû, hemû li dorê kom bûbûn. Çawa ku roj be û di nav wan de şewqa xwe dabe wisa bi wan re dikeniya û suhbet dikirin.

Piştî civînê ew û yên pê re xatirê xwe xwestin derketin. Careke din ketin ser riya qata dehan. Di rê de çavên wî li ser çiyayên derdora Şamê rawestiyabûn. Li silsileya çiyayên derdora bajêr dinêrî. Silsileyê weke bazinekê xwe li dora bajêr pêçabû û ji dûr ve weke hêlînekê xuya dikir. Şeveke sahî bû û bajarê Şamê pir xweş xuya dikir. Bayekî sar ji aliyê Cebel Şêx ve li pencereya seyareyê dixist. Ronahiya malan bi pesarên çiyê ve hilkişiyabûn. Çiya bûbûn dîwar, ronahî jî bûbû xemla wê. Ji jêr hata jor çirîskên ronahiyê weke stêrkan diçirisîn. Vê rewşê rengekî xweş û bedew dida bajarê kevnar. Çawa ku bajar nû hatibe avakirin xuya dikir. Seyare di ber felekeya Meyadîn re diçû. Berê xwe da çiyayên jora wê. Kulîlkên li dora felekeyê, yên rengûreng û nafûra avê bajar bedewtir kiribû. Şev bû, lê ji tevgera bajêr tiştek kêm nebûbû. Di ber Gulîstana Tişrînê re borîn. Xelk nû ji malên xwe dihatin geşta şevê. Tiştek ji ber çavên wî nedirevî; li mirovan, kolanan, li her tiştî temaşe dikir. Siwar jî seyare hêdîka diajot. Piştî qasekî gihîştin ber deriyê malê.

***

Seyare di rê de bû, şevên Şamê bi qasî aramî û bedewiya xwe, veşartî û tovê xirabûyê jî lê hatibû reşandin. Bi qasî şûnpiyên mirovên mezin û baş, yên weke Muawiye û Yezîd jî pir bûn. Ji sîxûriyê heta reşkujiyan, ji xeterê heta kêfxweşiyê, weke tarî û ronahiyê li ser wê axê bi hev re dijiyan. Bê vê dualîteyê jiyan nedibû. Şama şerîf ya bûyî qasid, tariya wê jî dibû xefk û bîrên kûr. Apo ji Rihayê ber bi vê axê ve herikîbû, li vê reşayiyê jî baş hayîl bûbû. Bi dehê caran ew pêlên dijwar û bixeter derbas kiribûn. Her ku şev tarî dibû, sîxûriyê tevna xwe dihona. Çiqas ruh û geşedanên nû hebûna jî, ewqas jî bi xwe re xeter dianî. Bi qasî bedewiyan, kirêtî jî di quncik û dîwanên wê de digeriyan.

Payîza pîrî mirarî, di wan şevên aram de nedisekinîn. Apo di pencereyê re li asîmanê tarî temaşe kir. Çavên xwe li ser stêrka êvarê rawestandin. Her cihê didît, dîroka wî aliyên baş û nebaş vekolîn dikirin. Di  hişê wî de fanûsa ronahî timî pêketî bû. Bi rabûn û hilatinê re kesên dixwestin wê biqedînin dîtibûn. Êdî ser rêbazê wan ve bûbû. Dinya ronahiyê çiqasî mezin dibû, ya tariyê jî xwe pê re digihand. Çawa siha wê be, jê veneqete dimeşiya. Qederekî li bêdengiya hundirê xwe jî guhdarî kir. Nefesên dijmin yên kêlî bi kêlî li her derî ew dişopandin pê dihesiya.

Wê rojê diviya ewlekarî baş bê girtin. Gihîştin ber avayiyê, li derdora wê baş temaşe kir. Wî bedewî û veşartiyên şevê baş dizanîn. Di ruhê wî de, destan û meselokên Kurdan yên li ser felekê deng vedidan. Ji xapandin û fenên wê agahdar bûbû. Mesela Kurdan ya ku digotin, benê felekê  şevê ji asîman vediqete li erdê li nêçîra xwe digere. Wey ji wî re yên ku xafil bibin, wê felek agir bi mala wan bixe. Lê yê şiyar be, felek jê direve, qeder jê ditirse. Çawa ku li wî anîbin, ew jî şiyar bû, ne felek nêzîk dibû, ne jî qederê xwe lê diceriband. Gotinên pêşiyan, dîrokên borî weke guharekî kiribû

guhên xwe. Kêliyekê jî xafil nedibû, wî bi xwe li dora xwe baş nêrî. Ev meselok hatibû bîrê. Kenekî xweş ketibû ser lêvên wî. Rûyê wî yê nûr jê dibarî geş bûbû. Hestên wî kêliyekê jî çavên xwe xamûş nedikirin. Wê şevê deng ji derdor nedihat. Di wan kêliyên bêdeng û bixeter de rojên cejin û şahiyan dihatin ber çavên wî. Tarî û bêdengiyê xwe çiqas nêzîk bikira jî, nikarî ruhê wî ji kelecan û coşa roja avabûna û hebûna Kurdan veqetîne. Ew coşa Kurdan ya ji navê hatî li bîrê bû. Di hundirê xwe de got, em li welatê xwe bûna, meyê heta serê sibê şahî li çiya, gund, bajar û deştên Kurdistanê li dar bixista. Ev roja hilatina Kurdan ne. Berî ku bikeve avayiyê careke din berê xwe da wan derdoran. Ji dûr ve kesên ku didîtin baş di mejiyê xwe de tomar dikirin. Her tevgereke piçûk jî bala wî dikişand. Çawa ku ji seyareyoê peya bû, seryarekê şewqa xwe xist nava çavên wî. Ber bi wan ve hat. Heta ku Siwar û yên din li derdora xwe nêrîn, wî xwe da aliyekî û ji ber çavên wan zû dûr ket. Siwar dest avêt, demanceyê. Milîtanên din jî tevan xwe li dorê kirin xelek. Wî jî bê ku demê wenda bike berê xwe da avayiyê. Rûyê wî aram bû, ew ne cara yekê bû rastî wan hawldanan dihat. Di dilê xwe de got, dema me ev gav avêt, me xwe ji dêwê heftserî rizgar kir. Me hesabê bi hezaran insanên di vê rê de biçin û em bi xwe jî tê de biçin. kiribû. Bilez derî vekirin ketin asansorê.

Rozerîn bi bazdan derî vekir. Milîtanên din hemû li ber derî sekinîbûn. Çavên wan li rûyê Apo bûn. Moralê ji c**iv**înên gel girtî û kêfxwşiya wî li ser rûyê wî diyar dibûn. Yekser derbasî eywanê bû. Dayîka di civînê de behsa Diyarbekir kirî, hat bîrê. Kêfa wî gelek hatibû. Serê xwe hejand: “Êdî gelê Kurd ji her derê berê xwe dide Şamê û ji bo dîtina me her tiştî didin ber çavên xwe. Piştî ku hinekî bêhna xwe vekir, kevirê xwe yê reş derxist. Hinekî lê nêrî, berê xwe da yên hundir:

-Ev kevir xelateke pir mezin e, ji min re hatiye.

Qasekî lê nêrî, rabû ser xwe çû odeya xwe. Berkêşka cam kişand, kevirê xwe danî cihekî ku her roj çav pê bikeve. Berkêşk girt, ber bi pencereyê ve çû. Hêdîka perde da aliyekî. Li derdora avayiyê temaşe kir. Çend kes li ber çavên wî ketin. Gazî Siwar kir:

-Biçe li jêrê binêre ka ew kî ne li derdora malê diçin tên. Berî niha jî hin diçûn dihatin.

Siwar yekser berê xwe da jêrê. Piştî pênc deqîqeyê vegeriya:

-Serokê min, berpisên dewletên ne. Seyareya gava din bala wan jî kişandibû, erkdar rêkirine, wê li wir bisekinin.

Apo bêdeng ma: “Xuya ye êdî mal ji gelek aliyan ve tê şopandin.” Çû odeya kêleka eywanê ya ew Kemal bi hev re li ser wê dîwanê rûniştibûn. Di dilê xwe de got, divê em ji vir hinekî dûr bikevin. Li her çar dîwarên odeyê nêrî. Kesên destpêkê hatîn û bi hev re li wir mayîn anîn bîra xwe. Destê xwe da dîwar: “Tu jî weke axa Şamê, cihê şûnpiyên insanên hêja û mezin li ser te hene. Dîsa çû eywanê. Milîtanên li wir tev rabûn ser piyan:

-Kerem bikin rûnin, emê îro suhbetekê bikin. Hûn dizanin îro ji Diyarbekir dayîkek hatibû civînê, digot, li nava Diyarbekir jî em serdest bûne.

Berê xwe da milîtanên jin, hinekî li wan temaşe kir. Di hundirê xwe de welatparêziya jinê û fedekariya PKK'ê dan ber hev. Di xeyalê xwe de dîmenekî xweşik çêkir. Wêrekiya Bêrîtan û ya dayîkan û xwedîderketina wan ya li şoreşê, yek bi yek anîn ber çavên xwe. Dayîka xwe anî bîra xwe, hevoka diviya ji ruhê xwe re bêje, got: “Kûrbûna herî bingehî ya ez ber bi welatparêziyê ve birîm, geşedanên li derdora rastiya jinê ne.”

-Min gotibû, jin weke welat e û divê bê rizgarkirin. Min çîroka xwe ji we re got. Ev hesteke bingehî ye û jixwe min aniye halê durişmê. Jina azad Kurdistana azad e, heta zilamê azad e. Asta azadiya jinê asta azadiya civakê ye. Ew jî ya welêt e.

Piştî vê axaftina xwe rabû ser xwe, berê wî li Siwar bû:

-Du hebûnûn bingehî yên xweşiktiyê, zilamê xweşik û jina xweşik in. Berî her tiştî min jin qezenc kir. Kuştina zilam qezenckirina jinê ye. Li cem min pirsgirêka zilam li pêşiya pirsgirêka jinê ye. Hin ji we ji Zelê jî hatine, Bêrîtan dîtine, helwesta wê dîtine. Ji bo kesayeta jina têkoşînê dike û ji bo bîranîna dayîkan, divê em artêşa jinê ava bikin. Dibe ku gelek kes li hember derkevin, lê hûn di nava xwe de nîqaş bikin. Sala bê wê mijara me ya bingehî ev be. Artêşa jinê baş nîqaş bikin. Li ser hevala Bêrîtan û berxwedana wê baş rawestin! Jina her tiştî qebûl dike, zilam jê hes dike. Ya red dike, qebûl nake.

Ber bi Siwar ve çû, hinekî lê temaşe kir:

-Siwar, tu çi dibêjî?

Siwar ketibû kelekcanê, di hundirê xwe de dihizirî ka wê çi bersivê bide. Dixwest nêrînên ji xortan bihîstîn bêje:

-Serokê min, artêşa jinê bi serê xwe nabe. Divê zilam wan biparêzin!

Biken lê temaşe kir. Siwar ferq kiribû ku şaşîtiyek kiriye, lê nizanî ka wê çawa ji navê derkeve. Gotina pêşiyan e; jor ve tif bikî, simbêl in, jêr ve tif bikî rih e. Wisa lê hatibû. Apo jî fêm kiribû ku ew gotin ne yên wî ne. Vê carê ber bi Rozerînê ve çû. Dizanî ku di şerê çekdarî de jî tecrûbeya wê heye:

-Ha, Rozerîn, te bihîst? Xort qebûl nakin. Berê jî min gotibû qebûl nakin tu çi dibêjî?

-Serokê min, li qadên şer nêzîkbûna zilam ji jinê re ya parastin û namûsê ye. Li Amedê jî digotin, jin nazik e, nikare şer bike. Ji qadên şer hatin dûrxistin û tev di zindanên dijmin de hatin işkencekirin. Lê emê artêşa xwe ava bikin. Di her qada zor de me cihê xwe girtiye. Jin dikarin bibin hêzên şer yên serbixwe.

Dema behsa rewşa li Amedê hat kirin, pir hêrs bû:

-Tu çima nav nadî? Li Amedê Zekî wisa kiribû. Lê ne ew tenê kiriye, gelek tiştên din jî kiribûn. Wisa xuya dike kuştina sih û sê leşkeran jî bi fermana wî çêbûye. Hişmendiya li Amedê derbarê jinê de pêkhatî, li dijî hişmendiya me ye. Lê Ferhat jî ne kêmê wî ye. Li Zelê jî kongreya jinê di binê siya Ferhat de ma. Hişmendiya wê demê ya derbarê jinê de ev bû: Jin ne ji bo şer e. Ji ber wê me ew kongre qebûl nekir. Sedema bingehî ev bû. Divê kongreyên jinê di binê siya Bêrîtan de çêbin. Bi dehan keçên di şer de weke wê şehîd bûyîn divê mînak û sembol bin. Ew temsîla jiyaneke nû dikin, temsîla jiyana min dikin. Pîvanên me ji bo jinê ew in...

Piştî axaftinê derbasî pirtûkxaneyê bû. Li pişt mase rûnişt dest bi nivîsa perspektîfên azadiya jinê kir...

***

Saleke nû li ber deriyê şoreşê bû. Ya kevin bi xweşî û nexweşiyên xwe derbas bûbû. Lê şoreşê mohra xwe li geşedanên ser salê dabû. Ji salên Kurdan yên bêdeng, derbasî salên bideng bûbû. Her kesî berê lehiya şoreşê mereq dikir. Temenê şoreşê dîwarê emrê wê bilind dibû. Wê mizgîniya salê bihata dayîn. Her kes li benda gotineke Apo bû. Her ku salek diket ser temenê PKK'ê deriyê wê firehtir dibû, destkeftiyên Kurdan mezintir dibûn. Şer gihîştibû asteke bilind. Kurdistaniyên derveyî welat berê wan li vegerê bû. Li Rojava jî çavê bi hezaran kesî li daxuyaniyên partiyê bûn. Berê her kes li vê qadê bû. Deng hemû li vir kom dibûn. Bi sedan komên milîtanan derbasî qadên şer dibûn, bi qasî wan ji her qadê berê xwe didan vir. Pira aştiyê û çereseriyê li vir bû. Dibistanan bi awayekî berfireh xwe bi êxistin kiribûn. Ji piçûkbûn û bêdngiyê ber bi dengvedan û mezinbûnê ve diçûn. Çawa ku bay kêf û mizgîniyê li vir dixist, yê xemgîniya ji bo pakrewanan jî li vir dixist. Komên şehîdan dihatin

îlankirin. Ji her sê herêman heta Şam û Lubnanê ji bo bibîranîna şehîdan diketin riyan. Kurdan pişta xwe dabû Apo, zincîra dîrokê ya qetiyayî bi hev ve dibû. Keyyfxweşiya Kurdan li her derî weke hev bûbû. Êdî her qad bûbû qada têkoşînê. Qada serhildêriya ramanên azad ji vir diteyisî seranserê Kurdistan û cîhanê ronî dikir. Ev quncika piçûk bi liv û tevgera xwe ya bilez, zora demê biribû, êdî xwe li tenga cîhanê dixist û digot ez heme.

Roja dawî ya meha Kanûna 1993yan bû. Reş ketibû erdê. Li taxa Qabûn ya Şamê wê li mala welatparêzekî sersal bihata pîrozkirin. Apo bi seyareyê ber bi malê ve diçû. Li eywana malê ji mirovan rê nemabû. Jin, mêr, piçûk, mezin, ji her beşa civakê kom bûbûn. Li milekî eywanê jî milîtanên jin û mêr bûn. Her çar dîwarên eywanê bi gulan xemilandibûn. Derdor bi rengê kesk, sor û zer hatibû xemilandin. Weke dengê ji gurbika mêşan derkeve, wisa ji hundir deng dihat. Li nîvê eywanê kursiyek tenê vala hiştibûn. Ala ERNK'ê jî ji aliyê hundir ve, bi cama pencereya li pişt kursî ve kiribûn. Li ser mase jî ala ARGK û PKKê danîbûn. Li derdora wan jî ji her rengî destgul hatibûn bicihkirin. Raserî alan jî wêneyekî Apo yê reş û spî hebû. Çavên kesên rûniştî li ser xemla malê û wêneyê Apo bûn. Di wêne de awirên wî li aliyekî dinêrîn. Derdora wêne bi regnê tîrêjên rojê hatibû xemilandin. Sîmê li derdora çarçoveyê diberiqî. Di guldanka li ser mase de jî kulîlkên çolê yên hûrik hatibûn danîn. Kursiyê şîn weke bûkeke xemilanîd lê hatibû. Du balgî jî li her du aliyên wî hatibûn danîn.

Êdî dema hatina wî bû, ji ber wê eywan bêdeng bûbû. Geh li saetên xwe dinêrîn, geh li deriyê eywanê. Bi bihîstina dengê derî re, çawa ku civanê wan be her kes rabû ser xwe. Bi rûyekî geş ket hundir. Ji rêza li ber deriyê eywanê ve dest bi silavdayînê kir. Ji milê çepê heta milê rastê, yek bi yek destê her kesî girt. Herî talî li ber kursiyê şîn sekinî. Parkeyekî risasî yê vekirî, bestûkên wî hinekî

risasî yê tarî lê bû. Destê xwe avêt zincîra parke heta dawiyê kişand. Hundir germ bû, lê ji kişandina zincîrê diyar dibû ku derve sar e. Pantolonê wî jî risasî bû. Bi rêzdariyeke mezin, li pêşberî kesên rûniştî sekinî. Di rûyê wî de hem aramî, hem leza her car xuya dikir. Di hişê xwe de axaftina ji bo rojê amade kiribû. Li çavên kesên rûniştî temaşe kir. Di hundirê xwe de  got, gelê me hêjayî mizgîniyên nû ye, divê em wê mizgîniyê bidin. Ji bo rûniştina gel, her du destên xwe, bi aliyê rast û çepê ve bilind kirin û danîn:

-Kerem bikin rûnin! Hûn hemû bi xêr hatine!

Çawa ku fermaneke leşkerî hatibe dayîn, tev bi hev re rûniştin. Çengên xwe li hev pêçan û kesên rûniştî careke din di ber çavên xwe re derbas kirin. Hinekî li pêşberî xwe temaşe kir, pişt re li saeta çarkoşe ya bi dîwêr ve nêrî. Êdî dema axaftinê bû. Çavên her kesî li liv û tevgera wî bûn. Bi dengekî bikelecan dest bi axavtinê kir. Dengê wî yê axaftinê jî pir xweş bû:

-Hevalên alîkarên partiyê û gelê me yê welatparêz, hûn dîsa bi xêr hatine. Dawiya salê û destpêka sala 1994'an li we hemûyan piroz be. Kurdên di têkoşîna azadiyê de hemûyan silav dikim. Zivistanên berê pir sar bûn, tarî bûn, lê niha lê dinêrim û li ber xwe jî dibînim germ e û hêvî xurt e.

Bi qasî du kêliyan sekinî. Destên xwe danîn ser balgiyê li kêlkên xwe:

-Hûn dizanin me di demeke kin de li welat evqas hêz û bawerî xuliqand. Isbata karê me ne axaftin e, şerê me ye. Dewlet dibêje, di van salên borî de me heştsed tirilyon pere ji bo şer dane. Niha jî çarsed tirilyonî ji bo şer dixwazin, iflas kiriye. Gelek insanên me dikuje û dike zindanê. Lê ew jî di vî şerê taybet de difetise. Divê em hesabê xwe baş bikin û hesabê rast jî jiyan e.

Li ser pêvajoyê û şer qederekî axivî. Vegeriya ser mijara harî girîng ku hem ew, hem Kurd kiribûn nava lêgerînê:

-Kurd ketiye û bi xwe dilîze. Dijmin bi Kurdan pir dilîze û kirine jiyaneke ji ya koletiyê xirabtir. Lê hê jî hin ruh di me de heye û emê qîmetê xwe çêkin. Sala 1993yan di dîroka me de gelek tişt bi ser xistin. Li gorî hesabê dijmin diviya em biqedin, lê nebû.

Her du destên xwe xistin berîkên parkeyên xwe û di cihê xwe de hinekî çû hat:

-Di meseleya me ya agirbestê de, em bi hêzke mezin li hemberî dijmin û projeya wan ya teslîmbûnê sekinîn. Dawiya 1992'yan hûn dizanin şerekî mezin çêbû, xwestin bi destê xayînan me tine bikin. Telebanî jî bi zimanekî nerm ji me re got, hûnê biçin, bi siyasetê xwe li ser piyan bigirin. Me jî got emê li ser bisekinin.

Ji rengê rûyê wî diyar dibû ku ji hin tiştan hêrs dibe:

-Hûn dibînin niha li Tirkiyê jineke li gorî xwe çêkirine. Dijmin bi pêncî hezarî dihat ser Cûdî, digel ku derdora wê rast e jî lê nikarî bikeviyê. Em mirovên weke hesin çêdikin. Sala 1993'yan bi hezaran leşker û sîlehên giran anîn Kurdistanê, lê bi ser neketin. Niha Telebanî careke din bi navê dîplomasiyê hatiye gel min, dixwaze tiştekî bike. Lê dîplomasiya li Kurdistanê çêbûyî qet fayde nedaye. Kurd berê jî diçûn deran, lê ti kesî qebûl nedikirin. Emerîka jî qebûl nedikirin. Lê bi saya şoreşa me niha diçin her derê. Lê bi xwe dilîzin û dixwazin bi me jî bilîzin. Me armanceke mezin danîbû ber xwe, hedefa me çêkirina tişteke mezin ji bo Kurdistanê bû. Dema insanên bişeref çêbin wê welatê me bibe cinet.

Destek tizbiyên kehrîbarê zerê zerdelî li tiliya xwe ya beranekê pêçabû:

-Ez mirineke ketî, ne dixwazim ne jî qebûl dikim. Ez naxwazim weke her kesî bim. Eger gel bixwe parastina xwe bike dijmin nikare tiştekî bike. Divê em ji bo sala 1994'an xwe baş hazir bikin. Niha rê vebûye; leşkerî, siyasî jiyan, dîplomasî, zane, nezan, xwendevan, jin, şivan, ji her kesî re rê vebûye û werin tevlî xebatê bibin!

Di mejiyê xwe de ew tevlîbûna bedew didît, lê derfetê wê jî ji wan re bi awayekî vekirî digot:

-Gelek kes dibêjin, Apo dîktator e. Ezê van derfetan bidim we, lê weke min kar bikin! Roj roja şer, serhildan û yekîtiyê ye. Eger hûn bi destê xwe nikarin, bi zimanê xwe, bi dilê xwe bikin. Divê heta dawiyê mirov xwe bigihîne jiyana birûmet. Bila dost jî û dijmin jî hay ji xwe hebin.

Yên rûniştî di gotinên wî de vê carê zelalî û cudabûn baş didîtin. Wî bixwe jî dixwest vê nîşanî wan bike û berê lehiya şoreşê bide her kesî. Pêşiya xwe pak bike û bi xwe re biherkine. Piştî axaftina du saetan dengê çepikan bilind bû. Li saeta xwe nêrî. Xatirê xwe ji civatê xwest, bilez derket. Di nava taxa Qabûn ya piçûk re seyare derbas bû. Ji ber piçûkbûna taxê gelek bi şiyarî li derdor dinêrî. Piştî ku gihîştin Mesakin Berzê, Siwar nû leza seyarê hinekî kêm kir.